Lê li vir em wê werênina li ser ziman ku wê piştî salên 1990î û pê de wê rewşa duqutubîyê wê ji holê rabikê wê kapitalism wê pêşî bi rewşa xwe ya emperyal û di dewama wê de wê global wê bi têgînên weke liberalismê re wê, xwe bide dîyarkirin. Di wê çerçoveyê de wê, li giştîya dunyê û jîyanê wê ji gelek aliyan ve wê serdest bibê. Di dewama wê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman wê, rewşa bazarê wê weke rewşek tevgerî û aktivî wê, rengên têkiliyên berê wê bi xwe re wê, bide gûharandin din. Di serî de mirov dikarê bahse hinekî li ser rengê têkiliyên berê ên kevn ên di jîyanê de

ku ew hena û serdest in li ser wan bisekinê. Wê, di destpêka dewleta 'mureffeh' a kapitalist ku ew her tiştî kontrolbikê û kifşbikê de wê, di rengên têkiliyên wê yên kevneşopîyî de wê, sazûmanak di rewşa karûxabatê de jî wê hebê. Mer wê, xwediyê karekê bê. Wê di dema xwe de wê herê û wê were. Jin wê li mal bê û wê, weke jina malê bê. Wê her tişt wê li ser rewşa hêza mirovî re wê, di rewşa xwezayî de wê di jîyanê de wê were beşkirin. Mînaq wê, mêr ber ku ew di rewşa hêza xwe ya destî de zêde ya wê, ew wê bi wê re di nava jîyanê de wê derkeve li pêş. Ji wê re wê bê gotin 'hêza çeng a mêr.' Ev hêz wê, mêr di mal de nedê sekinandin. Ewê li derve wê, karûxabatê bikê û wê, weke kesê ku ew debare malê dikê bê. Ev rewşa mêr wê, di aslê xwe de wê, weke rewşeka bi hezaran salan ku wê, xwe bi wê rengê li gorî deman reng û awa standiya û daya demandin bê. Di serdemên neolitikê û ên berî wê de wê, mêr li derve wê, nêçirê bikê û wê, jin di şikeftê de wê, li zaroyan wê binerê. Ev rewş wê, piştî pêşketina jîyane şariştanî de wê, di rewşa jîyanê de jî wê, xwe bide domandin.

Rengê rewşa têkiliyên di nava mêr û jinê de ku wê li ser rewşa malbatê re wê biafirin wê, di wê rengê û awayê de wê, xwe pêşbixin. Wê ev weke rewşek kevneşopîyî a ku ew teqez were kirin û domandin bê. Ev rengê têkiliyê wê, di aslê xwe de wê, heta serdema me jî wê, werin. Di wê rengê û awayê de wê, mirov dikarê di dewama wê de wê, werênê li ser ziman ku wê, aktivitiya bazarê a di nava jîyanê de wê, hin bi hin wê, weke rewşeka ku wê, gûharînan di wan rengên têkiliyan de jî wê, bide çêkirin bê. Di cihane bazarê de wê, ne tînê mêr wê hin bi hin di rewşa kar de wê, cih bigirê. Hin bi hin bi pêşketina di jîyanê de derketina li holê a pişeyên nû û rewşên nû ên bi wan re wê, jinê jî wê, weke mêr wê ji mal derxê û wê li derve wê bide karkirin û xabitandin.

Ev rengên têkilîyî ên klasik (yên kevn) wê hin bi hin wê, gûharin wê di wan de wê çêbibê. Di temenê wê gûharînê de bêgûman em divê ku pêşketineka bi hişmendî û têgihîştinî a bi mirov re ku wê, keseyetîya mirov wê bi xwe re wê biafirênê wê, divê ku mirov wê kifşbikê û wê werênê li ser ziman. Lê ji wê zêdetirî wê, ev rewş wê, weke rewşeka ku mirov wê, bi aktiviteya di jîyanê de re wê hilde li dest û wê, werênê li ser ziman bê. Di dewama wê de ku em li ser rewşa dewletê re li wê bihizirin wê, dewlet wê, weke aliyekê ku ew wê diadilênê wê li wê bê nerîn. Di roja me de wê, kesên ku ew bêkar in ku ew ji saziyên dewletê doza kar dikin û li bendê na ku ew ji wan re kar biafirênê û ankû bibinê wê, wan bikê weke îteatkerê wê dewletê jî. Wê dewlet wê, ji wan re wê, ew wê, sererastkirinê wê bikê û wê, bişopênê. Wê mafê wan li şûna wan wê biparêzê. Ew jî wê, ji her aliyê ve wê, di xismeta wê de bin. Kengî dewletê got wan herin û şerbikin wê ew wê herin şerbikin. Kengî got wan herin bimirin wê herin û bimirin. Di wê rengê û awayê de wê, mirov wê, di rewşekê de wê, bi îteatî wê bijî. Di aslê xwe de ev rengê dewletî ê klasik wê, weke dewleta ku ew her tiştê kontrol dikê û ew dide kifşkirin û dervî wê mafê jîyanê nîn a wê, were dîtin bê. Rewşên jîyanî û aborî wê, ji aliyê dewletê ve wê, ji her aliyê ve wê, were kontrolkirin û wê, bê kirin bin kontrolê de. Wê ew aborîyê bide dîyarkirin. Wê bi gotineka din wê, dewlet wê, weke endazyarê civakê bibinê û wê, hertiştê wê bikê ku ew sererastbikê.

Di aslê xwe de wê, rewşa endazyarîya civakî ku wê, were kirin wê, weke nexweşîyeka çapê û rastê jî bê. Ev herdû alî wê, di şêwayekê de wê, dem bi dem wê, hevdû li ser bûyîna endazyarê xirab re wê rexne bikin. Di vê rewşê de rexneyên aliyê çapê ku wê, li aliyê rastê bikê di wê warê de wê, ew wê, ji kirina rewşek wusa weke ya ku ew rexne dikê wê xilas nekê.



## **Kî baş a kî xirab a**

Rewşa demokrasiya sosyal a demên berê ku me hinekî di beşa li ser vê de di çerçoveya têgîna dewletê û dewletitîyê de wê hanî li ser ziman wê, hinekî din jî wê, li ser nîqaşkirina hizran re wê, mirov dikarê wê, li ser wê bisekinê. Di aslê xwe de wê, di vê çerçoveyê de wê, hizrên ku wê, wê werina li ser ziman wê, bi serê xwe wê, weke aliyna giring ku mirov dikarê hilde li dest bin. Mijare demokrasiyê û wê hanîna li ser ziman wê, di serî de wê, weke rewşa bêşert û merc xwe hanîna li ser ziman bê. Li vir wê dema ku mirov gotina 'sosyalê' û ankû 'civaknasê' ku em li pêşîya wê dênin û weke demokrasiya sosyal û ankû civaknas wê werênina li ser ziman wê, wateyek bi rengê di nava tûra têkiliyên jîyanî de weke bi rehetî tevgerîn jî wê, xwe bide dîyarkirin. Wê, weke rengêkê şîrovekirin û salixkirina li ser wan reng û awayê têkiliyan re jî wê, wate wê bide me. Me di dawîya beşa li ser vê de bahse nîqaşên di nava çap û rastê kir ku ew li ser rewşa endazyariya civakî ku ew gotinê digihênina li hevdû. Di aslê xwe de wê, ev wê, weke rewşeka ku mirov wê, werênê li ser ziman ku wê, di wê warê de weke rewşa çapê ku wê zêdetirî karibê kûr bihizirê û ankû rastî ku wê zêdetirî li awa û reng û dîtbarîya wê bialiqê jî wê, wan ji rewşeka ji rastiya civakê û fahmkirina wê dûr wê ji wê xilas nekê. Di aslê xwe de wê, rewşa weke ya endazyariya civakî ku wê, li ser dewletê re wê were kirin wê, temenê hemû pîrsgirêkên civakî ên hemû deman jî bê. Ber ku wê, civak wê ji rastiya wê û ahenge wê ya bi xate wê ya pêşketina wê re ku ew heya wê, ji wê cûdatirî wê, di reng û awayê de wê, bi têgînên bîrdoziyî wê, were bi reng û awa kirin. Di serî de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku **endazyariya civakî** wê, mirov divê ku wê ji rastiya herikîna wê ya xwe bixwe re wê berdê. Li vir wê, mirov divê ku wê, esas bigirê. Dema ku wê xwest ku ew civake xwe çap biafirênê û ankû aliyê rast xwest ku ew civake xwe biafirênê wê, demê wê, ti qiymetê gotinên weke giringî dayinê jî wê zêde li holê wê nemênê.

Li ser rewşa bi gotina endazyariya civakî re mirov divê ku axiftin, ramyarî, felsefe û hemû cûreyên aqil ên weke 'propaganda' û hwd ku wê, werina pêşxistin mirov dikarê li ser wan bisekinê. Civaknasî û derûnî jî wê, di wê rewşê de wê, weke aliyna din ên teybet ku mirov dikarê bi wan wê hilde li dest û fahmbikê bê. Di sêkika civaknasî, derûnî û felsefeyê de mirov civakê hilde li dest wê, di wê rewşê de wê, weke aliyekê giring wê, çerçoveya gotina me ya bi navê endazyariya civakî jî wê, xwe bide dîyarkirin. Di vê warê de gotina "tu çi bîne ser ziman di nava civakê de wê, bê malê wê" weke gotineka ku mirov wê, di temenê wê rengê hizirkirin, afirandin û hanîna li ser ziman a di wê warê de wê, werênê li ser ziman. Endazyariya civakî wê, weke beşeka ku wê di nava antropololojî û ramyarîyê de wê, were hildan li dest bê. Wê di jîyane me de wê, bi gotin, kifşkirin, hanînen li ser ziman û hwd re wê destpêbikê. Fektorên xwezayî, civaknasî, çandî û hwd wê, bi dîrok û mejuyê re wê, bi zêdeyî wê, xwediyê bandûrê bin.

Wê bi ramyarî, rewşên weke politikayên aborîyê û civaknasiyê û hwd re wê, pîr zêdeuyî wê, xwediyê temenekê bê. Di roja me de wê, ev zêdetirî wê, di nava jîyanê de wê, were hîskirin. Ramyarîya ku ew dihêkirin û gotinên ku ew dihên bi lêvkirin û hwd wê, di wê rengê û warê de wê, çerçoveyekê wê bi wê re wê, bidina çekirin. Ramyarîya welêt ku mirov wê, hilde li dest û çerçoveya wê, ku mirov wê fahmbikê wê, bi wê re wê, reng wê û berê wê bi kûve ya wê, ew wê, were kifşkirin. Di rewşek endazyariyî de jî wê, ev wê, bi xwezayî wê, xwediyê afrînerîyekê bin. Minaq dema ku rejîma tirk

zimanê kurd qadaxa dikê ji kurdan re ku ew xwe bi wê perwerde bikîn û xwe bi wê werênina li ser ziman û statûya wan ya civakî ku ew bi hebûn û dîroka wan a li ser ardnîgarîya wan re ku ew heya ku ew înkâr dikê wê, di wê rengê û awayê de bi mantîqekê ew wê dikê. Her çendî ku wê endazyarîya civakî wê, weke rewşeka dîzaynkirina civakê û kirina wê ya rêyekê a li gorî armançekê jî bê lê wê, ev gotin wê bi xwe re wê, du tiştên din jî wê, bide dîyarkirin. Yek wê, ji temen ve rast ne fahmkirina civakê bê. Duyem jî wê, li şûna fahmkirina civakê wê, bi rengê hizirkirina xwe re hewldana fahmkirina civakê bê. Ev herdû alî jî wê, di rastiyê de wê, ji fahmkirina rast a civakê bi mejuya wê re wê ji wê dûr bê. Wê vajî wê, temenê pîrsgirêkên ku wê, civak wê bijî bê. Hem bloka kapitalist û hem jî ya sosyalist wê, di warê de wê, bi rengên fahmkirina xwe re wê, hertimî wê li hêtê civakê wê bialiqin. Rûxîna yekîtiya sovyet wê, ji aliyekê ve wê, ne rast xwendina civakê bi mejuya wê, di temenê wê de bê. Ji aliyekê din ve jî wê, heta roja me pêvajoya pevçûnê ên serdema kapitalist bi dem bi dem û herêm bi herêm ku wê bijî wê, dîsa wê, ev pîrsgirêk wê, di temenê wê de wê hebê. Heta ku ew dikê civakê weke xwe fahmbikê û weke civakê bi reng û awa bikê wê, bo wê armanca xwe wê, bi hebûna civakê re wê, bi keve nava şer û tekoşînê a pirralî de.

Di wê warê de pîrsgirêkên dewletî ên bi destûrî bin û ankû bi rengên din û hwd bin wê, dîsa mirov dikarê cardin li vir wê bibîrbikê. Ev jî wê, weke aliyekê wê yê din bê ku mirov wê, ji temen ve wê, werênê li ser ziman bê.

Di roja me de wê, minaq wê weke li yewnenistanê wê, partiya Syriza ku wê Alexis Tsipras wê bi wê were bijartin. Lê di demek kort de wê, dema ku wê, were ser desthilatdarîyê û wê dema ku wê, weke ku wê gotî ku wê newênê li cih wê, winda bikê. Di wê rewşê de wê. Hilbijartinên li welêt ên di 6ê temûzê de wê, bina weke têkçûna wê û hêvîyên bi wê ku wê werina girêdan jî wê, were li ser ziman.

Di serdemek ku wê, weke serdeme liberal wê were dîtin de wê, ev wê wê bibê. Di aslê xwe de wê, liberalism wê, giraniyê bide li ser rewşa pergale aborî û serdestî û serbestîya wê ya li giştîya cihanê. Liberalismê wê gelek gotin û rewşên dema reell sosyalismê ku wê bi başî bi lêvkirin û ne hanîn li cih wê li wan xwedî derkeve û wê, werênê li ser ziman û wê li gorî wan wê kirineka li gorî fahmkirina pergale kapital wê bi wê re wê pêşbixê. Wê bo rewşên din ku ew bi awayekê hatina pêşxistin wê bo wan jî wê, ev rastî wê wusa bê. Li ser wê rewşê re wê xwe gelemper bikê li giştîya cihanê.

Piştî rûxîna yekîtiya sovyet wê, stretejiyek ku wê weke **Ronald iglehart(\*)** wê werênê li ser ziman bi gotinên weke “pêşketina rewşa aborî û piştre wê, kes bi rewşa hêjabûna(kalite) jîyane xwe ve wê, alaquadar bibê. Li vir wê kaliteya jîyanê wê, di aslê xwe de wê, weke mijareka ku wê, piştî rûxîna yekîtiya sovyet wê, pîrr zêde wê li ser wê were sekin in bê. Di vê warê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, têgîna “ku wê, ti kesek ne li ser ti kesekî re û her kesek dikarê weke hevdû bijî” jî wê, weke temenê wê têgînê wê, were li ser ziman. Di wê warê de pergalek alikariya civaknasî ku wê, were pêşxistin wê, ji aliyekê ve wê, ji vê rewşê re jî wê, di nava civakê de wê, bê temen.

Di dewama wê de li ser meseleya hevbeşiyê û ankû ‘kollektivismê’ jî mirov dikarê wê, bêjê ku wê, ev jî wê, hin bi hin wê li ser wê re wê, cihê xwe li rewşa jîyane xwe ya ku

-----

(\*)Ronald iglehart wê, profesor û zaneyekê amarikî ku wê li ser modernismê û ankû postmodernismê wê binivîsênê.

mirov wê dijî û derxistina li pêş a ferdiyete re wê bide hiştin. Mirov di nava civakê de wê, çendî wê li rex hevdû wê bijîn lê wê, wilqasî ku ew nêzî hevdû na wê, biqasî wê ji hevdû wê, dûr jî bin. Beyenîbûn wê weke dîyerdeyek civakî a giştî wê, hin bi hin wê, bi wê re jî wê, pêşkeve. Di wê rewşê de wê, êdî wê li rex wê, bi hevdû ne bawerbûyîn û bi tenêbûyîn wê, zêdetirî wê, pêşkeve û serwerî mirov û jiyane mirov bibê.

### **Bijartinên ramyarî**

Em î ro weke ku wê were gotin di nabva pergalek ku wê, hin bi hin wê nixên demokratikî wê bi asta himendîya mirov re wê di wê de wê bilind bibin bê. Di wê dunya demokratik de wê, di nava welêt de wê, parti wê hebin û wê, parti wê xwediyê berneme û armançên xwe yên ramyarî bin. Wê, bi wê re wê, mijarên civakê ên weke pirsgirêk û ku bi wan ve alaquadar dibê wê, ji xwe re wê bikê weke mijar. Wê bi wan re wê, rojevê wê bikê ku bide dîyarkirin. Li kurdistanê wê, partiyên ku ew hena wê, bi zêdeyî wê, weke PDK, PKK û hwd wê, weke partiyên ku wan hêzên xwe yên tekoşînê dana avakirin û tekoşînê bi rêbazên çekdarî didin jî bin. Lê bi wê re jî wê, partiyên weke HDP û hwd wê, weke partiyên qada ramyarî bin. Wê, di nava civakê de wê, bi rêyên danûstandinê û ankû dîyalogê wê, werênê li ser ziman.

Parti wê hertimî wê, xwediyê felsefe û bîrdozîyekê bê. Di roja me de wê, her wusa wê, dema ku wê bahse felsefe û bîrdoziyên partiyên wê werê kirin wê bizêdeyî wê, 'muhafazakarî' û 'liberalî' wê derkevina li pêş. Di wê warê de wê, çendî ku wê piştî salên 1990î wê, rewşa dunya du-qutub wê ji holê rabê jî lê wê, bi wê rengê wê, li ser rengên zihniyetî re wê, di nava jiyane ramyarî de wê, ew wê, bide hanîn domandin. Partiyên liberal jî û yên muhafazakar jî wê, weke partiyên ramyarî ku ew hebûna bazarê wê, esasbigirin û wê li ser wê re wê, xwediyê regekê pêşxistina politikayên xwe bin.

Di rewşa giştîya ramyarîya pergali de wê, politikayên muhafazakari û liberaliyê jî wê, ji hevdû ne cuda bin. Di şewayekê hişk de wê, muhafazakar wê, liberal bê. Lê dema ku rastarast bahse liberaliyê were kirin li çûna gotina muhafazakariyê wê, hingî wê, bi wê întibaya ku wê, hinekî din wê, liberalî wê nermtir bê ji ya mihafazakariyê. Di vê rengê de wê, di şewayekê de wê, xwe bide li berçav.

Di aslê xwe de wê, dema ku mirov wê, werênê li ser ziman wê, tiştêkê din wê, piştî salên 1990î û pê de wê, rûbide. Li şûna van partiyên ku wê, qada ramhyariyê wê, di nava xwe de wê, bi awayekî mantiqê qutubî wê di nava xwe de wê di bin navê 'partiya îktidarê' û ya 'muxalafetê' wê di nava hevdû de parvebikin jî lê wê, dervî wan piçûk mazin wê partinên weke partiyên bi navê 'demokrasiyê', 'partîya keskê' û hwd wê, derkevina li holê. Weke intibayaka giştî a navnetewî wê, navê partiya keskê wê hema bêja wê, di bin rengê rêxistinîya partiyê de wê, li giştîya welatên ku wê, weke 'xwweyî pergalek demokratik' in wê, di wan de wê hebê. Rejimên weke yên li rojhilat ku wan bizêdeyî di bin reng û maskeyek olî de xwe dana avakirin weke partiyên revebirinê wê, bi awayekê fihêtokî jî bê wê, rewşên bijartinê wê, bo ku ew xwe di nava dîmenê giştî ê cihanê de bi awayekê bidina dîyarkirin wê, bikin. Lê her kirina hîlbijartinê wê, mirov nikaribê wê bi awayekê rastarast weke rastîyeka demokratikî jî wê, werênê li ser ziman, her çendî ku wê rewşa bijartinê weke rêgezeka demokrasiyê a bingihînî wê, were dîtin û bi navkirin jî. Ber ku wê gelek ji wan hîlbijartinan wê, bi awayekê vekirî wê, kesên ku ew di nava dewletê de xwe bihêz kirina wê, bo ku ew xwe bi awyaekê di bin regekê desthilatdarî ê 'meşrû' de bidina li berçav bê. Di roja me de

wê, ji gelek aliyan ve wê, bijartin wê, bi wê rengê wê, weke li îranê, tirkiya, gelek welatên din ê herêmê de wê, bi wê rengê wê wre bikarhanîn. Herî zêde wê, ew wê gotina 'demokrasiyê' û 'nirxên demokrasiyê' wê bikarbênin. Lê wê herî zêde jî ew ji wê rastiye wê, di kirinê, gotinê û rastiye de wê, jê dûr bin.

Partiyên ku ew weke 'partiyên iktidarê' ku ew dihên ser serê rêvebirina welêt wê, hertimî wê, di nava wê rewşê de bin ku wê çawa wê weke hevdû kirina civakê û wê weke ku ew dihênina li ser ziman wê 'cûdahiyên ji holê rabikin' wê, di nava hewldanên wê de bin. Lê di rastiye ev wê, bi serê xwe wê, nîşanaka wê bê ku wê, nebûna têgihiştin û hişmendiyeka demokratîkî jî bê. Di çerçoveya demokratîkî de ku mirov bihizirê wê, dema ku mirov di rewşek weha de bihizirê ku ew girseyek civakî a kêmmentewî bê, komeke civakî a weke ya bi rengên din ên weke ciwanan û ankû yên homofilan û hwd bê wê, li şûna ku wê hewlbide ku wan bikê weke xwe wê, bi herêkirina hebûna wan re wê, li levkirineka mirovî wê bigerihê û wê, rewşa aramiyê wê, bi levkirina nava wan re wê, di çerçoveyek giştî de wê, çêbikê. Di aslê xwe de wê, ev wê bi serê xwe wê, weke aliyekê din ê giring ku wê temenê pêşketina civakî a li ser temen û rastiya xwe jî bê. Ber ku wê, civak wê ne tenê di reng û awayekê de bê. Wê gelek rengên pêşketinê wê, di nava wê de wê hebê. Wê ber vê yekê wê, ew levkirin wê, bi navê wan û barkirina wan li qada ramiyê bi nav û hebûna wan re wê, temenê wê pêşketinê û hevdû pejiyendinê jî bê. Di nava rewşek demokratîkî a rast de wê, pêwîstî bi wê nebê ku mirov bo ku were cem hevdû û ankû têkiliyê bi hevdû re dênê ku mirov di heman bawerî û fikrê de bê. Ji wê zêdetirî wê pêwîstî bi wê hebê ku mirov hevdû bi rastiya hevdû re wê bibînê. Levkirina demokratîkî wê, ji vê aliyê ve wê weke levkirineka pêwîstî bê, ne levkirineka bi kotekî (zorê) bê.

Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, gotina rêya sêyem wê, li vir wê, di aslê xwe de wê, çendî ku wê, weke gotineka ne şenber bê di destpêkê de lê wê, di kirina jîyanî de wê, hin bi hin wê, dervî aliyên li hemberî hevdû de wê, bi ne mecbûrbûyîna bijartina aliyekê re wê, xwe di wê warê de wê weke rêgezê demokratîkî a giring wê karibê xwe bide dîyarkirin.

Di wê rengê û awayê de wê, dema ku mirov î ro li rewşa partiyên weke yên keskan ku ew bi têgîneka ekolojîkî tevdiagerihîn wê, ne kêmandam bin. Di aslê xwe de wê, di nava civakê de wê, dema ku mirov dinerê wê, mirov dibînê ku wê, bi hebûna li hewirdora xwe re wê, hin bi hin wê, zêdetirî wê, ew wê weke têgînekekê û têgihiştinekê wê di jîyanê de wê, xwe bide dîyarkirin. Minaq wê, î ro wê, di bin rengê jîyane hemdem de wê, pîrr zêde wê, rewşên weke bi fabrîqa û hwd re wê, berdana gazê û hwd li xwezayê wê bibê. Wê bi wê re wê, ev rewş wê, ji gelek aliyan ve wê, weke rewşna bo bazirganiyê ku wê, hewirdora me bi hebûna jîyane mirov re wê tehdid jî bikê bê. Devereke ku wê li wê hildana bêhn û ankû hewayek paqij ku wê li wê hilde wê, hema bêja wê nemênê li dunyê. Wê xweza wê, pîrr zêde wê wre serifandin. Wê, ji ya ku mirov ji wê pêwîsta wê, zêdetirî wê ji xwezayê wê, hilde û wê, bi wê re wê, hin bi hin wê ahangê xwezayê wê, bide gûharandin. Bi wê re çendî ku wê gûharandin bibê wê, di jîyane mirov de jî wê, ew gûharîn wê bibê. Î ro li bajarên û ankû metropolan wê, li ser deh-milyonan re wê mirov wê di nava hevdû de wê bijîn. Hebûna bajarvaniyê a kosmopolîtîkî wê, bi rêjeya zêde a kesên dijîn a di wê de re wê xwe bide dîyarkirin.

Mirov wê di roja me de wê, bi awayekê wê bi keseyetîya xwe re wê pêşkeve û wê, jîyane xwe wê avabikê. Ber vê yekê wê, bixwezê ku ew jîyaneka ku ew dixwezê wê bijî

wê avabikê. Di wê rewşê de wê, du asteng wê li pêşîya wê hebin. Yek wê, kêmbûna rewşa aborîyê wê car bi car wê, xwe di temen de wê bide dîyarkirin. Aliyê din jî wê, rewşa mudahaleyên bi zêhnî ku wê li jîyane mirov wê bibin wê, xwe bide dîyarkirin. Partiyên sosyalist ku ew hena wê, dem bi dem wê xwediyê felsefeyeka ku ew mudahale li jîyane mirov newê kirin bê. Her wusa wê, bi teneserê xwe were hiştin. Lê vi wê rewşê de partiyên muhafazakar ku weke ku me li jor bi navkir wê, di wê warê de wê, vajî wê, xwediyê wê aqilê bin ku mirov pêwîst bê karibê mudahaleyê li jîyane mirov bikê. Ev gotina 'pêwîst bê!' wê, mantiqê wê li ser esasê politikayên dewletê ên desthilatdariyê wê were avakirin. Gotina weke 'parastina ahlaqê civakê' ku ev şewayên partiyan wê ji xwe re wê bina temenê mudahaleyê wê, di aslê xwe de wê, li ser vê gotinê re wê, her cûra mudahaleyên ku ew dixwezî jî wê, li nava jîyane civakê wê bikin. Minaq wê, di roja me de wê, ji hevçûdabûna jin û mêran ber bi hevdû re nikarin bijîn wê, li hêtekê ahlaqî ê ku wê berê were li ser ziman wê bialiqê. Di wê çerçoveyê de wê, rewşa weke çêkirina zarokan ku wê tenê pêwîstbû ku jinûmêra ku wan bi hevdû re jîyane xwe kiriya yek û avakiriya ku wan biryar bida wê, li şûna wê wê, partiyên desthilatdarê wê, dest biavêjjina mijarên bi wê rengê. Dem bi dem wê, ev mijar li welatên herî demokratik ên roja me jî wê, were li rojevê. Di mijdara 2018an de ku wê, li norwêcê wê, hikimeta Arna solberg wê, mijara jibergirtina zarokê wê, hilde li rojava xwe wê, bertekên giştî û mazin wê ji sazi û komelên jinan li norwêcê wê li hemberî wê, werina pêşxistin. Xwepêşandinên bi sedhezaran li osloyê de li wê demê de wê li hemberî wê, werina kirin. Li vir di aslê de wê, ev rewş wê, bi wê re wê bide nîşandin ku wê, di dunya me de wê, di asta bilind de jî wê ji aliyê hişmendiya demokratikî ve wê, kêmbûn wê hebê. Li hemberî rewşên weha wê partiyên liberal wê, ew wê intibayê bidin ku ew zêdetirî piştigiriyê didina azadiya keseyetî. Wê zêdetirî wê li wê bihizirin.

Li vir di aslê xwe de wê, di çerçoveya sînorê rejîma welat de ku ew çendî weke ku ew 'pêşketî' jî bê wê, çendî wê mirov karibê bahse pêşveçûneka demokratikî a li gorî jîyane mirov wê bikê? Ev wê, weke aliyekê din ê giring ku mirov di dewama wê de dikarê li wê bihizirê bê. Mijarên weke yên keseyetîyê û azadiyê û sînorê wê bi xwestekên wê re wê, car bi car li mudahaleyên dewletê wê bi aliqin. Di wê warê de wê liberal wê, li ser keseyetîyê re wê, ferdiyetê wê derxina li pêş û wê, bi şewayekê wê weke li dijî mudaheleyên li mirov û jîyane mirov bin. Muhafazakari wê vajî wê, aligirê mudahaleyê bin. Partiyên sosyalist wê, ji aliyê aborîyê ve wê, bahse kontrolkirina li wê bikin. Di warê kontrolkirinê de wê, Liberal jî wê, bi şewayê tezên nêzî yên sosyalistan wê, biparêzên di derbarê kontrolkirinên nava civakê de. Lê ji aliyê rengê wê kontrolkirinê û armancên wê ve wê, ji gelek aliyên ve wê, ji hevdû wê cûda bibin. Minaq wê, liberal wê, bahse serbestbûna bazarê bikin. Wê bêkontrolkirina wê biparêzên. Lê çendî ku wê sosyalist jî wê, di warê keseyetîyê de wê, bahse pêşxistina ferdiyetê û parastina wê bikin jî wê, li dijî bêkontrola bazarê bin. Di wê warê de wê, dema ku mirov wê, li gotinên sosyalistan bînerê wê, bi rengên "weke her tişt dihê derxistin li bazarê bo firotinê." Di zane min de wê, di wê warê de wê, çendî ku wê, bi zihniyeteka ku wê, her tişt wê, bihayekê wê hebê wê, nêzîkbûn bibê jî lê wê, di aslê xwe de wê, ji aliyekê din ve jî wê, bi hissiyetî jî bê wê, bi demên xwe yên jîyanê ên dawî de wê fahmbikîn ku wê her tişt wê, ne xwediyê bihayekê de. Nirx û hêjabûn wê, çendî ku wê, bihayek li wê were pîvandî jî lê wê, mirov dikarê werênê li ser ziman ku wê, ti biha nikaribê nirx û hêjabûnê bipîvê. Dema ku em vê bêjin dibê ku wê gelek dordor wê bihizirin û wê bêjin

ku ji xwe bihayîfî jî wê, nîrx û hêjabûnek bê. Rast a. Lê ew pîvandina li wê pîvanê wê, ne beremberê wê bê. Her tişt wê bi xoslet û teybetmendiyên xwe re wê hebê. Ji vê aliyê ve wê, weke rastiyeke bê ku wê, tişt wê, bi hebûna xwe ya ku mirov wê, dikarê bi pîvê, bi hêjabûnekê wê binîrxênê wê hebê. Mirov dikarê tiştêke ku wê li bûtîkekê wê weke şekir, pîvaz, isot, û hwd wê bikirê. Lê wê nikaribê kiloyek jîyan bikirê ku ew bi ser jîyane xwe ve bikê ku ew bi wê hinekî din zêdetir bijî. Di warê fahmkirina me ya li ser jîyanê de wê, mirov dikarê wê hinekî din jî wê kûr û dûr bibê. Lê li vir emê wê li vir bihêlin. Ber ku mijare me ew a. Mijare di serî de wê, rewşên gûharînê, fahmkirina rewşa **xate sêyem**(\*) û pêşketinên civakî û ramyarî ên bi wê re bin. Fahmkirina xate sêyemîn de wê, mirov dikarê li vir wê bêjê ku wê, bi pêşveçûnên di jîyanê de ku ew rûdidin re wê, mirov dikarê wê şîrovebikê û wê, werênê li ser ziman. Wê di vê rengê û awayê de wê, ew wê, weke aliyekê wê yê din jî wê, mirov karibê wê, werênê li ser ziman bê. Di aslê xwe de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa fahmkirina wê, di roja me de wê, weke rewşeka giştî wê, zêdetirî wê, xwe bide dîyarkirin. Em î ro wê dibînin ku wê piştî salên 1990î û pê de wê, bi gûharinên piştî ji holê rabûna herdû qutuban re wê, bi tégîna demokrasîyê re wê, zêdetirî wê rewş wê, werina salixkirin û şîrovekirin. Wekî din wê, heta wê demê wê, di nava dema ku wê pêşketin wê li ser partî û rewşên jîyanî re wê, were şîrovekirin wê bi tégînên weke yên çap û ankû rastê re wê were şîrovekirin. Divê ku mirov wê herêbikê û wê werênê li ser ziman ku wê, piştî salên 1990î û pê de wê, rengê têkilî û jîyane berê a hîyararşîkî a weke li jor dewlemend û li jêr xizan-karker wê hebin wê, gelek rewş wê, di wê de wê gûharîn wê çêbibê. Her çendî ku wê ew dîmen wê bi tememî wê ji holê ranebê jî lê wê, gûharîn wê di wê de wê bibin. Wê, rewşên jîyanê û jîyankirinê wê, yek kêw û yek zêde hema bêja wê, weke hevdû wê bijîn. Derfetên jîyanê wê, zêdetirî wê, pêşkevin bo jîyanê. Derfetên jîyanê ku wê, bibin wê, ji gelek aliyên ve wê, ew wê dîmenê ji hev cûda wê ji holê rabikê. Î ro wê, yekî ku ew zêde dewlemend jî bê wê karibê kêw zêde wê, her betleneyê li welatekê din. Di wê rewşê de wê, ew rewşa bi qutub wê, hin bi hin wê ji aliyekê ve wê, ji holê wê rabê. Î ro wê dema ku wê, çûyîna hîlbijartinekê wê bibê wê, di wê çûyîna hîlbijartinê wê, wê ji hevdû cûdakirina 'kapitalist' û 'sosyalist' a li ser rewşên aborî û hwd re wê, kêw wê ew bi rengê wê re were berçav û wê were dîtin. Wekî din rewşa weke ya 'çap' û 'rast' jî wê, di hîlbijartinan de wê, zêdeyî wê, bandûrê li serkevtin û binkevtinê wê nekê. Ya ku wê, bandûrê bikê wê, ew bê ku wê çendî wê bersivdayîna li xwestekan, hêstan, dîrûstbûn û rastbûn bê.

Lê aliyekê din wê, ew wê, xwe bide dîyarkirin. Wê ew jî wê ew bê ku wê, ji hevdû cûdakirina weke ya bi partîyan, otoriterîye liberal û kevneşopî û ne kevneşopî, hemdemî û hwd wê, zêdetirî wê, pêşkevin. Ev jî wê, di nava rewşeka global de ku mirov li wê bihizirê wê, mirov wê karibê bi wê re wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşên bi wê rengê ku ew zêde derdikevin li holê wê, weke rewşna gişt jî wê, karibin xwe bidina dîyarkirin. Di zane min de ez dikarim gotinekê deynbikin ji nava nîqwaşên ku di wê warê de di çerçoveya giştî a globalismê de û bi wê werênîma li ser ziman wê ev baştirin wê were

-----  
 (\*)Xate sêyemîn wê weke xatek ramyarî ku wê piştî rûxina yekitiya sovyet wê, were ser ziman û wê ji wê were bahskirin. Wê, weke sosyal demokrasîyê wê, li ewropa wê were naskirin. Lê ji aliyê tégîmî ve wê, piştî wê, bi şîroveya sosyalismê re wê, Ocalan jî wê, lingekê wê yê din wê pêşbixê. Di wê felsefeya wê de wê, ne mecurbê ku ew bijartinekê di nava çap û rastê de bikê. Yan jî du hêzên hegomonik de bikê.

fahmkirin. Mınaq wê, bahse ‘pırr-qutubîtiyê’ wê, were kirin. Ev gotina pırr-qutubitiyê wê, piştî rewşa du-qutubitiyê ku wê pêşkeve wê ji aliyekê ve wê karibê vê rewşê vebêjê û wê, bide fahmkirin. Ev rewşa qutubitiyê wê, bi demê re wê pırr zêde wê, xwe bide domandin. Lê di aslê xwe de wê, weke aliyekê ku wê, di çerçoveya rêveberîya demên tengezerîyê de ku wê çawa wê werina bi rêvebirin wê, ew wê, weke aliyekê wê yê din jî bê. Di nava wê rewşa ku ew weke rewşa pırr-qutubi diafirê wê, di aslê xwe de wê, rewşên ku mirov wê, pırr zêde wê, werênê li ser ziman jî wê hebin. Di dema hebûna du-qutuban de wê, rewşên weke yên demokrasiya sosyal wê, zêdetirî wê piştî xwe wê, bide aliyê sosyalist. Ji aliyê bîrdozîkî û têgihîştinî û felsefîkî ve wê, zêdetirî wê, xwe nêzî wê hîsbîkê. Di roja me de wê, dema ku wê, partiyên sosyal demokrat wê, li şûn xwe binerin wê bi haznekê wê li şûn xwe wê binerin û wê di wê lêgerîna xwe de wê, weke ku wê li rewşeka ku ew piştî xwe bidinê de wê, li wê bigerîhin. Ev ji aliyekê ve wê, weke rengêkê hizirkirinê ê ku ew zêdetirî jî fahmkirina hebûna civakê dûr jî bê, wê întibayekê wê bi me re wê bide çêkirin. Di aslê xwe de wê, weke ku wê wusa jî bê. Ber ku wê, dema ku wê, di nava civakê de wê, xwediyê rastiyan wê yên ku ew bi wan dijî ku ew wan fahmbîkê û li wan xwedî derkeve û wê cihêrengiya wê ya jîyanî wê kifşbîkê û wê derxê li asta felsefe û ramyarîya xwe û bi awayekê dûrûst û hevgerî ku ew bijîyan wê, ew xwe piştî hîskirina wan jî wê, nebûba. Li vir di aslê xwe de wê, piştî jî holê rabûna herdû qutuban wê, zêdetirî wê, rewşa fahmkirina civakî û mejuva wê, zêdetirî wê, weke aliyekê pêwîstî wê xwe bide dîyarkirin. Di wê rengê û awayê de wê, ew wê, weke temenekê bê. Lê ji ber ku ew jî ne bi politikayên civakê dem bi dem nêz dibê û di çerçoveya politikayên liberal de dikê ku ew sosyal demokratîyêkê bi zihniyeteka rejîma serdest li welêt bikê wê, êdî wê, ew jî wê, di nava rewşek ne cîdî û dûrûst de wê, were dîtin. Wê, nikaribê xwe bikê weke hêzek serdest. Wê sînorê windahiya rejîmê wê ya wê jî bê. Li vir di aslê xwe de wê, mirov dikarê wê, weke aliyekê din di dewama wê de wê werênê li ser ziman ku wê, rewşa nû a piştî jî holê rabûna herdû qutuban wê, di warê xwe de wê dervî fahmkirina çap û rast, sosyalist û kapitalîzmê, idealîzmê û metalyalîzmê û hwd re wê, di rewşek realist a giştî de wê, karibê hebûna civakê bi hemû reng û awayên wê re wê fahmbîkê, bi rêxistin bikê û wê, bikê rewşa piştî xwe. Piştîşîftîya xwe bi wê dagirê. Di nava civakê de wê, ya giring wê bê ku me gelek caran di lêkolînên xwe din de jî hanîya li ser ziman wê, ew bê ku civak bi rastiya wê ya dîrokî re ew were fahmkirin û ew bi hemû aliyên wê re wê, herêbîkê. Wê derfetê jî wê re pêşbîxê ku ew di nava xwe de bi hemû aliyên xwe yên heyî û yên ku ew pêşdikevin re ku ew xwe rêxistin bikê. Komelgerî û hwd di wê warê de wê, ji temen ve wê, temenê xwe rêxistin kirina wê bê. Civak pêwîsta ku ew li ser temen xwe yê dîrokî bi rastiyan xwe re ew were fahmkirin. Li şûna ku wê hewl were dayin ku ew bê xistin li hundûrê qaliban û were bi reng, awa û şêkilkirin wê, rengê hizirkirina xwe li wê, bi kifşkirina wê û rewşên wê re weke wê biafirênê. Wê ev ne tenê bê dîtin û herêkirina rastiya wê, ji aliyekê din ve jî wê, bê temenê pêşxistina wê ya bi berpêşaroja wê ve jî. Li vir di aslê xwe de wê, mirov dikarê weke aliyekê giring li vir wê, werênê li ser ziman ku wê, civak wê, di rewşa giştî de wê, temenê herî giring ê ku wê piştî xwe dayina li wê bê. Li têgîneka kapitalîst jî û ya sosyalîst jî wê, ji gelek aliyên ve wê, temenê dizaynkirinên wê bin ku wê, karibê wê ji rastiya wê ya dîrokî jî dûrbîkê bê. Pêvajoyê kirin(piretik)ên herdû aliyên ên ji destpêka sedsale 20an û bi vir ve ku mirov wê tenê hilde li dest wê, têrê bikê ku mirov wê baş fahmbîkê.

Hebûna civakê wê, zêdetîrî wê piştîre wê, derkeve li pêş. Bernemeyên ku wê, werina amedekirin ku ew ji aliyê partiyên çap, rast û demokrat ve jî bin wê, ji aliyê xwe ve wê, ew wê hildina li dest. Partiya kurd HDPê wê, bi hişmendiya 'rêya sêyem' wê, werênê li ser ziman. Di wê warê de wê, politikayên civakî hem bo civake kurd û hem jî bi giştîya civakên herêmê wê ji xwe re wê pêşbixê. Di wê warê de wê, ev aliyê wê di aslê xwe de wê, temenê nexweşiyên rejimê ên ji wê jî bê. Aliyekê din jî wê, hebûna civakî a civake kurd ku ew hatîya redkirin û statûya wê, bi ti awayê ji aliyê wan rejimên herêmê ve nayê herêkirin wê, bê xistin bin pêvajoyên hêrişan de. Hebûna civakî wê, di serî de wê, bi pêvajoyên wê re wê, were xistin bin pêvajoyên hêrişê de. Li dijî wê, weke aliyê gel wê, HDP wê bikeve pozisyonekê de. Dema ku weke aliyê gel ket pozisyonekê de wê, bi awayekê xweza wê, bikeve dij-pozisyona li dijî rejimê û politikayên wê de. Ev jî wê bê sedem ku wê, rêveber û wekilên wê hertimî wê oparasyon li wan were kirin û wê her roj bi dehan û sedan endamên wê yên rêveber werina girtin û bèn avêtin li zindanan. Di wê warê de wê, aliyekê wê yê bi wê rengê wê hebê.

Di nava sînorê rejimê de wê weke partiyên iktidar wê, çendî wê gotin a'xalk' û 'demokrasiyê' wê ji devê xwe bernedin jî wê, di çerçoveya sînorê rejimê û zihniyeta wê de wê ew wê werênina li ser ziman. Wê dernekevina dervî wê. Di wê warê de wê, ne weke aligirên civakê lê wê, weke aliyna ku ew li dijî hevdu tekoşîna desthilatdariyê didin partiyên rejimê ên weke CHP, AKP û partiyên din ên rejimê wê, di pozisyoneka wê de bin. Piştî hîlbijartinên 31ê adara 2019an ku wê, partiya desthilatdar wê windabikê wê, gelek deverên navendî ên weke istembûlê wê cardin wê hîlbijartinên wan nûbikin. Di 23 hazirenê de wê yên istembûlê wê, dubare wê, windabikin. Wê bandûra kurdan û dengê wan ê rêxistinkirî wê zêdetîrî wê, di wê de wê, hebê. Dengê kurdan wê, di nava herdû blokkên rejimê ên weke ya 'îtifaqa cumhur' û ya 'îtifaqa gel' de wê, kurd wê, weke aliyekê sêyem jî wê, bimênin. Her çendî ku wê li bajarên tirkiya ên rojava wê, stretejiya bi blokka AKPê dana windakirinê wê pêşbixin û wê weke pêwîstîya wê, dengên xwe bidina nemzetên blokka gel li bajarên weke anqara, istembûl, mersin, adanê û hwd û wê, bi wê dengê wan wê ev partiya wê blokkê piştî 40 salî wê, care pêşî wê li wan bajaran bê iktidar jî lê wê, tevî wê jî wê kurd wê, weke aligirekê sêyem wê bimênin. Kurdan xwest ku bi blokka AKPê bidina windakirin. Ber ku ew bloka ku konseptên şer li ser serê civake kurd bi armanca jenosîdkirina civakê dimeşênê bê.

Di vê demê de wê, AKPê, wê pîr hewlbide ku ew qatbûnê di nava dengên kurdan de bide çêkirin. Gotina birêz ocalan weke banga wî ya li HDPê ya bi rengê "weke aliyê sêyemin pozisyona xwe biparêzê hê ku du roj ji hîlbijartinan re mana wê werênina li ser ziman. Dizanîn ku wê kurd deng nedina wan. Ber vê yekê, dixwestin ku dengên ku kurd, minaq wê libajarên weke sitembûlê ku wê bidina menzetê bloka gel Ekrem inanoglu ku ew qatbikin û bi wê deng kêmbikin û bi wê re ew xwe bi serbixin wê, bikevina nava leyistikên wê de. Di aslê xwe de kurdan ê di kêlîka pêşî de ev rastî didît. Lê aliyekê din jî hebû. Bi rengê ku kurdan gotinên birêz ocalan dixwandin û bi rengê ku rayadarên dewletê û AKPê, dixwendin pîr ji hevdu cûda bû. Ew levnekirina di xwandinê de wê, bo rayadarên dewletê û AKPê weke ne fahmkirinê jî wê, xwe di qada ramyarîyê de wê bide dîyarkirin. Nemaya birêz ocalan ku ew hat ragihandin wê, bi teybetî wê, sazî û nûçegihanên dewletê wê bi 'nûçeyên lezgin' wê ragihênin û wê bêjin ku "ocalan ji kurdan xwest ku ew pozisyona xwe ya sêyemin biparêzên. BI rengê ku wan didan jî wê, bi wateya ku kurd neçîna li ser sandoqan wê ragihênin. Kurdan ev



rewş pîrr zêde baş dixwand. Dema ku kurd neçûban ser sandoqan û dengên xwe bikarnehanîban wê, bi kêmbûna dengên nemzetê blokka gel re wê, AKPê nemzetê xwe bi ser bixista. Di nava leyistika wê de bû. Lê wê leyistika wê, negirt. Bi serneket. Kurdan li bajarên weke anqara, istembûlê, mersin, adanê û hwd bi wê dana windakirin.

Li vir di aslê xwe de wê, weke aliyekê din ê giring wê ew wê hebê ku mirov li ser wê bisekinê wê, rewşa hîlbijartinan bê. Hîlbijartin wê çendî wê weke nişanaka demokrasiyê a temenî wê were dîtî û şîrovekirin jî lê wê, di aslê xwe de wê, weke aliyekê ku wê, di wê rengê de wê, weke rêya 'bi gel dana herêkirin û 'meşrû dana nişandin' a rêveberiyên xwe bê. Rêveberiyek ku ew hat bijartin, piştî ku ew hat bijartin wê, ew gelê ku ew bijartî wê nikaribê wê, ji iktidarê werênê xwerê jî wê, hîlbjartinê heta hîlbjartinek din? Wê çaxê wê demokrasi wê li kûderê wê bimênê? Di aslê xwe de wê, di vê rewşê de wê, ev wê weke aliyekê giring bê ku mirov wê li ser wê bisekinê bê. Mekanismayên ku wê, ji hîlbjartinê û heta hîlbjartinê wê, iktidar wê were xistin wê, newina pêşxistin. Ev jî wê, demokrasiyê wê, ji kirin û hebûna iktadarê re wê, bikê weke qawlikekê.

Piştî salên 1990î û pê de wê, zêdetirî wê piştî dûyna du-qutubî wê, demokrasi wê zêdetirî wê, derkeve li pêş. Demokasî û ankû 'sosyal demokrasi(\*)' wê, ji gelek aliyên ve wê, weke mirovekê bisuc wê were dîtî. Di demên dunya du-qutubî de wê, weke têgîneka li rex ya sosyalîsmê wê were dîtî. Ankû wê weke têgîneka ku ew jî sosyalîsmê û hizrên wê peyxam digirê wê, were dîtî. Ber wê yekê wê, sosyal demokratî jî wê, ji aliyekê ve wê, bi çavekê din ê cûda wê li wê were nerîn. Piştî salên 1990î wê, dema ku wê bahse wê were kirin wê, pêşî li bersiva wê pîrsê were lêgerîn ku ew li bazarê çawa dinerê û liberalismê çawa dixwênê di mejiyê xwe de û li wê dinerê wê, li wê were lêgerîn. Wê, bersivên van pîrsan ku wê li wan werina lêgerin wê, temenê 'baş' dîtina sosyal demokrasiyê bê û ankû 'xirab' dîtina wê jî bê. Î ro ku em li rewşa sosyal demokrasiyê binerîn em, hê jî bi bandûra dunya du-qutubî wê têgîhiştinê dibînin ku wê, bi du aliyekê wê ew wê were pêşxistin. Sosyal demokrasiya ku wê, bi aliyê rastê wê were şîrovekirin û sosyal demokrasiya ku wê, bi aliyê çapê wê were fahmkirin bê. Sosyal demokrasiya ku wê, bi aliyê çapê wê were naskirin wê weke sosyal demokrasiya sosyalist jî wê were dîtî. Wê ber vê yekê wê, weke têgîneka ku ew zêdetirî kontrola dewletê hê jî li bazarê dixwezê wê were fahmkirin. Di rastiyê de wê, di vê warê de wê, rewşa demokrasiyê û ankû sosyal demokrasiyê û bi awayekê rast şîrovekirina van aliyên wê, pêşnekevê. Hê jî wê, di hişmendîya xwe de wê, kêmbimênê. Piştê rûxîna herdû qutuban wê, 'sosyalist enternasyol(\*)' wê were sazîkirin û wê ji pîrriya welatên cihanê wê, partiyên çap û sosyal demokrat wê di bin banê wê de wê li hevdu wê bigihîna li hevdu. Rengê hizirkirina sosyalist enternasyonelê ku ew hê jî gelek aliyên ve jî ne zelal jî bê lê wê, bi têgîneka sosyal demokrasi wê tevbigirihê. Lê li vir em tiştêkê din jî wê, werênina li ser ziman ku wê, di nava wê de wê, gelek qatbûn wê bi zêhnî û rengê fahmkirinê wê hebin. Mînaq wê, partiyên kesk û hwd ku ew pêşdikevin wê, ne

-----  
(\*) Sosoya demokrasi wê, weke têgîneka demokratîkî ku wê bihizirê ku ew bi demê re bi xwenûkirnan ku ew civake demokratîk avabikê ew jî xwe re weke armanc dihênê li ser ziman. Di sedsalê 18'în û piştê wê, zêdetirî wê, weke tîgîneka ku wê pîrr zêde wê, hêrîş û dijberî jî wê li wê were kirin. Ber ku wê bi marksîsma ku ew pêşket wê zêdetirî wê, tîgîna şoreşê wê esasbigirê. Wê sosyal demokrasi wê weke 'reformist', 'oportunist' û heta ku kesên ku wê diparêzên wê weke ajanên kapitalîstan wê werina şîrovekirin jî. Di wê rengê de wê, di bin pêşvajoyekê de wê bijîn.

(\*)Sosyalist enternasyonal wê, saziyeka giştî a navnetewî ku wê partiyên çap, sosyal demokrat û hwd wê di bin banê wê de wê levbigihîna li hevdu

hindik endamên wan wê hebin lê wê, ne xwediye levkirinekê bin. Di wê warê de kar û xabatên ku ew dimeşênin wê, li pişt derîyan wê bimênin.

Li vir wê, dema ku wê bahse demokrasiyê wê were kirin wê, hertimî wê pirsek wê were pirsin. Ew jî wê ew bê ku demokrasi weke qutubekê mirov dikarê li wê bihizirê? Mînaq di rengê qutuba sosyalist(\*) de. Di aslê xwe de wê, demokrasi wê, dema ku mirov li wê bihizirê wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, ji aliyê parastina hebûn û nirxê ve wê, bi dîrûstî radikalîyek wê pêwîst bê. Lê di nava rewşa giştî a civakî de wê, di ahengekê de wê, di mantiqê hevdu pejiyendin de wê, mirov wê şîrovebikê. Mantiqê wê, li ser esasê ku mirov ne bi demê re û ne jî di wê dema xwe de wê, di wekehevdû hizirkirinekê de bê. Wê hertimî wê, cûdahî wê di nava wan de wê hebê û ev jî wê, rastîyeka xwezayî a mirov û jîyane mirov bê. Mirov kirinan pêşdixê û her kirin wê, weke têgînekê jî wê xwediye wateyê bê. Di wê rengê û awayê de wê, mirov dikarê werênê li ser ziman ku wê, jîyane mirov, temen, nirx û rengê wê yê civakî û hwd wê, weke aliyên ku wê mirov bi wan bijî bê. Wê li ser wan re wê pêşaroja xwe wê, bijî. Ez dema ku nîbi têgîna demokrasiyê dihizirim weke aliyekê sêyemin wê, di çerçoveya statûqûyê de wê, nexwezim ku wê hildima li dest. Di aslê xwe de wê, di rastiyê de wê, statûqûya wê nebê jî. Ya ku wê, hebê rastiya demkî a jîyane civakê, kes û komên civakî ên ku ew dijîn bin. Li vir wê, dema ku bi ramyarî bê û ankû bi awayekê din bê ku jî civakê û kesên wê hat xwestin ku ew weke wê bijîn û ankû li gorî têgînekê ew statûya wê hat kifşkirin wê, hingî wê jî wê rastiya demokrasiya civakî a xwezayî jî wê, were dîrketin. Ya ku giring wê ew bê ku wê ramyarî û rêveberî wê, li şûna ku wê hertimî wê civakê wê li gorî xwe wê biadilênê, ew hertimî û dem bi dem li gorî rengê pêşketina civakê û nava wê, dem bi dem xwe biadilênê û bigihênê li reng û awayê kirina ramyarî. Di wê rengê hizirkirinê de wê, cihê pêşketina statûqûyê wê di aslê xwe de wê, nebê. Ber ku wê, hertimî wê xwe li gorî rastiya civakî wê biadilênê. Li vir wê ast û pîvan wê civak û rengê pêşketina wê bixwe bê. Bi aqilê civakê bijî.

Dema ku mirov bahse aqilê civakê bikê wê, di aslê xwe de wê, ev wê, were dîtin ku wê, rêveberî wê, xwediye wê kevnepîyê bin ku wê, xwe ji civakê bi zanetir û çêtir wê bibînin. Wê ew “bermeneyên pêşxistina wê” çêbikin. Wê, ew wê xwe weke yên ‘birast bi rêvebirina civakê’ wê bibînin û wê bihasibênin. Di aslê xwe de wê, ev rewş û rastî bi serê xwe wê, temenê pîrsgirêkên civakê ê hemû deman jî bê. Di roja me de wê, di temenê pîrsgirêkên civakan de wê, ji temen ve wê ev rengê rêveberiyê û pêşketina wê hebê. Ji vê aliyê ve wê, pêwîstî bê ku mirov hebûna welêt û rêveberîya wê bi desthilatdarî jî bê bikê berlêpîrsînê de û wê bi rastî fahmbikê. Di nava rastiya civakê de wê, cihê wê çî bê û ne çî bê wê, divê ku mirov wê fahmbikê.

### **Civak, keseyet, demokrasi û globalîzm**

Di bin sernavê civak, keseyet, demokrasi û globalîzmê de wê, bêgûman gelek sernav, serek û mijarên ku mirov wan kifşbikê û wan werênê li ser ziman wê hebin. Di wê warê de wê, di serî de wê, em bêjin ku emê hûrûkûr hemû mijaran ne hildina li dest. Emê di serî de çerçoveyekê bi giştî bo fahmkirinê weke perspektîf wê, werênina li ser ziman. Di wê çerçoveyê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, ev wê weke aliyekê giring jî bê.

-----  
(\**Qutuba sosyalist wê qutuba sovyetê ba. Wê ew wê weke qutuba ku wê li gorî wê sosyalîzm wê pêşbixista û wê bi berdewanî wê heta kominîzmê wê biriba wê jî wê biheta bahskirin. Lê di sale 1990î de rûxî û bû rûsya.*

Di destpêka mijarê em vê kifşbikin ku wê, piştî rûxîna herdû qutuban wê bahse 'bêwatebûyîna çap û rastê' wê werê were kirin. Ev mirov dikarê wê, weke aliyekê rast wê werênê li ser ziman? Ev wê di serî de wê, weke pîrseka ku em dikarin di çerçoveya mijara xwe dem bi dem wê jî bikin ku li bersiva wê bigirin. Aliyê din pêşketina globalismê bê. Globalism wê, gelek aliyên netew-dewletê wê bêwatê bikê. Wê mecbûr bihêlê ku ew di xwe de gûharînan bikê. Bêgûman wê, dema ku mirov wê li ser wê re wê bihizirê wê, gelek aliyên ku mirov dikarê wê, di çerçoveya globalismê de wê, werênê li ser ziman. Ji aliyê ramyarî ve wê, dema ku mirov wê hilde li dest wê, were dîtin ku wê, rewşa bandûra ramyarîya klasîk a demên berê ku wê di dema dunya du-qutub de jî wê, were meşandin wê were dîtin. Statûqû wê, bi serê xwe wê weke nîşanaka wê bê. Di wê çerçoveyê de wê, statûqû wê, hebûna dewletê wê, ji xwe re wê, bikê temen û wê li ser wê re wê, bikê ku ew 'netewa xwe' biafirênê û ew xwe bi wê bijî. Bêgûman wê, di serî de em bêjin ku wê, gotina netewê û ya civakê wê, li vir wê ji hevdû bi wateyan wê were li ser ziman. Em dema ku bahse gotina netewê dikin em, wê qast dikin ku wê dewletek li ser çerçoveya xwe ya dewletî a bi ramyarî, aborî, yek zimanî û hwd re ku ew diafirênê û nava wê dikê ku ew li gorî xwe dagirê bê. Wê, ev rengê pêşketinê wê, çendî ku wê qarîqatûrekê civakî jî wê, bi xwe re wê bide li berîçav lê wê mirov nikarê bi tememî wê weke civake rast a dîrokî wê werênê li ser ziman.

Aliyekê din ê serdema me wê, bêgûman rewşa ramyarîyê û statûqûyê wê bi serê xwe wê weke sernavekê giring ê demê wê biafirê. Statûqû wê, bi ramyarîyê û bi rengê pêşxistina wê re wê, were pêşxistin. Di rewşa şîrovekirina ramyarîyê û ankû politika de wê, mirov gotina demokrasîyê wê li kûderê bicih bikê. Wê dem bi dem wê, weke ku emê di pîretikan de jî wê kifşbikin wê, politika wê, weke aliyekê ku wê, hertimî wê, demokrasîyê wê, yan weke xwestekên xwe wê şîrovebikê û yan jî wê, sînorê wê li gorî xwe û weke ku ew dixwezê wê xêzbikê. Gotina bi demê re demokratizekirina dewletê bixwe jî wê, dema ku mirov wê dahûrbikê û wê bikê ku wê fahmbikê wê, bi serê xwe wê têrê bikê ku mirov wê, wê rewşê piştrast bikê.

Di dunya me ya ku wê weke dunya global wê were dîtin û şîrovekirin wê, bêgûman wê, ji aliyê bandûrên ku em di wê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman wê hebin. Li vir wê jî mirov dikarê wê, werênê li ser ziman weke aliyekê bingihînî wê, ew bê ku wê, bi demê re pêşketina zanebûnê wê, weke aliyekê ku mirov di temenê wê afirîneriyê û gotina bandûrê a bi gotina gîbalê re ku wê were li ser ziman re wê werênê li ser ziman. Di serî de wê, dema ku mirov wê zanebûnê wê, werênê li ser ziman wê, di cih de wê, fêrbûn û wê bi wê re wê keseyet wê, weke aliyekê wê yê giring ê din wê xwe bide dîyarkirin. Wê demê wê, di asta dawî de wê, keseyet wê weke dîyardeyek din a giring wê bi demê re wê xwe bide dîyarkirin. Gotina keseyetîyê a ku wê, di nava têgîna kapitalismê a lîbîralismê de wê were bikarhanîn û ya di nava sosyalismê de wê, were bikarhanîn wê hinek cûdabûn wê di fahmkirin û nûansên wan de wê hebin. Keseyet wê, weke dîyardeyek giştî û gelemper wê di demê de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Her mirov wê, xwediyê keseyetîyê bê. Pêşketina bi keseyetîyê re wê, weke aliyekê din ê ku wê bandûra wê li temen ve wê li hemû diyardeyên din ên li jîyanê wê hebin bin. Xate pêşketinê ku ew wê, çap-rast, wê kapitalism-sosyalism û hwd wê, hemû diyarde di nava wê de bin wê, ji temen ve wê bi keseyetîyê re wê, wateya wê hebê. Rewşa dewletê û pêşketina wê jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Dewlet wê, di dîrokê de wê weke rengê rêxistinîyê ku ew hatîuya kifşkirin, pêşxistin û heta roja me hatîuya hanîn

bê. Marks wê, dema ku ew bahse keseyetîyê dikê wê, têkiliya wê ji aliyekê ve wê, bi dewletê re wê dênê û wê bêjê ku ' bi pêşketina keseyetîyê re wê, hin bi hin wê, dewlet wê ji holê rabê. ' Wê temenê wê jî wê, di heman gotina xwe de wê, li ser wê bide rûnandin û wê bêjê ku "bi azad pêşketina kes wê, bê sedema bi azadî pêşketina hemû kesên di civakê de. ' Di wê warê de wê, têkiliyek sêkik wê bi wê re wê, dênê û wê werênê li ser ziman. Di dîrokê de wê, dema ku mirov li ser mirov û keseyetîyê re wê, werênê li ser ziman wê, keseyet wê, weke pro-tîpa giştî a civakê jî wê, xwediyê wateyekê bê. Wê, civak wê, çendî wê xwe bi wî re wê, bide dîyarkirin û wê, nirxên xwe wê, di wê de wê, bide pêşxistin wê, keseyet jî wê, dema ku ew xwe dihênê li ser ziman wê, beremberê wê, ew wê, civakê wê bi xwe re wê, rakê li ser lingan wê bide meşandin. Meşîna mirov wê, ji aliyekê ve wê, meşîna civakê jî bê. Lê ev jî wê, ji temen ve wê bi aqil û li ser aqil bê.

Dîrokê ev ev ji gelek aliyên ve bi awayekê vekirî û rehetî daya nîşandin. Pêşketina keseyetîyê wê, ji ber vê yekê wê, weke aliyekê giring ê civakî bê. Mirov nikaribê wê, ji civakê cûda wê, şîrovebikê û wê werênê li ser ziman. Li vir di aslê xwe de wê, weke mijareka giring a civakî û derûnî jî bê wê, têkiliya kes û civakê û bandûra wan ya li hevdû wê, hertimî wê mijara lêkolîmî û fahmkirinan bê. Kîjan ji wan pêşî tê wê, hertimî wê, bê mijara gengêşiyên zêhnî û felsefîkî jî. Lê di rewşek giştî ev bi awayekê vekirî dihê dîtîna ku wê, keseyet wê, zêdeyî wê, derkeve li pêş. Keseyet û civak wê jî hevdû re wê temen bingeh bin. Bê hevdû mirov wê nikaribê wan ji hevdû cûda wan werênê li ser ziman û şîrovebikê. Keseyetîyek bi tenê bi serê xwe wê, mirov nikaribê wê, bi rastî şîrovebikê û wê werênê li ser ziman. Mirov bi xwe wê, weke zindiyekê civaknas bê û wê, xwediyê civaknasiyeka di mejiyê xwe de bê. Her gotin û rewşên ku ew di mejiyê xwe de wan dijî ku ew bi tene serê xwe jî bijî wê, bi civaknasiyek giştî wê ew wê bijî. Di serî de wê, weke aliyekê giring ê vê aliyê mijarê em wê kifşbikin û wê werênina li ser ziman. Mirov wê, hem bi civaknasî û hem jî wê bi derûnî wê, bi civakê ve wê wê girêdayî bê. Ankû mirov dikarê bêjê ku wê, bi hevdû ve wê girêdayî bin. Aliyê din jî wê, bo xwe domandinê bi zayendî wê, bi awayê bîolojîkî jî wê, bi hevdû ve wê, girêdayî bê û wê li hevdû hoyendî bê. Ji aliyê civakî ve ku mirov wê hilde li dest wê, bêgûman wê gelek aliyên wê yên ku mirov wê, di wê rengê û awayê de wê, werênê li ser ziman wê hebin. Têkiliya keseyetîyê bi gelemperiyê û ankû têgîna globalismê re ku mirov wê dênê û wê werênê li ser ziman wê, mirov karibê wê werênê li ser ziman ku wê, keseyet wê, weke ku me hinekî li jor hanî li ser ziman wê her pêşketina ku wê bi xwe re wê çêkir wê bikê malê giştîya civakê. Ew jî wê, bi xwe hanîna li ser ziman re wê bikê. Di wê warê de wê, gelemperî wê, li ser wê rewşê re wê weke xosletek xwezayî ê jîyanî ku mirov di temenê wê de wê, werênê li ser ziman bê.

Tabî mijare keseyetîyê emê li vir hinekî dênina li keviyê û emê bi têgîna globalismê re têgîna netewê û mayîdatîya wê ya bi demê re wê, werênê li ser ziman. Ji aliyê çandî ve wê, wateyek wê giştî wê hebê. Têgîna globalismê wê çendî ku wê, weke sernetewî jî wê, were şîrovekirin û hanî li ser ziman jî lê wê, weke têgîneka ku wê, di wê rewşê de bi gihîna li hevdû a pêşketina wan re mirov dikarê wê, werênê li ser ziman bê. Xosleta netewîyê ku em rewşa hebûna civakeyê li bin bicih biikin û wê werênina li ser ziman wê, di aslê xwe de wê, bi mejuya xwe re wê, mayîdatîyeka wê hebê. Li vir wê, li ser temenê civakî re wê, temenê pêşketina keseyetîyê, jîyankirinê û xwe hanîna li ser ziman wê bi wê re wê, xwe bide dîyarkirin.

Di wê rewşê de wê, dema ku mirov wê bahse globalismê bikê wê, komelên civakî wê hertimî wê qarakerê wan ê sernetewî wê hebê. Wê di wê warê de wê karibin rêveberîya hikimetî jî ew rêya wê bidina dîyarkirin. Di serdemên civakî ên pêşarojê de wê demê ku em bêjin wlê komelîtî û komelgerî wê bi wê rengê wê zêdetirî wê, bi giringî wê pêşkeve û derkeve li pêş wê, rast û di cih de bê. Ji xwe ku netewî-civaketî nebê wê mirov nikaribê bahse hebûna gilobalismekê jî li ser wê re bikê. Di aslê xwe de wê, globalism wê bi derketina netewên din re wê kûrbûna ku ew bi civakî bi wê re xwe dide dîyarkirin wê, li ser rengên têkiliyên wê yên ku mirov dikarê dem bi dem bi rengê hîyararşikî jî bixwênê wê, xwediyê awayekê fahmkirinê bê.

Em ku wê ji aliyê aborî ve wê hildina li dest wê, bi zêdeyî wê, weke ku wê were dîtîn û şirovekirin jî wê, rastiya wê were fahmkirin û dîtîn. Weke rengê sazîyên serneteweyî ku wê ji nava netewan li nava netewan wê têkiliyê dênin û wê pêşketinê wê bi hevdû re wê, bi şirket û danûstandinê bi çandî, bazirganî û hwd re ku wê bide çêkirin wê, mirov dikarê weke aliyekê wê yê din ê giring jî wê, werênê li ser ziman. Di wê rengê û awayê de wê, di aslê xwe de wê, dema ku wê, herêmîtî û netewîtî herêm bi herêm wê, di wê warê de wê, weke aliyna ku mirov wê, dikarê wê, werênê li ser ziman. Di roja me de wê, bo ku komek civakî û ankû netewî bo ku ew bijî wê, pêwîstîya wê bi wê hebê ku ew di awayekê rast de wê fahmbikê, xwe bi wê fahmkirinê pêşbixê û wê bi wê re jîyane xwe biafirênê. Parvekirin wê, weke aliyekê wê yê ku mirov wê dikarê wê, werênê li ser ziman. Weke hemû gotinan di dema globalismê de wê, wateya parvekirinê jî wê, pirralî û rewşî bê. Di ti rewşên wateyî ên bi jîyankirinê de wê, ew gelemperîya global wê weke ku ew dihê gotin wê nebê. Ji xwe ku ew heba wê mirov nikariba bahse globalismê bixwe bikira. Bo ku ew globalism bibê wê, ew wate wê biafirê û wê were ser ziman û bi wê re wê were gelemperkirin. Wê bi wê re wê, hingî wê ew wê bi pêşketinî wê xwe bide dîyarkirin.

Globalism wê were wateya xwestek û rengên wan ên nû û nû di nava jîyanek hevbeş de. Bi wê re wê, were wateya nasnemayên herêmî ku ew werina kifşkirin, pêşxistin û derxistin li holê. Wê, di wê çerçoveyê de wê, ev wê, weke aliyekê wê yê din jî bê ku mirov wê werênê li ser ziman. Ji aliyê civakî ve ku mirov werênê li ser ziman wê, li qanada Quebec(\*), li îspanye bask û qatalanya(\*). Li ingilistan iskocya(\*), li rojhilata navin kurd, ermenî, asûrî û gelek komên din ên civakî û hwd mirov dikarê navê wan werênê li ser ziman.

Di wê warê de wê, astangiya herî mazin wê, li pêşîya pêşketinê wê, statûqûftîya ku ew bi demê re pêşdikeve bê. Wê, di serî de wê, weke aliyekê giring mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Dema ku mirov di nava jîyane global a hevbeş ku ew pêşdikeve de ku em bahse keseyetîyê bikin em, dikarin wê bêjin ku keseyet çendî ku pêşket û xwe dît wê, mudahaleyên li jîyane xwe ku ew ji kîjan dordorê werin û lê bibin wê li hemberî wan wê bikê ku ew berteke xwe bide nîşandin. Bertek ne tenê bi devkî wê hanîna li ser ziman a. Bi hêstî, hişmendî û hwd jî wê, mirov wê werênê li ser ziman. Keseyet wê, weke

-----  
 (\*)*Qoebec herêma qoebecîyan ku ew bi etnikî weke xalkekê herêmî na û di nava sinorê qanada de dimênê ev herêm*

(\*)*Qatalonya û baks wê, du herêmên ji hev cûda ên di nava sinorê îspanya de bin. Lê baskî û qatalani jî tekoşîna serxwebûnê bi civakî didin ku ew jî îspanya vaqatihin.*

(\*)*Iskocya wê herêma iskocîya di nava sinorê ingilistanê de bê. Xwedî parlamen û xweserîya xwe na. Hikiimeta iskoc heya û ew li ser qadera iskocîyan xwedî bîryar a.*

çerçoveyek giştî wê, xwe bide dîyarkirin. Wê, navenda xwe wê biafirênê. Wê, di nava jîyane gelemper a global de wê, keseyet wê, weke dîyardeyek giştî û temen bê. Ji aliyekê din ve jî wê jî mirov dikarê wê, werênê li ser ziman wê, keseyet wê, mudahaleyên rêveberîyê ên li jîyane xwe jî wê, herê nekê. Di wê warê de wê, çendî ku wê keseyet wê pêşkeve wê, bandûr û kontrola dewletê jî wê, kêmbimênê. Wê weke qalîkê wê bimênê. Navaroka wê, qalîkê wê, piştî wê, mirov çawa li gorî wê dema mirov bi keseyet dagirê wê, ew jî wê, bi serê xwe wê, weke mijareka din a ku mirov wê, bi teybetî dikarê wê li ser wê bîponijê û wê hilde li dest bê. Di aslê xwe de wê, di serdema globalismê de wê mijare fahmkirina keseyetîyê wê bi serê xwe wê, weke mijareka teybet a ku mirov wê, dikarê wê hilde li dest bê. Wê, dema ku me ew hilda li dest wê demê tîkiliya keseyetê bi civakê û hebûna civakê û dewletê mirov çawa bi tîkiliyekê wê werênê li ser ziman wê, ew jî wê, weke aliyna din ên giring ku mirov wan dikarê werênê li ser ziman bin. Globalism wê, weke rewşeka giştî a bi hevbeşîyên ramyarî û aborî ku ew afirîya bê. Wê, di wê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, di nava pêvajoyên globalismê ên ku weke pêvajoyên zaroktiyê ku ew derbasbûna wê, zêdeyî wê, ji aliyê aborî û hwd ve wê, were hildan li dest. Wekî din wê, mirov wê, hertimî wê, tiştê jêre were dîtin ku ew heya xwe bide li ser wê. Em dikarin wê weke 'meşkele' û 'hobî(\*)' jî wê, werênina li ser ziman.

Pêşketina keseyetê li ser pêşketina aqil re wê weke pêşketinêka ku wê nebê nabê bê wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Lê di serdemên me yên aqil de wê, ev wê bi rengên bîrdozîyan wê werê li ser ziman. Liberalism, marksîsm û hwd wê, bi gelek rengên din ên bîrdozîyî wê were li ser ziman. Lê di vir wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman wê, aliyekê sêyemin ê aqil wê hebê ku wê, li ser van rengên hizir hemûyan re bê. Ew jî mirov wê carna bê ku di farqê de bê wê dijî. Ew jî wê qate pêşketina aqil bê. Freud(\*) wê, bi tîgîhiştina derûniyê re wê, bi egoyê û pêşketina wê re wê, hebûnê bîne li ser ziman. Hebûna keseyetîyê wê, weke aliyekê pêşketina mirov bê. Wê çendî ku wê li ser temenekê kevneşopîyî wê were hanîn li ser ziman bi aqil û rengên wê re lê wê, mirov dikarê di dewama wê de wê, werênê li ser ziman ku wê, keseyet wê ji aliyekê ve jî wê, derketina dervî ya weke herêkirin û herênekirinên me jî bê. Mirov wê di jîyane xwe de wê, dem bi dem wê xûyû tiştên ku ew fêrî wê bûyî wê bi wê bijî. Wê ev ji aliyekê ve wê nîşanaka keseyetê a bi hebûna wê re bê. Lê rengê keseyetîyê jî wê, bi demê re wê, bi gûharînan re wê xwe bide dîyarkirin. Ji sedsale 19'în û 20'în ve wê, rewşên weke 'kesên çapgir', 'kesên rastgir', 'kesên demokrat' û hwd wê, derkevina li holê. Ev gotin wê, çendî rengê pêşketina keseyetê wê werênina li ser ziman. Lê di aslê de wê, ev gotin wê ji aliyekê din ve jî wê, nîşanaka hebûna keseyetîyê kêmbimênê zêde xwe dayîna li der jî bê. Wê jî weke aliyekê wê yê giring wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Dema ku em bahse çap û rastê bikin wê, ev cûdabûn jî wê, ji aliyekê ve wê, weke rengê ku mirov li ser wê re wê, werênê li ser ziman bê. Bi teybetî wê ji destpêka sedsale 20'an û pê de wê, cûdabûnê weke çap û rastê li hemberî hevdu wê pîr tişt wê hebin. Wê, şewayekê qutubî wê bi wê cûdabûnê re wê, pêşkeve. Ji xwe wê cihane du-qutubî û piştî ya pîr-qutubî wê, di encama wê de wê

-----  
 (\*)Hobî wê tiştê ku mirov xwe bi wê mijul dikê weke meşkele bê.

(\*)Freud wê, psikanalîstê sedsale 20'an bê. Wê teoriya psikanalîsmê pêşxist û temenê wê, bi awayekê ku wê çawa wê, di wê dermankirinê wê bê kirin pêşxist.

pêşkeve. Di wê warê de wê çap û rast wê bi felsefeyên ji hev cûda ên li hemberi hevdu re wê derkevina li holê. Bi teybetî wê, weke aliyekê du-qutubiya ji şerê cihanê ê yekem ve ku wê pêşkeve wê, ev wê di temenê wê de bê. Lê li vir em wê jî wê, werênina li ser ziman wê, çap û rast wê, wê weke têtîna ku wê, di encama pêşketineka bi aqil re de wê pêşkevin bin. Ev rewşa çap û rastitiyê wê, bi demê re wê, di wê de wê kûrbûn wê bibê. Cihane çapgirî û 'cihane rastgir' wê, bi nixxên têtîhiştîni ên ji hevdu cûda wê pêşkevin. Rewşa çap û rastê wê, bi demê re wê, bi aqil re wê, pêşkevê. Ew aqilê ku ev herdu têtîna pêşkevina wê hin bi hin wê têtînen li ser wan re jî wê, weke nixx wê hin bi hin wê pêşbixê û wê bide diyarkirin. Çap jî û rast jî wê, di wê warê de wê, dema ku mirov wê bahse nixxên navaroka wan wê bikin wê, bahse rewşên jîyanê ên ku ew baştirin dixwezî ji mirov re wê bikin. Şiroveyên aliyê çap wê, zêdetirî wê, hevgerîneka wan bi dîrok û fahmkirina civakê re wê, hebê. Lê çendî ku wê, çap wê têtîna sosyalîsmê wê pêşbixê û derxê li pêş jî wê, ji aliyekê ve jî wê, hin bi hin wê, were dîtîna ku wê, ya ku wê, ji wê kêmbê wê, têtîna demokrasîyê bê. Demokratîkbûn wê weke gotineka ku wê heta salên 1970yî jî wê, di literatura çap û rastê de wê tenê wê bi gotinê wê hebê.

Piştî salên 1990î û pê de wê, rewşên nû wê li ser keseyetîyê re wê xwe bidina diyarkirin. Mînaq wê, ji vê demê û pê de wê zêdetirî wê li ser hebûna dewletê û mudahaleyên wê li jîyanê re wê, werê li rojevê. Thatcher(\*) û Bush(\*) wê, ji vê demê û pê de wê, temenê pêvajoyek nû wê, bo pêşxistina cihanek liberal wê biavêjin. Gotinên weke "Bila herkesek li çareya serê xwe bînerê" wê, zêdetirî wê, werina hanîn li ser ziman. Ya zêde wê bi hanîna gotinên bi vê rengê wê kirpandinê wê bide kirin wê Thatcher bê. Ev jî wê, bi armanca pêşxistina cihane liberal, bazarê û sererastkirinên wê bin. Wê keseyetîya ku wê were ser ziman wê, di rengê de wê, weke kesetîyeka bazaê bê. Wê, di wê rengê de wê, dema ku wê keseyet wê were hildan li dest wê, çendî wê, serifendîna wê di jîyanê xwe de wê bikê wê li ser wê re wê, lê were hizirkirin. Mirov wê, bi jîyane wî ya ku ew bi wê dijî wê, weke lingekê aktivkirina bazarê û dewrûdayimîtiya bazarê bi kirin-firotinê û xericandina tiştan re.

Keseyet wê, bi ferdiyetê wê hebê. Ferdiyet wê, bi nixxên wê yên ku ew bi wan dijî re wê hebê. Wê, di wê rengê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Ferdiyet wê, weke têtîneka ku wê, li ser esasê bûyîna keseyetîyê wê xwediyê wateyê bê. Her keseyet wê ferdî bê û wê xwediyê ferdiyetekê a bi serê xwe bê. Di wê rengê de wê, ferdiyet wê, bi aqil û hebûnî bi serê xwebûyîna keseyetîyê bê. Keseyet wê, bi rengê xwe re wê hebê. Em dema ku bahse wê dikin wê weke têtîneka ku wê di bin bandûra demên du-qutubiya dunyayê bê wê, têtînen çap û rast wê werina berbîra me. Mirov wê, di wê demê de wê, yan weke çap û yan jî weke rast wê werê nasin. Piştî salên 1990î û pê de wê, gelek caran wê bahse hebûna çap rastitiyê ji holêrabûna wê were kirin. Hizirvanên ramyarî ên weke **Norberto Bobbio**(\*) wê, bahse kifşkirina nava

(\*)Bush wê baskanê amarîka ê di nava salên 1981 û 1989an de ku wê amarîka bi rêve bibê bê.

(\*)wê baskanê îngîlistanê bê. Ji salên 1975an û heta salên 1990 wî di rêveberîna welêt de wê cihbigirê. Bi hizrên xwe yên ku ew dihênê li ser ziman re wê, bi thatcherîsmê re wê, bê hanîn li ser ziman. Wê li ser bazara serbest wê, hizrên xwe wê, werênê li ser ziman. Wê muhafazar bê.

(\*)Norberto Bobbio wê, siyasetmeder û rewşenbîr û filozofekê îtalyanî bê. Wê ji torino îtalya bê. Wê di bin rejîma missolini de wê, illegal wê, li dijî wî tekoşînê wê bikê "paertito d'Azione" de wê, feliyetên xwe wê bikê. Wê weke sosyalîstekê wê hizrên xwe wê, binisênê. Li ser çapê û di dema cihane global de çawa divê ku ew bijî û wê rengê çawa wê bigirê wê hizrên xwe li ser wê bînen li ser ziman. Di wê warê de wê, gelek pirtûkan wê binivîsênê û pirtûkên wî dibîna çavdêrî ji pêşaroja sosyalîst demokrasîyê a roja me re.

çap û rastê wê bikin. Wê weke hizirvanekê italyanî wê, hizrên wî piştî salên 1990î û pê de wê, di warê de wê, zêde wê werina axiftin. Di pirtûka xwe ya bi navê “kîjan sosyalism(\*)” de wê, pirsgirêkên dema sosyalismê wê werênê li ser ziman. Wê bahse nebûna têgîneka wekhevî a demokratîk jî wê, di pirtûkên yên di wê warê de wê bikê. Di pirtûka xwe ya bi navê “demokrasi û ankû diktatorî”yê de wê, li ser çapê jî wê hizrên xwe di wê warê de wê, werênê li ser ziman. Di wê warê de wê bi awayekê wê, li pirsarêveberîyeka çawa di demên hemdem ên bi aqil de wê, pêwîst bê wê li bersiva wê bigerihê. Di mijare aligirîya çap û rastîyê de wê, bêtê li ser ziman ku wê, hebûna bîrdozîyan ku ew hat xistin li ahengekê de wê hingê wê kesên ku wê, di navê de wê pêşkevin wê bidest lêpîrsîna wan aliyan wê bikin. Di warê de wê babbio wê, hizrên xwe li ser helwesta çap û rastê jî wê, werênê li ser ziman û wê bêjê ku çap dixwezê wekneheviyan ji holê rabikê. Lê rast dixwezê ku ew civakê di nava hîyararşiyekê de wê bibînê. Di dewama wê de wê, li ser hewldana çapê a ji holêrakirina wekneheviyê wê, bisekinê. Gotina wekheviyê wê dîtbar bê. Li vir dema ku mirov bahse wekheviyê kir mirov divê ku wê, hinekî li ser wê bisekinê û wê fahmbikê. Wekheviyek çawa em qast dikin ew jî wê, weke aliyekê din ê ku mirov wê divê ku wê fahmbikê bê. Li vir di aslê xwe de wê, ji aliyekê ve din ve jî wê, dema ku mirov bahse wê, ji holêrakirina wekneheviyan bikê wê, li vir wê aliyê çap wê, hemû wekneheviyan wê ji holê ranekê. Ev jî wê, di aslê xwe de wê, weke aliyekê din ê ku wê bi nerînê ve girêdayî wê bimênê, weke ku bobbio dihênê li ser ziman. Li vir di aslê xwe de wê, weke gotineka ku wê dema ku wê li ser çapê jî wê, were li wê hizirkirin û li ser rastê jî wê were li wê hizirkirin wê, hewlbêdayin ku were fahmkirin ku wê çap û rast wê ji holê rabikin û ankû na. Li gorî Bobbio wê, ev ranebê. Hebûna çapê a ku ew nûha di rengekê lawaz û weke bêarmanc de dijî wê, di aslê xwe de wê, rewşa wê ya hewldan ne dayina nîşandin a fahmkirina rewş û pirsgirêkên cihane roja me bê. Çap wê di aslê xwe de wê, di roja me de wê pirsgirêka wê ya sereka wê ne tenê fahmkirina demê bi ast û pîvane wê ya pêşketinê re bê. Ji wê zêdetirî wê, ji dîroka xwe ya bûhûrî nekarîna kirina nerîna xwe ya li mijar, rewş û pirsgirêkan û bi wê re hanîna wê nerînê li roja me bê. Di wê rengê û awayê de wê, weke aliyekê giring mirov dikarê bin wê xatbikê û wê werênê li ser ziman.

Di mijara fahmkirina çapê de wê, weke aliyekê wê yê din jî wê, ew bê ku wê, weke ku Bobbio jî wê, werênê li ser ziman wê çap wê, bi nerîna ku wê, dewlet wê, dewleta sosyal pêşbixê wê, hizrên xwe wê, di wê rengê de wê, werênina li ser ziman. Di aslê xwe de wê, dewletgirî ku wê çendî wê, berê tenê wê, di mejiyê çapgiriyê de wê, weke amûreka xwe gihanda armancê bê û piştî wê, derbasbûna ji wê werê li ser ziman wê, piştî salên 1990î û pê de wê, zêdetirî wê, di mejiyê çapgirana de wê, hebûna dewletê ku wê, bi wê dewleta sosyal, demokrasi û hwd ku wê, were pêşxistin wê, nerîneka bi wê rengê wê, were pêşxistin. Di wê rengê de wê, nerîna çapê a dewletê wê, ji ya salên sedsale 19'în a weke ya markantilistên demê wê di reng û awayekê de bê.

Weke ku markantilistên demê wê bi çapên roja me re wê di mejî de wê cih bigûharênin wê reng û rewşek wê xwe bi wan re wê, di awayekê de wê, bide dîyarkirin. Di rengê şîrovekirin û hildana li dest a erkên dewletê û reng û şewayê bikarhanîna wê, di wê warê

-----  
 (\*)Bobbio, Norberto(1977); *Quale socialismo*, P. 78-92

(\*)Bobbio, Norberto(1965); *Da Hobbes a Marx*, p.52-71



de wê çendî ku wê hinekî cûda jî bê lê wê, ji dewletê û hebûna wê, ne xwediyê hizirkirina cûdatir bê. Di wê warê de wê, rewşeka di aslê xwe de ku wê, pîrr xarib bê wê, bi rengê pêşketina çapê re wê xwe bide dîyarkirin.

Di aslê xwe de wê, di felsefeya çapê de wê, ji aliyê têgîna azadiyê ve wê, zêdetirî wê, xwe bi rengekê wê bide dîyarkirin. Li aliyê çapê cihgirtin wê, weke bawerkirina bi politikayên azadkirinê re wê di hemwateyê de bê. Wê di wê rengê de wê, reng û awayekê pêşketinê wê, xwe bide dîyarkirin. Di aslê xwe de wê filosof Joseph Raz dihênê li ser ziman wê, bi wekneheviyan re alaquadarbûyîn wê ji pêwîstîya pêwîstîyê û xwesteka xwestekê jî wê were. Ev jî wê, car bi car wê, xwe bi awayekê egzotikî wê bide dîyarkirin. Lê divê ku mirov wê têgînê li gorî rewşan wê hilde li dest û wê fahmbikê.

Wekhevi wê ber çî wê giring bê? Di aslê xwe de wê, ev pîrs wê weke pîrsek mifte a vê beşa me ya ku em wê nûha dinivîsênin jî bê. Ji aliyê civakê ve ku mirov wê, werênê li ser ziman wê, wekhevi wê temenê xwe hanîna li ser ziman û di nava aramiya ku ew bi wê pêwîsta de ku ew bidest bixê û bi wê pêşkeve bê. Wê ji vê aliyê ve wê, weke temenekê giring ê civakê bê. Civakê ku ew bi kevneşopîyên xwe bê û ankû bi rêgezên xwe rêvebirinê bê ku ew weknehevi di wê de hevê wê, derfetê ji kesên nava xwe re wê zêde nasnekê ku ew xwe werênina li ser ziman. Wê ev jî wê, ne tenê bo civakê wê, bi demê re wê bê temenê xwe ne hanîna li ser ziman û pîrsgirêkên weke li şûnmayîn hwd. Wekhevi wê mifteya derfet dayina xwe hanîna li ser ziman a ji endamên civakê re ku ew ji zerer dayina xwe êdî xwe xilasbikê bê.

Î ro li dunya ku ew ji aliyê endustriyê ve pêşketîya em nikarin zêde bahse çapek tundrew bikin. Her wusa wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê çap wê, di reng û awayê sosyal demokratîyê de wê, pêşkeve. Di roja me de wê, hinek libitandinên bi mejiyê kesên çapgir re dibê wê, ji wan wê were ser ziman ku wê, pîrsgirêkên cihane global ên weke wekheviyê, esasgirtina demokrasiyê, maf û azadî, azadiya xwe hanîna li ser ziman, mafê civakî û netewî ên komên civakî û xalkên herêmî û hwd wê, bi wan re wê, were li ser ziman. Lê di vê warê de gihandina wan hizran li bernemeyek demokratîkî û barkirina li tekoşinek demokratîkî a aşîtîyane jî wê, pîrr zêde wê kêmbê. Wekî din qûtbûna têkiliyê wê weke aliyekê din ê ku mirov bi wê re wê, werênê li ser ziman. Di nava cihaneka global de wê, bêgûman wê, çêkirina tûra têkiliyan li nava civakan û bi pîrsgirêkên nava wan re di çerçoveya hebûna wan de bi wan ve alaquadarbûyîn wê, weke aliyekê giring ê ku mirov wê, dikarê wê werênê li ser ziman bê. Li vir wê, mirov dikarê werênê li ser ziman ku wê, hanîna li ser ziman wê, weke aliyekê afrîner a bi têgînî jî bê. Wê pêşketinên ku ew, maf dikin ku ew bi navek cûda werina li ser ziman wê, derkevina li holê. Di wê warê de wê, têgîna demokrasiyê wê, di aslê xwe de wê, yek ji wan bê. Çap û rast wê, ew bi mejuya wê re wê, were li ser ziman. Lê em vê jî wê, weke aliyekê din wê bîna li ser ziman wê, her tişt wê, di vê warê de wê di rewşek dîtbar de wê, xwe bide dîyarkirin. Di roja me de wê, zêdeyî wê, mirov kifşdikê ku wê, pêşketina bi aqil a mirov wê, ji aliyekê ve wê, çendî ku wê bê temenê fahmkirinê wê, hin bi hin wê, sekna bi cûdahiyê a ku ew heya wê, bide dîyarkirin. Çendî ku ew ew hat fahmkirin wê, êdî wê, di nava aqil de wê, weke dîyardeyek fahmkirî wê bimênê û wê, di rewşek asayî a aram de wê were fahmkirin.

Li vir em axiftina xwe bi gotinên weke yên çapê û mayîndabûyîna wê û ankû ne

-----  
(\* )Joseph Raz(1986); *The Morality of Freedom*, P. 94-99

(\* )Joseph Raz(1986); *Practical Reason and Norms*, P.41-78

mayîndabûyîna wê bidina domandin û bi wê re wê werênina li ser ziman. Piştî salên 1990î û pê de wê pîrr zêde wê ji aliyê gelek dordoran ve wê, bahse ji holê rabûna cûdahiya bi navê çap û rastiyê wê werê li ser ziman. Em di serî de wê bêjin ku wê ne çap û ne jî rast wê karibê xwe weke berê bi rêvebibê û bijî. Ew derfet li hemberî pêşketinên ku ew rûdana ji wan re nemaya. Lê li vir wê bêjim ku wê, aliyê rast-liberalist ku wê bi serbestîtiya bazarê wê bihizirê wê, ji salên 1990î û heta roja me wê, cihanê wê bi rêvebibê wê, ji wê re jî wê, bi wê rengê hizirkirin û weke pergalek serdest a pêşketî derfetê ji jîyanê ji wê re jî namenê. Li vir fektora serî a pêşketinê wê, pêşketinên ku ew li ser aqil re bi mirov re rûdidin bin.

Çend ku şert û merc digûharin wê, derfet û temenê pêşketinan ên nû wê xwe bidina diyarkirin. Ev wê hem ji aliyê civakê ve bê û hem jî wê ji aliyê xwezayê ve wê, derkevin li holê. Pîrsgirêkên ekolojîkî ên civakê û yên xwezayê wê, weke pîrsgirêkên ku wê li wê were hizirkirin bin. Lê bo wan pîrsgirêkan çareserkirinên wan jî wê, pêwîstiya bi levkîrin û ankû konsensusên civakî wê hebin.

Bi demê re pîrsgirêkên ku wê derkevin û wê karibin temenê gûharînên mazin di jîyanê de bi xwe re bênin wê, pîrsgirêkên weke yên aborîyê, yên nasnemayên çandî, keseyetê, karûxabatê û hwd wê bin. Lê ev pîrsgirêk hemû wê weke gelek pîrsgirêkên din jî wê weke pîrsgirêkên azadiyê jî bin. Mirov dikarê wan di wê rengê û awayê de jî hilde li dest. Pîrsgirêkên çareseriyê û careserkirina wan û her wusa pîrsgirêkên azadiyê ku wê werina kifşkîrin wê, weke aliyên ku mirov wê, hilde li dest bin. Pêşxistina politikayan li wan û bi wê re gihandina li careseriyên wê, weke aliyekê giring ê ku mirov werênê li ser ziman bê. Di roja me de wê, pîrsgirêkên ku wê li ser van pîrsgirêkan re wê weke aliyekê din ê girantir dikê jî wê, tevî hemû pîrsgirêkên wê, pêşketina *navenditiya çapê* ya. Wê ev jî wê, weke aliyekê din ê ku wê, ji jîyanê û rastiya pîrsgirêkan û çareserkirina wan wê dûrbikê bê. Ber ku wê ew ravîna li navendê wê bi çapê re wê bibê wê, bi demê re wê 'çape navîn' wê pêşkevê. Ev rewş wê bi heman rengê wê, bi rastê re jî wê pêşkeve. Di wê navberê de weke gotinna ku wê, bi sosyal demokratîyê re wê xwe bidina diyarkirin li ser wê valahiya ku wê herdû alî wê bi ravîna li navendê ku wê were li ser ziman 'navitiya aktiv' û ankû 'navenda aktiv' wê weke gotinna ku wê, mirov karibê wan derxê li pêş bê. Lê di aslê xwe de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, li vir wê, rewşa çapê jî û ya rastê jî wê, li ser navendîtiya wan a hatî pêşxistin bê. Di wê rewşê de wê, di serî de wê, têgîneka demokratîkî a sosyalist ku wê, birêz Ocalan jî wê werênê li ser ziman wê, di vê warê de wê weke aliyekê aktivkirina temenê bê. Wê ji wê ji jêr ber jor ve wê karibê temenê xort demokratîkî bi radikalî jî derxê li pêş.

Di roja me de wê, pîrsgirêk hemû wê, werin û li hebûna dewletê(\*) û rêvebirina wê bisekin in. Di wê warê de wê, pîrsgirêk wê ji aliyekê ve wê, çawa wê desthilatdarî wê, were bidest xistin wê, li wê were hizirkirin. Dema ku mijar ev bê wê, hingî wê pîrsgirêk wê weke aliyekê din ê navendî wê bi statûqûyî wê xwe bide diyarkirin.

Di roja me de wê, di vê rewşê de wê, dema ku wê bahse radikalîzmê wê were kirin wê, weke demên berî salên 1990î wê, rewşa çapê li dijî rastê û rastê li dijî çapê wê bikarhanîna wan û ankû li hemberbûyîna wan a li hevdu wê were berbîra mirov. Di wê rewşê de wê, çendî ku wê, qatbûyî jî bin wê, komên demokrat ên sosyal û sosyalist ku ew xwe cûda dibînin jî wê, bi wê qatbûyîna xwe re wê yekpareyeka berfireh a mazin wê biafirênin.

-----  
(\*)Giddens, Anthony (1996) Durkheim on Politics and the State, P. 12-54

Piştî salên 2000an û pê de wê xwestekên weke xwenûkirinê ên sosyal demokratitîyê wê bi gotinên bi heman rengê ên liberalistan ku ew dihênina li ser ziman wê, cûdabûn wê pîrr zêde wê di wan de wê hebê. Di aslê xwe de sosyal demokratitîya ku ew pêşket wê, ji aliyekê ve wê, hin bi hin wê ji gelek ve wê cihê çapê navîn wê bigirê û wê pêşkeve. Ber wê herdû alî wê, ji ber tundrewî û radikalîsme bi wan re wê, nikaribin pêşketîneka giştî û kûr bi jîyanê û mirov bidina çêkirin. Radikalîsm(\*) wê, li pêşîya çareserîyan wê, weke astengiyek giştî û ya her demê jî bê. Di wê warê de wê, gotinên ku wê ji herdû alîyan wê werina li ser ziman wê, ji aliyekê din ve jî wê, li dora cûdahîya bi çap û rastê re ku wê, hebê wê bicivê. Pîrsgirêkên azadiyê û malbatê, komên kal ên qawitî û hwd wê, di nava sînorê dewleta sosyal de wê, werina ser ziman.

Ji gelek alîyan ve wê, dema ku mirov li rewşa çap û rastê binerê wê, mirov dibînê ku wê radikaliya wan wê zêde wê, îtîbarê wê ji aliyê gel ve wê nebînê. Di rewşên çûyîna li hilbijartinan de wê, dengên ku ji wan diravin wê, di vê warê de wê, nîşanaka wê bin. Partiyên çap jî û rast jî wê, di van deman de wê, bi zimanekê nerm û rewşek konsensûsî de wê, werina li ser ziman.

Ku mirov were li ser têgîna konsensûsê wê, di aslê xwe de wê gelek tiştên ku mirov karibê bêjê wê hebin. Pîrsgirêka konsensûsê wê, weke pîrsgirêkek ku wê temenê alozîyên nava civakê de jî bê. Di çerçoveya hebûna civakê de wê, dema ku parti li ser çerçoveya wê û pîrsgirêkên wê, levnekirin wê, temenê pîrsgirêkên wê kûrtir jî bikin. Dema ku mirov li demên bûhûrî binerê mirov wê, gelek minaqên wê jî bibînê. Li kurdistanê partiyên kurd wê, di mijarên civakî de wê, ew pîrsgirêka wan ya çêkirina konsensûse civakî(\* û di wê çerçoveyê de tevbigerihih wê, ew pîrsgirêka wan wê hebê. Di rewşa partiyên kurd de mirov wê, sefeletekê tekûz wê bi hebûna wan re wê kifşbikê. Di rewşa hebûna wan de wê, dema ku ew dikevina berhevdû de wê, beremberê wê, artarnetifa wan wê ne civake ku ew dibêjin ew bixwe jî ji wê ne bê. Wê, ew yan xwe li dijî hevdu û yan jî wê, rejimên ku ew bi tememî hebûna civake wan înkâr dikin wê, hilbijêrên. Ev jî wê, bi rengekê wê bê bijartina tûnabûna xwe bê bo wan. Di vê rewşê de bijartina rêyek sêyemin wê, sereke wê ji pirtûkên nava wan û bijartina rejimên ku ew li dijî civake wan in wê, hebûna civake wan bixwe ba. Di vê warê de wê, rêya sêyemin wê, di vê warê de wê, pêwîstî bo parti û komelên kurd wê, pêwîstîya wê bi jîyanî wê hebê. Ji aliyê têgîn û gotina 'rêya sêyem' ve ku mirov rewşa kurdistanê wê hilde li dest wê, di aslê xwe de wê, bi wê têgihîştina wê, bo parti û komelên kurd û beşên civakê wê, rastîya wan ya civakî, meju, ziman, çand û hebûna wan wê ji bijartina wan ya rejimên serdest ên li ser serê wan re wê, weke rastiyekê wê xwe bide dîyarkirin. Minaq wê, zimanê kurdî wê qadaxa bê ku kurd bi wê bihizirin û xwe perwerde bikin. Wê ji vê rewşê re jî wê, cihê bijartinê wê hingî wê ji wan re wê, bê rastîya wan ya civakî û nîrxên wê bê. Ji vê aliyê ve wê, di aslê xwe de wê, fahmkirîneka giştî wê, mirov dikarê bi wê re bo wan di vê çerçoveyê de werênê li ser ziman.

Ji aliyekê din ve jî wê, rastîya civakê wê, temenê aqilekê hevbeş bê bo wan. Wê, temenê têgîneka konsensûsî a civakî bê ku ew li ser wê re bijîn, bi hevdu re têkiliyê dênin û hevdu bêjî ku ew herina li ser nerinên hevdu ew di rêgezên rastîya jîyane xwe wê werênina li ser ziman. Têgîna konsensûsê wê, di aslê xwe de wê, temenê wê li ser hevdu dftin û

-----

(\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 133-161

(\*)Bobbio, Norberto(1985); *Liberalismo e democrazia*, P.37-83

fahmkirinê bê. Di wê warê de wê, ji wê zêdetirî jî wê, di rengê nerînek giştî a li ser nerînan re wê, xwe bi awayekê wê bide dîyarkirin. Ew rewşa konsensûsî a xwezayî nava civakê ku ew ji aliyê endamên civakê jî ew bi hêncetên cûr bi cûr nayê esasgirtin. Di wê rengê û awayê de wê, ji aliyekê ve wê, partiyên kurd wê temenê pirsgerêkên civakî bin bo civake kurd giştî jî. Civakên ku ew di bin dest de dijîn wê, pirsgerêka wan ya pêşxistina konsensûsê wê ji du aliyên ve wê, xwe bi temenî bide dîyarkirin. Aliyek wê, bi rewşên weke fahmkirina konsensûsê weke kêmesî û ankû radestbûna ji hevdû re bê. Aliyê din jî wê, bi nebûna mejiyekê wan ê bi wê rengê bê. Di wê warê de ku mejiyek hebê jî wê, ew hêza pêşxistina wê bi plan û bernemeyekê jî wê, kême bê. Di wê rewşê de wê, berjewendî wê, li pêşîya wê bi astengiyên ku ew diafrin re wê, ji aliyekê ve wê karibê bide dîyarkirin. Dijberî ku ew bi dijminatîyê bê wê, rewşa muxalîfîyê wê, newênê li ser ziman. Mîrov wê nikaribê bi wê re werênê li ser ziman. Wê dema ku du hêzan li ser esasê nerîna ne wekhev li berhevdû man û li hevdû jî dem bi dem û ankû cih bi cih hisandin wê, hingî wê, weke muxalîfîyê wê, xwe bide dîyarkirin. Rehetî û aramî jî wê, hingî wê, di rewşa ji holê windabûna radikalîsmê de wê, xwe bide dîyarkirin. Sînoren tûj ên nava du aliyên wê, di rewşa hebûna radikalîsmê de wê, xwe bide dîyarkirin. Wê hingî wê, li şûna muxalîfîyê wê, aliyê serdest wê bikê ku ew aliyê din ji holê rabikê.

### **Dewlet û demokrasi**

Li vir jî wê, dewlet û demokrasi wê, weke serekek giring wê xwe bide dîyarkirin. Wê dewlet wê, dema ku wê, were şîrovekirin wê, ji aliyê liberalîstan(\*) ve wê, bi têgîna kêmkirina kifşkirina wê ya li ser jîyanê re wê, werê li ser ziman. Li vir di aslê xwe de wê, çap wê, weke ku em di nava têgîna çapê a demên nû de jî wê dibînin wê zêdetirî dewlet wê derkeve li pêş. Mijara dewletê wê di her rewşê de wê, derkeve ber me. Ber vê yekê wê, dewlet wê, bi erka wê ve girêdayî wê, were şîrovekirin û hanîn li ser ziman. Çapgirên ramyarvan ên weke Norberto Bobbio wê, di rewşa pêşxistina dewleta sosyal de wê, dewlet wê karibê weynek mazin bileyizê. Wê bi wê rengê wê, dewletê wê, werênê li ser ziman. Di rewşa dema tê de wê, çap jî û sosyal demokrat jî wê, di nava hizrên wan de wê, dewlet wê weke dîyerdeyekê wê zêdetirî wê, derkeve li pêş. Di aslê xwe de wê, zêdetirî sosyal demokrasi wê, bi têgîneka liberal wê xwe bişoyê û wê derkeve li pêş. Di wê şewayê de wê, bi awayekê wê, di nava xwe û çapê de jî wê, xîzekê wê bikê nav de.

Li vir wê, mirov dikarê wê dubare wê werênê li ser ziman ku wê, çap wê, bi bêadaletî, weknehevî û hwd re wê, têbikoşê. Wê bi wê rengê wê, derkeve li pêş. Wê jî bi rêya pergalek demokratîk û rêgezên wê bikê ku pêşbixê. Wekhevî û tekoşîna we wekheviyê wê, di aslê xwe de wê, weke rêgezê ku wê xwe di her demê de wê, bide dîyarkirin bê. Li vir wê, dema ku mirov bahse wekheviyê dikê mirov wê, çî jî wê fahmbikê wê, ew jî wê giring bê ku mirov wê, bênê li ser ziman. Wekhevî wê, di wê warê de wê, weke temenekê tekoşîna sosyal demokrasiyê ku wê, di wê îdfayê de bê ku wê, civakê bi başî pêşbixê bê. Di wê warê de wê, dema ku wê, ramyarî hatkirin û meşandin wê, di wê de wê, sînor newê danîn û wê, axiftin û hanîna li ser ziman wê were kirin. Berjewendiyên cuda ku ew di wê de werina parastin. Bo wê jî amûr û rêyên cuda werina pêşxistin. Di warê ragihandin

-----  
 (\*)Bobbio, Norberto(1985); *Liberalismo e democrazia*, P.37-83

û maf û azadiyê de ku wê ti sînor newê danîn li pêşiyê ku wê qada xwe hanîna li ser ziman wê, were pêşxistin û wê ew wê were parastin. Di parastina hevbeş û refahê de wê, hebûna malên civakî û jîyane wê were parastin. Amûrên tundûtûjîyê ji jîyanê dûrêkirin û civake bi rêyên aşîfîyane wê, fêrî xwe parastin û pêşxistinê bikê. Bi wê re aşîfîya civakî wê, saz bikê. Di warê perwerde û lêkolînkirin û pêşxistina aqil de sazûmanak civakî a temen were pêşxistin. Sazûmanaka destûrî a aktiv saz kirina wê. Lê ev sazûmana destûrî ku ew xwe ti carî li ser ti beşên civakê re nebînê û hertimî wan bibînê û xwe li gorî wan saz bikê. Di warê kar, xabat û kermend de ku ew di xabatên civakî de di pêşketina civakî de weyn bileyizê. Di rewşên weke aborîyê de ku kermend mudahaleyên aborî ku ew bi makro û mikro'yî bûn ku ew di weyne xwe de aktiv bê. Di dewama wê de wê ku wê, komeliya civakî wê, were pêşxistin. Hikimet ku ew di nirx û rêgezên civakî de ew ne li gorî komekê û ankû xwe tevbigirihê. Ew di nava jîyanê de li gorî hemû rengên civakî ew bi pejirandina wan re ew, tevbigirihê. Di warê pergale perwerde, tendurustiyê û hemû aliyên din ên ku wê, bibin wê, di pêşxistina wan û sîdîgirtina ji wan de wê, aktiv wê, temenê wê biafirênê. Di wê warê de bo ku ew karibê hevbeşiyên herêmî û sernetewî saz bikê û armancên global werênê li cih wê, ev wê ji wê re wê, weke temenekê pêwîst bê.

Di wê warê de ku mirov hinekî din di hizirkirina xwe de kûr herê wê, were dîtin ku wê, bi jîyane civakê re wê, rewşên nû wê, derkevina li holê. Rengê jîyanê, mafên bo weke xwe jîyankirin û xwe hanîna li ser ziman wê, pêwîstin ku ew werina kifşkirin û parastin. Komelên mafên mirov, ên zayendî, mafê kesên ku ew serifandinê dikin û hwd wê, weke aliyna ku mirov wê, li vir bibîrbikê bê. Parastina ekolojîya civakî û xwezayî, mafê heywanan û hwd wê, weke aliyna din bin. Di vê warê de wê, pêwîstîya fahmkirina giştî a civakî wê hebê. Ev wê, bi xwe re wê encamên wê yên bi ramyarîya rêvebirinê re wê hebin. Di serdemeka ku wê, di wê de komelên civakî û ankû saziyên sîvîl ên weke saziyên civakî ên sîvîl ku wê serdest bibin wê, di nava jîyane civakê de wê, weke lingekê giring ê rêvebirinê wê, hin bi hin wê derkevina li pêş. Heta ku wê, rêvebirina ramyarî wê, ji parlamenanên jî wê, bi ber van saziyên sîvîl û aktivbûyîna wan ve wê, biherikê. Bi gotineka din wê, ew wê zêdetirî wê, di warê kifşkirinên civakî de wê, derkevina li pêş. Saziyên weke parlamenê, hikimetê û hwd wê, weke saziyana ku wê di asta bilind de wê, di çerçoveya ramyarîya global de ku wê, xwediyê politika bin û wê armancan bidina dîyarkirin û wê bikin werênina li cih bin.

Em wê bînina li ser ziman ku ji navendekê kifşkirina jîyane giştîya komên civakî wê, bi serê xwe wê, temenê tengezerîyên ku wê, bi civakê re wê rûbidin jî bin. Ji aliyekê din ve jî wê, tengezerîyên bi rêvebirina dewletê û ankû têkiliya wê ya bi civakê û hwd re wê, xwe bidina dîyarkirin. Dî sîyesetek demokratîkî a civakî de wê, cihê saziyên sîvîl ên komelî wê pirr zêde wê hebê û wê li pêş bê. Bi demê re wê, ew wê were dîtin ku wê ew wê weke dînamîsme rêvebirina civakê jî bin. Di wê warê de wê, di reng û şewayekê rêxistinîya civakî de wê, xwe bide dîyarkirin. Di serdema global de wê bêgûman wê rengê ramyarîya wê û hildana li dest a mijar û pirsgerêkan wê giring bê ku mirov wê fahmbikê. Civak wê, di nava xwe de wê, mekanîsmayên xwe yên xwe parastinê wê bi xwe re wê pêşbixê. Sazi û komelên parastina mafê mirovan, mafê komên zayendî, mafê haywanan, saziyên parastina ekolojîkî ên xwezayî û civakî û hwd wê, mirov dikarê bahse wan bikê. Mînaq saziyên weke yên 'greenpeace' û hwd wê, pêşkevin û wê,

derkevina li holê. Dema ku em bahse saziyên sivil bikin wê, li vir wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku em di mantiqê têgînek hîyararşikî de wê, fahmnekin. Meyle liberalismê wê, bi fahmkirina wê re wê, ew bê ku ew di wê warê de ew bi rengekê hizirkirinê ku wê bêhna hîyararşiyê wê ji wê were dixwezê ku ew bi wê fahmbikê û hilde li dest. Di aslê xwe de wê, di rewşa sazûmana cihane global de wê, ev wê, bi serê xwe wê, weke aliyekê ku wê temenê pirsgirêkên civakî bixwe jî bê. Di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku gotinên weke “divê ku kesên weke endamên civakê karibin li çareya serê xwe binerin” wê weke gotinna ku wê, di aslê xwe de wê, di çerçoveya aktivitiya civakî û endamên wê de wê, mirov karibê wê bêjê. Piştî ji devê kesên Thatcher hanîna van gotinan li ser ziman wê, bi mantiqekê liberal wê were li ser ziman. Di wê warê de em, dikarin wê bêjin ku ev gotin rengê bi lêvkirina wan û wateya wan di wan de ku ew dide me, wê dema ku ew levnekin wê karibin di şewayekê şaş de jî ew wateyê bidina me. Ber vê yekê wê, ev levkirin wê weke aliyekê giring bê ku mirov wê, di ahengekê de wê, werênê li ser ziman û wan fahmbikê. Weke ku wê **Norberto Bobbio** wê werênê li ser ziman wê, di aslê xwe de wê, zêdetirî wê, di nava çap û rastê de wê, cûdahî wê, dema ku mijar were li ser rengê gotinan wê, zêde nebê. Lê wê, di kirinê û encamên ku wê werina derxistin li holê de wê, ew cûdahî wê, xwe bi awayekê wê de bidê dîyarkirin.

Di warê fahmkirina rastiya saziyên sivil û pêşketina wan de wê, di aslê xwe de wê, weke aliyekê civakî wê, pîr zêde wê, hin bi hin wê zêdetirî bi hişmendî wê xwe li pêş bide dîyarkirin. Di wê warê de wê, saziyên ku wê civakê di ahenge wê de wê, hilde li dest û wê, bi fahmkirina xwezayî wê, bikê ku wê bide fahmkirin jî wê, di rastiye de wê, ev bê. Di wê warê de wê, pêşevaniyek giring a civakî wê pêwîst bê ku ew bi dîrûstî were kirin.

Ku mirov ji kîjan aliyê ve binerê wê, dîrûstî, pêşketinek rast û rast perwerdebûyî wê, zêde giringîya wê, xwe bide dîyarkirin. Wê di nava rastiya civakê de wê, fektora perwerdeyê wê, zêdetirî wê, derkeve li pêş. Ev jî wê, weke aliyekê dinamik ê ku wê civakê bi xwe re wê pêşve bibê bê. Di aslê xwe de wê, weke aliyekê giring ê rênîşanê jî wê xwe bide dîyarkirin. Mirov çendî ku pêşket wê du tişt wê bi wî re wê derkevina li pêş di jîyanê de. Yek wê bawerkirina wî ya bi rewşan bê. Ya din jî wê, aktivitiya wî ya di nava civakê de bê. Bi wê re jî wê, jîyane mirov bê. Di roja me de wê, politikayên partiyên wê, zû ji çav wê bikevin. Sedema wê jî wê, ew bê ku ew bi gotinên xwe têrbûnekê di wê warê de ku ew nikaribin bidina hewirdora xwe di nava civakê de. Di gelek rewşên hîlbijartinî de wê, rêjeya çûyina li sandoqan wê, bikeve li jêr. Ji gelek aliyên din ve jî wê, gelek kesên ku ew diçina li ser sandoqan wê, ne bi hêvîya gûharînekê wê herin. Ber vê yekê jî wê, ew tenê wê weke kirinekê ku ew weke pêdîvîya hemwelatîtiya wan dihênina li cih wê dîkin.

### **Perwerde û demokrasî**

Perwerde wê, weke aliyekê giring ê ku mirov di wê de li demokrasîyê bigerihê bê. Di serdemê berê de wê, kesên ku wê kariban xwe bigihandan li zaninê wê kesên ku ew bi aborî xwedî derfet û ankû kesên weke rêveber ên serdest bin. Girseyên mazin wê ew derfet wê di destê wan de nebûba. Piştî serdemên kevnara wê hin bi hin wê, ev rewş wê bigûharê. Aqilê ku wê ji serî ve wê were fêrkirin wê hin bi hin wê dakeve li jêr li nava

(\*)Hebermas, Jorgen(1962); Strukturwandel der Öffentlichkeit, .P.11-42

girseyan û wê bê male girseyan. Piştî serdemên kevnera wê, serdemên navîn û di dewama wan de dema ronansansê wê, weke demek giring a ku wê di wê warê de wê, di girsekirina zaninê û fêrbûnê de wê, gavên mazin wê bide avêtin. Ev jî wê, weke aliyekê giring bê ku mirov wê, li ser wê bisekinê.

Wekî din wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, dema ku wê, piştî dema ronansansê wê were ser ziman wê weke 'dema zaninê' jî wê, were bi navkirin û wê were hanîn li ser ziman. Wê ev jî wê, weke rewşeka ku wê, bi girsebûna aqil re wê ji temen ve wê bê hanîn li ser ziman.

Dema aqil wê, bi felsefe, fêrbûnê û afirandina wê re wê, xwe bide dyarkirin. Ji aliyekê din ve jî wê, hin bi hin wê, dibistanên ku ew berê bo komek kes û ankû bo têtgînek baweriyî hebûn wê, bi zêdebûna wan re wê, ji temen ve wê, bidest perwerdekirinê wê bikin. Wê di wê warê de wê, gavên giring wê ji sedsale 18' min pê de wê, hin bi hin wê were avêtin. Di sedsale 19' min de wê, di wê warê de wê, gavên destpêkê ên giring wê werina avêtin. Di wê warê de wê, perwerdekirin wê, hin bi hin wê, li ser felsefe, aqil û zaninên xwezayî re wê, dest bi pêşketina xwe wê bikê. Di wê rengê û awayê de wê jî mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê ji vê demê û pê de wê, kifşkirinên di warê beşên zanistan de ku wê werina kirin wê, hinekî jî wê, ev rewş wê di temenê wan de bê.

Bi demê re wê, têtgîna mafê perwerdeyê û ankû xwe gihandina zaninê wê hin bi hin wê pêşkeve. Di wê warê de wê dewlet wê, weke saziyek ku wê dibistanan wê avabikê û wê. Temenê perwerdeyê wê, pêşbixê. Wezeretên çandê, perwerdeyê, malbatê û hwd wê, hin bi hin wê, di nava hikimetên welêt de wê, werina demezrendin. Ev jî wê, karê wan bi wê rengê wê, karê weke perwwerdeyê, çandê, malbatê û hwd re wê, alaquadar bin.

Perwerde wê, pêşkeve û wê, di wê wan deman ku wê dem wê were serdemên sedsale 20an wê, hin bi hin wê, pêşketinên dîrokî wê, di van beşan de wê, werina çêkirin. Wê, êdî wê, fêrbûna bi perwerdekirinê wê hin bi hin wê weke karekê xweza ê ku wê, were pêşxistin wê li wê were nerîn. Di wê warê de wê, hin bi hin wê, tiştêkê din wê derkeve li holê. Ew jî wê, ew bê ku wê, rêveber ku wê nerîna wan çi bê wê, li gorî wê amûrên perwerdeyê wê pêşbixin û wê mirovan wê perwerde bikin. Wê bi perwerdeyê wê, girseyên xwe yên 'aligir' wê bikin ku ew wan biafirênin.

Di vê rewşê de wê, di bin navê 'zaninên ne rast' û ankû 'zaninên xaternel' û hwd de wê, zaninên ne li gorî nerînên xwe wê, wan ne hêlin ku ew werina perwerde kirin. Di wê warê de wê, zimane fermî ê welêt wê were pêşxistin. Wê bi wê were pêşxistin. Di wê rengê de wê, gelek komên civakê ku ew xwediyê ziman û çandên cûda na wê, bi wê bûhûrandina wan di 'perwerdeya fermî' wê, ew ziman û çanda wan wê were dayin jibîrkirin û ankû ji holêrakin. Piştî van deman wê, weke pîrsgirêkên civakî ên weke pîrsgirêkên 'bişavtinê' û hwd wê, biafirin û wê bikevina jîyane me de. Ev pîrsgirêkên ku wê ji rengê perwerdeya welêt ku ew dihê pêşxistin ku wê werina pêşxistin bin.

Ji aliyekê din ve jî wê, navaroka amûrên perwerdeyê ên weke pirtûk û hwd wê, bi rengên ku ew dihên nivîsandin wê, ji gelek aliyan ve wê, ji rastiya civakê û çanda wê dûr bin. Bi wê dihê bawerkirin ku mirov, hat perwerdekirin wê êdî ew bawerkirinên wan, dîroka wan ya civakî, xwestekên wan ên weke bi maf û azadiya civakî û hwd wê, temenê wan wê were ji holê rakirin. Ber vê yekê ya ku wê, bi israrî wê, rêveberî wê li ser zimanên fermî ku wan pêşxistiya re wê, perwerdekirinê wê pêşbixin. Wê, di wê warê de wê, bi rêya pergale perwerdeyê wê, çand, ziman û civak wê werina ji dîrokê birin. Li vir wê dema ku mirov wan aliyan hilde li dest wê, di vê rengê û awayê de wê,

rastîya dewletê wê, di aslê xwe de wê, ji gelek aliyan ve wê bikeve berlêpîrsînê de. Di dîrokê de wê, di wê çerçoveyê de wê, bi ji holêrakirin çand û zimanan wê, mesuliyeta wan li ser piştta wê bê. Di wê warê de wê, dema ku wê birêz ocalan wê bahse 'civakên netewî' wê bikê wê, gotina 'di pêvajoyên jenosîdê de hatina derbaskirin û afirandin' wê bikarbênê.

Ev alî wê, di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê, weke aliyna ku mirov wan dikarê ji gelek aliyan ve bi teybetî hilde li dest û wan werênê li ser ziman bin. Dema ku em ji aliyê têgîna demokratîkî ve hilde li dest wê demê em divê ku wê perwerdeya ku ew dihê dayin wê, ji van aliyan ve wê, bikê berlêpîrsînê û wê, werênê li ser ziman. Wê bêgûman wê, ji aliyê demokratîkî ve wê gelek aliyan wê yên ku mirov wê hilde li dest wê hebin. Wê, hem ji aliyê navaroka wê ve wê, mirov wê hilde li dest û hem jî wê, mirov wê ji aliyê rengê dayina wê bi rêbazên wê yên weke ku me hanîna li ser ziman re wê, dikarê wê, werênê li ser ziman. Pêvajoya vê rengê perwerdeyê mirov, wê dikarê bi gelek rengên din re wê ji gelek aliyan din ve jî wê, hilde li dest û wê werênê li ser ziman. Mînaq hebûna malbatê û mudahaleyên li nava wê, rewşên çandî rengên hanîna li ser ziman ên bi ramyarî û hwd ji aliyê felsefeya ramyarîyê ve ku ew bi wê dihê perwerdekirin ve mirov dikarê hilde li dest.

Perwerde wê, dema ku mirov bi têgîna demokratîkî ve wê hilde li dest wê demê mirov wê, divê ku wê ji aliyê maf û azadiyê û rengên wê ve hilde li dest. Li vir ku xwesteka mirov ew bê ku ew bi rengekê û zimanekê were perwerdekirin wê, bêgûman wê, ew weke mafekê ku ew newê nîqaşkirin jî bê. Ji vê aliyê ve jî wê, dema ku mirov hebûna dewletê hilde li dest wê, ji gelek aliyan wê yên bi destûrî û hwd ve wê, weke bi pîrsgirêk wê derkeve li ber me. **Li jêr emê li ser hebûna dewletê û demokrasîyê û erkên wê bisekin in(\*)**. Li vir em, di serî de wê, divê ku wê werênina li ser ziman ku wê, dewlet wê, di roja me de wê, rêyên weke perwerdeyê û hwd wê, bo ku ew 'civake xwe' biafirênê wê bikarbênê. Di dewama wê de mirov, dikarê wê, werênê li ser ziman ku maf û azadî wê, hê jî wê, li bendê wê bialiqin ku mirov jî wê sûdbigirê. (\*)

Mafê perwerdeyê, mafê xwe hanîna li ser ziman, mafên giştî ên civakî û hwd wê, mirov karibê wan werênê li ser ziman. Lê mafên keseyetî ên ferdî wê, yek bi yek wê, çerçoveyek civakî wê biafirênê. Di wê rewşê de wê, dema ku ew temen bi giştî newê afirandin wê demê wê, mafê keseyetîyê jî wê ne hatibê parastin û misogerkirin.

Maf û azadî wê, di warê xwe hanîna li ser ziman, perwerdekirin û hwd de wê, weke aliyekê giring ê ku mirov hilde li dest bê. Ji du aliyan ve wê, mirov dikarê bi giringî hilde li dest. Aliyê pêşî wê, bi wê rengê bê ku mirov wê dema ku ew weke bi rengê ku ew dixwezê ku ew perwerde xwe li ser temenê xwe yê civakî nebînê wê ji gelek aliyan ve wê temenê pêşketina wî ya giştî jî wê, were kuştin bê. Di wê warê de wê, mirov dikarê weke aliyekê wê yê giring wê werênê li ser ziman.

Civakên roja me wê, li ser çerçoveyek ku wê bi maf û azadî û berpîrsîyarîyên wan ên li hemberî civakê û ankû hevdu re wê, were ser ziman. Gotina 'mîrov weke ku ew dixwezê ku ew bijî' wê, di aslê xwe de wê, mirov nikarê tenê li ser rengê jîyanê û derfetên ku ew jî wê re dihên nîşandin re bi tenê werênê li ser ziman. Her wusa wê, dema ku mirov hebûna dewletê wê bi şibihênê pirtûkek perwerdeyê wê demê wê rengê nivîsandina wê û

-----

(\*)Giddens, Anthony (1996) In Defence of Sociology. P9-34

(\*)Hebermas, Jorgen(1962); Strukturwandel der Öffentlichkeit, p.62.80



uniteyên ku ew di wê de werina vekirin wê rengê hebûn û pêşketina wê bide dîyarkirin. Ji vê yekê jî wê mirov dikarê weke encamê derxê ku wê, dewlet ne hebûnna zindî bin. Wê hebûnna bi aqilê mirov ê zindî ku ew dihên afirandin bin. Di wê warê de wê demê wê, mirov çawa wê binivîsênê wê ew wê, xwediyê wê, rengê û awayê bê. Rengê nivîsandina wê bi dîrok û rengê perwerdeyê jî wê, rengê pêşketina wê were dayîn dîyarkirin. Bi hebûna dewletê re wê rewşa perwerdeyê wê bêgûman ji van aliyên ku me hanî li ser ziman bi têgîneka demokratîkî hem ji hundûrînîya wê ve û hem jî ji aliyê çerçoveya wê ya giştî ve wê, pêwîstî bi wê hebê ku ew were kirin berlêpîrsinê.

### **Dad(\*) û demokrasi**

Ji aliyê mijare ve ku em, demokrasiyê û dadê bi hevdû re wan hildina li dest wê, bi serê xwe wê, weke mijareka giring a dîrokî wê xwe bide dîyarkirin. Dîroka dadê ku mirov li ser wê bisekinê wê, bêgûman wê bi hezaran salan wê herê. Çêkirina destûran, zagonan û hwd wê, weke nîşanaka şariştanî û jîyane wê ya bi rêgez ku ew bi pêşdikeve jî bê. Di wê warê de wê, bi teybetî wê, serdemên hûrî û mîtannîyan û piştê ya demên kevnera wê weke demna ku wê bi rêgezên ku ew çêdikin re wê, temenê rêgezên destûrî ên hemdem wê biavêjin. Piştê jî wê, rewşa dadê û pêşketina wê hin bi hin wê pêşkeve. Di serdemên berê de wê, bi gotina kesên weke key û hwd re wê, were ser ziman. Wan çî ji devê wan derketiba wê weke destûr wê biheta dîtî û wê biheta hanî li cih. Piştê jî wê, ev wê bidomê. Lê hin bi hin wê, bi derketina olên yek-xwûdayî re wê, ev rewş wê, bigûharê. Wê, rêgezên ku wê, key jî wê ji wê re wê îteatê wê bikin wê derkevina li holê. Wê, di wê warê de wê, dema ku wê key ew jî li gorî wan destûran dijî wê, tiştê ku wê were kifşkirin wê ew bê ku key xwe weke parastvan û bicihhanînê wan destûran wê xwe denezênê. Di wê warê de wê piştê wê, di dewama wê de wê, xwe weke kesê bijartî ê bo wan destûran wê, werênê li ser ziman. Ev rewş wê, piştê wê, hin bi hin wê bigûharê. Wê, bi destûrên olî ku ew pêşdikevin re wê, di wan de jî wê gûharî wê bibê.

Ji xwe piştî ku aqil pêşket û pê de wê, bi wê re wê gûharî wê hin bi hin wê bibê û wê bi wan gûharîna re wê, werê li ser ziman. Aqil wê, hin bi hin wê, bi felsefeyê û pêşketina wê re wê, destûrên aqil û yên jîyanî ku wê li gorî wan were jîyankirin wê, were û pêşbixê. Bi demê re wê, destûrên giştî ên desthilatdariyan wê pêşkevin. Wê, ji aliyekê din ve jî wê kevnêşopîyên rêveberîyan ku ew pêşdikevin wê ew jî wê ji aliyekê din ve jî wê temenekê bo pêşketina destûrî û zagonan di jîyanê de wê biafirênê. Li kurdistanê wê, hertimî wê kevnêşopî, orf û adetên wan wê giring û pîroz bin bo kurdan. Wê di wê rengê û awayê de wê, jîyane xwe li gorî wan wê biadilênin.

Piştê wê, bi aqil re wê, hin bi hin wê, pêşketinên ku ew dibin wê, adilandin di jîyanê de wê bi xwe re wê, werênin ew adilandin jî wê, weke rewşna ku mirov dikarê wan di vê çerçoveyê de bi aqil werênê li ser ziman bin. Piştî serdemên navîn wê, çendî ku wê ji aliyê keyan ve jî wê, werina bi rêvebirin wê welatîtiyên tîran û hwd wê, pêşkevin. Wê bi wê re wê, destûrên wê werina nivîsandin. Berî zayina îsa, '*destûrên perikles*' ku wê weke destpêka rewşa demokrasiya roja me jî wê, were hanî li ser ziman, bahse wan wê werê

-----  
(\*)Nietzsche, Friedrich (1887). "Zweite Abhandlung: "Schuld", "schlechtes Gewissen" und Verwandtes". Zur Genealogie der Moral.

(\*)Ober, Josiah (1996). "The Nature of Athenian Democracy". The Athenian Revolution: Essays on Ancient Greek Democracy and Political Theory.

kirin. Wê, di wan de wê, bahse 'hemwelatîfîyê' wê werê kirin. Di wê warê de wê, hemwelatîfî wê, weke çerçoveya têgîna demokratiîyê wê werê hanîn li ser ziman. Hemwelat wê weke kesên ku ew serdest û ne kole ku ew li cem key jî cih digirin wê, hebin û wê xwedî erk û berpirsiyar bin. Di wê warê de wê, piştî wê, ev têgîna hemwelatîfîyê wê xwe bide domandin bi rewşên rêveberîyan re.

Di serdemên piştî ên navîn de wê, ev rewş wê, zêdetirî wê were kûrtir kirin. Wê, di wê warê de wê, dewletîfîyên ku ew di wan de hemwelatî hena wê werina pêşxistin. Di aslê xwe de wê, di wê warê de wê, çendî ku wê welatîfîyên bi destûr û hemwelatîti wê pêşkevin jî lê hê jî em, nikarin bi tememî bahse demokrasiyekê bikin. Ew demokrasiya ku ew dîroka wê, ji serdemên kevnera bi vê rengê dihê dayîn destpêkirin wê pêwîstîfîya demokratîzekirina wê jî wê, bi demê re wê, weke pêwîstîyekê wê xwe bide dîyarkirin. Wê ew wê, were kirin. Piştî serdema ronansê wê, bi awayekî li berçav ev rewş wê zêdetirî wê, xwe bîne li holê û bide diyarkirin. Her wusa girseyên civakî ku ew ne weke hemwelat in wê, êdî wê ti rêveberî wê nikaribê wan bi rengê bide domandin. Di wê rengê de wê, hin bi hin wê, têgîna hemwelatîfîyê wê çerçoveya wê were berfirehkirin. Wê bi demê re wê destûr û zagonên dewletê ên di wê çerçoveyê de wê, werina pêşxistin. Destûr û zagonên ku wê, hebûna mirov bi rengê hemwelatîfîyê wê, misogerbikin wê, weke rewşek teybet a jîyane mirov bê. Wê, weke rewşa misogerkirina mirov a bi destûrî jî bê. Destûrên hemwelatîfîyê wê, di wê rengê de wê, bi demê re wê, zêdetirî wê, giringîya wan were dîtin.

Dewlet wê, bi demê re wê, li ser têgîneka nîjadî ku wê were avakirin wê, di rengê dewleta kole a serdemên kevnera ku wê komek mirov li ser serê hemû girseyên din wê bi wê rengê wê herêbikê wê, bi têgîna nîjadîyê jî wê, nîjadekê wê bikê ku ew li ser serê nîjad û komên din ên civakî wê, pêşbixê. Dewletên nîjadperest wê, bi wê rengê wê werin û pêşkevin.

Dewletên nîjadperest wê, di wê rengê de wê, weke dewletên kole wê, di reng û awayekê de bin. Hemû pîrsgirêkên rêveberîyên welatan ên bi komên din ên civakî ên di nava sînorê wê de wê, di aslê xwe de ev têgîn wê di temenê wan de wê hebê. Piştî salên 1990î û pê de wê, nîjadîfî û nîjadperestî wê, dîsa wê, ji xewa wê ya dirêj wê weke kabusekê wê, were şiyarkirin û wê, bê xistin li temenê rêveberîyê de. Dewletên ku ew bi navê nîjadekê dihên bi navkirin wê, bina sedema ji dîrokê birina nîjad û komên din ên civakî bi çand, zimanî û hebûna fîzîkî.

Di çerçoveya hebûna dewletê de wê, dewlet û destûrên wê û bûyîna xwediyê wê, di destpêkê de wê hêsta ku mirov xwediyê hertîstê ya wê biafirênê. Lê bi demê re wê, ew hêst bi gûharê li kabûsekê. Ber ku ew destûrên welêt wê tenê çerçoveya wê, welatîfîyê wê esas hildin û wê, ji çerçoveyek giştî a civakî dûr bin. Di vê warê de wê, dema ku wê bahse demokratîzekirina destûrên welêt bi hebûna wê re wê, ji wê rewşa wê ya destûrî bi ber rewşek civakî a giştî û gerdûnî ve çûyîna wê, were qastkirin. Di wê warê de wê, di wê çerçoveyê de wê, êdî wê, sînorên welat wê dîtbar bibin. Wê, hebûna civakekê li dijî ya din bê û wê ne li ser ya din re wê xwe bibîne. Demokratîze kirina destûrên welat wê, di wê rengê û awayê de wê, weke weke aliyekê giring wê xwe bide dîyarkirin. Bi demokratîzekirinê re wê, rewşa wê ya ku ew bi wê rengê weke ku me li jor hanî li ser ziman wê, li şûn xwe bihêlê û wê xwe ji nûve wê bi wate bikê. Wê, di vê çerçoveyê de wê, ji dewletek zêdetirî wê, weke çerçoveyek saziyî a ku ew li gorî xwestekên mirov bi rêve diçê wê bimênê.

Destûr û demokrasî wê, dema ku wê di çerçoveya hebûna welêt de wê bahse wê, were kirin wê, dema ku wê welat xwediyê wê bê wê weke ku ew jî hebê wê, întîbayek wê biafirê. Lê ew tûna ya. Destûrên ku ew hena wê, bi gîyane wan re wê, çawa wê bi demê re wê, li gorî ast û pîvane demê a pêşketinê wê, werina pêşxistin wê, ew jî wê, weke aliyekê wê yê din wê li holê wê bimênê. Dewletên nijadî wê, şewayekê dewletên kole ên ku ew di serdemên hemdem de bi şewayekê din weke yê hemdem hatina bi rêxistin kirin jî bin. Wê di temenê wan de wê, xalkîti wê nebê. Wê nijadîti wê hebê. Felsefeyên civakî wê, tenê wê bo wê rewşna rewşên ku ew ne hilde li cidiyetê bê. Wê, bo wê weke wê ji holêrakinê bê. Wê têngîna netewîyê a roja me ku ew hatîya pêşxistin jî wê ji têngînek demokratîkî wê li gorî xwe wê bi wê rengê wê bixwênê. Asta sînorê wê dewleta nijadî wê, bi nazîyan re wê li almanya wê bigihijê wê bigihijê nûqteya herî bilind.

Dervî wê, di roja me de wê, dewletên netew wê ji ya dema nazîyan wê hinekî wê hatibê kirpandin bo ku ew karibê xwe di nava rewşên roja me de karibê bijî bê. Demokrasî ku em ji aliyê dad û huquqê ve wê hildina li dest wê, di aslê xwe de wê, weke rewşeka li ser rewşa sînorên hebûna welêt bi xwe re jî bê. Demokrasî wê, di rastiye de wê, destûrên wê yên jîyanê wê, di çerçoveya destûrên gerdûnî ên giştî yên xwezayî de bê. Wê bi wan re wê, bo hemû mirovan wê heman tiştê wê bixwezê. Di nava sînorekê welatekê de ku gelek komên civakî ên cûda hebin û di welêt de tenê ji wan yek weke bi nijadî were esas girtin jî wê, ev tenê nebê rewşeka weke tûna hesibendina wan komên din. Wê ji wê zêdetirî wê bê rewşeka weke tûna hesibendina mirovatîyê û vê rengê têngîna demokratîkî jî bê.

Bêgûman wê, felsefeyek civakî wê pêwîst bê ku bo ew demokrasîya ku em bahse wê dikin pêşkeve. Di wê warê de wê, felsefeya civakî wê, ji temen ve wê, hebûna civakê bi endamên wê re wê, hilde li çerçoveya xwe. Ev jî wê, bi demê re wê civatîyê wê bi xwe re wê, bi awayekê xwezayî wê bi temenê xwe wê bi çandî û demokratîkî wê pêşbixê. Di nava civakê de wê, di aslê xwe de wê, dijberî wê, di rastiya wê de wê nebê. Ya ku wê di diafirênê wê, rêveber û ankû ev rengê welatî ku me li jor bahse wê kir bê. Di wê warê de wê, weke xatek sêyem hebûna dewlet û destûrê wê, dervî wê hebûna civakê wê, bi girseyên wê re wê hebê û wê, ew wê tekoşîna wan ya demokratîkî wê, di herdû aliyan de jî wê, pêşketin û pêşxistinê wê, li gorî rastiya civakî wê, bide çêkirin di jîyanê de.

Destûr û welat wê, dervî civakê wê di ahengekê de wê hevdû biparêzên. Dema ku ew ne xwediyê têngîneka ku mirov di navende wê de weke têngînek kifşkar û kirde hebê wê, hingî wê, weke xale parastinê parastina welêt û bê şert û merc pêkhanîna destûran wê were esasgirtin. Di nava wê parastina welêt û pêkhanîna destûran jî wê, bê temenê tafisandin, perçiqandin û çermisandine civakê bixwe jî. Hebûna welêt jî û destûrê jî wê di reng û awayê hebûna desthilatdarîyêk bê şert û merc a li ser serê civakê jî bê. Wê, di wê warê de wê, bo ku ew desthilatdarî were domandin wê, civakê ji reng û awayan wê bibê û bikê reng û awayan. Di wê rengê û awayê de wê, şerê welêt û destûrê ê bi civakê re wê, li ser wê esasê bi civakê û nava wê re wê ti carî wê dawî li wê newê. Li hemberî wê rewşê civak wê, weke rêya xwe parastinê jî wê, rêya sêyem a demokrasîyê li dijî wê, destûrê û hebûna welêt wê karibê biparêzê. Di wê warê de wê, civak wê, di aslê xwe de wê dînamîsma giştî a jîyanî bê. Wê dema ku wê civakê hêza xwe kifşkir wê, karibê wê, weke hêzek gûharîner wê bide pêşxistin.

Li vir wê, weke xate sêyem wê sazî û komelên ku ew ji nava civakê na wê, pêwîstî bi bernemeyên rast û pak ên ku ew diikarin rastîya civakê stalîzebikin û wê, dênina li

pêşiyê. Di wê çerçoveyê de wê, weke hêzên gûharîner ên civakê wê, hingî wê weyna xwe wê bileyizin.

### **Çand û demokrasi**

Di dewama mijara dad û demokrasiyê de hildan li dest çand û demokrasiyê wê hem rast bê û hem jî wê wateyek wê hebê. Li vir ezê di dewama wê de ji nûqteya civakê a di nava wê de bi rewşên komelên sivil ku ew weyne xwe bileyizin ji wir bidina domandin. Ev wê, weke aliyekê wê yên giring bê. Civak wê, xwediyê mejuya xwe bê. Wê dema ku mirov li mejuya wê binerê wê, hingî wê, rastî wê baştirîn wê were fahmkirin. Çandên cuda ên desthilatdarîyê dem bi dem wê di nava civakê de wê werina pêşxistin û wê ev wê temenê tundutuyiyên ku wê di nava wê pêşkevin ji bin. Li vir wê dema ku em bahse civakê bikin wê demê divê ku mirov ji ya desthilatdarîyê cûda wê, çanda civakî bi serê xwe wê li ser temenê wê, kifşbikin û wê werênina li ser ziman. Di wê warê de wê, çandek demokratikî wê, di aslê xwe de wê, ew temenê wê biafirênê. Di nava çanda civakî de wê, komên civakê ên cuda ku wê bijîn wê bi rastiyan wan re wê hebin. Di wê warê de wê, ew wê weke rastîya wan ya mejuyî û civakî bê. Wê, di dewama wê de wê, ew wê, xwe bînin li ser ziman. Çanda civakê di serî de wê, weke ku ew dijî bi hevdû re di nava aramî û aşîtyekê de ku mirov wê werênê li ser ziman wê, ew wê, weke rastiyeke demokratikî a civakî bê. Wê, di wê rengê de wê, ew rengê wê temenê jîyane wê ya bi hevdû re jî bê. Di her demê de wê, komên civakê ên cûda wê biafirin û wê bixwezin ku ew qada jîyanê ji xwe re vekin.

Dema ku mirov bahse çanda civakê bi gotina demokrasiyê re bikê wê, bêgûman wê gotina felsefeyê a demokrasiyê wê, pêşxistin û fahmkirina wê bi wê hebê. Di rastiyan de wê, felsefe wê kirina wê weke regekê jîyanê û hizirkirina wê ya di nava jîyane civakê de bê. Civak wê, hertimî wê bijî û wê, di nava hewldana fahmkirinê de bê. Felsefe jî wê, bi pêşxistina rêbazên fahmkirinê û rêyên wê re wê, di nava civakê de wê, ew wê weynê bi xwe re wê bi aqil bileyizê. Di serdemek aqil de wê, felsefe wê, dîyardeyek giring a pêşketina di nava jîyanê de bê. Mirovê dema aqil wê, bi awayekê xwedî keseyet û bi wê keseyetîyê re ferdiyet bê û wê, bi awayekê pîr ali pêşketina xwe wê bi aqil bijî. Ji vê re wê pîr-aqilî jî wê were gotin. Dema ku wê bahse demokrasiyê wê were kirin wê, ji aliyekê ve wê, di roja me de wê, bahse iktidarbûyîna civakê wê were qastkirin. Di wê warê de wê, bahse civakê were kirin ku ew weke ku ew dixwezê bijî û biryarên xwe yên di derbarê jîyanê de ku ew bi serê xwe bigirê. Li vir di aslê xwe de wê, çanda demokratikî wê, bi wê re wê, were ser ziman. Çanda demokratikî wê, rêzikên demokratikî ên jîyanî re wê mirov karibê bahse wê bikê. Di roja me de wê, dema ku bahse demokrasiyê wê were kirin wê bahse hîlbijartinê û bi wê bijartinê û şandina nemzetên xwe li parlamana jî wê were qastkirin. Lê dema ku em demokrasiyê wê, hildana li dest wê, pêşî wê weke çandekê, felsefeyekê jîyanî û regekê hizirkirinê wê xwe bi dîyarkirin. Gotina çanda demokratikî wê, mirov dikarê wê li vir wê, werênê li ser ziman. Wê bi vê gotinê wê ya ku wê were qastkirin jî wê, ew bê ku mirov li ser temenê xwe weke ku ew dixwezê bijî û pêşketina xwe bijî. Lê ku em bi gotina çandê re wê hildana li dest wê, bêgûman wê bi felsefeyî û aqilî wê hemû afrînerîyên me wê, ji aliyekê ve wê, mirov karibê di wê çerçoveyê de bikê berlepîrsîn û fahmkirinê de. Mînaq wê, dema ku wê, mufredetêke perwerdeyê wê were amedekirin û navaroka pirtûkên perwerdeyê ku ew hatîya nivîsandin ku ew çawa bê û bi çi rengê bê wê, rengê pêşketina

di jîyanê de wê bandûrê li wê bikê. Li vir di serî de mirov dikarê li demokrasîyekê bigerihê. Demokrasîyê ku mirov wê, di serî de wê, ji aliyê çanda demokratîkî ve wê hilde li dest wê, mirov di serî de ji aliyê têkiliya mirov û civakê û dewletê re wê hilde li dest. Wê di roja me de wê gotina rejîmên demokratîkî wê, ji gelek rejîmên 'pêşketî' re wê were bikarhanîn. Her pêşketin wê, mirov nikaribê bi demokratîkî wê pênasebikê û werênê li ser ziman. Li vir mafê mirov bi komî û ferdiyetî çendî di hilde ewlehiyê û sînorên li pêşîya jîyankirinê dirakê bi wê re mirov dikarê werênê li ser ziman. Xwestekên mirovî bi azadî çendî ku wê ji hevdû cûdahî jî wê bidina diyarkirin wê, ew ne pîvan bê ku mirov bahse sînorkirinê ji wê re bikê. Yan jî wê, li vir wê dema ku mirov bi çandî wê hilde li dest wê, çendî rast bê ku hêncetên weke yên parastinê, destûrê û welat weke kêmkirina maf û azadiyan werênê li ser ziman? Mnaq kurd wê, welatê kurdistan(\*) wê di nava sînorê îran, îraq, sûrî û tirkîya de wê were qatkirin. Wê hemû maf û azadiyên civakî ên civake kurd wê ji destê wê werina girtin. Piştê jî wê, destûrek xwe binivîsênin li ser esasê înkarkirina hebûna wê civakê û wê piştê wê, bê ku şerm û fihêtbikin ji mirovatîyê wê derkevin û wê bêjin ku "çî di destûrê de nivîsa ew a." Yanî em nikarin derkevina dervî wê. Ev sînorên ne mirovî wê weke sînorên ku wê li ser destûr û çerçoveya welêt re wê werina kişandin wê temenê şer û hêrîşên li hebûna civake kurd jî bin. Wê temenê komkujîyên di hemû deman ên li hemberê civake kurd bin.

Li vir di aslê xwe de wê, mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku di awayekê dûrûst û bêtawiz de ku ew demokrasi nîrx û rêzîkên wê werênina parastin wê, civake kurd wê, bi awayekê bê ku ew hêvîyê ji wan rejîmên wan welatan bikin ew di nava xwe de ew mekanîsmayên xwe yên civakî pêşbixê û li ser wê re tekoşîna xwe ya maf û azadiyê bide. Ev wê ne tenê bo wê baş bê. Wê bo wan civakên din ku ew li rex wan dijîn ên weke farîs, tirk û arab jî wê, baş bê. Ber ku wê, rejîmên wan jî wê, li ser temenê rast wê bide rûnandin. Ber ku ew rejîmên wan, heta ku ew rewş bidomê wê, di reng û awayê rejîmên mêtînger de wê bijîn û wê, hemû dahat û bacên ku ew ji wan berhevdikin wê di wî şerê li dijî wê, civake kurd dikin de wê, bikarbênin. Ji vê vê aliyê ve wê em dikarin wê bêjin ku wê, bi ghişîna azadîya a civake kurd re wê, ew jî wê, bi awayekê wê, weke ku wê bigihijina li azadiya xwe wê li wan wê were. Wê bi wê re jî wê, rejîm wê li pêşketin û zêdetirî demokratîzeyê wê bihizirê û wê destûrên xwe wê, bi wê rengê wê pêşbixê. Li vir em dema ku ji aliyê civake kurd ve di wê rewşê de bihizirin wê dervî wan û destûrên wan bi wê rengê xwe pêşxistina xwe wê, weke aliyekê ku ew bi wê hebûna xwe jî biparêzê bê. Di wê rengê de wê, ti carê wê, ne di hana rejîmê de li partiyên iktidarê û ne jî yên muxalefetê ku wê, di çerçoveya wê sînorê welêt û destûrê de wê nêz bibin wê ne pîvanên bijartinê bin bo civakên weke civake kurd. Bijartina wan wê, bi awayekê wê, bê temenê înkarkirina hebûna xwe bixwe jî. Ber vê yekê wê, weke aliyekê girîng wê, pîr zêde wê girîng bê ku mirov wê fahmbikê ku wê, ji aliyê partiyên kurdan ve jî ku ew bi

-----  
 (\*)Kurdistan wê navê welatê kurdan bê. Di nava îran, sûrî, îraq û tirkîya de wê piştî şerê cihanê yekem bi konferanse lozanê re wê were qatkirin li çaran. Kurd wê, heta roja me jî wê, bi wan rejîman re wê tekoşîna maf û azadî û serbixwebûna xwe wê bidin. Di sale 1946an de wê, li rojhilatê kurdistanê wê komare kurd a mîhabadê wê avabibê. Lê ew jî temenê 11 meh dibin. Bi alikariya sovywetê tê avakirin û bi vekîşîna wê re tê rûxandin. Kurdistan li rojhilata navin dimênê.

hevdû re ne di heman nerînê de jî bin wê, dîsa wê, li dijî hevdû wê ji wan re wê ne pîvan û rê bê ku ew aliyekê rejîma serdest a li ser serê civakan wan a wê hîlbijêrên. Rêya çûyina li gel wê, ji wan re wê hingî wê esas û rast bê. Hingî jî ew ku ew di şewayekê rast û dûrûst de bin wê, bêgûman wê piştgirîyê wê ji civakê wê bigirin. Lê dema ku ew bi nerînên serdestê xwe çûna civakê û serî li wê dan wê, hingî wê, di piştgirîyê wê ji wê nebînin. Di wê warê de têngîna demokrasiyê bi çandî mirov wê temenê wê li ser wate û hebûna mirov re wê fahmbikê wê hingî wê ew weke nîrxek giştî a li ser hemû tiştî re wê were dîtin bi wê. Di vê warê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser zîman wê, çendî ku aqil pêşket û derket li pêş jî wê, hin bi hin wê, zêdetirî wê hey û bale li maf û azadiyê a mirov wê zêdetir wê bibê û wê derkeve li pêş. Aqil wê, ji aliyekê ve wê, çendî wê ew wê pêbixê wê, ji aliyekê din ve jî wê, aqilê demokratîkî jî wê, zêdetirî wê, pêşbixê. Mîrov ji aliyekê ve bixwezê jî û nexwezê jî wê berê aqil wê li jîyanê, civakê û kesê bê.

Ji aliyê demokrasiyê ve wê, ramiyarî, aborî, destûr, çand, welat, civaknasî û hwd wê mirov karibê hilde li dest û bikê mijare lêkolînên giring.

### **Demokratizekirina demokrasiyê.**

Di aslê xwe de wê, dema ku mirov demokrasiyê wê, hilde li dest wê, çî jî wê gotinê wê were fahmkirin wê, weke aliyekê giring wê, mirov dikarê wê hinekî li ser wê bisekinê. **Jorgen Hebermas, Antony Giddens og Norberto Bobbio** jî wê, di wê warê de wê dema ku mirov teorîyên wan ên di derbarê pêşketina civakê û gotina demokrasiyê de dixwênê wê, dibînin ku ew gotinên di derbarê demokratizekirina demokrasiyê(\*) bixwe de jî wê, werênina li ser zîman. Di wê warê de wê, dema ku mirov bahse hebûna demokrasiyê kir wê, ew ne demokrasi bê? Rast a. Her gotina demokrasiyê ku ew dihê bikarhanîn wê, demokrasiyê wê, newênê li ser zîman. Di wê warê de wê, wateyên ku ew li wê dihên kirin, hêncetên kiu ew bi destûrî û hwd li pêşîya wê didênin wê, di aslê xwe de wê, ji demokrasiyê cûdatir wê tişteke wê bi navê demokrasiyê wê, werênê hanîn li ser zîman. Ji aliyekê din ve jî min ev li jor jî li devereke hanî li ser zîman ku wê, hîlbijartin wê dema ku ew dihên kirin wê bê gotin ku “meyizênin hîlbijartin dihên kirin, wê demê demokrasî heya.” Her kirina hîlbijartinê wê, çendî ku wê newê wateya hebûna demokrasiyê wê, biheman rengê her demokrasî jî wê ne bê bijartin bê. Di rewşa hebûna demokrasiyê de wê, dema ku ew were bi navkirin wê, bi sînorê welêt re wê were kirin. Di destpêkê de wê, di aslê xwe de wê, destpêka ji rêya demokrasiyê derketin û dûrketina jî wê, ji wir wê destpêkê. Di vê warê de wê, di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser zîman. Li vir di aslê xwe de ez dixwezî balê bikişênima li ser gotinên weke başî, dûrûstî, rastî û rast axiftin û jîyankirinê. Ev gotin wê, ji aliyekê ve wê, karibin tişteke wê, werênina li ser zîman. Di aslê xwe de wê hebûna wan gotinan û gîyane wan wê ji aliyekê ve wê, karibê bide nîşandin ku wê ew têngîna ku em bi gotina demokratizekirina demokrasiyê re wê dikin ku wê fahmbikin wê bi me bide fahmkirin. Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, rengên pêşketina roja me wê, di aslê xwe de wê, di wê warê de wê, hem bi destûrên navnetewî û hem jî yên netewî wê, hinek astengiyên li pêşîya demokratizekirina demokrasiyê wê hebin. Di wê warê de em dikarin balê bikişênina li ser rewşa Sûrî û mudahaleyê Amarîka a ji salên 2011an ve ku ew li wê

(\*)Giddens, Anthony (1996) In Defence of Sociology. P9-34

(\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 144-165

(\*)Hebermas, Jorgen(1962); Strukturwandel der Öffentlichkeit, .P.11-37

dihêkirin. Wê di wê rewşê de wê, weke qadaka ku wê hêzên hegomonîkî ên weke Rûsya û amarika wê li hemberî hevdû wê li ser hêzê re wê pêngavan wê li hemberî hevdû bikin. Hêzên herêmî wê, di wê rewşê de wê, hewlbidin ku ew sûdbigirin û çendî ku ew sûdgirin jî wê, herêmê wergerênina gola xwûnê. Hêrîşên rejima tirk li rojava, başûr û bakûrê kurdistanê wê, ji vê aliyê ve wê, weke nîşanakên wê rastiye bin.

Wekî din çanda rêveberiyê ku ew bi salan hatiya pêşxistin wê, weke astengiyek herî mazin a li pêşiya pêşketina herêmê û demokratizekirina wê jî bê. Di vê warê de wê, gelek nîqaş wê, heta roja me jî wê li ser rewşa demokratizekiirna herêmê wê werina li ser ziman. Di hemûyan de jî wê, bi zihniyetî wê, hêncetên cûr bi cûr wê werina hanîn li ser ziman. Xwe hanîna li ser ziman wê, li herêmê wê kêmbê. Wekî din herêmîfî û ankû xalkên herêmê wê, ji rewşên xwe hanîna li ser ziman wê dûrbin. Lîngekê demokratizekirina demokrasiyê wê, herêmîkirina wê bê. Bi gotineka din demokrasiya herêmî ku ew were pêşxistin. Ji aliyekê din ve jî wê, weke lîngekê din wê ew bê ku wê, çawa wê makanîsmayên civakî wê werina afirandin ku wê, li şûna ji hilbijartinan heta hilbijartinan wê karibin mudahale bikin ku wê, rêyên artarnatif ji vê rewşê re wê werina dîtin. Ber ku rêveberiyek wê dema ku ew hat hilbijartin wê, ew wê mafê ji xwe re bibîne ku ew her tiştê bikê. Û her tiştê ku wê kir jî wê, bêjê 'gel ev destûrê daya min û ez dikim.' Lê di rastiye de wê, rewş ne wusa bê. Wê vajî wê bê. Di demên hilbijartinan de bi gotinên şêrin û xweşik xwe dana nîşandin û piştî wê, di sa li rastiyan xwe vergerin wê, di aslê xwe de wê, weke aliyekê din ê xirab ku mirov di vê warê de wê bi bîrbîkê bê.

Di demokrasiyek rast de ku wê hertişt wê birastî û zelalî wê li berçav wê were kirin û wê ji binî bi ber serî ve wê, were pêşxistin bê. Wê tevlibûna gel, hemwelatîti, berpîrsîyarî, afrînerî û hwd wê, hewl bê dayin ku were pêşxistin. Gel li şûna ku wê hêvîyê ji saziyên rêveberiyê wê bikê wê, ew bixwe wê, biafirîne. Di wê warê de ku alikariyek welatî nebê ku ew ti carî bi ti awayê tevli jîyane wê nebê û ne li ser navê wê û ne jî li dijî wê ku ew şer nekê û dijberiyê nekê.

Piştî salên 1990î pê de wê li giştîya yekîtiya ewropa jî wê, xwenûkirin wê were pêşxistin. Wê, demokrasiya herêmî wê zêdetirî wê derkeve li pêş. Her wusa wê, hem meclîsên herêmî û taxî wê hebin û hem jî wê yên giştî wê hebin. Lê meclîsên herêmî û taxî wê, bandûr û weyna wan zêdetirî wê hebê. Wê bi pîrsgirêkên civakî, xwezayî, hewirdorî û hwd re wê, alaquadar bibin û wê bikin ku ew ji wan re çareserîyan bibînin. Wê bi mantiqekê di cih de demokrasî û ankû demokrasiya rastarast wê bi wê re wê, were dîtin. Di rewşa hatina cem hevdû û hevdû fahmkirina mirov wê, li ser mijaran re wê zêdetirî wê bibê. Î ro gelek rewşên weke yên pîrsgirêkên hewirdorê, rastfahmkirinê û dûrûst nêzîkbûnê wê xwe bidina li der. Wekî din di rewşa demokratizekêkirinê de wê, di serî de wê esashildana gel wê, mirov karibê wê, werênê li ser ziman. Di wê warê de minaq li swîsre wê dema ku bo ku ew li ser mijar û rêgezêk destûrî çûyina referandûmê bê kirin wê, 50 hezar hemwelatî ku ew li bin qaxizê imzaya xwe dênin û û radest bikin wê, têrê bikê. Piştî imza hatin radestkirin di hundrê 3 heyvan den çûyina referandûmê li ser mijara ku ew hatî pênasekirin wê bibê. Li hin deverên herêmî ên ku wê ev rewş wê werê kirin wê, li rêjeyê wê were nerîn. Minaq li Çekya wê, dema ku ew li beldeyekê wê, herê referandûmê wê, li rêjeya sadî 30an wê were lêgerîn. Li gorî xwestekê ku wê, referandûm wê were pêşxistin wê, di serî de wê, weke aliyekê rastarast a demokraiye bê. Li welatên weke swîsre û hwd wê, ev wê, li kantonên wê zêdetirî wê were bicihhanîn. Ev di rewşa çêkirina destûrê de jî ku wê rastarast wê serî li gel wê were

xistin bê. Di wê warê de wê, xoslet û teybetmendiyên herêmi wê li wan wê were lêgerîn. Mantiqê lêgerîna teybetmendiyên herêmi ew bê ku herêmek bi etnîsiteya xwe cûda bê wê, di çerçoveya wê de wê, ew wê were esasgirtin. Bi wê re wê, dema ku wê kesê zagon çêker û ankû destûrker ku wê çêbikê wê, li gorî wê xwesteka gel wê tevbigirihê. Gel wê karibê pêşniyara çêkirina destûr û zagonê ji wan re bikê. Minaq li Norwêcê wê, di rewşa pêşxistin û çêkirina razandinên aborî û hwd de wê, şaradar wê, xwedî erkbin. Wê ji herêmên xwe wê bi destûrî û erkên berfireh wê ji wê bi mesûl bin. Meclisên şaradariyê wê, biryarên aborî, civaknasî û hwd wê bigirê. Li ser mijarekê û ankû rewşekê wê dema ku wê biryarê bigrê wê, li hevdû wê bicivin û wê, ji dordorên cûda ku wê fikrên wan ên cûda wê hebin wê hizrên wan bigirin û wê li gorî wan wê herina wê, biryargirtinê. Di warê çêkirina referandûmên herêmi de jî wê, rewş wusa wê. Wê dîsa wê, şaradar wê karibin wê biryarê bigrin. Tenê ji salên 1970 û heta 2007an li norwêcê wê li herêman wê ser 514 referandûm wê werina çêkirin. Di rewşa demokrasiya herêmi û giştî de jî weke ku mirov li welatên weke norwêcê dinerê wê ti carî wê saziyên weke “walitiyan” û hwd wê nebê. Ber ku ev saziyên ku ew nayêne bijartin wê, newina esasgirtin. Wê şaradar ber ku ew tê bijartin wê, di kar de wê, weke devera pêşî û yekane ku ew dikarê biryaran bide girtin bê. Weke aliyekê din jî wê, mirov dibîne ku wê, ti carî wê gotina rêveberên ne bijartî wê ne li ser ya yên bijartî re bê. Wê ev jî wê, weke xaleka giring wê li wê were nerîn.

Di wê warê de minaq wê weke norwêcê wê li Polonya jî wê, şaradar weke rêveberên herêmi wê karibin di nava sînorê herêma xwe de herê referandûmê li ser mijarekê. Di wê warê de wê, ev rewşa referandûmê wê herêmkî bimênê. Di wê warê de wê, bi rengên demokrasiya rastarast de wê, hemwelatî wê karibin rojeve welêt a ramiyarî jî ji aliyê ve bandûrê li wê bikin û ankû bidina gûharandin.

Armanca demokrasiya rastarast wê ew bê ku hemwelatî di her mijarê de li ser pêşaroja welêt xwedi gotin bin. Di wê warê de wê, bi wê re wê, hebûna saziyên sivil û biryardayina hemwelatiyan wê, bi wê rengê wê, weke bergirekê jî bê ji kirinên rejimê û rêveberiyê ên ne rast a. Di wê warê de wê, pêşiya wê jî wê, were girtin ku ew di nava civakê de li dijî komna bikeve dijpozisyon û li hinek komna xwe weke aligir bide nîşandin û pişt a xwe bide wan. Di wê warê de wê cûdahiya negativ wê, temenê wê were ji holê rakirin. Di warê de hebûna demokrasiya rastarast de wê, hemwelatî wê ji aliyekê ve wê, rastarast wê tevlî biryar girtinan wê bibin. Wê di wê warê de wê almanya wê welatekê ku wê ji aliyê demokrasiya herêmi a navxweyî de wê li gelek herêmên wê yên weke Zurichê wê, li pêş bê. Minaq wê ji salên 1945 û heta 2008an wê ser 850 carî re wê referandûmên herêmi wê li wê werina kirin. Di wê warê de wê, dema ku mirov li rewşa meclisên herêmi dinerê wê, mirov dikarê bêjê ku wê, kêm zêde wê, rewşên herêmi wê li wan jî wê hebin. Ev rewşa tevlîbûna hemwelatiyan li biryaran wê, temenê hem bi xwe bawerbûnê bê û hem jî wê temenê xwe berpîrsîyar hîskirin û tevgerîna wan jî bê. Di wê warê de wê, demokrasiya herêmi wê, zêdetirî wê qiymetê wê were zanîn. Di wê warê de mirov dikarê wê, bêjê ku wê almanyan wê welatî herî zêde pêneber ji cihanê girtîya bê. Wê di wê warê de wê, komên ji welatên din ên ku çûnê de jî wê karibin bi navê xwe û etnisteya xwe sazî û komelên xwe avabikin û heta ku mafê xwe perwerdekirina bi zimanê dayikê hildin û bicih bînin. Di wê warê de wê, ew temen jî wê, hebê. Demokrasiya rastarast wê, hebûna civake ne homojen wê, di rastiyê de wê çawa wê ahengekê de wê bide pêşxistin û bi ber pêşarojê ve wê bibê wê hinekî jî wê, rastîya wê



bê. Di civakên weke ya alman ku wê zêde pêneberiyê li nava xwe hilde wê temenê parastina wan komên çûna weke pêneber ku ew raastiya xwe biparêzên bi wê bijîn bê. Ji aliyê civakên ku ew pîrr komên etnikê bi hevdu re dijîn jê wê, çawa wê, ew kom wê li rex hevdu wê bi rengên xwe wê xwe bi rêxistin bikin û wê, xwe barî rêveberîya ramiyarî û sazûmana wê bikin wê, temenê wê biafirênê. Di wê warê de wê, weke aliyekê wê yê giring bê ku mirov wê, werênê li ser ziman ku wê demokrasî wê, di wê warê de wê, weke ku wê were salixkirin pîrrrengîya civakê ku wê barî sazûmana rêveberî û ramiyariyê bikê bê. Di wê warê de wê, weke aliyekê din mirov dikarê bêjê ku wê, ji binî ve wê, kifşkirin û hildana biryar, destûr û çêkirina çêkirina zagonan û hwd wê, were kirin. Dîsa wê dema ku wê, destûr û ankû zagonêk wê were bi şûn ve kişandin wê, heman rê wê were bijartin. Di bi şûnve kişandina biryarekê, destûrekê û ankû zagonêkê de wê, di wê warê de ew maf di destê meclîsên herêmî de hebê ku ew karibin wê biryarê destûrê, û zagonê û hwd bibin referandûmê û wê ji aliyê xwe ve wê, bê hikim bikin. Di wê rengê de ku ew pêşîya şaşiyên ku ew werina kirin bigrin. Yan jî biryarek ku ew bi rastî hat girtin û dema ku ew hat pîretizekirin û encamên bo komekê civakî xirab derketin li holê ku ew komek etnikî bê û ankû komek ji aliyê zayendî ve cûda bê weke homofil û hwd ku ew karibin ji aliyê xwe wê biryarê bê hikim bikin. Wê ew dema ku wê karibin wê biryarê li ser jîyane xwe bigirin û karibin di derbarê jîyane xwe de wê biryarê bidina girtin wê ew ji wan re wê bê temenê baweriyê ku ew karibin bi rastîya xwe re di nava civakê de bijîn. Çendî ku wê weke fêr û azmûneka nû jî bê rojavayê kurdistanê ji salên 2011an wê, herêmî wê xwe bi rêxistin bikê. Çendî ku wê di rêveberiyên giştî de wê rejîma sûrî wê, nasnekê jî lê wê, herêm bi herêm wê meclîsên xwe wê avabikê û wê di wan de wê, biryara xwe rêvebirinê, perwerde dîtina di dibistanan û hwd de jî wê bigirin û wê pêkbênin. Wekî din jî wê, di warê xwe rêvebirinê de wê, biawayekê xweserî di çerçoveya rastiyên herêmê, dîrok û cihêrengiya wê etnisiteyî de wê, ew rewş wê were pêkhanîn. Komên cuda ku ew bi bawerî cûda na û bi etnikî cûda na wê, di wê warê de wê, bi meclîsên herêmî û taxî wê xwe bi rêxistin bikin. Wê ev jî wê, hin bi hin wê bi wan re wê, zêdetirî wê, pêşkeve. Wê di dewama wê de wê, dema ku wê hêrişên komên tundrew ên weke DAÎŞê û hwd wê li wan bibin wê ji wan meclîsên herêmî wê biryara xwe parastinê wê pêşbixin û wê barî pîretikê wê bikin.

Di warê demokrasîyê û bicihhanîna wê de wê, gelek minaqên wê yên ku mirov wê, werênê li ser ziman wê hebin. Di wê warê de wê di aslê xwe de wê ezmûnek wê hebê. Li welatên îskandinav ên weke norwêc, danimarka û iswecê û hin welatên din ên ewropa mirov dikarê bi wê rengê rastî minaqên demokratîkî ên herêmî werê. Di wê warê de wê, rewşa pêşketina herêmê a adamiyêti wê, temenê pêşketineka rast a bi xwezayê wê re jî bê. Di wê rengê de wê jî wê mirov dikarê bêjê ku wê, civak û xweza wê, bêî ku ew ekolojîya wan ji hevdu were xirakirin wê karibin bi hevdu re bijîn.

Rêveberiyên mazin û navendî wê tenê wê temenê pîrsgirêkên ku wê ji civakê re wê biafirênin bin. Ti navend wê nikaribê bi awayekê rast li navendekê bi hizirê û ew biryarekê hilde. Rêveberiyên navendî ji xwe wê di aslê xwe de wê karê wan jî wê ne ew bê. Mirov wê, dema ku wê li wê bihizirê wê, ew di warê pêşxistin politikayên giştî de wê, karibê wê pênasebikê. Wê di rewşa rêveberiyê de wê, rêveberîya giştî wê politikayên global wê pêşbixê. Lê wê dema ku ew pêşbixê jî wê, serî li demokrasîya navendî a herêmî wê bixê. Çendî rêveberîya giştî herêm û rengê pêşketina wan fahmkir wê karibê temenê xwe bi awayekê rast pêşbixê. Wê li ser wê re wê, karibê bahse rast rêveberinekê

bikê. Rêveberîya giştî wê dema ku wê, hemû hêz û biryardayin di xwe de berhev kir wê demê wê, civak wê ji hemû aliyan ve wê were tûna hasibandin. Wê were tûnakirin. Wê demê wê, rêveberîya giştî wê, li şûna ku ew li civakê bihisênê wê bixwezê ku civak di bin gotina wê de û ji wê re îteatêbikê û dernekeve dervî gotina wê. Di wê rewşê de wê, di bin navê gotina demokrasiyê de wê, tûraniyeka pirr xirab bi qarîqatûrî wê bi wê re wê pêşkeve, ku ew di farqê de jî bê û ne di farqê de jî bê. Di wê warê de wê, di rewşek demokratîkî de derxistina kesên li pêş wê, zêde wê giringîya wê nebê. Di wê warê de wê çendî ku wê di nava civakê de wê, herkes wê bi keseyet û ferdiyeta xwe wê pêşkeve jî wê, yek derketina li wan re wê, weke rewş û dîmenek ne rast bê.

Ji aliyekê din ve jî wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê dema ku mirov rewşê şîrovebikê mirov li vir bi çend gotinan jî bahse keseyetîyê û ferdiyeta û pêşketina wê bikê. Keseyet wê ferdiyeta xwe wê pêşbixê. Wê bi wê re wê, xwe bibînê û wê biryarên xwe wê bigirê. Di wê warê de wê, kesek li wan wan kesên hemûyan re wê, ji aliyê wan keseyetîyan ve wê karibê bi civaknasî û derûnî jî temenê tengezerîyên mazin jî bê. Di wê warê de wê hingî wê ew karibê bibê temenê alozî û tengezerîyên mazin. Ber ku wê ew wê bihizirin ku ew nayêna hasibandin û hildan li cidiyetê. Wê hingî wê, dîrketina jî hevdû wê, bi awayekê xwezayî wê pêşkeve û wê kûrbibê. Qatbûnên di nava civakê de wê hingî wê yek bi yek li dîv hevdû wê xwe bidina dîyarkirin.

Ku mirov herêbikê û nekê jî wê berê pêşketina mirov bi aqil wê bi afirîne keseyetîya wî ve bê. Wê bi wê re wê ferdiyeta xwe wê pêşbixê û wê derxê li pêş. Di wê warê de ew keseyetîya ku ew ferdiyeta wê hat pêşxistin û derxistin li pêş wê, temenê kifşkirinê bê. Di wê rewşê de wê, dema ku wê sazûmana ramiyarî ne li gorî wê xwediyê pêşketinekê bê wê, hingî wê rejim wê yan bi hêz û tûndûtûji bikarhanînê wê yan xwe bijî û yan jî wê rastarast wê li hemberî komên civakê ên cûda ku ew pêşdikevin wê rastarast û vekirî wê dest bi şer û hêrişan wê bikê. Ev dikarê bi fizîkî weke bi hêza artişê bê û bi gotinên politîka meşandinê bê. Lê wê gelek cûreyên wê hebin. Politîkaya tengezerîyê wê hertimî wê xwe serdest bigirê li wê. Ev jî wê, rejim û civakê û beşên wê were hemberî hevdû. Dema ku pevçûn di nava koman de pêşket wê ew bê malê dîrokê di nava wan de wê, hertimî jî wê, ew weke nûqtetek jî hevdû cûdakirinê bê. Ber vê yekê giringa ku berî ku ew bibê ku mirov bergirên wê bigirê û nehêlê ku ew pêşbikevê. Wê demê wê, hingî wê aramiya civakê û ankû civakên ku ew li rex hevdû dijîn wê, bi hevdû re wê were parastin.

### **Politikayên rêya sêyem**

Politikayên rêya sêyem(\*) wê di aslê xwe de wê, weke aliyê vê rêyê ê giring bin. Wê di rewşa wê de wê, temenê serkevtin û ankû sernekevtinê wê bidina dîyarkirin bin. Wekî din jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, bi awayekê wê civak wê, ji nava wê bi beşên wê re wê, aktivîtiya wê xwe bi wê re wê, bide dîyarkirin. Di warê nerîn û her wusa dîtina rengên politikayan ku ew çawa na wê, weke aliyekê din ê giring bê. Politîka wê, di serî de wê, azadîkirinê wê ji xwe re wê bikina armanc.

Di nava civakê de wê, di serî de wê, her beş û kes wê, xwediyê jîyanekê bê. Ji aliyê politikayên rastgirîyê ve mirov hilde li dest wê, bi girêdana bi dewletê ve wê, hewlbidin

(\*)Ober, Josiah (1996). "The Nature of Athenian Democracy". The Athenian Revolution: Essays on Ancient Greek Democracy and Political Theory. P4-18

(\*)Bobbio, Norberto(1969), Saggi sulla scienza politica in Italia, .p.8-29

ku ew encamê bidest bixin. Her çendî ku wê bahse serbestî û bi serêxwebûnê wê were kirin jî lê wê ji aliyekê din ve jî wê, amûr û rêyên girêdana bi dewletê ve bi politikayên ramyarî, civaknasî û aborî wê pêşbixin. Di warê dîtina rengê politikayê û kirina wê de wê, çap wê, hertimî wê, di şewayekê nûkirîyê de wê, di awayekê de wê, bide dîyarkirin. Ev aliyê çapê wê, dem bi dem wê, ji aliyê komên oldar ku wê, bi politikayêmn rastgir wê, tevbigerihiin wê, weke 'li dijî olê', 'li dijî civakê', 'li dijî netewê', 'li dijî parastina nîrxêmn civakî û hwd wê, were hanîn li ser ziman. Di wê warê de wê, aliyê rastgir wê bo ku ew di wê warê de politikayên xwe bide çêkirin û xwe bi serbixê wê, serî hertimî wê li orf û adetên civakê û kevneşopîyên wê bixê ku ew bi wan xwe werênê li ser ziman û li ser wan re meşrûtiyekê bo xwe bide çêkirin.

Di aliyê çapgir de wê, dema ku wê bahse politikaya rêveberiya civakê wê were kirin wê, bi têgîna azadiyê re wê, hevgerîna civakî û hevbeşî û ankû 'kollektivîzmê' û hwd re wê, bide dîyarkirin. Di wê warê de wê, beremberî berpirsîyarîyê wê, maf wê were nîşandin û hanîn li ser ziman. Di nava jîyane dema hemdem a global de wê, bêgûman wê jîyane mirovan wê çendî ku wê di nava hevdû de wê pêşkeve wê bi pêşketina keseyetîya mirov re wê serbixwebûyîna mirov jî wê di jîyanê de wê bi wê re wê pêşkeve. Ev jî wê, weke aliyekê wê yê ku wê bi pêşketina wê re wê xwe bide dîyarkirin bê. Dema ku em gotina 'globalîzmê' bibîrbikin wê bêgûman wê di cih de wê, têgîna aborîyê û gelemperiyê wê were berbîra me. Ber ku wê hingî wê şîrove wê li ser rewşa bazarê, borsa û semyenîya gerîner û ya cih de wê were kirin û pêşxistin wê, bi wê re wê, weke aliyekê din ê ku mirov wê, dikarê wê, di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê, werênê li ser ziman. Di aslê xwe de wê, rewşa aborî û xwe dabarekirin wê weke aliyekê giring wê, di wê rewşê de wê were dîtin. Zêdebûna rêjeya girseyên civakî wê mijarên weke xwe dabarekirinê û ji wan re dîtina karûxabatê ku ew bi wê qizincbikin û bi wê karibin bijî jî wê, zêdetirî wê bi giringî wê derkeve li pêş. Di wê warê de wê, politikayên sosyal demokratîyê ku mirov wan werênê li ser ziman wê, di wê warê de wê ji aliyekê ve wê, weke 'karekê dewletê' wê were dîtin ku wê, di wan waran de wê makanîsmayên ku wê bersivê bidina xwestekên mirov di jîyanê de û ku ew werina pêşxistin wê, werênê li ser ziman. Li vir di aslê xwe de wê politikayên weke politikayên rêya sêyem ku mirov li wan bihizirê wê, di serî de wê hevbeşîya civakî a nava mirovan bi civaknasî wê weke aliyekê giring bê. Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, di destpêka avabûna yekîtiya sovyet de wê, li şûna ku wê li bende yekê bê mayîn ku ew ji wan re karûxabatê bibînin wê, bi hevdû re wê ew wê ji xwe re wê bi hevdû re ê qadên karûxabatê wê çêbikin û wê bi wê re wê, bi çandîni, çêkirinên bi destî û hwd re wê, tiştên ku ew bi wê jîyane xwe bidomênin wê çêbikin. Lê piştê wê, rewş wê zêde ne domê. Wê ji li şûna wê, bi awayekê 'kooparatîfîbûnê' wê, ew weke saziyîna dewletî wê werina pêşxistin û wê, kesên ku ew kardikin wê, çendî wê beşa ku ew karibin bi wê bijîn wê hildin jî lê wê, jî wê zêdetirî wê, ya zêde weke ked wê, were berhevkirin û wê bi wê dewlet wê were mazinkirin. Di wê warê de wê, dîsa wê dewletekê wê weke barekê giran wê bê danîn li ser piştê mirov. Ev rewş wê, di bin reng û awa jîyanek sosyalîst de wê, bi demê re wê dewletek tekûz ku wê piştê wê, wergerihê li dewletek kapitalîst wê biafirênê wê werênê li holê. Di wê rewşê de wê demê ya ku mirov wê fahmbikê wê, çi bê? Di serî de ya ku mirov wê fahmbikê wê, hem keda ku ew dihê dayîn û hem jî ew keda zêde ku ew diafirê ew, wê di nava civakê de wê, bi wê re wê çawa wê were pêşxistin wê li wê mirov

bihizirê. Hevbeşîya civakê ku ew li ser wê pêşkeve. Saziyên dewletê ku ew bûna weke saziyna berhevker û wan di xazineyên xwe de berhevkerin zêde çêkir wê, hingî wê ew bê weke hêzek serdest li ser serê giştîya civakê jî. Ya ku wê, di aslê xwe de wê dewletê weke hêzek serdest wê, li ser serê civakê wê bikê weke hêzek bindestkirinê û ya şerker jî wê, di aslê xwe de wê ev bê. Di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê mirov dikarê weke aliyekê giring wê werênê li ser ziman. Politikayên civakî, wê çawa wê jîyane civakê wê pêşbixin ew jî wê, weke aliyekê wê yê giring bin ku mirov li ser wê bisekinê. Politikayên ramyarî û ankû siyêsî ku ew derketina li ser yên civakî û ankû sosyal re wê, hingî wê, ne tenê wê statûqû wê bi demê re wê pêşkeve bi desthildariyê re wê, ji wê zêdetirî jî wê, maf û azadiyan jî wê ew rewşa rêveberî a wê ramyarî û siyasetê wê ji dest bigirê û wê, xwe li cihê wan wê farz bikê.

Ji vê aliyê wê demê wê weke rêgezê giring a civakî ku wê were kifşkirin di kirina ramyarîyê de wê, ahenge di nava politika û jîyanê, ramyarî û civaknasîyê, mirov û azadiya mirov de bê. Ev alî wê weke aliyekê giring ku wê, dema ku ew jîyane civaknasî e what pêşxistin wê, bi wê re wê mirov wê xwe bibînê bi aqil bibê, pêşketina xwe ya keseyetî wê bide çêkirin û wê, ferdiyeta xwe wê bide dîyarkirin. Di wê warê de wê bê xwedî biryar. Wê bixwezê ku ew li ser biryaran wê bixwezê ku ew jî xwedî gotin bê. Di wê warê de wê, di nava jîyane civakê de wê, hingî wê, dema ku ew pêşket wê, mecbûrî wê sazîyên dewletê wê ji sazîyna adiliner zêdetirî wê nebina xwedî wate. Wê ti wateya wan ya îdeolojîkî wê nebê. Dema ku sazî bi wateyên îdeolojîkî(\*) hatina rewakirin, şirovekirin û hanîn li ser ziman wê, hingî wê weke sazîyna destlênerê ên pîroz wê xwe bidina dîyarkirin. Wê hingî wê xwe ji jîyane mirov zêdetir bi qadr, qiymet û zêdetir li pêştir wê bibinin. Wê mirov wê hingî wê, di nava dinanên û destarê de wê were hûrkerin. Wê, mirov wê, hingî wê, ji nirxên ku ew bi wan divê ku ew bijî û jîyane xwe biadilênê weke maf û azadiyê wê dîrkeve. Wê weke keseyetê îteatker wê hebê û wê bijî. Bo ku mirov nekeve van rewşan de wê çi bergir wê werina girtin? Di serî de wê, bersiva wê pirsê wê, herkesekê ku ew desthilatdar û rêveber û xwedî azwerî bo desthilatdariyê wê bitirsênê. Hingî wê, gotinên ku wê, ji devê hinek oldaran wê bi nîjadperestî wê di demên berê de ku wê werina gotin ên bi rengê 'welat ji dest diçê' wê hingî wê, bi reng û şêwayên din wê temenê kirina ramyarîyê û politikayên wê bidina dîyarkirin. Wê di dewama wê de wê bi devkî jî wê werina bi lêvkerin.

Di aslê xwe de wê, di wê rewşê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê dewlet wê, weke aliyekê giring ê ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Di dewama wê de wê, mirov dikarê weke aliyekê giring wê fahmbikê ku wê, gotina ku me li jor bi rengê parastina ahenge nava ramyarîyê û civaknasîyê wê li vir dîbare bibîrbikim. Ji xwe wê, dema ku wê civaknasî û têkiliyên civakî ên navxweyî ew kêmbûn wê, êdî wê temenê serdestbûna rêveber û gotinên rêveber wê biafirê. Ber ku pêşî ew aheng hatîya xirakirin û wî cihê kirina 'propaganda(\*)' xwe bi wê valahiyê daya çêkirin. Wê ew propaganda jî wê, wê temenê bi bandûrkirina kesên ku wan bi windakirina civaknasîya xwe re ku hêza hizirkirin û afirandina xwe ya aqil jî windakirîya wê ji wê re wê bê temen. Ji vê aliyê ve wê, mirov dikarê wê, weke aliyekê din ê giring wê werênê li ser ziman. Li

-----  
 (\*)Bobbio, Nortberto(1960), Teoria dell'ordinamento giuridico (A Theory of Legal Order), p.5-34

(\*)Bobbio, Nortberto(1960); Profilo ideologico del Novecento italiano (An Ideological Profile of Twentieth Century Italy), p.8-37

vir wê demê wê, politika wê çi bê? Wê politika wê çawa wê were kirin? Di wê warê de wê bersiva van pirsan wê zêdetirî wê me di nava têgîneka giring û teorîkî a bersivdayînê de wê karibê bibê. Emê li şûna wê çûyina wê rêwîtiya teorîkî bi kirinî û ankû pîretîkî li ser wê bi hizirin û werênina li ser ziman. Li gorî min, kirinek bi hezar gotinî ya. Wê di wê warê de wê kirin wê, karibê wê aliyê teorîkî ê ku ew were pêşxistin wê ji wê re jî wê ji gelek aliyan ve wê karibê bibê bersiv. Di wê warê de wê, politikayên rêya sêyem û ankû sosyal demokratîtiyê wê, di aslê xwe de wê, dema ku ew hatina hanîn li laş bi çerçoveyek rast wê û ew bi dîtbarî hat danîn li ber dîtina civakê wê, hingî wê temenê serkevtina wê di nava jîyanê de jî wê, bide dîyarkirin. Ez dema ku gotina 'sosyal' û ankû civaknasiyê' bi kardihênin li cih bi cih di wateya sosyalistîtiyê de jî wê bikardênin. Lê ez naxwezim ku wê cudahiye bikima navê. Her wusa naxwezim zêde li gotinan bialiqim. Wê ew ne pêwîst jî bê. Ber ku wê, li vir wê, di aslê xwe de wê armanca hemû mirovan wê ew bê ku ew di jîyane xwe de xwe bigihênina li rewşek baş û bi wê re ku ew karibin jîyane xwe bi azadî û biewlehî wê biadilênin û wê pêşbixin û temenê wê parastina wê çêbikin. Parastin, xwe bi nîfîşî dana domandin û xwearin xwarin wê, du xosletên mirov ên ku ew bi wan dixwezê jîyane xwe bidomênê.

Di wê warê de wê, rastiya civakê wê, weke aliyekê wê yê giring bê ku ew di nava aramiyê de ew bijî bê. Di serdemên berê ên mediya de wê di nava kurdan de wê ew kevneşopî wê hebê ku wê dema ku wê key wê biryara çûyina şerekê wê bide wê ew bi serê xwe wê nikaribê wê bide. Wê pêşî wê serî li rêmidaran wê bixê û wê dema ku wan rast dît û rêya serkevtinê di wê re dît wê, ew jî wê piştî wê re wê biryara xwe wê bide. Lê di roja me de wê, rejimên welatan wê bêjin 'em bi hilbijartinê hatina bijartin' û ankû wê bêjin 'em bi dengê bilind ê gel hatina bijartin' û wê li ser navê wê li dijî komên din ên civakê û ankû herêm û civakên din wê biryara şer wê bi reheti wê bidin. Di wê warê de wê, rewşa tirkiya wê, bi serê xwe wê karibê bibê weke mînaqek teybet di wê rewşê de, bi şerê wê yê ku ew bi dehan salane li dijî hebûna civake kurd dide meşandin.

Di rewşa hildana biryaran de wê, weke aliyekê giring bê ku mirov wê li ser wê bisekinê bê. Di rewşa politikayên rêya sêyem de wê, mekanîsmayên civakî jî taxî, herêmî û heta bajar û giştîya welat wê, ast bi ast wê werina hildan. Di wê warê de wê, di serî de wê, mirov dikarê bêjê ku politika wê dema ku ew xistin li meriyetê wê, encamên ku wê derkevina li holê wê, civak wê li ser wê re bertekên xwe wê bide. Wê, di wê rengê de wê, rastî û ne rastîtiya wê were dît. Di wê warê de di rewşekê de bo ku zirer zêde nebê, dema di destpêkê ku ew reşa zirer dîtîne hat dîtîne ew hingî jî herêm û taxan wê karibin wê, bergiran li hemberî wê bigrin. Biryarek ku ew ne li gorî rastiya komek civak bê, divê ku ew kaibê bergirên xwe yê civakî li hemberî wê bigirê. Divê ku ew karibê 'şerhê' li hemberê wê dênê û wê, pîretîzekirina wê, ji aliyê xwe ve bide sekinandin. Di wê warê de wê, ev komên civakê wê dema ku wê bi rewşek bi wê rengê re wê bimênin wê, ew temenê wan û misogeriya wê mafê wan wê, weke aliyekê parastina wan û jîyane wan jî bê. Civak wê, di wê warê de wê, di nava xwe de wê, bi cihêrengiya xwe wê, pêşkeve.

Di her pêvajoyên jîyanê de wê, rewşên bi vê rengê wê karibin derkevina li hemberî mirov. Di wê warê de wê, dema ku mirov wan hilde li dest wê, ji aliyekê ve wê, di cih de wê, rewşa rêveberiyê wê derkeve li hemberî me. Di wê warê de têkiliya rêveberiyê wê, di wê çerçoveyê de wê li ser wan rewşan re wê mirov dikarê wê, hilde li dest. Di aslê xwe de wê, di nava serdemên global û pêvajoyên demokratîkî de wê, pîrsgirêka

rêveberîya û ne di heman nerînê de bûyîna beşên civakê ên bi wan re wê, hertimî wê, derkeve li pêş. Di wê warê de wê, weke aliyekê din jî wê, ew hebê wê, ji aliyê felsefikî, jîyanî, nerînî û hwd ve wê, bikevina hemberî hevdû de. Wê werina hemberî hevdû. Di wê warê de wê, ew jî wê, weke aliyekê giring wê, xwe bide dîyarkirin wê, rejim wê, ji aliyê politikayên bo wê û domandina wê giring wê bikê ku ew pêşbixê. Di wê warê de wê, bixwezê ku ew xwe serdest bikê. Lê mirovê ku ew keseyetîya wî afirîya û ferdiyeta wî pêşketîya li jîyanê wê, nexwezê ku ew serdestîyekê lê hebê. Ew serdestî ya rejim û ferdiyeta keseyetîyê wê, di wê warê de wê werina hemberî hevdû. Wê, di wê rewşê de wê, heta hemberî hevdû wê, bandûrê li civakê bixwe jî wê bikê. Pêşketina mirov wê di wê warê de wê, weke fektorek kifşkar bê di rewşên weha. Wê, li hemberî wan rewşan wê, rêveberî wê demê ku ew dema ku di hebûna xwe û serdestîya xwe de israr bikê û bixwezê ew mirov ji wê re îteatkar bê wê hingî wê, rejim wê weke rejimek otorîter wê, derkeve li pêş. Rejimê ku wê li şûna ku ew hebûna civakê bi pêvajoyên we yên pêşketinê re weke aqil ji xwe re herêbikê ku ew rabê aqilê xwe bi bîrdozîkî pêşbixê û li şûna wê bixwezê ku wê herkesek îteatê ji wê re bikê wê, temenê pîrsgirêkên nava xwe û civakê wê di destpêkê de wê biafirênê.

Di wê warê de wê têkiliya rêveberîyê û civakê li jêr dema ku me hebûna komelên sivil hilde li dest de emê di wê de wê werênina li ser ziman. Lê li vir wê di serî de wê bêjim ku wê dema ku wê mirov ji vê aliyê ve wê, ji aliyê meşandina ramiyariyê û kirina politika ve wê hilde li dest wê, weke aliyekê giring wê, ev rewş wê, xwe bide dîyarkirin. Di serdemên hemdem de wê zêdetirî wê, wijdan, ahlaq, dîrûstî û hwd wê, di nêzîkatîyan de wê were lêgerîn. Di kirinekê de ku rêveberîyê kir û wijdanê mirov êşand wê hingî wê, ew bê weke rewşek mayinda a ji hevdû dîrketinê. Wê bandûra wê, hertimî wê, bi mejuya civakê re wê, bi wê re wê hebê. Wê ew weke rewşek ji hevdû dîrketinê jî wê, xwe bide dîyarkirinê. Rewşên weha wê, karibin bi tememî têkiliya civakê û rêveberîyê ji hevdû dîrbikê. Di wê warê de wê, mirov dikarê bêjê ku wê, di demên hemdem û global de wê, şewayek rêveberî ê teybet ku ew biaqil dihê meşandin wê pêwîst bê. Rêveberî ku ew weke ku kurdên berê digotin ku 'mîrov dema ku kirinek kir li pêşî û paşîya wê bihizirê û piştê bikê' wê, ev têgîna vê gotinê wê zêdetirî wê, bo rêveberîya van deman wê bûhûrîner bê. Têkiliyek rast û bi tendûrûst wê di aslê xwe de wê, weke aliyekê giring wê, di wê warê de wê, xwe bide dîyarkirin. Ez vê jî wê, werênima li ser ziman ku wê, rewş rêveberîyê wê, mijarek sereka bê.

Mîrov wê, di jîyanê de wê, dema ku ew jîyane xwe avadikê wê, bixwezê ku ew biserê xwe wê bijî. Mudahaleyên li jîyanê ku ew dihên kîrin di van deman de wê, herî zêde wê, bandûrê li wê têkiliyê wê bikin. Mîrov wê, di demên hemdem û di pêvajoyên pêşketina xwe ya jîyanî de wê, mudahaleyan wê herê nekê. Wê li dijî wan wê bijî. Ti çekên parastinê ên fizîkî ku rejim wan dikirê û ankû çêdikê bo parastinê wê, di wê warê de wê, nikaribin parastinek rast bo wê bikin. Ya rast wê di nêzîkatî û aqil de bê. Di wê warê de wê, gotinek ku wê piştî salên 1990î wê were li ser ziman ez, balê bikişênima li ser wê. Ew jî wê ew bê û wê bê gotin ku 'parastin wê bi aqil û pêşketinê bê.' Ev rast a. Wê, di demên piştê wê, ew zêdetirî wê were dîtin û wê mirov wê, karibê wê, bibînê. Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê zanîn bi rastî û dîrûstî bikarhanîn wê, weke rewşa parastinê a herî rast wê xwe bide dîyarkirin.

Aqil di zane min de wê weke şûrekê ku wê herdû aliyê wê tûj bin. Wê dema ku wê dirêjî pêşîya xwe kir ku ew bi rast bikarneyênê wê kesekê birîndar bikê. Lê ku bi şûn ve

kişand ku ew bi şûn ve kişandin ku wê rast nekê wê xwe bixwe wê birindar bikê. Di wê warê de wê, ev minaq di rewşa bikarhanîna aqil de wê, bo min wê vegotiner bê. Ev bi gotinê jî wusa ya. Dema ku mirov gotinekê ji hevdû re bêjê wê, ew gotin wê ya hêstek xweş wê bide me û wê me dilxweş bê û yan jî wê, hêstek vajî wê bide û wê me bihêrs, dilşikeştî û xamgin bikê. Ev rewş wê, weke rewşna hêstî ku wê karibin bandûrê bi awayekê li kirin û tevgerên mirov ên ku mirov wan pêşbixê jî wê bikê. Di wê warê de kirinên baş wê çendî wê encamên baş wê bi xwe re wê werênê wê, vajî wê kirinên nebaş wê, encamên xirab wê bi xwe re wê werênê. Gotina 'karma' a bûdûsmê a weke ti tiştekekê bikê, têyê beremberê wê tiştekekê bibinê wê, di wê warê de wê, têgînekê karibê li ser vê têgîna bi gotina a di kirinê de bi encam û bertekên wê û yên li dijî wê re wê karibê bide me. Em li wateya wê gotina 'karma' ne bi têgîneka nepenî li wê dihizirin. Em bi wateya aqil û kirinê û têkiliya wan ya bi hevdû re di çerçoveya wê têgihîştina xwe de li wê dihizirin. Aqil wê, di wê rengê û awayê de wê bi axiftin, bikarhanîna û pêşxistina wê re wê, bi rengê wê û hwd re wê, ji temen ve wê xwediyekê afrînerîyeka ku em nikaribin ji rewşên wê yên bandûrî dûr werênina li ser ziman wê li jîyane me wê hebê. Di wê çerçoveyê de wê, di rewşa meşandina politika de wê, ev jî wê, weke aliyekê giring ê ku mirov wê, dikarê wê ji temen ve wê, bi wê rengê wê, werênê li ser ziman. Di rewşa aqil û ramyarîyê de jî wê, têkiliyek xort wê bi hevdû re wê hebê. Weke oldarên ku wan ji serdemên navîn û pêde ku wan têkiliya aqil (felsefeyê) û olê ji hevdû cûda dikirin em, divê ku di wê de bi heman şewayê têkiliya ramyarîyê û aqil ji hevdû cûda neyênina li ser ziman. Di wê warê de wê, bi rengê xwe wê ramyarî wê xwediyê rengê pêşketinê ê ku mirov wê bi wê re fahmbikê wê hebê. Lê li vir wê, di serî de wê, dema ku felsefe têkiliya wê bi wê re hat danîn wê, hingî wê temenê lêpîrsînê wê, di nava têkilîyan de wê, biafirê. Lêpîrsînî ku ew afîrî wê, bo nêzîkatîyek rast wê, ya rast weke têkili di nava rêveberî civakê de wê derxê. Lê dema ku rêveberîyê got 'kirinên min rast in û wê ti kesek li wê lînepîrsê wê, hingî wê, temenê pîrsgirêkê wê bo herdû aliyan wê biafirê. Lêpîrsînerî wê di kirina politikaya rêya sêyem de wê, weke aliyekê giring ê pêşketiner û kişandina li rastiyê jî bê. Wê ew wê, rêveberîyê jî şaşiyên wê dûrbikê. Wê bikê ku ew rasttir fahmbikê. Di rewşa fahmkirina ramyarîya xate sêyem de wê, di serî de wê, wekhevî di têkilî û jîyanê de, yên xwediyê pêwîstîyan in parastina wan, li ser bi serêxwebûyîna re maf û azadî, xwe berpîrsîyarî hîskirin û bi wê re bûyîna maf û ankû li maf azadiya xwe bi berpîrsîyarî xwedî derketinê, pêşxistina demokrasîyê bi têgihîştina wê re di her demê de li gorî demê û aqilê demê, pîrranîtiya kosmopolitîk(\*) a civakî û ji aliyê felsefe, rewîst û aqil ve xwe gihandina têrbûnekê wê, weke aliyna ku mirov karibê li vir di serî de hilde li dest bê. Ev alî wê weke aliyna ku wê li ser wan re wê, ramyarî jî wê wre meşandin û politika jî wê were kirin bê.

Ji vê aliyê ve wê dema ku mirov binerê wê, weke aliyekê giring ê ramyarî meşandin û kirina politikayê a xate sêyem wê fahmkirina ekolojîkî a civakî û xwezayî wê derkeve li pêş. Di wê warê de wê, weke aliyekê giring wê, ev wê xwe bide diyarkirin. Civak wê, di her demê de wê, xwediyê pêşketina xwe ya ku ew weke darekê bi çiqilên xwe hertimî diafirê û pêşdikeve bê. Wê dema ku wê jî wê darê çiqilek hat jêkirin wê ew dar wê weke çiqilekê xwe windakiribê wê li wê were. Wê ew dever wê, we karibê temenê bi xwûnbûyîna wê jî wê biafirênê. Lê li vir wê, bêjim ku di kijan demê de jî bê ku wê, çî jêkirin û pêvekirin ku wê were kirin wê ew wê, di bîra wê ya civakî de wê bê xwediyê

-----  
 (\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 150-165

têgîneka mejuyî a dîrokî. Wê ew wê jibîrnekê. Di wê warê de wê, bi wê re wê, bê xwediyê têgînekê. Ber vê yekê wê, giring bê ku mirov ji vê aliyê ve hertimî di wê heyideriyê de bê ku mirov di kirina xwe de wê rast bikê. Civak wê li ser endamên wê re wê, weke organismeyek zindî bê. Wê dema ku wê kirin li wê hatina kirin ku ew kirin bi zanebûnî bi xirabî were kirin û ankû bi nezanî jî were kirin wê, ew jî wê, di wê rewşê de wê bi rengê wê re wê, xwe bidina muhafazakirin di mejiyê wê de. Wê, ew jî wê, weke aliyekê ku mirov wê jibîrnekê. Civakê mirov nikaribê tenê wê, weke rewşeka jî pîrr kesan pêk tê wê werênê li ser ziman. Nirxên hevbeş ku wê ew endamên wê bi wê bi hevdû re bijîn ên weke ziman, çand, rewşên civakî û aborî û hwd wê bi wan re wê, mirov dikarê werênê li ser ziman. Wekî din wê li ser wê re wê, bi civakî wê dîroka wê weke dîroka wan ya hevbeş wê biafirê.

Di rewşên pêşketina civakê de wê, her demê fektorên bi aqil ên ku wê derkevina li holê û wê bandûrê li wê bikin wê bibin. Mînaq wê di roja me de wê teknoloji wê bi pêvajoyê û rengên wê yên pêşketinê re wê mirov dikarê werênê li ser ziman. Ev fektorên ku ew pêşdikevin wê, hem bi serê xwe wê xwediyê wateyekê bin û hem jî wê, bi rewşa jîyane bi hevdû re jî wê, xwediyê wateyekê bin. Ji aliyekê din ve jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman wê, ev fektorên fizîkî wê, xwediyê xwediyê bandûrna bi fahmkirinê ên pîrr aqilî bin. Wê, di rewşên fahmkirinê, gavavêtinê, kirina ramyarîyê û hwd de jî wê, bandûra wan wê pîrr zêde wê bi pêşketina civakê re wê hebê.

Di wê warê de wê, her rêgezên ku ew wê jîyanê û meşandina civakê wê bidina çêkirin û dîyarkirin wê bibin wê, di nava wan de aheng wê weke aliyekê giring wê pêwîst bê. Ger ew nebê wê, hingî wê mirov dikaribê bahse pêşketineka rast bikê. Demên bûhûrî wê, di pêşketinên roja me ya î ro de wê, ji gelek aliyan ve wê, weke aqilekê ku ew jî kifş dikin wê hebin. Levkirineka rast a bi rêgezan wê, pêşketineka rast jî wê bi xwe re wê werênê. Lê li vir wê, ev levkirin wê carne ne bi kifşkirin û ankû nivîsandina rêgezan wê xwe bide dîyarkirin. Carne ji xwe re berdana civakê bi serê xwe wê, bi wê re jî wê, pêşkeve. Ji xwe, heka ku mirov bixwezê pêşketineka rast bijî wê demê mirov divê ku wê ji xwe re bûyînê bahse çêbikê. Li ser wê re wê, fahmbikê. Mudahaleyên ku wê, ji temen ve wê bikin ku ew civakê bi gûharênin û wê bi wê gûharandinê wê ji rastîya wê dîrbikê û ji rêya wê derxê jî wê, mudahaleyên şaş û yên xirab ku ew xira dikin bin.

Ji aliyê meşandina ramyarî û kirina politikaya xate sêyem ve wê, di nava civakê de wê, weke aliyê keseyetê, demokratizekirina demokrasiyê û parastina komên civakî ên cuda bi cihêrengîya wan re wê, malbat jî wê weke aliyekê giring wê derkeve li pêş. Di wê warê de emê li jêr li ser malbatê û rewşa wê ya civakî û wateya wê ya bi demê re wê li ser wê bisekin in. Lê li vir wê di aslê xwe de wê, mirov dikarê bêjê ku wê malbat wê, pro-tîpa civakê û rengê pêşketina wê jî wê bide dîyarkirin. Nirxên malbatî û parastina wan û fahmkirina navaroka wê, weke aliyekê giring wê xwe bide dîyarkirin. Malbat ku ew bi nirxên xwe yên civakî jîya wê ew hebûna civakê wê ji aliyekê ve wê weke stûn wê li ser lingan wê bigirê. Berdewamîya di jîyane malbatê de, di nava malbatê de pêşketina zarokê û kêfxweşî û dilşahiya wan û hwd wê rengê pêşketinê jî wê bide dîyarkirin. Di rewşa kevneşopîya malbatê a kevn de wê, weke qalibekê rûniştî wê, bi hiyararşikî wê, regekê têkiliya wê rûniştî wê hebê. Wê ev jî wê, weke ku mirov wê dibînê wê bandûrê li meşandina ramyarîyê û kirina politika bixwe jî wê bikê. Li jêr emê li ser wê bisekin in. Lê li vir di serî de divê ku mirov di çerçoveya wê beşa mijarê de wê



fahmbikê ku wê malbat wê weke aliyekê temen bo meşandina ramyariyê û kirina politika jî wê, bi malbatî wê xwe bide dîyarkirin.

### **Dewlet û komelên sivîl**

Hebûna dewletê wê piştî salên 1990î û pê de wê, bi awayekê wê weke ku wê bikeve ber pêvajoyek rastorasyonê de. Wê şewayekê nû ê dewletî ku wê bi navê 'dewleta demokratîk' wê were pênasikirin wê were li holê. Lê li vir wê, hertimî wê, bi gotina 'pirsgirêkên demokratîkbûnê' re wê, were li ser ziman. Têkiliya nava civakê û dewletê wê, weke pêvajoyek navbeynkar wê, sazîyên sivîl û ankû komelên sivîl(\*) wê pêşkevin. Di wê warê de wê, sazîyên weke komelên sivîl ku wê li gorî rewş, mijar û pêvajoyan wê pêşkevin wê, weke rewşa ku wê, dewletê jî wê, kontrolbikin wê werina hanîn li ser ziman.

Pêvajoyên piştî salên 1990î tiştêkê din jî da nîşandin. Wê ew jî wê ew bê ku wê dewlet wê, yan bo ku ew xwe ji bin bar û zora sazîyên sivîl xilasbikê wê, gavekê wê ew biavêjê û wê yan sazîyên xwe yên sivîl ên weke aligir wê avabikê û yan jî wê, sazîyên ku ew dervî wê hatina avakirin wê yan krîmînalîzebikê û wê bîrê ser xate xwe û yan jî wê, mirovên xwe bişênê li nav wê û wê bi wan wê kontrolbikê. Ev jî wê, di rewşa sazîyên sivîl û komelên ku wê weke sazîyana civakî û weke dengên ji nava civakê wê pêşkevin wê bê sedema ku ew bendekê di nava wan civakê bixwe de jî ew çêbikin. Ew sazîyên sivîl û ankû komelên sivîl ew çendî di tîkiliyek rast û baş a bi civakê re de na. Di serî de wê, mirov dikarê weke aliyekê giring wê, di serî de wê bibersivênê. Di wê warê de wê, di rewşa tîkilî û bendên civakî de wê, ev sazî wê, heta roja me jî wê, kêmbimênin. Wê li dûv hin politikayên dijber ên li hikimetê û ankû rejimê wê bikevin û wê bi awayekê wê li ser wê re wê bikevina pozîsyona ku ew civakê bi xwe jî ew ji bîrbikin.

Di wê rewşê de wê, rewşa ku ew derket li holê wê, ji rewşek civakî zêdetirî wê di rengêkê din ê weke rewşek sîyesî de wê xwe bide dîyarkirin bê. Di wê warê de wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê sazîyên sivîl wê, weke sazîyana ku mirov dikarê wan di serî de bi rewşa civakê re wan werênê li ser ziman. Di wê warê de xwedî bernema û plangeriyên civakî bin. Û hertimî di nava civakê de bin. Pirsgirêkê wê hem çareserbiikin û hem jî rêyên çareserîyê ji wan re bibînin. Di wê warê de ew xwe bi sazûmanek baş saz bikin û di nava civakê de ew xwedî erk bin. Di wê warê de herêm bi herêm ew xwe bi rêxistin bikin. Wê ev rewş wê, ne tenê wê bo wan wê bê baş wê bo civakê jî wê bê luleyekê bêhnstandinê.

Di warê sazîyên sivîl de wê, li ser çî temenê wê xwediyê tîkiliyê bi rejimê û ankû dewletê re bin? Di serî de wê, pêwîstî bi bersivdayineka rast, dîrûst û baş a ji vê pirsê wê hebê ku wê ji aliyê civakê ve wê were herêkirin. Wê hingî wê, karibê weyna xwe bileyizê. Bersiv û rewşa wê ya bi wûcanî wê, hevdû di kirina wê de wê temem bikê. Wê li ser wê re wê karibê weke aliyekê din wê, weyna xwe bileyizê. Di warê pêşxistina demokrasîyê û ankû demokratîzekirina wê rewşa demokrasîyê ku ew bahse wê dihê kirin de jî wê, weke hêzeka demokratîzekirinê a ji aliyê civakî ve bê. Sazîyên sivîl wê, di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, nikarîbin bahse bêalîtiyê bi hebûna xwe re bikin. Ew ji aliyekê ve ku ew dîrûst bin wê, mecbûr bin ku ew li aliyê civakê cihbigirin. Di wê warê de wê, weke

-----

(\*)Draper, Hal(1977 & 1986). *Karl Marx's Theory of Revolution*, New York: Monthly Review Press., p.11-42

(\*)Ocalan, Abdullah; *Manifestoya civake demokratik*, P.35-47

aliyekê civakî ê ku wê, di kirinên wê de wê rejimê jî wê bisînorbikê û wê balanseke wê di nava wê û civakê de wê, çêbikê. Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, saziyên sivil wê, karibin wê hikimetê bi kirinên wê yê xirab re wê ne tenê çavdêrîyê li wê bikin. Wê jî wê zêdetirî wê karibin wê di politikayên sivil û civaknasî de ew weynek mazin bileyizin. Di dewama wê de jî ew politikayên ku ew hatina pêşxistin ew dewlet bixwezê jî û nexwezê jî ew di şopandina wê de cihbigirin û bi wê şopandinê bibin çav û mejiyê civakê ê rast jî.

Rejimên zêde navendî û ku ew adamiyet di wan de nîn a wê, laşgiran bin. Wê nikaribin bibina xwediyê aktiviteyekê. Wê nikaribin xwe bigihênina li binî ku ew pirsgirêkan çareserbikin. Wê tenê wê bi saziyên weke pergale dadê û ya meşandinê wê, hewldana kontrolkirinê wê bidina nîşandin. Di wê warê de wê, di nava hewldanaka kontrolkirinê a li ser serê civakê de bin. Wê jî aliyekê din ve jî wê, ji ber wê rewşa wê, wê hertimî bi tirsê windakirina kontrolkirinê wê, bend li civakê wê bijidênê û wê, di gavavêtinan û naskirina maf û azadiyan de wê, weke zayıfîyekê wê jî xwe re wê bibinê û wê, dijberîyê bi hêncetên ku ew di mejiyê xwe de pêşbixê wê bide nîşandin. Dewlet wê, di wê warê de wê, pirsgirêka herî mazin wê, demokratizekirina wê wê bê. Di aslê xwe de wê, rewşê mirov dikarê jî rewşa wê ya destûrî a bingihînî û politikayên wê yên civaknasî û ankû 'sosyal' wan fahmbikê û werênê li ser ziman. Di waran de wê, kirinên wê, karibin bibina neynika wê.

Weke aliyekê din jî em wê bêjin ku em rewşa dewletê wê, werênina li ser ziman ku wê, dema ku wê, çawa wê xwe sazîkê wê, weke aliyekê giring bê. Li vir wê, weke aliyekê giring wê, bi demokratizekirina demokrasîyê re wê, pêşxistina politikayên sosyal û refahê bi awayekê positîv ku ew werina pêşxistin wê weke aliyekê wê yê giring bê. Ji van aliyan wê di serî de wê pêwîstîya wê ya xwe pêşxistinê wê hebê. Dewlet wê, dema ku wê di roja me de wê were fahmkirin bi bahskirina wê re wê, bi statû(statûqû) û ramyarîya wê ya ku ew dimeşênê re wê were pênasêkirin. Di wê warê de wê, zêdetirî wê weke saziyek sîyesî wê, were naskirin. Dewleta civaknas û cihêreng ew heta roja me jî mirov nikarê bahse bi awayekê rast û pak pêşketina wê bikê. Li rojavayê ewropa û welatên iskandinav hin minaqên wê yên ku pêşketina û weke minaqna pêşketî jî wê, werina li ser ziman wê, hê jî wê dewleta sosyal wê li ser ya ramyarî re wê newê dîtin û girtin. Wê ew di bin kontrola aliyê ramyarî de bê. Dema ku rewş ev bê wê, hingî wê ya ku wê bibê û wê were dîtin wê ew bê ku wê, li şûna ku wê, rewşa ramyarî wê li gorî ya civaknasî wê were sererastkirin wê, rewşên civaknasî wê bo rewşa ramyarî a welêt wê, werina sererastkirin. Di wê warê de wê, ev wê weke aliyekê din ê giring bê. Lê dîsa wê, li van welatên iskandinav û rojavayê ewropa wê, di rewşek nêzî ahengkirin û çêkirina balanseke di nava rewşa ramyarî û ya civakî de wê, di rewşekê de wê bisekinê, çendî ku wê, aliyê ramyarî wê hê jî wê bi giraniya wê re wê li ser wê hebê û wê bijî û wê kifşkar bê.

Saziyên sivil wê, weke aliyekê civakî bin. Di serî de jî aliyekê ve mirov divê ku wê rewşa bernema wan ya bi komelî wê pêşbixê û wê werênê li ser ziman. Di wê warê de ew weke saziyêna kifşkar ên civakî ku ew karibin jî aliyê civakê ve bidina diyarkirin. Weke aliyekê giring mirov wê, dikarê werênê li ser ziman ku wê civak wê, bi wan wê hebê. Di nava civakê de wê, gelek komên etnikî ên civakê û bawerîyên ji hevdû cuda wê hebin. Ew jî wê mafê xwe birêxistin kirin û xwe weke ku ew dixwezîn bi aşîfî di nava hevdû de bijîn. Li dijî hevdû ku ew ne xwediyê hêstên dijberîyê bin û hêstên dijberîyê

pêşnexin li ser wê esasê ku ew diyenete xwe bi rengê xwe bijîn. Di rastîyê de wê, ti carî mafê dewletê û rêveberîyekê wê nebê ku ew ji komek etnikî û ya bawerî bixwezê ku ew weke wê bijî. Ew wê hem ne mirovî bê û ne jî demokratîkî bê. Rewşên weke bişavtinê û hwd wê, nîşanaka nebûna demokrasîyê, mafê mirovan, azadiya xwe hanîna li ser ziman û hwd jî bê. Li dijî nîrxên civakekê hêrîş pêşxistin bi gotinê bê û bi rengên din ên fizîkî bê wê tenê wê ne meşrûtiya wê rejimê wê bide nîşandin. Rejimek wê tenê û tenê wê bi kirinên xwe yê baş û pozîtîv ên li gorî jiyane civakê û rêzgirtina wê ya ji cûdahiyên wê re û weke wê kirinê re wê karibê bahse meşrûtiya xwe bikê. Wekî din mirov wê nikaribê bahse meşrûtiyekê bo wê bikê.

Komelên sîvîl wê di serdema globalîzmê de wê luleya bêhnstandinê a civakan jî bê. Wê bi wê re wê, karibê xwe werênê li ser ziman. Di serdemên global de wê karê hikimetan wê di aslê xwe de wê, sazîkirin, dîzaynkirin û rengdayina civakê û ankû civakan bê. Wê tenê wê, weke rewşa sazîyî ên astbilind ku ew tîkiliyên global çêbikin û wan rewşa civakê a ku ew heya weke wê, ragihênê. Wê tenê û tenê wê karê wê ev bê. Lê dema ku di serdemên global de hikimet tevî karên nava civakê bûn wê, weke karekê ku ew ne karê wan ku ew dest biavêjênê de jî wê bimênê. Di wê rewşê de wê, hikimet wê, xwe ji wan sererastkirinên civakî ên weke dîzaynkirinê û ankû ku ew xwe weke endazyarîya civakî dibînin divê ku ew dev û dest ji wê berdin. Wê ya ku wê weke şertekê demokrasîyê û pêşketina wê ê ku wê nebê nabê bê.

Li vir wê, xateka pîr tenik wê bi tîkiliyî wê, di nava civakê û sazîyên sîvîl û hwd re wê hebê. Ew jî wê, bi demê re wê pêşkeve. Di wê warê de wê, sazîyên civakê wê, di demên global de wê, rênîşanên wê bin. Di roja me de wê, hem ji aliyê liberalan ve û hem jî wê ji aliyê sosyal demokatan ve jî wê, pêşketina beşên nava civakê wê bibînin. Li ser wê yekê wê gotina xweserîya nava civakê wê bilêvbikin. Di wê warê de wê, herdû alî jî wê, dema ku ev wê gotinê bi lêvdikin wê di nûansan de wê hinekî wê ji hevdu wê cûda bin. Wê liberal wê li ser serbestîya bazarê û pêşketina wê ku ew li ti sînorê nealiqê wê, bînin li ser ziman. Di wê warê de jî wê, civak wê, serbestîya wan wê, bo bazarê wê weke hêzek dewrûdayimî a giring wê were dîtin.

Di nava rejimên roja me de wê, gotina demokrasîyê wê, dema ku wê werênina li ser ziman wê, dem bi dem jî wê gotina tengezerîyê wê li şûn wê di hin hevokna de wê bînin li ser ziman. Wê ber çî wê gotina tengezerîyê wê li şûn wê werê li ser ziman? Sedema sereka a hebûna gotina tengezerîyê di nava demokrasîyekê de wê, ne ji ber hebûna demokrasîyê bê. Wê ji ber nebûna demokrasîyê û ankû kêma hebûna demokrasîyê bê. Di wê warê de wê, dema ku wê, pêşketin wê bibê û wê li sînorê rejimê wê bialiqê wê, di aslê xwe de wê ji ber wê nebûna demokrasîyê wê, ew sînorê wê ku ew hat hejandin wê ew tengezerî wê di aslê xwe de wê şîroveya wê ew bê. Ya wê sînorê xwe berfîhreh bikê û wê xwe nûbikê û yan jî wê, bikeve nava dijberî, nakokî û pevçûnê a bi beşên civakê re. Ev jî wê, weke aliyekê wê yê giring bê ku mirov wê, di serî de wê, werênê li ser ziman bê. Di wê warê de wê, dema ku wê bahse 'pêşxistina demokrasîyê(\*)' wê were kirin de wê, di aslê xwe de wê, hinek wateyên din jî wê ji aliyê rejimê ve wê li van gotinan wê hebin.

-----  
(\*)Artemio, Guillermo (2012). *Historical Dictionary of the Philippines*. Scarecrow Press. p. 9-25.

(\*)Crosland, Anthony (2006). *The Future of Socialism*. pp. 9, 80.

(\*)Newman, Michael (2005). *Socialism: A Very Short Introduction*. Oxford University Press. p.11.45

(\*)Vincent, Andrew (2010). *Modern Political Ideologies*. Wiley-Blackwell Publishing. p. 8-90.

Bi gotineka din wê rêyên xwe hildana li ewlehiyê û rêyên kêmkirina bertekan wê, hinekî di wê warê de jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Heta salên 1990î wê, dewlet wê weke hebûneka pirr laşgiran wê bijî û wê, nikaribê xwe zêde dewrûdayim bikê. Wê weke din jî wê, dewlet wê heta wê demê wê, di nava cihane du-qutubî de wê, weke saziyeka ku wê hin bi hin wê ji holê were rakirin wê, di têgînê de wê were dîtin. Her çendî ku wê ew wê were parastin jî lê wê, di wê rengê de wê li wê nêzîkatî wê were pêşxistin. Piştî salên 1990î wê, piştê wê, rêyên xortkirina dewletê wê zêdetirî wê, werina pêşxistin. Cihane ku em di wê de dijîn ku ew çend dewlet hebin wê, bi hevdû re wê bikevina pêşbaziya pêşxistin û ankû kirîna çekên giran ên şer ku ew bikin. Di wê warê de wê, rewşek nû wê derkeve li holê. Di aslê xwe de ew rewş wê, hin bi hin wê, weke rewşeka ku wê, teybet bê. Dema ku rewş ew bê wê demê wê, di nava wê hengeyê xwe bi hêzkirin û zêdetirî ketina pey çekên giran de wê, rewşa pêşxistina demokrasiyê jî wê, weke aliyekê ku wê bikeve zorê de. Demokrasiya roja me wê, di aslê xwe de wê ji gelek aliyan ve têçûna wê, mirov dikarê ji aliyekê ve bi wê rewşê ve jî wê girêbide û wê hilde li dest. Sosyal demokrasî wê, weke rêyeka ku wê hem azmûnên aliyê çapgir û yên aliyê rastgirê jî wê ji hinek aliyan ve wê hilde li nava xwe û wê xwe bikişênê li navendê û wê bikê ku ew demokrasiyê pêşbixê(\*). Di wê warê de wê, demokrasiya ku ew pêşbixê. Wê ji aliyekê ve wê, bigotina 'hêvî nekirina jî dewletê' re wê, civak wê çawa wê, li rêyên xwe pêşxistin û parastinê wê bigerihê û wê pêşbixê wê bikeve pey wê de. Wê ew jî wê, bo ddwletê wê hinek aliyan ve wê, weke 'teluke' wê ji aliyê rêveberan wê were dîtin. Bi hêncetên weke 'kêmkirina hêza rêveberîyê û bi wê re çekirina zayîfîyê wê were gûnahbarkirin. Wê di wê warê de wê, sosyal demokrasi jî wê, di aslê xwe de wê ji gelek aliyan ve wê li şûna ku ew tekoşîneka aşîfîyane a demokratikî bide wê, xwe bi şûn ve bide alikî û wê gelek tezên xwe yên bi navê demokratizekirina civakê û parastina wê ya bi hemû reng û cihêrengiyên wê re wê, rewzibikê. Wê li gorî zihniyete rejimê, destûra wê, xwe bikê reng û awayekê de. Wê, di wê rewşê de rengên ku wê, bikeve parastina civakê û ankû beşên civakê de wê, bi hêncete bikeve dijberî destûrê de wê, bêdeng bimênê. Yan jî wê dengê nerm û pirr lawaz ê bêbandûr wê derxê. Di wê rengê de wê, di rewşekê de wê xwe bide hiştin. Lê dema ku ew wê jî nekê wê ji gelek aliyan ve wê, bi iktidara serdest re wê bikeve nava lihevkinê û konsensûsreka li ser esasê parastina iktidarê û destûra wê, ku ew dij demokratikî jî bê. Ev bi şûn ve gavavêtinên sosyal demokrasiyê wê, bina temenê xwe ji tekoşîna pêşxistina demokrasiyê di nava civakê û aktivkirina wê dûrbikê. Wê di wê warê de wê, civak wê, weke ku wê bi iktidarê re wê bi tenê bê hiştin. Bi gotineka din wê bi insafa iktidarê re wê bê hiştin.

Di wê warê de wê, dema ku wê bahse nebûna demokrasiyê û ankû kêmkirina pêşketina demokrasiyê wê, hinekî jî wê, bi nebûna bi awayekê rast ê bi rêxistinîya saziyên sîvîl ên şariştanî bin. Wê bi tîrsa wê ketina dij iktidarê de wê, ew wê, nekin. Yan jî wê, xwe bişûn ve wê bidina kişandin. Wê di wê rewşê de wê, rewşa nebûna demokrasiyê wê, ne weke rewşeka baxt(qader) bê wê weke rewşeka ku ew bi zanebûn hatibê pêşbixistin bê.

Di wê warê de minaq li kurdistanê rejîma tirk bi salan li pey di bin avê hiştina hekîfê

(\*)Demokrasi wê, zêdetirî wê, piştî salên 1980 û bi teybetî jî piştî rûxina yekîtiya sovyet wê, zêdetirî wê, weke têgîneka serdewletî wê, were ser ziman. Di wê warê de wê, çendî ku wê, bahse bi hevdû re jiyankirinê û wekhevîdûbûnê bi wê re wê were kirin jî wê, di nava sînorê rejimê de wê, weke gotineka ku wê were îstîmarkirin û tafisandin jî wê dem bi dem wê bimênê. Ev helwest wê, li pêşîya rast pêşketina wê ya her demê jî bin.

de bê. Wê li dijî wê, ji nava kurd wê, bertekên xort jî wê hebin. Lê barkirina wan bertekan li sazûmana komelî a xort û li asta global a cihanê wê kêmbê. Heta ku wê, pîr zêde wê lawaz wê bimênê. Yê ku wê dengên xwe wê bi komî wê derxin jî wê rastî tûndûtûjiya rayadarên rejimê wê werin. Di wê warê de wê, ew dîroka deh-hezar salan wê were tûnekirin û cihê di bin avê de wê were hiştin. Weke wê deverê herebeyên balqîsê jî mirov dikarê werênê li ser ziman. Weke wan li dehan deverên din bendavên bi armancek ramyarî li dijî civakê ku ew dihên pêşxistin wê di wê warê de wê nebina mijare sazkirina komelên civakî û li dijî wan bertek werina pêşxistin. Dema ku wê, rewşa demokrasiya sosyal(\*) weke xatek sêyem ku wê were ser ziman wê, Antony Giddens wê bahse 'bi awayekê xort tesiskirina hebûna otoriteyê' bikê di nava cihane global de. Li vir di aslê xwe de wê, ev rengê tesiskirina wê otoriteyê wê di çî rengê de bê wê, ji gelek aliyên ve wê ew wê bêbersiv wê were hiştin. Lê li vir wê, çendî ku wê ji aliyekê ve wê, bahse rewşa xortkirina otoriteya welêt di nava rewşa globalismê de bi rewşên komelî wê, di aslê xwe de wê ji aliyekê ve wê li ser wê gotinê re wê ev têngîn wê bikeve mejiyê mirov de ku wê, çawa wê ev saziyên civakî wê di xismeta iktidarê de wê werina pêşxistin. Ez nabêjim ku wê, saziyên sîvil û hikimet wê di gelek waran de wê levnekin. Di aslê xwe de li ser rêgeze jîyane civakê û aramî, aşîti û parastiya rengên wê bi meju û dîroka wê re wê, karibin konsensûsekê jî çêbikin. Di wê warê de wê heta ku wê karibin bi hevdû re wê, destûra welêt jî wê binivîsênin. Wê di encama wê levkirinê de wê destûrek civakî ku wê hemû beşên wê karibê herî hindik wan biparêzê wê çê jî bikê. Lê bi demê re wê du fektor wê xwe bidina dîyarkirin. Fektora pêşketina civakê a bi demê re û ya din wê fektora rewşên nû ên civakê ku ew derketina li holê û weke li dijî destûrê werina pênasêkirin wê, di wê rewşê de wê, hingî wê hikimeta wê, bêjê 'ez mecbûrim destûrê werênima li cih.' Mînaq wê, herêma qatalanya a di nava ispayan de wê, di lê kewçerê de wê referandûma serxwebûna qatalanê wê bikê û wê pîrrianiya xalkê qatalan wê, ji wê re bêjê herê. Lê destûra îspanî wê rewşê wê weke rewşek derdestûrî wê bihasibênê û wê nasnekê. Dadgeha makazagonê a îspanî wê di 7ê razbara 2017an de wê, rawastandina rewşa hikimeta qatalan wê pêşbixê. Heman rewş wê, li **başûrê kurdistanê di 25 êlûna 2017an de wê, referandûma serxwebûnê wê li darbixê û wê rêjeyek mazin li dora ji sadî 93 wê kurdistanî wê dengê xwe wê bo serxwebûnê wê bikarbênin.** Piştî wê re wê hikimeta baxdadê û ya tirk û ya îranê jî wê bikevina nava pêvajoyên hêrişê li wê de. Rejîma tirk û ya îranê ber ku ew jî di nava sînorê wan de du beşên kurdistanê hena. Di nava sînorê tirkîya de bakûrê kurdistanê heya û di nava sînorê îranê de rojhilatê kurdistanê heya. Bo ku ew serxwebûna li başûrê kurdistanê wê, pêvajoyek hêrişan bi ramyarî, leşkerî û ji gelek aliyên din ve wê pêşbixin. Wê, dorpeçkirinê li giştîya kurdistanê wê pêşbixin. Ev rewş û gelek rewşên din ên weke wan wê di aslê xwe de wê, rewşa welat a bi nêzîkatîya wê ya serdestiyê re wê gelek tiştan wê vebêjê. Wê, bide nîşandin ku wê li şûna ku wê li civakê wê werê hizirkirin wê li desthilatdarîyê wê were hizirkirin. Di aslê xwe de wê, ev rewş wê, tiştêkê din jî wê bide nîşandin wê ew bê ku wê, di nava rewşek global de mirov dikarê hebûna demokrasiyê weke nîrxek sernetewî wê fahmbikê. Di wê warê de di nava sînorê welatekê de fahmkirina wê çendî wê, kêmfahmkirina wê û ankû wê, di

(\*)Artemio, Guillermo (2012). *Historical Dictionary of the Philippines*. Scarecrow Press. p. 9-32.

(\*)Crosland, Anthony (2006). *The Future of Socialism*. pp. 9, 75.

(\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 120-160

gelek rewşan de wê, rewşên dioj demokratîkî jî wê bide nişandin jî wê, dema ku ew di çerçoveya giştî de wê, pêşkeve wê, hingî wê, bixwezê û nexwezê jî wê, derkeve dervî sînorê welat. Di aslê xwe de wê, di wê rewşê de wê, ev wê were dîtin ku wê sînorê hebûn û ramyarîya welat wê sînorek ji pêşketina demokrasiyê re jî bê. Wê di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku heta ku derketina dervî wî sînorê nebê jî wê bahse demokrasiyek jidil û rastarast wê mirov nikaribê bahse wê bikê. Di wê rengê wê de wê ev rewş wê, rewşa wê bide diyarkirin saziyên sîvîl wê, weke aliyekê giring wê, valahiyên rêveberî ên di wan waran de wê, dagirin. Wê hebûna wan wê, di aslê xwe de wê, hebûna sînorê welêt jî wê bi sînor bikin.

Piştî salên 1990î wê, hinekî wê li ser rewş û fonksiyona komelên sîvîl wê nîqaş wê pêşkevin. Lê di dewama wan nîqaşan de wê tiştek wê were dîtin. Wê ji her aliyê ve wê, bi sînokirina welêt wê derkeve li holê. Di encama wan nîqaşan de wê dewlet wê encama wê derxê jî wê ew bê ku wê ji aliyekê ve wê, komelên xwe yên sîvîl wê weke 'saziyên dewletî' wê pêşbixê û ji aliyekê din ve jî wê, çawa wê di rewş lawaz û bêerk de wê, komelên sîvîl wê bide hiştin wê bi destûrî û hwd wê bergirên wan wê ji aliyê xwe ve wê bigirê. Di wê warê de wê, weke saziya civakî ên bêerk wê komelên sîvîl wê hebin.

Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, rewşa destûrî a komelên sîvîl wê dema ku mirov wê bikê bin rewşek lêkolînî de wê ji gelek aliyên ve wê ew çerçoveya ku wê derkeve li holê wê, were dîtin ku wê bi sînokirina wê re bê. Dewletê dema ku wê dît ku wê di encama pêşketina komelên sîvîl de wê ew bi sinorbibê wê, pêşî destê xwe zû girt û wê komelên sîvîl bêerkkir û wê ew bi wê rengê kirina bin kontrola xwe de. Di wê rengê de wê, rewşek wê vajî ya ku wê were nîqaşkirin wê bibê. Di encama nîqaşên ku wê werina kirin de, diviyabû ku komelên sîvîl bi hêzbûban û bi wê re dewlet bi sînor bûba û weke aliyekê din ê giring erk û fonksiyona wan ya di nava civakê de zêdetirî pêşketiba û derketiba li pêş. Lê ya ku wê bibê wê vajî wê bê. Komelên sîvîl wê ji aliyê xwe ve wê kêma encamê wê ji wan nîqaşan di kirinê de wê derxin. Wê di rewşa demên berê de ku wê li bendê dewletê bê mayin ku ew destûrê bibe û ew pêşbixê wê, di wê demê de jî wê ew bibê. Wê ev jî wê bide nişandin ku wê, dema ku wê rejim saziyên sîvîl zêde pêşketina wan li berjewendiyên xwe nedibîne wê, nehêlê ku ew pêşkevin. Lê li vir di aslê xwe de wê, weke rewşeka li derve dewletê komelên sîvîl divyabû ku ew pêşketiban. Ew dervî dewletê pêşketin wê, ne bi awayekê dijber ba. Wê tenê li ser rêgeza parastina civakê û bûba dengê wê ba. Ya ku ew nebûna wê ev bê. Di wê warê de wê, dewlet jî wê, piştî salên 1990î wê, bo ku ew karibê kontrola xwe çêbikê û zêdetirî kesên ku ew îteatê jî wê re dikin bibîne û kesên ku ew bo wê şerbikin zêdetir bibin wê nîjadperestîyê û olê di wê rengê de wê pêşbixê. Wê li ser wê re wê xwe bijî. Wê li şûna piştî xwe bide gel wê, bide van herdû diyerdeyan. Di serdema global de wê, dema ku dewlet piştî xwe bide civakê wê mecbûr bimênê ku ew demokratizekirinê bi xwe re çêbikê. Lê wê ji aliyê xwe ve wê, bi bîrdozîkî wê, li ser nîjadperestîyê û olê û hwd re wê, bergirên wê bigirê. Di wê warê de wê, piştî salên 1990î nîqaşên li ser esasê şerê nava olan û ankû nava şariştanan wê hinekî jî wê ji aliyekê ve wê ev rewş û rengê fahmkirinê û pêşketinê wê di temenê wan de wê hebê. Em dema ku wan aliyan baş fahm nekin emê nikaribin bahse wan rastiyên rengên pêşketina wê bikin. Bo demokratizeyeka baş wê dahûrkirina dewletê û bergirên wê yên bîrdozîkî ku wê ji aliyê xwe ve girtin wê giring bê. Wê bi wê re wê were dîtin ku wê, demokratizekirina wê, û **demokratizekirina demokrasiya** wê

ya ku ew bahse dikê jî wê, bergirên bi zane wê ji aliyê dewletê ve wê bi destûrî û hwd wê di temenê wê de wê hebin. Ji vê aliyê ve wê jî mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê rewşa komelên sivil wê tenê weke saziyna lawaz ên bêerk pênasêkirin û hanîna li ser ziman wê bi serê xwe wê, weke aliyekê ku mirov wê li ser wê bisekinê bê. Weke ku wê Antony Giddens jî wê werênê li ser ziman wê, piştê salên 1990î wê hewldana xortkirina dewletê û aktivkirina wê û ji rewşa laşgiraniyê wê derxin wê derkeve li pêş. Di wê warê de wê, dewlet wê, weke saziyek aktiv wê derkeve li pêş. Peymanên global ên aborî û saziyên aborî ên ku ew hatina pêşxistin wê, ji van aliyan jî wê, hinekî wê nişanaka wê bin. Em dema ku ji van aliyan ve li rewşê dinerin em wê dibînin ku wê dewlet wê, weke aliyekê giring ê diyardeyî wê derkeve li pêş. Wê rewşa komelên sivil wê ew wê werina bêerkkiirn û lawazkirin. Wê li şûna wê dewlet wê were xortkirin û bi hêzkirin. Dewlet bi hêz wê weke diyardeyekê wê derkeve li pêş. Argûmanên wê jî wê ew bê ku dewleta bi hêz wê, di nava jîyane global de wê tenê û tenê wê karibê xwe li ser lingan bigirê. Wê demê ew jî bo ku ew karibê xwe li ser lingan bigrê wê mecbûr bê xwe ji her aliyê ku ew dikarê ve xwe bihêz bikê. Di wê warê de pêşbaziya bi hêzbûnê ku wê weke diyardeyek global wê derkeve li pêş wê, di aslê xwe de wê, ji aliyekê ve jî wê, weke aliyekê têkçûna pergalek global jî bê. Wê, çendî ku wê, gelemperîbûn wê, di xwezayê jîyanê de wê hebê jî lê wê, ew wê, weke aliyekê ku wê, di nava wê de wê çawa wê xwe bi sînorê xwe re wê bijîn wê bimênê. Ji vê aliyê ve wê mirov dikarê wê bêjê ku wê, rewşa diyardeya bi hêzbûnê wê, weke aliyekê giring ku mirov wê li ser wê bisekinê bê. Hêz ku ew li şûna ku wê di civakê de wê berhev bibê ku ew di saziyên welêt de berhevbû wê, hingî wê bi mecbûrî wê civak wê weke girseya ji kesên ku ew îteatê ji dewletê bikin wê pêkwere. Di wê warê de wê, zordayina li girseyan pû kesan ku ew îteatê ji dewletê re bikin wê, weke aliyê hatina berhevdû a dewlet civakê jî mirov dikarê wê werênê li ser ziman bê.

Ji aliyekê din ve jî wê jî mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê globalism wê, weke rewşa gelemperîya wê ku mirov wê werênê li ser ziman wê, di çerçoveya rêgezên demokratikî ên gerdûnî de wê, weke aliyekê giring wê werênê li ser ziman. Li vir du aliyan mirov têkiliya wan bi hevdû re dênê û werênê li ser ziman wê, di zane min de wê baştir bê. Aliyekê wê, mafê mirovan û ankû maf û azadiya mirov bê. Bi wê re wê serbestiya mirov bê. Aliyê din jî wê demokrasî û demokratizekirina demokrasiyê bê. Di wê warê de wê, ev herdû alî jî wê ji aliyekê ve wê li gorî dad û rêgezên gerdûnî wê, hebin. Di jîyanê de wê mirov weke zindî wê bijîn û wê her zindiyê ku ew dijî wê weke ku zerdeşt jî wê werênê li ser ziman wê mafê wî yê jîyanî wê hebê û wê pîroz bê. Ev herdû alî wê karibin çerçoveyek civakî bi pergali bi pêşketina wê re bidina çêkirin û wê werênina li ser ziman. Ji aliyekê din ve jî wê, mirov dikarê bêjê ku wê, di her rewşê de wê, maf, azadî, serbestî û serbixwebûnîtîya mirov bi jîyane mirov re wê, armancên wê pêşketina mirov bin. Di wê warê de wê demê wê, di wê çerçoveyê de wê mirov wê çawa wê, karibê ew bi rastîya xwe bijî wê, mirov li wê bîponijê. Di wê warê de wê, mirov wê bi maf, azadî, serbestî û serbixwebûyîna xwe keseyetî û hwd ku ew pêşdikeve wê, di aslê xwe de wê, hin bi hin wê were hemberî welat û rejimê jî. Wê, di wê warê de wê, rejim jî wê, bo kontrolkirinê wê, amûrên pêşketinê wê, weke di roja me de wê bi teknîkî û hwd wê pêşbixê. Di wê demê de wê mirov wê pêwîstî bizanebûneka pîrralî wê bibê. Gelek rewşên ku wê werina pêşxistin û ankû wê rûbidin û wê bina malê dîrokê mirov wan nizanê. Mirov wê, dema ku wê fêrî zanebûnê û wê, êdî wê, bixwezê ku ew

tiştan bizanibê û fêr bibê. Di wê warê de wê, mereq wê, weke aliyekê wê yê ku mirov teşwîkî fêrbûnê dikê bê. Di rewşên di cihê xwe de ku mirov fêr bibê wê, ji du aliyan ve wê, giring bê ku mirov bi zanebûn û fêrbûnê re hilde li dest. Wê aliyê pêşî bi rewşî û pêşketina wê ya bi kirinî bê. Aliyê din jî wê, bi herêmi dîroka wê û rewşên wê yên ku ew li ser wê temenê ew rû didin bin. Dema ku wê, pêwîstî mînaq bi sê aliyan bibê bi zanebûnê û ku aliyek ji wan yek kêmbê wê weke herdû aliyên din saqat bimênin wê li wan bimênê. Wê di jîyanê de wê kulek bin. Zanebûna pirralî ku ew êdî di jîyane mirov pêwîsta wê, ew aliyên wê hevdû temem bikin di jîyane mirov de. Aliyek ji wan kêmbê wê, mirov di rewşek nezanîyê û hwd de wê ji bikarhanîna ji aliyê rejimê ve wê vekirî bihêlê. Di wê warê de wê were dîtî ku wê zanebûn û ankû bizanebûn wê weke aliyekê giring ku mirov wê bi awayekê giştî û tekûz li wê bihizirê bê. Ya ku wê di aslê xwe de wê bi pêşketina keseyetîya me re wê, aliyekê maf, azadî, serbestî û serbixwebûyîna me bi afirênê jî wê ev bê.

Mirovê dema globalismê wê mirovê ku ew bi aqil pêşdikeve û jîyane xwe diadilênê bê. Wê rengên zêhnan wê pêşxê û wê bi wan pêşve wê herê. Di wê warê de wê, kifşkirinan wê bi aqilê xwe de wê pêşbixê. Wê bi zanistên weke yên genetikê û biolojiyê û yên weke yên civaknasî û derûnîyê û hwd wê di ahengekê de wê, jîyanekê wê avabikê. Wê di jîyane xwe de wê, heta ku tu bixwezê wê ji wan têgînên zanîstî wê sûdbigirê û wê jîyane xwe wê pêşbixê. Wê xwe bi wan bide jîyandin. Mînaq çêkirina fêkîyan weke bi genetika wan leyistinê û hwd re wê, tenê wê weke aliyekê ku wê pîr zêde wê pêşketî bê. Di wê warê de wê, gelek tiştên xwarinê wê temenê pêşxistina wan wê li lebratuwaran wê werina pêşxistin û wê pêşxistin û wê xistin li jîyane me û wê bên danîn li pêşîya me.

Serdema globalismê(\*) wê, weke aliyekê din ku wê, têkiliyên mirovî wê di nava hevdû re wê derbas bibin. Wê bandûra têkiliyan li hevdû wê, bi bertekî, sedemî û hwd wê zêdetirî wê pêşkeve. Wê weke biriqîna kirinan li hevdû wê, ew wê bibê. Wê li ser wê rengê tûra têkiliyan a bi hevdû ve girêdanê re wê gotina 'dunya weke gundekê lêhatîya' wê were bikarhanîn. Di wê gotinê wê ya ku wê were fahmkirin wê ew bê ku wê mirov wê zêdetirî wê, ji hevdû wê nedûr bê. Wê teknika ku wê nêzî hevdû dikê û barî deveran li/ji deveran dikê wê pêşkeve. Di wê warê de wê, rewşek nû wê pêşkeve. Ev rewş hemû wê, taqabûlî rewşekê wê bikin. Ew jî wê ew bê ku wê mirov wê çawa wê bi keseyetîya xwe wê pêşkeve. Keseyet çendî ku ew pêşket wê, hin bi hin wê mirovatiyê wê weke ku wê bibîrbikê. Di wê warê de wê, di serdema global de wê, rewş û kesên dager wê weke di rengê mitolojiya demên hûrî û mîtannîyan û ankû a dema girêkê û hwd wê werê pêşxistin. Wê bi wê re wê, dager wê weke rewşek zêhnî ên ku ew hatina bi reng, mînaq û awa kirin û wê ji wan wê mirov wê, mînaq bigirê. Mînaq wê, artistekê li 'hollywood' ku ew çawa dijî wê, bi magazinê wê jîyane wan wê were hanîn li ser ziman. Wê, bi şewayên ku ew dihên hanîn li ser ziman wê, bê xwestin ku mirov weke wan bijî. Wê, di wê rengê de wê, bi dîtbarî wê mirov wê bikê ku ew xwe şekl û awayan de. Wê, bi wê rengê wê bijî. Mirovekê ku wî ne bizane jî bê li gorî demê wê bi

-----  
 (\*)Gotina globalismê wê piştî salên 1990 wê zêdetirî wê were ser ziman. Wê dema piştî rûxîna sovyetê wê bi wê re wê, were li ser ziman. Di nava cihane global de wê, rewş wê çawa wê pêşkevin wê hertimî wê mijareka ku wê mirov wê serê xwe li wer wê biwastênê. Bi teybetî jî demokratizekirinê zêdetirî wê, kî bi hêz wê hebûna xwe biparêzê wê, ji aliyê iktîdaran ve wê lêbê nerîn. Lê hin bi hin wê bê fahmkirin ku wê çendî giring bê ku demokratizekirin ku ew were pêşxistin bê.



gûharînên dîtbarî ên xwe re wê, vajî wê, rastîya xwe karibê xwe bide nîşandin. Di wê rengê û awayê de wê, şewayekê jîyanî wê were û pêşkeve. Wê mirov wê çendî ku wê bi zanebibê wê, weke ku wê di nava rewşek bêzane de bijî wê lê jî were. Wê bikeve rewşekê de. Wê dema ku mirov nizanibê ku wê zanebûnê çawa wê bikarbênê wê, bi zanebûnê û di demek zanebûnê de wê, bi nezanî wê bijî. Di wê rengê û awayê de wê, rewşa mirov wê, di wê rengê de bê. Di dema zanebûnê de wê, ji zanebûnê zêdetirî wê bi zanebûnê re wê armanc, plan, stretejiyên jîyanê û hwd wê, rê şanî mirov wê bidin. Wê, di wê rengê de wê, ji ne dîyarîyan wê mejiyê mirov wê xilas û rizgarbikin.

Rewşên weke ne dîyarîyê, ne zanîna ku wê mirov çî bikê û her wusa rewşên weke yê ne fahmkirina rewşan bi tememî wê, weke rewşên ku wê mirov wê, bi rehetî karibê bide bikarhanî jî. Di wê warê de zanebûna şaş ragihandin bo têgihên rênîşandinê pêşxistinê û ankû tirsên bi xwe ve girêdanê ku ew werina pêşxistin û hwd wê, weke aliyana ku mirov dikarê li vir bibîrbikê bê. Piştî salên 1990î wê rewşên weke telukeyên li dij hevdû wê were ji holê rakirin. Wê bi awayekê wê, gûharîn wê di rewşan de wê bibê. Di wan demên berî salên 1990î de wê, têgîna 'dijminatîyê' ku wê were pêşxistin û wê li ser wê re wê girse wê, werina manipulekirin û hwd wê, ew wê were ji holê rakirin. Di wê warê de wê, dema ku wê dewlet wê xwe xort û bihêz bikê wê, di wê rengê de wê, 'telukeyên ji hundûr' û 'telukeyên ji derve' wê, bi têgihî wê, werênê li ser ziman wê xwe li pişt wan vêşêrê. Di wê rengê de wê, ew wê, bi wan re wê girseyan wê manipule bikê. Di wê warê de pêşxistina salixkirina 'risk' an û rengên fahmkirînê ên ku ew li ser wan re dihên pêşxistin wê weke aliyekê ku mirov wê dikarê li ser wê re li wê bihizirê û wê werênê li ser ziman bê.

Di rewşa jîyane global de wê, gerîna li dunyê wê hinekî wê hesantir bê. Wê tûrên betlaneyê wê ji welatan li welatan wê werina pêşxistin. Wekî din wê, wê naskirina hevdû wê pêşkeve. Bi gotineka hemdem ku wê di roja me de wê li ser wê rewşê re wê were bikarhanî wê ew bê ku wê 'çandên hevdû nasbikin', 'çandên herêman nasbikin' û hwd wê were li ser ziman.

Wê di dewama wê de wê, li ser pêwîstîyê ku wê werina kifşkirin wê bibin. Wê xwestek wê, li wê were pirsin ku wê çî bixwezê, çawa dixwezê bijî û li kûderê dixwezê bijî. Wê xwestek wê, weke aliyekê ku wê, rengê kirin û berê jîyane me wê bide dîyarkirin jî bê. Li ser xwestekê re wê, were pirsîn û lêgerîn. Mirov wê, di jîyane xwe de wê, bi rehetî wê bijî. Wê keseyetîya xwe wê bi egoyên xwe re wê, weke ku ew dixwezê wê bijî.

Di wê warê de wê, dema ku em rengê civake hemdem a dema global wê li wê binerin wê, hinek aliyên wê yê giring wê derkevina li pêş. Mînaq wê, tendurûstî, parastina hewirdorîyê û refêha civakê wê, weke aliyana ku wê, xwe bidina dîyarkirin bin. Di wê rengê de wê, dewlet wê, politikayên sosyalê wê pêşbixê ku ew wê rewşa refahê a civakê, bi tendurîstî û hewirdora wê re wê pêşbixê.

Gotina riskê wê weke gotineka ku wê ji gelek aliyên ve wê cerbên wê werina pêşxistin bin. Hin bi hin wê li ser jîyanê û parastina wê re wê werina pêşxistin. Li ser parastinê re wê werina pêşxistin. Li ser jîyane hewirdorê û hwd re wê werina pêşxistin. Di wê rengê de wê, risk wê tefsîrên wê werina pêşxistin. Mînaq wê, dema ku wê mirov wê jîyane wî di xaterîyê de bê wê, ew çawa jî wê were xilaskirin? Wê ew wê, weke rewşeka ku wê di wê çerçoveya riskê de wê bê hildan li dest bê. Mînaq wê, di rewşên tendurûstîyê de wê, 'ambulans' wê werina pêşxistin ku wê dema ku wê nexweşî bû wê

di cih de wê, were û wê, hilde û wê bibê li nexweşxaneyê û wê ew wê bê dermankirin û başkirin. Mirovekê ku ew kriza dil derbas bikê wê, demek pirr kort wê li pêşîya wî hebê ku ew were xilaskirin. Wê, di wê hundûrê wê demê de ku ew tendurstan nikaibê xwe bigihênîyê de wê nikaibê xilasbikê. Weke van wê gelek rewşên din ên rîskê ku mirov dikarê wan kifşbikê û werênê li ser ziman wê biibn.

Mirov wê nikaibê rewşê ji pêş ve wê bibînê. Rewşek ku ew nebûyî wê, qayda wê jî wê li dirokê wê nebê. Wê karibê wê hisbikê ku ew rewş dest bûyîna wê bû. Wê di wê demê de wê ew rewş wê, hingî wê, weke rewşeka ku wê mirov wê, dijî wê hisbikê.

Di wê warê de wê, di nava wê rengê jîyanê de wê, çi pêşwîst bê? Wê di serî de wê, ev rengê jîyanê ku ew bi sazûmanî pêşdikeve û digihê sazûmanakê wê, bo pêşxistina wê û parastina xwezaya civakê bi wê re wê, bi awayekê pirralî demokratikbûn, qada komelên civakî û ya civakî ku ew were aktivkirin û politikayên wê yên civaknasî û ankû sosyali werina pêşxistin, di rêveberîya civakî de afrînerî û ankû berhemdarî, rastarast pêşxistina makanîsmayên demokratîkî, erkên ku ew werina dayin ku ew bi awayekê bêalî di xîmeta civakê û beşên de wê were bikarhanîn û ne li dijî ti beşên wê yên civakî ên olî etnikî û hwd bê. Wê di wê rengê de wê, hingî wê, mirov karibê bahse rengê dewleta demê ku wê weke dewleta ku ew rêveberîya berhemdar, pêşxistiner û xîmetê dikê bê. Di wê warê de wê, dubare mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, çendî wê erka dewletê wê jî wê were kêmkirin wê ew çendî jî wê serbestî wê bi pêşketina komelên civakî ên sîvil û pêşketina wan re wê pêşkeve. Wê serbixwebûyîn, serbestî, maf û azadiya xwe ku ew weke ku ew dixwezê bikarbênê wê, pêşbixê. Di wê rengê de wê, dewlet wê, çendî ku wê di roja me de wê, weke amûr û ankû aygiteka ku wê, ew wê wan rewşên wê bi civakê re wê pêşbixê û wê civakê wê bawerî pêşarojê wê li wê binerê jî lê wê, di aslê xwe de wê, ya ku wê barî pêşarojê bikê wê civak bê.

### **Pirsgirêkên komelên sîvil**

Komelên civakî wê weke lingekê civakî ên ku mirov di çerçoveya xate sêyem de wê bi teybetî binxatbikê û wê werênê li ser ziman bê. Wê, di aslê xwe de wê, dema ku me li jor bahse 'dewlet û komelên sîvil' kir de me hinekî li ser sekinî. Lê li vir wê pêwîstî bi wê hebê ku ew bi navê xwe û pirsgirêkîya xwe re weke beşekê di dewama wê de bi mijara xwe re were li ser ziman. Di serî de wê, hebûna komelên civakî wê, di aslê xwe de wê weke lingekê wê yên ku ew li şûna ku ew hevîyê jî dewletê bikê ku ew bi serê xwe bikê û pêşbixê bê. Herêmên piçûk û ankû taxt û herêmên keviyê wê, bêgûman wê, dema ku wê bahse komelên civakî wê were kirin wê, di pêşxistina wan de wê, komelên civakî wê girîng bê.

Komelên civakî ku ew ne xwediyê bikarhanîna însiyatîfa xwe xwe bin wê, hingî wê, ew wê tenê weke saziya ku ew giraniyê jî civakê re çêdikin wê li holê wê bimênin. Ji aliyekê din ve jî wê, dema ku ew sazî ew karê xwe nekin jî wê, bi heman rengê mirov dikarê wan werênê li ser ziman.

Di nava civakê de wê, pêşxistina rêyên şaş, bikarhanîna haşhaşê û ankû heroînê û hwd wê bibê. Wê bergirên ku wê li pêşîya wan bigirê û wê ciwanên civakê û ankû di

-----  
(\*Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 120-160

(\*Busky, Donald F. (2000). *Democratic Socialism: A Global Survey*. Praeger. pp. 8-15.

(\*Bobbio, Norberto(1960), *Teoria dell'ordinamento giuridico (A Theory of Legal Order)*, p.5-67

(\*Bobbio, Norberto(1999), *Teoria Generale della Politica*, p.7-45

nava hemû beşên civakê de wê, parastinê wê li dijî rewşên bi wê rengê wê pêşbixê wê, saziyên sivil wê karibin weynek mazin bileyizin. Di wê rewşê de wê, aqilê civakê wê ji çareserkirina pirsgirêkên nava wê re wê hebê. Lê tenê bes divê ku ew derfet û imkan ji wê re wê were naskirin. Ku ew newê naskirin wê ew nikaribê wê bikê. Ji aliyekê din ve jî wê, sazi û ankû komelên civakî wê, weyna xwe wê dema ku ew neleyistin wê, werina rexnekirin. Tenê ku ew rexneyên ku ew ji nava civakê li wan dihên kirin ku ew sazî tenê gûharê xwe bidina wan wê têrî wan bikê ku ew bi xortî ti rêyek rast de bimeşin.

Li vir wê, dema ku em bahse bikarhanîna saziyên civakî dikin wê, bêgûman wê têgihîştineka bi keseyetî a ku wê, xwe berpîrsiyar bibînê wê, di temenê wê de wê pêwîst bê. Minaq wê, ev di roja me de wê bi navê 'hemwelatîfîtyê' û berpîrsiyarîyên wê, werina li ser ziman. Di roja me de wê, hemwelatîfî wê tenê ji aliyê dewletê ve wê were bikarhanîn û wê, berpîrsiyarî û spartekên wê tenê bi îteate li dewletê û li gorî politikayên wê meşînê û kirinê re wê were şîrovekirin û hanîn li ser ziman. Di wê warê de wê, hebûna civakê û şîroveya civakî wê, di aslê xwe de wê, weke rewşek talî û ankû ya di asta duyem de wê di fahmkirina wê de wê were hiştin bê.

Di temenê sazûmanaka civakî a bi komelên wê yên ku navxweyî ku ew pêşkevin û erkên xwe werênina li cih wê, hişmendiyek baş a hemwelatî a li hemberî civakê ku ew hatî pêşxistin jî wê pêwîst bê. Di wê rengê de wê, di serî de weke aliyekê giring ê bingihînî mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, hişmendiya hemwelatîfî wê, pêwîstî fahmkirina hebûna civakê bi rastîya wê re hebê. Divê ku ji gelek aliyên ve ew jî qalîkên dewletê û rengên şîroveyên wê were derxistin û pêşxistin bi hebûna civakê re. Wê hingê wê mirov karibê bi rastî bahse wê bikê.

Ji aliyekê din ve jî wê, dema ku em bahse wê (komelên sivil) dikin em, wê divê ku wê werênina li ser ziman ku wê, di wê rengê de wê, bi têgîneka civakî ve rabin wê pêwîstîya wan bi wê hebê. Di wê warê de wê pêşxistina wan li ser temenekê civakî bi hişmendîya hemwelatîfîya civakî wê, pêwîstîya wê bi wê hebê. Di wê rengê de wê nûkirin wê bi wê re wê dem bi dem wê were pêşxistin. Di wê warê de wê, komelên sivil wê karibin bi dewletê re bi hevdu re projeyan pêşbixin û di pêşxistina wan hevkarîyê bikin. Ji aliyekê din ve jî wê, pêwîstî bi wê hebê ku ew li herêman di nava civakê de cih bi cih ew insiyatîfa xwe bikarbênin û bi wê re civakê aktivbikin li ser rewşên wê yên navxweyî û pêşxistina wê ya bi berpêşarajê ve. Wê di wê rewşê de pêşketina wan pêwîstî bi icazet û ankû li bendî insiyatîfê ji dewletê nebê. Ji xwe, dema ku ew kat rewşek wusa jî wê, êdî wê wateya xwe ya bi komelî û civaketî wê windabikê. Weke aliyekê din ê sêyem jî ku ew komel li pêvajoyên pêşketinê û rewşan werina serdest û serwerkirin. Di wê rengê de wê, hinekî wê mirov karibê bi awayekê rast û tendûrîstî bahse pêşketina wan bikê. Bi wê re wê weyna xwe wê bileyizin. Wê di farq û zannîna wê de bin. Ew çendî ku ew di farqê de bin wê, qada civakî a hevbeş ya jîyanê wê biparêzên û wê maf û azadîya wê hildina ewlehiyê. Li vir li ser gotina parastina qada civakî mirov dikarê wê hinekî din balê bikişênê li ser wê û li ser wê hinekî bisekinê. Di aslê xwe de wê, ev wê weke aliyekê giring bê. Ev gotin wê, têgîneka civakî a rewşî a giring wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Ji xwe wê, karê komel û saziyên sivil ku ew bi çî rengê bo civakê, rewşên wê yên civakî û pirsgirêkên wê û her wusa bi rêxistîniya nava wê werina avakirin wê, ji aliyê xwe ve wê ew wê qwada civakî a hevbeş wê salixbikin ji aliyê xwe ve û wê li ser wê re wê xwe pênasebikin û wê werênina li ser

ziman. Di wê warê de wê, bi hevdû re jî wê, di nava têkiliyek rast, dûrûst û ahlâqî de bin.

Ew di nava têkiliya bi hevdû re de bûyîna wan jî wê, renekê têkiliyî ê weke tûra têkiliyan a nava civakê jî bê. Wê bi wê re wê, ew tûra têkiliyan wê weke rayên di laş de derbas dibin û di wan re xwûn diçê û tê bê. Di wê warê de wê, bi têkiliyên xwe re wê heya wan ji rewşan wê bibê. Wê bi wê re wê karibin berî ku rewş biqawimin ew pêşîya wan bigirin. Ji aliyekê din ve jî ew rewşa civakê wê, bi awayekê rast û baş wê fahmbiikin û wê hildina li dest. Malbat bi malbat, bêf ku ew ti farqê bikina navê de ew têkiliyê biheman rengê û awayê bi wan re dênin û di pêşketin û xwe parastin û dabarakirina wan de ji wan re bibina alikar. Di wê warê de wê karibin bibina temenê malbatek hemdem a demokratik jî. Bandûra têkiliyên demokratikî ên ku ew bi wê tûra têkiliyan re di nava civakê re dênin û ankû pêşbixin wê bandûra wê li malbatê ku ew weke dendika civakê a bingihîna jî wê bibê û wê di pêşxistina malbatek demokratikî de jî wê weyna wê hebê. Di wê warê de wê, di hevgirtin û parastina wê de jî wê weyna wan wê hebê. Ber ku wê malbat wê pirsgirêkên ku ew bi civaknasî, derûnî û aborî dijîn wê temenê wan karibê xirabikê. Di van wan û gelek warên din ên weke wan de komelên aktiv werina pêşxistin ew xismetê bibina ji civakê re. Wê di wê rengê de wê, hêviya wan ji dewletê jî wê, qût bibê. Ber ku ew çendî ku ew ji dewletê bihêvî bûn wê dewlet wê ji wan wê li bendî îteate bê. Kirinên dewletê ên di bin navê 'xismet' û hwd de wê bi hêvî û bendewariya îteate wê li şûn xwe wê werênê. Bwer vê yekê wê, dewlet wê, kirinên wê yên weke xismetê jî wê, bi armanc bin.

Ji aliyekê din ve jî wê, dema ku em li nava civakê binerîn wê gelek komên piçûk û mazin wê hebin. Li vir wê, giring bê ku ew piçûkatî û mazinatiya koman li wan newê nerin û bi heman nêzîkatîyê li wan werê nerin. Ew jî mafê xwe yê xwe bi rêxistinîkirinê bi destxin û komelên xwe avabikin. Di çerçoveya civakî de bi komelên piçûk û mazin re hevbeşî û armancên civakî ên hevbeş werina pêşxistin û li ser wan re bi hevdû re tevbigirihin. Di çerçoveyek giştî de wê, dema ku wê, komên mazin wê biafirin wê komên piçûk wê weke komên keviyê wê li wan wê were nerin û wê, zêde newina li berçav. Wê heta ku wê bahse wan jî wê newê kirin. Lê li vir xwe gihandina wan û di çerçoveyek giştî de ew gihandina wan li çerçoveya armancên hevbeş wê, wan jî wê, weke komna aktiv ê civakê wê bike nava tevgerê de. Bêgûman di nava civake kurdistanê a 60 milyonî de komek civakî a pîrr piçûk ku ew ji çend kesan jî ku ew pêkwere ku ew bi rêxistinîbikê û ew bi tevgerbibê wê, nêzî komên mazin wê karibin bandûrê li nava civakê çêbikin. Ji aliyê pêşketina civakê ve wê, bandûr û hebûna wan komên piçûk wê weke wan ne piçûk bê. Di rewşa civakê a giştî de wê, mirov dikarê wê bêjê ku wê, tevger, kirin, xûy û rastiyên komê ku ew bi wan dijîn wan di serî de mirov fahmbikê. Du tişt wê, karibin têkiliyeka giştî wê bi koman re wê di çerçoveya civakê de wê derxê li holê. Aliyê pêşî zêdebûna têkiliyan li dora têkiliyên komî bê. Wê ew dem bi dem di mejiyê endamên komê de wê, temenê bijartinên nû jî wê biafirênê. Aliyê din jî wê, dema ku ew pîrr têkiliyan dibîne wê, di mejiyê endamên komê de wê, têkiliyên xwe yên komî wê tang bibîne û wê xwesteka xwe avêtina li nava têkiliyên din jî wê pêşkeve. Wê bi wê re wê, dema ku wê, xwe avêtina nava têkiliyan heya ku ew ber ku ew ne ji komekê bê û ankû ew ji ber ku ew ji renekê din ê cuda bê ew rastî redkirinê werê. Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, giring bê ku mirov rewşa têkiliyan bi bi awayekê trapîyî wan hildê li dest wê baş bê. Di wê warê de hêstên redkirinê wan bide nîşandin ku

wê encamên wan hem bo yên ku ew didina nişandin û hem jî yên ku li hemberê wan marûzî wê dimênin wê çi encamê wê bi wan re wê bi xwe re wê werênê dikarê li wê bihizirê. Di warê de wê jî mirov werênê li ser ziman rewşa civakê wê, çendî ku wê dem bi dem wê hêstên dijber wê, karibê bi fahmkirinê ew werina salixkirin û jî dijberîyê derxistin. Wê bi wê re wê êdî wê, dijberî wê ji holê rabê. Minaq oldarek wê hebûna homofilekê ku ew weke bijartineka mafê wî kesî bibînê wê, karibê rast fahmbikê.

Dema ku mirov li hizir û fikrên cûda bihizirê wê, mirov dikarê werênê li ser ziman ku wê, dema ku mirov çi ji xwe re rast dît ku ew bi heman rengê nêzî yê li hemberî xwe jî bibê wê, hingî wê, ew wê, fahmbikê. Wê hingî wê, ew dijberî ji holê rabê. Di nava civakê de komelgerî wê, giring bê ku ew bi awayekê rast û li ser temenekê rast were bi felsefê û têgihîştin kirin. Wê bi wê re wê, êdî wê temenê li ser wê rewşa komelgeriyê re wê, dûrketina ji hevdû û ankû li dijî hevdû bûyîn wê ji aliyekê ve wê, were ji holê rakirin. Komel wê, ji saziyana bîrdozîkî zêdetirî wê weke saziyana civakî ku ew bi armanc, plan û bernema pêşketî na û ew, li nava civakê bo çareserîya pirsgerîkên wê dixabitin. Wê, bi awayekê din jî wê, bi têngîna rêxistinî wê temenê nênişana bi ber pêşarojê ve jî bê.

Di wê rengê de wê dema ku ev bû wê, aktivbûn wê bi komelan re wê derkeve li holê. Aktivbûna bi komelgeriyê re wê, di temenê xwe de wê têngîneka insiyatîfî wê bi hawenê. Wê, di wê warê de wê, di nava rewşa jîyanê a ramyarî, aborî û aliyên din jî de jî wê, jî aliyê civakê ve wê, aktivbûn wê bibê. Piştî salên 1950 û pê de wê, hin bi hin wê piçûk jî bê wê, pêşketinên bi komelgerî wê xwe bidina diyarkirin. Lê piştî bi demê re wê, ew hin bi hin wê pêşkeve. Heta ku wê sal wê were li dora salên 1980yî wê, were dît in ku wê, komelgeriyek li berçav wê hin bi hin wê pêşkeve. Komelên ku wê pêşkevin wan mirov dikarê di sê qatagorîyan de bi serekeyî werênê li ser ziman. Aliyê pêşî komelên ramyarî na. Aliyê duyem komelên aborî na. Aliyê sêyem jî wê komelên civakî ên ku ew di nava civakê de ew dihên saz kirin bin. Wê ev komel wê bi giştî wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Di wê rengê û awayê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, ev rewş wê zêdetirî wê, weke rewşna ku mirov dikarê wê, weke aliyekê giring wê, werênê li ser ziman bê.

Di nava civakê de wê, dem bi dem wê, temenê xwe nûkirinê jî wê, ev komel bin. Wê karibin gûharînan ew di nava civakê de çêbikin. Di wê warê de wê saziyên weke dewletê wê, li şûna ku ew wê bernemeyan wê pêşbixê û dênê ber civakê wê, pêwistî bi wê hebê ku ew dem bi dem xwe li gorî wê pêşketina civakê nûbikê. Di wê çerçoveyê de wê pêşketina civakê a ku ew dem bi dem dibê wê ji xwe wê bo wê bê rewşek her demî a xwe nûkirinê jî. Di wê warê de wê, dewlet wê, ji saziyek bîrdozîyî jî wê derkeve. Wê weke saziyek giştî a civakî wê, bijî û wê xwe wê werênê li ser ziman. Wê israr nekê ku wê weke wê bê. Di wê warê de wê, hemû rengên civakî ên komî û etnikî wê hilde li nava xwe.

Di wê warê de wê, ev rewş hemû wê, bi awayekê rast wê bi rola xwe rabûna saziyên komelî ve wê jî aliyekê ve wê girêdayî bê. Wê dema ku wan rola xwe leyist wê, hingî

-----  
(\*Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 120-160

(\*Bobbio, Norberto(1999), *Teoria Generale della Politica*, p.7-45

(\*Hobbes, Thomas(1650); *Human Nature: or The fundamental Elements of Policie* (first thirteen chapters of *The Elements of Law, Natural and Politic*, published without Hobbes's authorisation)

(\*Hobbes, Thomas(1650); *Pirated edition of The Elements of Law, Natural and Politic*, repackaged to include two parts:

wê, pêşîya dewletê weke laşgiraniyekê li ser ser serê civakê mazin bûna wê jî wê pêşîya wê bigirin. Di wê warê de wê, komel wê xwedyê otoriteya civakî a kji nava wê bin. Di serî de wê, weke aliyekê giring ê komelî mirov wê li vir kifşbikê û wê werênê li ser ziman. Li welatên pêşketî ên weke yên iskandinav, amarika, japonya û yên ewropî wê mirov dibînê ku wê komelên civakî wê ji gelek aliyan ve wê li pêş bin, her çendî ku wê hê jî hinek aliyan ve wê li bendî icezete dewletê a li wan bin. Bi gotineka din ew hê jî di bin rênîşana dewletê bin. Lê di wê warê de wê, dema ku wê, ji wê cûdatirî wê, bi serê xwe wê, bina xwedi otorite û wê karê xwe bikin wê, bawerîya li wan wê zêdetirî wê pêşkeve. Li van welatên pêşketî û yên din jî wê, di roja me de wê, were dîtin ku wê, zêdetirî xwe nêzî desthilatdarîya dewletê kirin û bi wê re tevgerîn wê li hemberî wan wê bê temenê bêbawerbûnekê jî jî nava civakê. Ev jî dihê dîtin. Ber ku wê ji ber kirinên wê yên otoriteyî wê, dewlet wê, bawerîyê wê zêde windabikê. Otorite wê, ji gelek aliyan ve wê, pirsgirêkên ku ew diafirênê li hemberî civakê wê, temenê bêbawerîya nava wê civakê û beşên wê bê. Saziyên perwerdeyê wê bi serê xwe wê, weke saziyna perwerdeyê bin. Lê li rex wan saziyên agahdarkirinê û ragihandinê ku ew pêşdikevin bi komelî wê, di nava civakê de wê karibin pêşketinên cûda jî ew çêbikin.

Weke aliyekê din jî mirov dikarê li ser rewşa temenê xwe jîyankirina wan saziyan mirov bisekinê. Ev sazî wê, dema ku ew ji dewletê bo jîyankirinê temenê xwe jîyankirinê hildin weke dahatê û ankû pere wê, bêgûman wê li ser wê re wê, bi wê ve wê girêdayî bin. Wê xwe bi wê ve girêdayî wê hîsbikin. Dewlet bixwe jî wê, weke saziyeka ku ew bi bacên civakê xwe li ser lingan digirê bê. Lê wê ew bacên civakê çawa wê werina bikarhanîn û ew pere li kû deveran dihên xarckirin wê, weke aliyekê giring bê ku ew werina zanîn bê. Ji wê aliyekê ve wê, dema ku saziyek komelî ku ew bixwezê wê lêbipirsê ku ew dahate wê ji dewletê bê wê demê rayadar çî bêjin wê weke wî bikin. Wê demê wê temenê lêpirsînê wê ji holê rabê. Di rewşa komelgeriyê de radikarîyek demokratikî bi rastî, dûrûstî û ahlaqî wê pêwîst bê.

Civak wê dema ku wê xwe di ewlehiyê de hîskir wê hingî wê, karibê bahse rast pêşketina wê bikê. Qadên xwe hanîna li ser ziman, qadên bi hevdû re li wan rûniştênê ên wan seyrangeh û deverên ewle ên weke parqan û hwd re wê, mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Dema ku ev temenên civakî ên xwe jîyankirin û di ewlehiyê de hîskirin ku ew nebin wê, hingî wê, dejenerebûyîn û hwd wê xwe bidina diyarkirin. Qadên jîyanê ku ew windabûn û ankû ji dest bûn û êdî xwe di wan de nedît wê, hingî wê, ew ahenge wê jî wê, were û ji holê rabê. Deverên ku wê komeên civakê li wê bijî wê, ne tenê wê weke deverna fizîkî bin. Ji wê zêdetirî wê weke deverna ku mirov dikarê bi xêr û jîyane wê re li ser meju û mejiyê wê re têkiliyê bi wê re dênê û wê hilde li dest.

Hebûna saziyên sivil û ankû komelên sivil wê, bo dewletê wê, di aslê xwe de wê, weke aliyekê ku wê, mecbûr bimênê ku ew otoriteyê û hêzê bi wê re parvebikê bê. Ber vê yekê wê, di nava civakê de wê, bixwezê ku ew herê bi ser wê de. Yan wê komelên sivil wê ji holê rabikê û yan jî wê, bènê li ser xate xwe. Dema ku çû ser xate wê, hinekî ji civakê dîrkeve û wê, li civakê nehisênê wê, dengê civakê wê neçê gûhên wê, li pirsgirêkên civakê wê ne hizirê, wê ji wan re wê li çareserîyan wê negerihê, wê di gotina rayadarên dewletê de bê, wan çî got wê weke wan bikê û hwd. Di wê rengê de wê, tevbigerihe. Hingî wê, komelên civakî wê, bixwe wê li ser navê dewletê wê bina pirsgirêkna civakî. Wê ew wê, bina weke rêyna ku wê dewlet bi wan civakê

kontrolbikê. Di rewşên dejenerebûyîna civakê, têkbirina wê ji nava wê ve û kuştina hizrên wê yên baş ên pêşketinê bo pêşarojê û hwd jî wê bi wê sayê wê pêkwerê.

Hingî wê, di nava civakê de wê, saziyên ku ew bi pirsgirêkên wê re alaquadar bibin wê nebin. Wê ast û rêjeya sûc di nava civakê de wê pêşkeve û bilind bibê. Wê rêyên kirina suc, xapandin û hwd wê, zêdetirî wê pêşkeve. Li ser serê civakê hewldanên kontrolkirinê ên dewletê wê bi serê xwe wê weke hewldanna ku wê ji aliyekê wê teşwîkî suc bikin bin. Civak bi kontrolkirinê ji rêya wê ya rast a civakê dihê derxistin. Wê ji hevdû dîrket in, alikariya li hevdû û ankû wê alikarvanî wê kêm bibê. Di jîyane bajarvaniyê de wê, di aslê xwe de wê, ev alî wê weke aliyna ku mirov dikarê hilde li dest bê. Di wê warê de wê, di warê fizikî û gîyanî de ku wê temenê têkiliyan wê biafirênê wê komelên civakî bê. Wê bi wê re wê mejîye hevbeş ê civakê wê bide xabîtandin. Dema ku ew nebû û ew derfet jî ji holê rabû wê, civak wê, nikaribê xwe pêşbixê. Di her rengên jîyanê de wê xesasiyetên nû wê xwe bidina dîyarkirin. Mînaq wê, mirovê ku ew li bajêr xwediyê jîyanek xwe ya hesaniya wê, di aramiya xwe de wê bixwezê ku ew bijî. Wê ji gelek aliyan ve wê ji rewşên wekên sucan wê bi tirs bê. Tirsên bi wê rengê û yên gelek aliyên din wê xwe bidina dîyarkirin. Ev rewş wê, di her temenê de wê, bi mirov wê karibê hem xwe weke hevdû bide nişandin û hem jî cûda û cûda bide nişandin.

Li bajaran keviyên bajarên wê weke deverna ku wê zêdetirî wê, kêmendam û xizan wê xwe li wê bidina dîyarkirin. Wê, di wê warê de wê, ev komên civakê ên keviyê wê hertimî wê, bi potansiyale ku ew meyla wan ya kirina sucê heya wê li wan wê werê nerîn û wê nêzîkatî wê li wan wê were kirin. Hêstên ku ew suc diafirênin û weke suc dibînin wê, weke aliyekê ku mirov dikarê di wê rengê de wê, werênê li ser ziman. Di wan waran de wê, weke deverna ku wê li wan wê rêjeya rêxistinîyê li gorî civaka bajêr wê kêmîr bê. Mînaq î ro li istambûlê wê li keviyên wê zêdetirî wê kurd bijîn. Herêmen bakûrê kurdistanê ku rejima tirk li wan şer dikê bi hebûna civake kurd re wê, derfetên jîyanê wê ji wan re wê li wan wê nemênê. Wê ew jî wê, werina li wan keviyên bajêr wê bisekin in. Wê dema ku ew hetina bajêr jî wê li kîjan deverê wê kurd wê zêde hebin wê xwe li wê bigirin. Wê ev hem aliyekê wê civakî û civaknasî wê hebê û hem jî wê aliyekê wê yê xwe bi ewlehî hîskirinê wê hebê. Ev dever jî wê, dewlet jî wê zanibê ku ew hemû tenê kurd in û wê di armanca dewletê de bin. Wê her demê wê bi operasyonên polisan ve wê sibehan wê rabin. Kurd wê, weke rewşek kriminalizekirinê şîrove dikin û wê dihênina li ser ziman.

Kurdên ku ji deverên cûda wê barî bajarên weke istembûlê wê bikin wê li wan deveran wê dema ku ew derfet hebê wê li deverekê wê bikin ku ew xwe bidina li hevdû. Mînaq î ro li stembûlê komekên cizirîyan, waniyan, amediyan, merdiniyan, nisibîniyan, reheyîyan, agirîyîyan û hwd wê, komelên kurdan wê hebin. Ev kurdên ji deverên ku ew hatina ku wan bi navê wan deveran xwe bi komelkirina wê, rengê wê bê.

Lê çendî ku wê rewş wê ev bê û wê bi wê rengê jî bê wê gelek aliyên wê yên din jî wê hebin. Cih gûhartin wê bo mirov û ankû malbatekê wê karibê bibê temenê tengezerî û ankû krîzên malbatî û civakî weke ku em bi kurdistanîyên ku ew barî bajarên dikin ku em bi wan re dibînin. Di rewşên malbatê de lêgerîna li rewşên berê ên ku ew dijîn wê weke aliyekê wê bê. Wê bixwezî ku ew rewşên malbate ên weke ya berê a klasîk wê biparêzên. Di wê warê de wê, tekoşîna parastina malbatîyîya barê wê, zêdetirî wê derkeve li pêş. Di wê warê de wê, dema ku mirov û ankû malbat ket nava şert û mercna

nû de wê, demê bikişênê ku ew adepte bibê li wan şert û mercên nû. Pirsgirêkên adeptebûnê wê her bijî. Wê pirsgirêkên wê di nava jîyane xwe de wê bijî. Wê rewşa malbate berê wê ji rewşek malbatî a aborî û xizmtiyê wê ji wê zêdetirî wê, weke rewşek malbatî bê. Wê ji rewşên biserêxwebûnê zêdetirî wê hevbeşiyek wê hebê. Wê otoriteyek malbatî wê hebê. Rengên girêdanîya bi hevdû ve jî wê, ji hevdû wê cûda bê. Di wê warê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê minaq wê, 'zawacên hemzayendî' wê pêşkevin û wê ev wê, di nava malbatên berê yên klasik de wê newina pejirendin. Dema ku mirov bahse rewşên malbatên nû wan werênê li ser ziman wê aliyên weke wan wê zêdetirî wê hebin û wê derkevina li pêş. Rewşa malbatê wê mirov dikarê di bin çend beşan de wê, di destpêkê de wê, li vir wê werênê li ser ziman. Di zane min de wê, dema ku em pirsgirêkên komelan nîqaşbikin wê, malbat jî wê bi pirsgirêkên xwe yên ku ew bi civakî dijî wê, mirov dikarê weke aliyekê wê li vir di vê beşê de wê, werênê li ser ziman.

. Di destpêkê de wê dema ku mirov malbatê(\*) de wê hilde li dest wê, weke aliyekê wê yê giring ê adeptabûyîna wê ya bi şert û mercên demkî ên ku ew dijî re bê. Di dewama wê de wê, pêvajoyên gûharînê û pêşketinê ên ku ew dijî wê, malbat wê, çawa û di çî astê de wê wan di xwe de wê hîsbikê û wê bandûra wê li wê çawa bê wê, weke aliyekê ku mirov wê, di destpêkê de wê, hilde li dest bê. Pêvajoyên ku wê civak wan bijî wê, weke pêvajoyîna ku wê, bi demê re wê, bi rewşên wê yên gûharîner re bin. Wê, gelek rewş, pirsgirêk û kirinên ku wê bijî wê biibn. Di dewama wê de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, malbat wê, di pêvajoyeka dema nû de wê derbas bibê. Di wê warê de wê çendê ku ew adeptebûyînê(\*) bi xwe re çêbikê wê karibê wê bijî. Hinek aliyên ku em bi gotina adeptebûnê re salixbikin û bêniina li ser ziman jî wê bi fahmkirin, salixkirin û fahmkirina pêşketina civaknasî bê. Aqilê civaknasî ê demê wê, weke aliyekê wê yê din ê giring bê. Di wê warê de wê, ew jî wê, were dîtîna ku wê, malbat wê, di wê warê de wê, li gorî rewşa xwe ya fahmkirinê û derfetên di destê wê de hena wê bi wan re bi sînor wê xwe werênê li ser ziman. Wê li ser wan re wê bijî. Di wê rewşê de wê, rewşên aborî wê, weke aliyekê giring ku wê, bandûrê li rewşa malbatê bikin. Aliyekê din jî wê, rewşên têgînî ên weke rewistê bê. Malbat wê, di aslê xwe de wê, saziyekê wê, xwediyê temenekê û rengêkê pêşketinê bê. Wê di wê rengê de wê, weke rewşek giring a dîrokî wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, di nava dîroka civakê de wê malbat jî wê, xwediyê dîrokek xwe ya pîr demdirêj a kevn bê. Di wê rewşê de wê, pêwîst bê ku mirov hewilbide ku malbatê fahmbikê wê dîroka wê pîr zêde kevn herê û wê bi wê re wê fahmbikê wê, ev wê, weke aliyekê wê yê giring bê ku mirov wê, di destpêkê de wê li vir hilde li dest û wê fahmbikê bê.

.Aliyekê din ê malbatê wê bi rewşa wê ya demên berê re wê, were dîtîna. Dema ku ez rewşa malbatê li vir dihênîma li ser ziman wê, gelek rewşên malbatî ên malbatên kurd ên ku ew bi zorê jî cih û warên wan dihên kirin û jî kurdistanê dihên goçberkirin li rojavayê tirkîya û ankû li hinek welatên ewropa wê, bi wan re wê ya ku wê were dîtîna wê lêgerîn û bêrfîya jîyane berê wê were kirin. Di gelek vegotinên ku min xwe jî li wan hisandiya di derbarê malbatê de wê, di wan de wê bahse demên berê wê bi awayekê

-----  
 (\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 120-160

(\*)Forbes, Scott(2005), *A Natural History of Families*, (Princeton, NJ: Princeton University Press,

(\*)Foucault, Michel (1978). *The History of Sexuality*



agzotikî wê were kirin. Wê, bi awayekê 'norstarjikî' wê were kirin. Di wê rengê wê de ew wê, xwe bide dîyarkirin. Di wê rengê de wê, ew wê bi wê re wê, di wan de wê were dîtin ku wê, mirov wê, ji ya ku ew li şûn xwe dibînê wê pîrr zêde wê ji wê kêmtir bê ya ku ew li pêşîya xwe dibînê ku ew bijî. Di wê warê de wê, di wate lêkirina rewşan û bi wê re jîyankirin jî wê, kêmbê. Gotinên weke 'berê mirovan xweşik bi hevdû re dijî' wê, weke gotinna ku wê, di wê çerçoveyê de wê, werina li ser ziman bin.

Malbat(\*) wê, dema ku ew rewşekê dijî û ew nikaribê wê bijî wê, demên xwe yên berê bibîrbikê. Di wê rengê de wê ji wan wê fêz û peyxam wê bigirê. Wê bi wê re wê, xwe bigihênê li piştîşîfîyekê û wê bi wê re wê bijî. Wê şewayekê girêdanê ê bi hevdû ve wê ji ya roja me wê cûdatir wê hebûba. Di roja me de wê, li hemberê pîrsgirêkê wê, hevser wê karibin hevdû berdin. Lê ew rewş wê zêde wê bi yên berê re wê nebê.

Malbat wê gelek aliyên wê yên ku ew bi wê were zanin wê hebin. Bi teybetî em dîroka herêmê a herêmên kurdistanê hildina li dest emê bi wê re dîrokek pîrr kevn a bi jîyane malbatê re ku ew pêşketî û heyî emê kifşbikin. Birêz Ocalan wê, di pirtûka xwe ya bi navê "ji dewleta rabiban a sumer heta ya demokratik" de wê, zêde giringiyê atfî malbate neolitik bikê û wê derxê li pêş. Wê, dîroka wê, weyna wê ya di nava civakê de û dîroka wê ya ku ew bi wê rabûya wê, werênê li ser ziman. Di wê warê de wê, gelek aliyên malbatê ên ku ew nayêna zanin wê, bi kûrbûna li ser jîyane malbatê a kevn re wê bê kifşkirin, fahmkirin û hanîn li ser ziman. Malbate kevneşopî ku wê, were ser ziman wê, di derbarê têkiliyên wê yên civakî de wê, dema ku mirov li wê dihizirê wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, weke aliyekê giring wê bi awayekê hîyaraşîkî wê, têkiliyên wê werê dîtin. Li kurdistanê di nava civakê kurd wê heta roja me jî wê, ew rengên têkiliyê ên malbatî wê, bi awayê kevneşopîyî ê berê wê were jîyankirin. Wê, di wê warê de wê, her endamên malbatê wê, bi rewşên xwe yên ku ew bi wê hatîya salixkirin wê were dîtin û ser ziman. Dapîr û bapîr wê, weke kesna serdest ên li nûqta bilind bin di malbatê de. Wê di nava têkiliyên dê û bav de wê, di destpêkê de wê, rol û weyna dayikê wê li pêş bê. Wê ew kifşkar bê. Lê piştî wê, bi herîkîna dîrokê re wê were dîtin ku wê, mêr wê derkeve li pêş. Wê, bi wê derketina wî ya li pêş re wê, di têkiliyên nava jin û mêr ên di nava malbatê de wê weknehevî wê bi zêdeyî wê pêşkeve.

Di nava malbatê de em zêde rastî destavêtinê nayên di malbate kevneşopî a kevn de. Lê em rastî rewşên wusa dihên ku wê, destavêtinên ji derve ku ew li jinên ciwan hatina bûna wê, di encama wan destavêtinan de wê, ew werina kuştin. Di wê rengê de wê rewş wê werina dîtin. Ji aliyekê din ve jî wê, aliyê ku wî destavêtin kiriya weke mêr wê, ji aliyê malbata jina ciwan ve wê were were dayin ku ew were kuştin weke tolhildanê. Bi têgîna kisasa kisas wê ew were kirin.

Di warê de em wê kifşdikin ku wê nîrxên malbatê ên ku ew bi wan dijî wê, weke rêgezna ku wê, qadaxabê ku ew derketina dervî wan bibê. Rewşên weke hemzayendî û têkiliyên hemzayendî wê, sedema kuştinê bin. Wê bi ti awayê wê newê herêkirin. Malbat wê, bi rengê kevneşopîyên xwe yên malbatî û dîroka xwe re wê, di nava civakê de û wê ji aliyê hevdû bixwe ve jî wê, were naskirin. Mînaq wê, malbatek kurd wê bo ku ew kevneşopîyîya xwe werênê li ser ziman wê, bi dehan û bistan wê bavikên xwe wê li şûn hevdû wê rêzbikê. Malbatek wê karibê heta 20 bavikên xwe jî bizanibê. Hinek ji

-----  
(\*Karl Marx and Friedrich Engels (in November 1844); *The Holy Family*

wan wê ji wê zêdetirî jî wê, karibin werênina li ser ziman. Dema ku mirov berhema Şerefxane bedlisî ya bi navê 'şerefxane' yê wê, di wê warê de wê, tipolojîyek giring a bi dara malbatê re wê bide nivîsandin û wê werênê li ser ziman. Ev wê weke kevneşopîyeka kevneşopîyî wê were li ser ziman.

. Malbate kevn wê ji malbatek xizmî û aborîyî zêdetirî wê di wê de wê bi wê re wê hebê. Wê weke saziyekê wê pêşketina wê bibê. Lê dema ku em rewşa malbata kevn wê di wê warê de wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman wê, weke saziyek hevbeş wê xwediyê rengê xwe yê pêşketinê bê. Wê, di rewşa wê de wê, ew wê bi wê re wê, were dîtî ku wê malbat wê, weke saziyeka hevbeş ku ew bi hevdû re di nava têkiliyên girêdanê ê xort de wê bijî. Bi serê xwe bûyîn û weke xwe kirin wê, ne tevger û kirinên ku wê werina pejirendin bin. Kesek wê, di nava malbatê de wê, ne di wê rewşê û awayê de bê ku ew tenê li xwe bihizirê bê. Kesê ku ew tenê li ser hizirî wê, weke kesekê ku ew ne xwediyê hizir û rêz û hûmeta malbatê wê were dîtî. Wê ew kes wê, weke kesekê ku ew di nava civakê de ew newê rêzgirtin wê lê were nerîn. Di wê rengê û awayê de wê, rewşa kes wê were dîtî.

Di aslê xwe de wê, dema ku mirov wê, rewşa têkiliyên nava malbate klasik wê werênê li ser ziman wê, di serî de wê, weke aliyekê giring wê, rewş û awa û rengê wê yê bi têkiliyên endamên wê ên bi hevdû re ku ew bi awayekê hîyararşîkî heya wê bibî. Mirov wê, bi tîgîneka hevbeş wê bi hizirê. Wê li malbatê wê bihizirê. Wê mîr wê, di nava tûra têkiliyên malbatê de wê, weke kesê ku ew derkeve li pêş bê. Wê, di dewama wê de wê, weke kesê ku ew karê derve dikê wê derkeve li pêş. Jin wê, zêdetirî wê bikeve malê û wê di nava karên malê xwe de wê weke ku wê windabibê. Wê di vê rewş de wê ev wê were dîtî ku wê, weke ku wê herkesek wê çî bikê ew ji wê aliyê xwe ve dizanê. Yanî bi gotineka din wê herkesek wê rol û weyna xwe û cihê xwe yê di malbatê de wê bizanibê. Ew di nava malbatê de wê, di wê pêvajoya ku ew dijî û mazin dibê de wê, fêrî wê bibê.

Rewşa malbatê wê, di wê rengê de wê, di awayekê de wê, pêşkeve û wê derkeve li pêş. Lê li vir wê mirov dikarê werênê li ser ziman ku wê ji aliyê têkiliyên wê yên aborî û xizmî ve wê, bi hevdû ve wê çendî wê girêdayî bê wê, bi heman rengê jî wê, bi têkiliyên xwe yên nava civakê re jî wê hebê. Wê bi rêngê ku ew dihê herêkirin û pejirendin wê karibê bi wê bijî û rabê. Di nava tûra têkiliya civakî de wê, ew bi wê rewşa xwe wê were nasîn. Wê malbat hem di nava têkiliyên xwe yên malbatî de û hem yên civakî de wê, ew bi wê rewşa xwe ya malbatî a hevbeşî û rengê têkiliyan wê were nasîn.

. Weke aliyekê din rewşa malbatê a berê mirov dikarê bi rewşa têkiliyên nava wê ên weke yên zawacê û hwd re wê, werênê li ser ziman. Di nava malbatên kurd de wê zêdetirî wê, di demên berê de wê, bi rewşa dîtî zawacê wê li pêş bê. Keçik ku ew hat demên xwe yên 17 û ankû 18 salî wê bî zewicandin. Wê zawaca keç û kûran wê ji aliyê malbatê ve wê, were çêkirin. Bi wê rengê wê weke zawaca hatî plankirin wê were dîtî. Di rengê zawicandina ciwanekê de wê, malbat wê hevdû bibînin û wê hevdû nasbikin. Wê hevdû bi mejuya hevdû re wê bizanibin. Wê ciwanên ku ew wê werina zewicandin wê nasbikin û bizanibin. Wê, li ser wê re wê, ew mazinên malbatê wê biryara zewicandina wan bi hevdû re wê bidin. Keç jî û kûr jî wê, heta ku ew nezewicê wê ji male dêûbavê xwe wê cûda nebê. Kengî zewicî wê dêûbavê wî ji wî re wê malê avabikin. Wê êdî ew cûda bibê û wê bê xwedî mal. Lê berî wê, ew wê, tabî malbate

dêûbavê xwe bê weke zaroyê wan. Di rewşa zewicandinê de wê, keç û kûr wê, dema ku ew hatina dema zawacê wê li bendê bin ku ew dêûbavê wan ew wan bizewicênin. Wê di wê warê de wê dêûbavê wan wê biryarê bidin.

Biryara ku dêûbav da jî wê, ne keç û ne kûr wê li dijî wê dernekeve. Wê ew wê pêkbênê. Di nava wê rewşê de wê, ew mazin bibin. Di demên berê de em di nava civake kurd de wê dibînin ku keç jî û kûr jî heta ku ew ji 17 saliya xw ene bûhûrin wê ew newina zewicandin. Lê piştê wê, bi bandûra olê û hwd ve wê, ev temenê zewicandinê wê bikeve li jêr. Wê zaro zûtir wê werina zewicandin. Lê em wê jî wê bêjin ku wê, di gelek rewşên zewicandinê de wê, rewşek din jî wê hebê. Ew jî wê ew bê ku wê berî ku wê malbat wê, biryara zewicandina zaroyan bi hevdû re wê bidin wê, zaro wê pêşî wê hevdû bibînin û wê ew wê, biryara xwe wê ji hevdû re wê pêşî wê bidin û wê piştê wê li ser wê re wê malbat wê biryara xwe wê bidin. Ev jî wê, weke rewşa *hildana dil* a di zewicandinê de wê, were bi navkirin. Wateya gotina *hildana dil* wê ew bê ku wê keç jî û kûr jî wê bi hevdû razî bin. Wê dilê wan ne li dijî hevdû bê. Wê hevdû red nekin. Lê wê di vê rewşê de wê gelek rewşên weke dilê keç û kûran ketîya hevdû û dêûbavê wan û ankû mazinên wan destûr nedana ku ew bigihijina li hevdû. Di nava civake kurd de wê vegotina çîroka 'mem û zînê' wê weke serborîyeka bi wê rengê a xamgin jî ku wê bi sedsalan wê di mejiyê civakê de wê bijî bê.

Malbat wê, ji vê aliyê ve wê, weke rewşeka ku mirov wê, bi teybetî wê hilde li dest bê. Di pêvajoyên pêşketina malbatê de wê, ew wê bi teybetî li kurdistanê wê, were dîtin ku wê, sazûmaneka bi kevneşopî a civakî wê hebê. Li ser wê re wê mirov wê xwe bijî, bênê ser ziman û wê, salixbikê. Di nava civakê de wê, bi awayekê herêkirin û redkirina mirov wê, ji aliyekê ve jî wê, bi rewşa wî ya nava malbatê ve wê girêdayî bê. Di wê warê de wê, weke nirxna civakî li kurdistanê wê, rêz û hûmeta li hemberî dêûbav û ankû mazinên xwe wê, weke nirxeka ku ew li ser wê ji xwe nayê nîqaşkirin jî bê. Di wê warê de wê, mazin wê weke rewşna serdestî wê hebin.

Di warê beremberê hevdû a rewşa jinê û mêr de jî mirov dikarê çend gotinan wê bênê ser ziman. Wê nirxên weke rewîst û ankû ahlaq wê, hinek ji wan nirxên ku wê bi wan mirov wê were herêkirin bê. Minaq wê, di nava civakê de wê, çendî ku wê, azadî û serbestbûna mêr wê hebê wê wilqasî wê ya jinê wê nebê. Di serdemên destpêkê ên şariştaniyê ên li kurdistanê de wê, vajî wê rewşek wê hebê. Wê gelek rewşên ku em dikarin weke cûdahiya pozitiv jî şirovebikê wê, bi jinê re wê, di nava civakê de wê bijîn. Wê, jin wê weke 'rûmetê' wê were herêkirin. Lê bi demê re wê, ew nirxeka weke rûmetê dihê dîtin wê weke 'malê mêr' û ankû 'aîdî mêr' were dîtin wê bibê. Wê, minaq wê, mêr ku wê karibê bi çend jinan re bizewicê wê, bibê. Lê ew rewş wê bo jinê nebê. Di warê têkiliyên zayendî de jî wê, heman rewş wê, hebê. Wê mêr wê di têkiliyên xwe yên zayendî de wê serbesttir bê. Lê wê jin wê wusa weke mêr wê ne serdest bê. Wê dema ku wê, jin wê, dervî mêr xwe wê li mêrekê binerê û ankû bi wî re wê bikeve têkiliyê wê, weke 'îffetê' wê were dîtin û wê, ne baş wê were dîtin. Wê weke 'zina' jî wê, were dîtin û wê dema ku weke 'zina' hat şirovekirin wê li ser wê re wê karibê jin were cezakirin. Di wê rewşê de wê, mêr wê, çendî ku wê rewşên weke bi gotina 'zina' yê re ku wê rewşna wî werina şirovekirin jî lê wê, ne weke yên jinê zêdetir bin. Di nava civake kurd a berê de wê mêr û jin jî wê, dem bi dem wê bo wê zinakirinê wê were cezakirin. Lê bi demê re wê, zêdetirî wê, rewşên mêr wê, werina sergirtin. Di gelek rewşan de wê, dema ku wê rewşên wusa bûna wê, malbat wê, bo ku ew rewş bi

rijandina xwûnê bi encam nebê wê mêrê ku wî destavêtî keçikê wê bi wê re wê, were zewicandin. Wê, bi wê rengê wê, weke 'çareserî' wê were pêşxistin. Ev rewşên civakî ên demên berê na. Yên civake berê na.

Di warê fahmkirina civakê û şîrovekirina wê de wê, weke aliyekê din jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman wê, bi demê re wê rewşên aborî wê, zêdetirî wê weke ku wê xwediyê hinek kifşkariyan di bendên girêdanê ên malbatîtiyê de bin. Lê wê hertimî wê, bendên giradanê ên rewîstî wê li pêş wê werina girtin. Ev jî wê, weke rewşeka teybet a ku mirov wê bi teybetî wê, dikarê wê werênê li ser ziman bê.

Malbat wê, mejuya wê, pîrr zêde wê kevn herê. Dîroka malbatê wê, dema ku mirov lêkolîn bikê wê, bi wê re wê, gelek rewşên bi wê rengê ku mirov wê, werênê li ser ziman wê hebin. Di wê rewşê de wê, dema ku mirov malbatê û jî aliyekê ve rewşên wê yên ku ew weke pîrsgirêk dijî ku em wan fahmbikin wê, bi wê re wê, di demên dawî de wê, zêdetirî wê, xwe bidina dîyarkirin. Li vir mijare me wê tenê bi serê xwe wê ne malbat bê. Ber vê yekê emê jî hemû aliyên wê ve wê, ne hildina li dest. Di çerçoveya mijare xwe wê, bi serekeyî wê, hildina li dest û wê derbas bibin. Di roja me de wê, weke aliyekê pîrsgirêkî ê ku ew xwe bi zêdeyî dide nîşandin wê dema ku wê jî deverên ku li wê dijîn ku ew barî deverêk dikin wê, di encama wê de wê gelek pîrsgirêkan wê bijîn. Wê li jîyane xwe ya berê wê lêbigerihin. Ev lêgerin jî wê, di temenê wê de wê, nekarina xwe nûkirin û adeptebûyîna li rewş û dema nû bê. Di wê warê de wê, dema ku ew nebê wê hingî wê, bi tengezerî wê rewş wê, xwe bi wê re wê bidina dîyarkirin. Pîrsgirêkên malbatê ên roja me wê, aliyekê wan wê, weke pîrsgirêkên ku bi jîyane xwe ya kevn a klasik re dijîn bê. Aliyê din ê duyem jî wê, bi li gorî demê nekarîna xwe pêşxistinê û ankû nekarîna adeptebûyîna li wê bê.

Di demên nû de wê rewşa malbatê wê, weke aliyekê wê yê giring wê derkeve li pêş wê, malbat wê, weke yên berê wê nejin. Wê di demên berê de wê, jin ne di nava jîyane derve de di nava jîyane kar de bê. Lê di dema nû de wê, jin wê jî malê derkeve weke mêr û wê ew jî di nava jîyane karûxabatê a derve de wê cihê xwe bigirê. Wê bê xwedî pişe. Ev jî wê, di têkiliyan û rengê jîyanê de wê bi xwezayî wê gûharînan wê werênê. Malbate ku wê, di demê berê de wê tenê mêr karbikê û wê dabare wê bikê wê, jin jî wê bi wê derketina wê derve re wê tevî mêr bibê. Wê, bi wê re wê, rewşa nû a malbatê wê bi gûharînen rengên têkili, jîyan û kevneşopîyên li gorî demê re wê, rengê xwe bide gûharandin.

Di rewşa malbatê de wê, weke aliyekê din ê teybet wê ew jî wê xwe bide dîyarkirin wê, hevdû berdan wê zêdeyî wê pêşkeve. Di rewşên malbatî ên berê de wê ev wê zêde nebê. Wê jin û mêr wê heta mirina xwe wê jîyane xwe wê bi hevdû re wê derbas bibin. Wê, dema ku jin û ankû mêr, yek jî wan mir berî ya din jî wê, ya ku li jîyanê ma wê, ew bi tenê jîyane xwe bide domandin heta ku ew jî bimirê. Wê, di wê rengê de wê, ew wê xwe bide dîyarkirin. Ev rewş li kurdistanê weke rewşên jî jîyane malbatê a demên berê bin û wê pîrr zêde wê heta roja me jî wê xwe bidina dîyarkirin.

Li kurdistanê ber ku wê jî civakên din ên herêmê zêdetirî wê canda civakî wê serdest bê wê, temenê gûharîne wê zêdetirî wê bi wê re wê hebê. Wê, di wê warê de wê, ew derfeta xwe gûharandinê wê zêdetirî wê hebê. Lê jî ber pêvajoyên şer ên li ser serê civakê wê, civak wê di nava xwe de wê girtî wê bimênê û wê, bi cihane hemdem re wê hevnasinê wê zêde nekê ku ew wê gûharîne bi awayekê rast û li gorî demê bi xwe re çêbikê. Ber vê yekê wê, dema ku rewş ev bê wê, hingî wê, zêdetirî wê di demên nû de

wê, bi kevnêşopîyên xwe yên malbatî ên demên berê re wê bijî. Ev jî wê, bixwezayî wê bina temenê pîrsgîrêkên civakî ên navxweyî ên xwe li gorî demê ne jîyankirinê. Di wê warê de wê, tekoşîna nava civakê wê, di aslê xwe de wê jî aliyekê ve jî wê tekoşîna xwe gûharîna li gorî demê û gihandina li ast û pîvaneka li wê radeya pêşketina demê ku ew li gorî wê û weke wê bijî. Pîrsgîrêka pênasêkirina rengên malbatî ên demî, herêkirina wan û bûhûrandina wan wê, hingî wê girantir bibê.

Gûharandin wê jî aliyekê ve wê, bi zêhnî, felsefîyî û aqilî bê. Ji van aliyan ve wê, malbat wê çendî ku wê xwe gihandina aqilên nû bike wê, karibê wan fahmbikê û muhasebeya wan di jîyane xwe de bikê. Wê, wan pîretîzebikê. Wê kirinên nû wê di jîyane xwe de wê pêşbixê. Di wê warê de wê, weke aliyekê din jî wê, dema ku wê rewş ev bê û ankû weke ku em fahm dikin ku astengî li pêşîya pêşketina civakê di wan waran de hebin wê, civak wê xwe di qalîkê xwe yê berê de wê bi ewletir û baştir wê hisbikê. Rewşên wê di qalîkê wê de dihêlin jî wê, hêstên weke tîrs, ne ewlehî û ne dîyarî bê. Ber vê yekê wê li şûna xwe berê xwe bide li pêş xwe û xwe pêşbixê wê, berê xwe bide bi şûn xwe ve û wê xwe bi wê bijî.

Ji aliyekê din ve jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê malbat wê, di rewşa gûharîna tîkîliyên nava wê û zaroyên wê de jî wê ev xwe bide dîyarkirin. Weke ku me li jor hanî li ser ziman wê, berê wê zaro wê piştî ku ew zewicî û piştî wê, jî male dêûbav wê cûda bibê. Wê male xwe avabikê. Wê jî wan cûda bibê. Lê di roja me de wê, ev rewş wê, bi gûharê. Zaro berî ku ew bi zewicê wê jî male wê barbikê. Wê di malê de wê bi serê xwe wê bijî. Wê, berê tenê zaro ku ew kûr bê û keç bê wê hevserê wan ya ku ew bi wan re zewiciya wê tenê wê herê male ku wan jî xwe re avakirîya. Lê î ro wê, rewşên weke yên evindariyê wê pêşkevin. Wê, bêî ku ew bi hevdu re bizewicin wê barî li cem hevdu bikin û wê bi hevdu re wê weke jin û mêr wê bijin. Di rewşên weke bi gotina 'destûra şariştanî' re wê were li ser ziman wê ew bê ku wê, bi fermî wê, zawaca xwe wê çêbikin. Berê wê, di zewicinê de wê zêde dilketina li hevdu û ankû hêj hevdukirinê wê lênehatiba lêgerin. Lê di roja me de wê li wê were lêgerîn. Heta ku ew bi wê rengê hêstan li hevdu bijîn wê bi hevdu re wê bijîn. Lê ku ew hêstên wan gûharîn wê ew jî wê jî hevdu wê vaqatîhin. Di warê de bûyîna xwedî zarokê de jî wê rewş wê bi heman rengê bê. Di demên berê de wê, weke jin mêr wê heta dema ku ew dikarin zarokan çêbikin wê zaroyên wan çêbûban. Lê î ro wê, gelek hevpar wê weke hevser wê di roja me de wê dema ku wê zaroyên wan çêbibin wê, rewşên weke aboriyê, hêjkirina ên li hevdu û hwd wê li berçav wê bigirin. Ev wê weke xoslet û teybetmendiyên malbate dema nû a hemdem bin. Gûharinên malbatî wê di wê rengê de wê bi awa û rengên bi van şewayan wê re wê xwe bidina dîyarkirin.

Di rewşa malbatê de wê, rewşa zarokan wê hinek gûharîn û ankû fektorên ku wê hindik zarok û ankû zêde zaro ku wê bidina dîyarkirin wê bibin. Berê wê, zêde ev rewş wê neban. Lê di roja me de wê, di rewşa weke yên aborî, bi mazinkirina wan re perwerde û gihandina qalîteyek baş a jîyanê wê li berçav wê were girtin. Di wê warê de wê, rewşa malbatê wê, ev jî wê weke hin restna ku wê bidina dîyarkirin. Ev weke restên malbatî ên hemdem jî dihên bi navkirin. Lê aliyekê din jî wê, zêdetirî wê mirov wê li keyfî û laşê xwe wê bihizirê û wê ber wê yekê wê zarokan wê çênekê. Di nava jîyane hemdem a popûlar de wê, zêdetirî wê, dîtbarî wê derkeve li pêş. Mirov wê lê were nerîn ku ew çawa dihê nerîn li berçav. Wekî din ew li xwe dinerê û ankû na nerê. Wê ev wê weke aliyna ku wê van rewşan jî wê bandûr bikin bin.

Berê bûyîna xwediyê zêde zarokan wê weke rewşek baş a ku ew bi gotina 'malmazinî' re dihat li ser ziman bû. Malmazinîti(\*) wê, wateya wê ew ba ku mirov wê xwediyê malbatek mazin bê û wê di nava wê de wê mazin bibê. Ev wê, weke aliyekê giring ê malbatê û ji restên malbatê jî wê bi heta dîtin. Lê di roja me de wê, vajî wê rewşên weke 'zarok bar a', 'nahêlê ku ez weke ku ez dixwezim bijîm', 'ez divê ku jîyane xwe bikim xîsmetî ya zarokê de heta ku ez wê mazin bikin û hwd wê, weke alî û hizirkirina ku wê di bûn û ankû nebûna xwediyê zarokê de wê, kifşkar bin.

Berê wê, dema ku wê bûba malbatek xwediyê gelek zaroyan wê, ew ji wê re wê weke qizincekê jî ba. Mînaq wê, ew malbat wê hem bi wê mazin bûba û hem jî wê ji aliyên din ên xwe dabarekirinê ve wê, bi hevdû re bijîyan û wê ji hevdû re wê bûban alîkar. Wateya malbat a klasîk wê hinekî jî wê alîkarîya li hevdû, hevbeşî û xizmtî bê.

Di roja me de wê, vajî hevbeşîya malbatê a klasîk wê kesîti wê derkeve li pêş. Wê mirov wê, ji aliyekê ve wê, bikeve wê rewşê de wê zêdetirî wê li xwe bihizirê. Wê ez wê zêdetirî wê derkeve li pêşîya hevbeşîya malbatê.

Di rewşa malbatê de wê weke aliyekê din jî ku mirov li vir wê werênê li ser ziman wê rewşa hevdûberdanê bê. Wê di wê rewşê de wê, demên berê ên malbatê de wê, dema ku wê jin û mêr bi hevdû re zewicin wê, weke restekê civakî jî wê were herêkirin ku ew heta ku bimirin ew bi hevdû re bin. Ew pîrsgirêkan jî bijîm wê hevdû şewîrîyê û hwd re wê werina çareserîkirin. Dema ku malbat xwedî zaro ba wê, ew rewşên hevdûberdanê wê, weke rewşna ku wê teqez wê ji jîyanê hatiban derxistin. Di roja me de wê, ev new wusa bê. Wê hevdû berdan wê, li ser xwesteka jin û mêr wê pêk werê. Di roja me de wê, weke aliyekê wê, dema ku wê jin û mêr wê hevdû berdin wê, hebûna zarokê wê, li berçav wê newê girtin. Wê çawa wê çareserîyan wê bi hevdû re wê di çerçoveya meyzendina li zarokan bi hevdû re piştî ku hevdû berdan wê bibînin wê li wê bihizirin.

Di rewşa zarokê de wê di aslê xwe de wê, hevdû berdan û cûdabûna dêûbav wê bandûra wê li ser zarokê wê pîr zêde bê. Ev alî wê, zêde weke aliyekê ku mirov dikarê wê, di demên hemdem de rastî wê were bê. Di warê xirabûna derûnî û civaknasîya zarokê de wê, ev weke rewşek giring bê. Rewşên ku ew dikarin bibina sedema hevdû berdanê ên weke di rewşa abnorîyê de ketinê, di rewşên jîyanê de ne hanina li cih xwestekên hevdû û hwd wê karibê werênê li ser ziman. Aliyên din ên weke bi gotina 'êdî ez hêj te nakim û ji ber wê ez te dibêrdim' jî wê, weke aliyna ku wê bibin bin. Di rewşa dîtin û kifşkirina sedemên hevdû berdanê de mirov dikarê gelek aliyan bi wê rengê wan werênê li ser ziman. Di rewşên hevdû berdanê de wê, ji gelek aliyan ve jî wê pîrsgirêkên derûnî, civaknasî û hwd ku wê, di roja me de wê mirov wê bijî wê, di temenê wan de bê. Ev rewş wê, weke rewşna ku wê, mirov wê, ji hevdû wê, cûda bikin bin. Mîrov wê, di roja me de wê, pîr bi hesanî wê, heya mirov wê ji ser hevdû wê her ser hinek din. Wê di encama wê de jî wê mirov karibê bahse hevdûberdanê wê bikê. Di wê warê de wê, dema ku wê, weke demên berê ên malbatê a klasîk ku zaro hebin wê ti carî wê ew newê rojevê wê, rewşên wusa wê ne bûhûrîner bin bo mirovê roja me. Di wê warê de wê ya bûhûrîner weke hêncet û sedema ji hevdûcudabûnê wê, xwe çawa hîskirin wê hebê.

Bêgûman rewşa malbata hemdem wê, ji gelek aliyan ve wê, mirov divê ku wê bi teybetî wê hilde li dest. Her wusa wê, rewşa malbate hemdem wê bi van rengên

-----

(\*)Bedlîsî, Şerefxan; Şerefname: Tarîxa Kurdistanê ya kevn, p.8-90

pirsgirêk û rewşên ku ew bi jihevçûdabûnê û hwd re ku wê bijîn wê, li gorî ya malbatî a dema berê wê, weke 'ji holêrabûna hebûna malbatê û windabûna wê ya bi nixrên wê re jî wê karibê were xwendin.

Malbat wê, weke têtîneka cûda a ku wê, ji aliyê çapê û rastê ve jî wê nêzîkatîyên cûda wê li wê werina kirin bin. Ya ku wê li xoşa mirov wê herê wê ew bê ku ew li gorî ya kevn wê hêsta malbatîyê wê bijî bê. Wê aliyê rastê wê li ser têtîna muhafazakariyê re wê li wê bihizirê û wê bi wê re wê bixwezê ku ew xwe nêzî malbatê bikê. Lê li vir di aslê xwe de wê giring bê ku em ji aliyê din ve li gorî asta pêşketina demê û têtîneka demokratîkî malbatê hildina li dest û wê fahmbikin. Wê gelek rewşên ku wê, karibin ji wê re wê, di dema hemdem de wê bibina weke çareserî jî wê, ev bê.

Hebûna malbatê ji ya demên berê cûda ku mirov wê hilde li dest wê, di roja me de wê, li pêşîya wê gotina 'hemdemiyê' wê were danîn bê. Lê gotina hemdemiyê wê bi serê xwe wê nikaribê bibê bersiv ji rastiya malbatê re. Hemdemîti wê weke têtîneka dîtbar a ku wê, li gorî rengên aqil û hwd ku mirov wê karibê cûda û cûda wê şîrovebikê û wê bêtê li ser ziman bê. Lê li vir di serî de wê têtînek li ser nêzîkatîyê û rengê fahmkirinê re ku wê wan ji xwe re wê bikê mijar weke têtîna demokrasiyê wê, pêwîst bê. Dema ku em gotina demokrasiyê li pêşîya gotina malbatê bicih bikin wê peyva '**malbata demokratik**(\*)' wê, derkeve li holê. Ji vê gotinê mirov wê, karibê rewşek çawa a malbatî wê fahmbikê? Di aslê xwe de wê, ev wê weke pirsek giring a ku mirov wê li vir di serî de wê ji gelek aliyên ve di çerçoveya rastiya malbatê de wê bibersivênê bê.

Di roja me de wê di vê warê de wê gotineka giring wê bi hebûna malbatê re wê derkeve li pêş. Ew jî wê malbata îdeal wê çawa wê were avakirin bê. Di wê rengê de wê, di serî de wê, dema ku wê, malbat avakirî bê û wê pirsgirêkên aborî wê bijî û wê, pirsgirêkên bi hevdû re danûstandinê wê bijîn wê, li vir wê, çi pêwîst bê ku mirov li wê bihizirê? Wê çi pêwîst bê ku mirov di serî de wê, bihizirê û wê derxê li pêş? Di aslê xwe de wê, ev wê weke aliyekê giring wê mirov wê li wê bihizirê ku wê, têtîliya nava malbatê wê weke aliyekê giring wê derkeve li pêş. Di roja me de wê, wekhevî wê, di nava malbatê de wê bi jin û mêtê re wê zêdetirî wê weke fektoreka kifşkar bê. Di wê warê de wê, ev fektor wê weke fektora ku ew malbatê pêş jî bixê bê û weke fektora ku ew malbatê ji hevdû bi felişênê jî bê. Berê wê, bi serdestîya mêt re wê, li malbatê wê bijî û wê, ev pirsgirêk wê di wê çerçoveyê de wê bi giraniya aliyekê û herêkirina wê re wê bi hetan çareserkirin. Li vir di aslê xwe de wê, dema ku mirov wê rewşê werênê li ser ziman mirov wê gotinên xwe wê çawa wê hilbijêrê wê weke aliyekê giring ê çêker wê bimênê. Ez ji ber vê yekê ne li ser mêtê re û ne jî li ser jinê re gotinên rexnegir û ankû ên yekî li ser yê din re dibînin û di bin bandûra rewşên berê ên ku wan bi malbatî bi dîrokê re jîyankirina ku ez werênima li ser ziman wê, çendî ku wê ji hinek aliyên re wê bê çareser wê ji gelek aliyên re wê dibê ku ew nebê çareser. Dibê ku ew di mejî de dijberî û rewşên weke piçûkxistin û dîtîne bi xwe re bidina pêşxistin(\*). Ber vê yekê weke aliyekê giring wê mirov wê çawa wê nêzîkî hevdû bê wê, mirov di çerçoveya wekhevîyê û têtîna wekhevîyê de wê, di destpêkê de di nava malbatê de bi jin û mêtê re wê çareserbikê. Ev wê tenê wê weke aliyekê bê. Lê gelek fektor û aliyên din jî wê hebin. Ew jî wê bi tevger, kirin û gotinên mirov ên ku mirov ji hevdû re bikardihênê bê. Ew jî wê, di aslê xwe de wê, dibê ku pêwîstî bi pêvajoyek fahmkirinê a weke ya perwerdekkirinê jî wê re pêwîst bê. Mirovê roja me wê, weke mirovê xwende bê. Ber vê

-----  
(\* )Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 120-160

yekê wê, mirov dikarê weke aliyekê giring wê, werênê li ser ziman ku wê, temenê fahmkirinê wê zêdetirî wê bi wî re wê hebê. Ji aliyekê din ve jî wê, ragihandin wê, pîr zêde wê pêşkeve. Mirov wê, hertimî wê di jîyane xwe de wê, bixwênê. Wê, bi wê re wê fahmkirina xwe wê pêşbixê. Ev alî wê, weke aliyna ku mirov ji aliyekê balê bikişênê li ser wan. Lê di aslê xwe de ez di wê bawerîyê de me ku wê, zanebûn wê, bi fêrbûnê wê, nikaribê bi tememî fahmkirinê û hişmendiyekê gelek caran pêşbixê. Di serî de wê li vir wê, mirov wê bi qarakterîstîkî ku ew xwe li wê razênê û ew wê fêrbûnê bikê. Di nava malbatê de wê, di serî de pêwîstî bi wê heya ku wê mirov wê hevdû bixwênê weke ku ew çawa û di demên xwe yê jîyanê ên destpêkê de ku ew li dibistanan perwerde dibîne û çavdêrîyên xwe dikê û bi wê re fahmkirina çêdikê. Malbat jî wê, ji aliyekê ve wê, dema ku mirov wê bi rastî hilde li dest wê, mirov karibê wê weke dibistanaka jîyanî ku wê mirov wê hertimî wê di nava wê de wê fêrbibê û wê pêwîstî fêrbûnê bibê bê.

Li vir em di dewama mijare xwe dikarin gotinê werênina li ser gotina ku me li jor hanî li ser ziman bi rengê 'malbate demokratik(\*).' Em wê weke dîyardeyekê wê hildina li dest û wê, hewlbidin wê fahmbikin. Weke rêgeze malbate demokratik wê wekhevi wê di destpêkê de wê hebê. Em ku li ser bingihê wê gotinê bi hizirin wê, wekheviya hemzayendî, di têkiliyê de maf û berpirsiyarîya ên wekehev, di warê meyizendina li zarokê, malê û hwd de hevbeşî, di derbarê meyizendina li zaroyê de levkîrin û ankû peymanên ku wê giştîya jîyanê bikina nava xwe, otorîteya ku ew li ser zaroyê dihê pêşxistin ku ew xwe bisipêrê levkîrin û ankû muzakareyan, berpirsiyarîya zaroyan a li hemberî dêûbav û hwd wê, weke hinek aliyên hizrî û hêstî ên ku wê mirov karibê di rewşa malbate demokratik de wê werênê li ser ziman bê. Wekî din wê, bo pêşketinaka rast, bi derûnî aheng û balanse zaroyê bi dêûbav re û her wusa entegresyona bi giştîya civakê re wê, weke aliyekê giring ê ku mirov wê li vir werênê li ser ziman bê. Entegrebûyîna bi civakê re wê, ji du aliyan ve wê pêwîst bê. Aliyê pêşî wê bi derûnî û keseyetîya ku zaroyê ku ew diafirê ve wê, girêdayî bê. Aliyê duyem jî wê, bi civaknasî û têkiliyên ku ew bi hewirdorê re dênê bê. Di wê warê de wê, di nava civakê de wê, zaro wê, xwe werênê li ser ziman. Wê dema ku zaroyê xwe hanî li ser ziman ew bigihijê întibayek baş piştî wê xwe hanîna li ser ziman wê, giring bê.

Wekî din wê rêz û hürmeta ji hevdû re wê pêwîst bê. Weke aliyê sêyemîn jî ew hewldana hevdû fahmkirinê a dayimî bê. Di wê warê de wê, di nava malbatê de wê dilnizmî wê karibê bibê temenê jîyaneka malbatî a rast û demdirêj. Wateya dilnizmîyê mirov dikarê wê ji gelek aliyan ve wê cûda şîrovebikê û wê werênê li ser ziman. Minaq mirov dikarê wê, di wateya hevdû fahmkirinê de wê, werênê li ser ziman. Dema ku di nava malbatê de ku wan kêmesiyek li hevdû kir ew, wê şanî hevdû bikin û li ser wê re lêborîna xwe ji hevdû bixwezî. Wê dema ku ew nekîr û ankû jinê û ankû mêrê li xwe nedanî ku ew lêborînê ji hevdû re bikin wê, hingî wê, li ser wê şaşî û xelatiya ku wan bi zanebûnî bê û ankû ne bi zanebûnî bê ku wan kirîya ew di farqê de bin û ne di farqê de bin wê li ser wê re wê bidina domandin. Ev jî wê, weke aliyekê ku wê hin bi hin wê karibê wan ji hevdû dûrbikê bê.

Li vir di dewama wê de mirov, dikarê balê bikişênê li ser reşa dêûbav weke 'rol

(\*)Ocalan, Abdullah(1984); Personality problem in kurdistan, p.7-60

(\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 120-160



model(\*)'. Di aslê xwe de wê, di nava jîyanê de wê, di wê warê de wê, weyna wan wê pîrr zêde wê bibê. Zaro wê, her çendî wê, dêûnbavê xwe wê weke hevdû nasbikê jî lê wê, wateyên cûda ku wê bi demê re wê, bi salixkirinn cûr bi cûr ên li ser rewşan re ku wê bi dêûbavê xwe re wê cûda û cûda wê bikê re wê, wan ji gelek aliyan ve wê biwate bikê. Wê ew wate wê, ne tenê weke watelêkirinên dêûbavî bin. Wê ji wê zêdetirî wê, weke tégînna ku zaro wan di wê rengê de wê, bi dêûbavê xwe re wê dimejyê xwe de wê bikod bikê bê. Zaro ti carî ne hizirê ku wê dêûbavê wî ji wî herin. Wê li ser wê hêstê re ew wê bikê. Di wê warê de wê heta ku ew rewşa wan ya bi hev re bûyîne bidomê wê, ew wê li ser wê temenê wê bijî. Lê kengî ku ew dêûbavê ji hevdû cûdabûn bi jevqatîneka mihtemel wê, hingî ew kodkirinên bi wateyî ên mejiyê zaroyê jî wê, weke ku wê bikevin. Wê şikeştin wê di wan de wê bibê. Bandûra ji hevdû cûdabûyîna dêûbavê wê hertimî wê mazin bê. Heta ku wê, karibê bibê temenê tengezeriyên ku ew di hemû jîyane xwe bijî bê. Di wê rengê de wê, weke aliyekê giring em di serê de wê werênina li ser ziman. Jevqatîna dêûbav wê di serî de wê, ne tenê temenê malbatitiya di mejiyê zaroyê de wê xirabikê wê, ji zêdetirî wê, şikştinê wê di rol modelên mejiyê zaroyê de jî wê bikê. Wê, ew şikeştinên ku wê zaro wê bijî ku ew bandûra wan bi demê re hin bi hin ji ser xwe biavêjê jî lê wê, heta ku ew sax a wê, ew wê ji ser xwe neavêjî. Wê piştî wê re wê hertimî wê zaro wê weke aliyekê wê saqat û xwûn jê tê û dihêşihê wê lê werê. Bandûra wê, pîrr zêde mazin a li zaroyê.

Li vir di aslê xwe de wê jî mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê dema ku wê bahse politikayên hevdûberdanê ê dêûbavan wê were kirin wê, bahse zorkirina wê were kirin. Ev di welatên hemdem ên pêşketa ji weke aliyekê ku wê hertimî di rojeve de bê. Li vir wê dema ku ew were kirin dibê ku wê, di rêjeya hevdûberdanê de wê, kêmbûn bibê. Lê wê, pêşîya ji hevdû cûda jîyankirinê wê negirê. Bi wê re jî wê, ev rewş wê, karibê rewşê zêdetirî xirabtir bikê. Lê li vir ji du aliyan ve mirov dikarê mijarê di serî de wê, hilde li dest. Aliyê pêşî ji aliyê zaroyê ve bê. Pêşxistina politikayê parastina zaroyê di serî de wê, weke aliyekê giring bê. Di wê warê de wê, dema ku dêûbav ji hevdû cûda jî bibin wê zaro wê, dibê ku ew ji aliyê piştgirî û hwd ve ew newê bi tenê hiştin. Lê li vir ji aliyê derûnî, civaknasi û hwd ve wê, weke aliyekê din ê ku wê li holê wê bimênê bê. Zaro wê pêşî wê xwe têrkirina ji aliyê hêstan ve wê pêwîstiya wan bi wê hebê. Heta ku ji destê mirov were di nava rewşa malbatê de çareserkirina pîrsgirêkan, dayina alîkarî û piştgirîya aborî û hwd wê, weke aliyekê ku wê karibê pîrsgirêkan kêmtir bikê bê. Ev alî wê, tenê wê weke aliyekê bê. Zaro wê, di wê rewşê de wê, dema ku mirov li wê bihizirê wê, ev jî wê, giring bê ku wê, çendî ku ew dem bi dem weke ku ew naçê malê û bi tenê li derve dimênê jî ew bi ewlehiya dêûbav a li malê re ew wê dikê. Ku ew ewlehi nebê dibê ku zaro wê jî nebê. Lê li vir wê mirov dikarê bêjê ku zaro wê, di serî de zaro wê ewlehiyê bi rewşên civaknasî wê, di nava civakê de wê, bi jîyankirinê re wê bijî. Di wê warê de wê, mirov dikarê wê weke aliyekê giring wê werênê li ser ziman ku wê, rewşa civaknasî û entegrebûyîna zaroyê ji zaroktiya xwe wê, hinekî wê di temenê wê de ew rewşa malbatê a baş û ew rengê ewlehiyê a ku me di vê paragrafê de li jor bahse wê kir wê hebê.

-----  
 (\*)Kline, Daniel T. (2003). *Medieval Literature for Children*. Psychology Press.

(\*)Reynolds, Kimberley (2011). *Children's Literature: A Very Short Introduction*.

(\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 90-140

(\*)Hunt, Peter (1991). *Criticism, Theory, and Children's Literature*. Oxford: Blackwell.p.12-45

Di rewşa malbatê û demokratizekirina wê de wê, di serî de wê, di vê warê de wê weke ku me hinekî li jor li ser rewşa gotina malbate demokratik re wê hanî li ser ziman wê, aktivbûyîna bi dêûbav a di jîyane wan û ya zaroyan de wê, giring bê. Di serî de wê dema ku zaro wan di wê rewşê de di rewşek hevpar, hevbeş û bi hevdû re bibinê de wê, ew wê, ji zaroyê jî wê bê hem piştgirîyek derûnî bi pêşketina wê re û hem jî wê, bê temenekê ku ew wê, piştî wê bi domandina wê re wê ji wan wê bi xwe re wê bide domandin bê. Ji aliyê zayendî û hêstî ve wê, zêdeyî wê, di malê de wê weke ku wê barekê mazin li ser milê dayikê bê. Di wê warê de wê, zaro, bi teybetî keç zaro wê li wê binerin. Wê bi wê re wê, di aslê xwe de wê, bi dabarekirina malbatê û bi rêvebirina wê re wê, aliyê hêstî û jîyanî wê, weke yê berhevkarê wê dayik bê. Di wê warê de wê, ji aliyê hêstî û kirinî ve wê, her rewşa wê, bandûrkar bê. Lê ya esas wê ew bê ku wê, dêûbav wê bi hevdû re wê di hevbeşîyekê de wê kirinên nava malê û ên li hemberî zaroyê wele lê meyizendinê û hwd wê bikin. Zaro wê, di wê rewşê de wê, ew wê, xwediyê rewşek teybet a ku mirov wê, bi teybetî wê, werênê li ser ziman bê.

Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, ji aliyê çandî ve jî mirov dikarê malbatê bi van têngî û aliyên ku me hilde li dest wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman. Çanda malbatê a dema hemdem wê, di vê warê de wê, çawa wê reng û awa û şêkil wê bistênê wê, ew wê, bi jîyane xwe re wê biryara wê bidin. Di wê rengê de wê, mirov dikarê wê bêjê ku wê, her kirin û rewşên jîyanî wê, di nava çanda malbatê de wê, werina li ser ziman. Malbat wê, çanda xwe ya ku wê pêşxist wê, piştî xwe wê bide wê weke ku wê çawa di demên berê de wê bide kevneşopîya xwe ya malbatî a klasik.

Di warê çanda civakî a malbatî de wê, çawa wê di ahengekê de wê pêşkeve wê, giring bê ku mirov wê ji malbatê bide destpêkirin û wê werênê li ser ziman. Bi demê re wê weke ku me li jor bi hevdû re rengê malbate ya demên berê a klasik û ya dema nû ku ew pêşdikeve ku me, bi hevdû re hanî li ser ziman û wê bi demê re wê pêşkeve, weke aliyekê ku wê di çerçoveyek gûharînî de wê mirov karibê fahmbikê bê. Wê di rengê pêşketina çandî a bi demê re ku ew pêşdikeve de wê xwe bide diyarkirin. Pêşketina çandî wê weke diyardeyek civakî jî bê, çandî ku wê bi malbatê re wê pêşkeve. Malbat wê, pêvajoyên pêşketinê û gûharînê ku ew bi demê re dijî wê, di nava wê de wê, bi wê rengê wê bi xwe re wê bide çêkirin û diyarkirin. Wê bi wê re wê, ew pêşketin wê, di nava civakê de ku ew bû jî wê bi hevbeşîya wê re wê, civak wê, endamên wê yên din jî ew wê bi xwe re wê bijîn.

Di wê warê de wê, gotina malbatên zort di demên nû ên hemdem de wê, weke aliyekê giring bê ku mirov wê jî wê hinekî fahmbikê. Wê ji aliyê çandî û zanebûnî ve ku ew têr pêşketî bê. Wekî din jî wê dema ku mirov bahse wê, malbate zort bikê wê, bi bandûra wê re wê ew wê xwe bide diyarkirin. Dema ku em bahse malbate xort dikin, dibê ku di cih de ji aliyê xortbûna bi aborî ve ew were fahmkirin. Wê ev tenê aliyekê wê bê. Lê aliyên wê yên din ên weke bi jîyanek ahengî û di balansê de ku ew dijîn û li ser wê temenê ku wan pêşketineka demdirêj a aramî pêşxistina wê, ew jî wê ji aliyê çanda malbatî, ahlaqî û hwd ve wê temenekê xort ê ku mirov di wê çerçoveyê de wê fahmbikê bê.

Têgîna malbata xort wê, weke aliyekê wê xwe bi pêşketina civakê re wê bide diyarkirin bê. Ev wê, di nava her civakê de wê, xwe bide diyarkirin. Malbata xwe wê, di nava kurdan de wê, bi rengê bûyîna xwedî meju re wê were dîtin. Di wê warê de wê, malbatên ku ew dikarin bi çandî bandûrê li civakê bikin wê, di wê rengê de wê,

pêşkevin. Ev jî wê ji aliyekê ve wê temenê wê li ser perwerdebûn û di warê pêşketina civakî de başdariyên wê yên di rewşên pêşketina civakê de wê, xwe bide dîyarkirin bê.

Li kurdistanê wê rewşa malbatên xort wê, li ser rewşa wan ya bavixsalari re wê xwe bide dîyarkirin. Wekî din wê, li ser perwerdebûn û weynleyistina wan ya di nava civakê de bê. Çendî ku ew li gorî çanda civakê û xwestek û rastiya wê tevgeriyan wê, ew wê di rewşa xwe de wê bijîn. Lê kengî ji wê dûrketin wê ji rastiya civakê jî wê dûrkevin. Di nava civakê de wê weke rastteqêniyekê wê civak wê, bi nixxên xwe re wê hebê. Wê hanîna wan ya li ser ziman û li gorî wan bi kevneşopî, orf adet, çand û zimanê re wê di nava wê de jîyankirin wê, di wê rewşê de wê dîyarker bê.

Pêvajoyên jîyane malbatî wê, li kurdistanê wê pîrr zêde wê dirêj bin. Di dema nivîsandîna me ya vê lêkolînê de min çavdêriyek li rewşa dîrok û herêmên kurdistanê xist. Di serî de wê herêmên botanê ên weke nisêbîn, cizir, silopî, qamislo, amûdê, afrîn, herêmên başûrê kurdistanê ên ber zagrosan û heta hewlêrê û herêmên li rojhilatê kurdistanê ên weke urmiyê, kirmaşan û hwd wê, li gelek deveran wê nîşanakên jîyane malbatî ên pîrr kevn wê werina dîtî. Wê, nîşanakên jîyane malbatî ên ji dema neolitikî jî wê werina dîtî. Li herêmên kurdistanê li gorî rastiya civakî a herêmê bi rastiya wê re ti lêkolînên mazin ên li berçav ne hatina kirin. Hin lêkolînên piçûk ku ew hatina kirin wê, bi armanca jî rastiya wê cûdatir hanîna wê ya li ser ziman bê. Ber vê yekê mirov wê zêde nikaribê îtîbarê jî bi wan werênê.

Di jîyane civakî a kurdistanî de wê, nixxên ku ew zêdetirî wê derkevina li pêş wê pîrr zêde bi restên rewist û ahlaqî bin. Di wê warê de wê, pergalek ku wê pîrr zêde hatibê hûrgilkirin wê were dîtî. Di wê warê de wê, jîyane civakê wê, di nava restên wê de wê, were û pêşkeve. Em dema ku wê mejuya civakê bi mejiyê wê re wê werênina li ser ziman em bêgûman nikarin ji wan restan dûr û cûda werênina li ser ziman. Di wê rewşê de wê, rastîya wê bi wan re wê, girêdayî wê, were li ser ziman.

Li kurdistanê wê, ji nixxên olî zêdetirî wê, nixxên civakî û restên wê yên bi têgihîştin bûna wê, rê şanî pêşketina wê bidin. Wê restên olî wê, di wê çerçoveyê de wê, werina li ser ziman. Ber vê yekê ya ku wê, weke aliyekê giring wê, rewşa wê ya pîrr rengî a civakî wê, bide dîyarkirin. Li kurdistanê wê êzîdîtî, yarsanî, feyli, zerdeştî, komên misilman û hwd wê hebin. Komên weke mitrayî maniyî û hwd wê, zêde li ser rûyê dîrokê wê nemênin. Wê nixxên wan di nava baweriyên weke cihûtiyê û mesihiyê de wê werina bişavtin. Wê bi rengê wê, rengê wan xwe bijî. Lê di rewşa rengê jîyane wan de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, çendî wê, oldarî wê hebê jî wê, bi awayekê bi nixxên wan ên felsefîkî, dîrokî û civakî ên çandî û hwd re wê were harmankirin. Di warê nixxên civakî de wê bi wê ev kom û gelek komên din ên ku em dikarin navê wan ji jîyanê bigirin û li vir binivîsênin wê bi hevdu re wê bijîn. Wê karina bi hevdu re jîyankirinê wê hinekî wê, bi sîyane wan ya ku ew bi wê karin di çerçoveyek civakî de bi restên xwe yên ahlaqî bijîn ve wê girêdayî bê.

Bi şartê ku em ji xate mijare xwe ya malbatê dûrnekevin em dikarin hinekî din jî wê, di wê rengê û awayê de di dewama wê de wê, werênina li ser ziman. Di zane min de wê ev rast giring û vegotinbar bê. Ber ku wê, bo fahmkirina rewşek rast a malbatî wê, di serî de pêwîstîya fahmkirinê wê hebê. Heta roja me jî wê, rejimên herêmê ên weke rejima tirk, îran û hwd wê destûrê ji kurdan re nedina nîşandin ku ew li beşên kurdistanê ên nava sînorê wan de kurd weke li gorî rastîya civakê xwe pêşketinên bi sazûmanî bi xwe re bijîn. Lê li aliyê îranê ê ne kurd û li aliyê tirkiya ê rojava ku ew ne weke

herêmên kurd dibînin wê li wan wê pîrr zêde wê, sazûmanên cûr bi cûr wê, bikin ku ew pêşbixin. Di wê warê de wê, bi zanebûnî wê, hewlbidin ku wê li şûn pêşketinê bihêlin bo ku ew civakê karibin ji hevdû bifelişênin û di nava xwe wê bihalênin. Ev wê hinekî bi wê armancê jî bê.

Di warê parastina nirxên malbatê li gorî rastiya wê û pêşxistina wê û di dewama wê de gûharîna wê li gorî demê û pêşketina demê wê, di wan waran de wê, gelek astengî wê li pêşîya wê hebin ku ew ji aliyê rejimên herêmê ve li pêşîya wê hatina danîn. Lê tevî wê, mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, rewşa malbatî tevî hemû astengiyên wê re wê şîrovebikê û wê fahmbikê û bi rastiya wê ya dîrokî re wê karibê bi pêşketina wê re werênê li ser ziman. Ev wê weke aliyekê giring bê. Ber ku wê, kîjan ali wê kêmbê û ji kîjan aliyê ve ew pêşîya wan bizanebûnî hatiya girtin wê ew wê di serî de wê, were fahmkirin. Di wê warê de lêkolînên civakî li ser hebûna civake kurd û hewldanên fahmkirina navaroka malbatê bi rastiya wê ya civakî û dîrokî re li kurdistanê wê heta dibêjê wê kêmbê. Ev jî wê, ji aliyekê wê bê temenê bê perspektîfîtiyê ji aliyê pêşketina jîyane civakî û civaknasî ve.

Ev wê weke aliyana giring ku mirov wê li ser wê bisekinê bê. Min li jor bahse gelek rengên pêşketinê ên malbatê û rewşa demê bi tégîna xate sêyemin re. Ev jî wê, ji aliyekê ve wê karibê bo van aliyan wê ji aliyê ve wê, weke temenekê fahmkirinê wê, biafirênê. Ez nabêjim ku ev bes û têrê dikê. Ya ku min hanî li ser ziman wê, li hemberî ya ku ew divê ku ew were hanîn li ser ziman dibê ku ew weke dilopekê ji wê deryayê bê.

### **Di rewşa malbate hemdem de jîyane bi hevdû re**

Di rewşa malbatê de me li jor heta em hatina vir me, ji hinek aliyan ve wê, hanî li ser ziman. Me xwest ku em çerçoveyek giştî bi pêşketina wê ya roja me re wê dênina li holê. Bi wê re jî me hinekî balkişandin li ser rewşên malbate kevn a klasik. Di wê warê de wê, dema ku em bi hevdû re li wan dihezirin wê em dibînin ku wê, di roja me de wê, hingî wê gelek gûharîna wê bibin. Mirov wê, astekê de wê, pîrr zêde wê pêşkeve û wê keseyetîya xwe wê derxê li pêş. Di nava malbatê de wê, ev rewş wê di serî de wê, were dîtîn û mirov dikarê wê, fahmbikê. Di nava malbatê de ku ew malbat herî hindik ji dêûbav, û keç û kûrekê pêk were wê, ev ji çar mirovan wê pêkwere û wê, ew çar kesên ku mirov li wan bihezirê bê.

Weke pîrsgirêkek giring wê di dema me de wê derkeve li pêş wê mirov çawa wê malbatê li ser lingan wê bigirê. Ber ku wê, rêjeya hevdû berdanê di nava civakan de wê, zêdetirî wê, derkeve li pêş. Ev weke rewşeka bi pêşketina mirov re li wê dihê nerîn û xwandin.

Li ser politikayên malbatê ên dewletê wê, heta roja me wê ji aliyê liberal û muhafazakaran(\*) ve wê nêzîkatiyên cuda wê, werina hanîn li ser ziman. Muhafazar wê ji hinek aliyan ve wê, pîrsgirêkên malbatê wê bi ji bin kontrola mêr derketina wê re wê, werênina li ser ziman. Politikayên muhafazar wê, ji aliyekê ve ku ew dema ku ew li ser esasê parastina ya kevn a berê bê wê demê wê rengê wê yê malbatî ê berê ê weke mêr li malbatê serdest(\*) a wê, bi wê re wê, werênê li ser ziman. Ev nerin di aslê xwe de wê, ji perspektîfe pêşketinê û bi pêşketinê re a gûharîna ku ew dibê wê ji wê bêpar bê. Wê ew di wê çerçoveyê de wê ne nerê. Yan jî wê, fektora pêşketinê wê ji aliyekê ve wê, dema

ku ew hasabê politikayên xwe dikê wê li berçav negirê. Di wê rewşê de wê, ji aliyekê ve wê, bi li ya kevn xwe pêçan re wê bikin ku wê werênina li ser ziman. Di rewşa malbatê û civakê û têkiliyên wan ên bi hevdû re de wê, malbat wê weke saziyeka civakî a bingihîni wê, bijî. Lê nixê n hevbeş ên civakî jî wê, çendî ku wê pêşketina malbatê wê kifşkar bê wê, ew jî wê kifşkar bê. Wê di wê warê de wê, di serî de wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa malbatê wê, ji aliyê rewşa civakê ve wê, hertimî wê, were hildan li dest. Ramyarîvan wê, di gelek rewşan de wê, gotinên weke civake pêşketî, malbate xort û hwd wê, bênina li ser ziman. Lê li ser çî temenê mirov divê ku van gotinan fahmbikê wê, ew jî wê, weke mijareka din a ku wê bi serê xwe mirov wê divê ku wê hilde li dest bê.

Me li jor bahse xate pêşketina malbatê a xort li ser temenê mejuya wê re wê bi bîr kir. Di dewama wê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, ji vê aliyê ve mirov dikarê bê ku wê di nava pîrrianiya civakan û li herêman mirov dikarê bahse malbatên bi wê rengê bikê. Di demên berê de wê malbatên xort wê, hevbeşîya civakî pêşdixist. Di wê warê de wê, di roja me de wê minaqên weke kurdistanê û başûrê italya û hwd ku mirov dikarê bibîr bikê wê, weke wan li gelek deverên din wê minaqên ku mirov dikarê bi navbikê wê hebin.

Li vir dema ku em bahse malbata xort dikin em wê li ser temenê ku ew bi her awayê bi rêz û hürmeta wê ya li destûrê û hwd re wê, nayênina li ser ziman. Di aslê xwe de wê, rewşên bi wê rengê wê, karibê ne tenê wan ji derve têkiliyên wan bide qûtîkirin wê, bi wê re wê karibê wan ji rewşên wan ên ku weke ku ew di nava civakê de weyn bileyizin wê cih bi cih wê karibê ji wê rewşa wan dûrbikê.

Di rewşa malbatê de wê, dema ku mirov wê di çerçoveya sazûmana civakî de wê, werênê li ser ziman wê, weke aliyekê pêşketiner û rêveberîner bê. Malbat wê, di rewşa xwe de wê, bi pêşditina xwe re wê, weyna xwe wê bileyizê. Ev jî wê, li ser rewşa kesên ji malbatê ên perwerdekirî re wê, dikarê werênê li ser ziman. Malbat wê, rewşên wê yên derûnî û civaknasî ku mirov wan li berçav bigirê wê mirov karibê wê li ser wê bêjê ku wê weke rewşek birêxistinî û zaninî a dijî bê. Di wê warê de wê, weke rewşeka civakî a ku mirov wê, di temen de wê fahmbikê bê.

Weke ku me li jor hanî li ser ziman wê, di mijare malbatê de wê rejim wê bikin ku ew mudahaleyî li civakê bikin. Me ev li kurdistanê bi pîretikên rojane û yên giştî ên demkî ku wê bikê re wê, bi gelek rengan dît. Ev çî dide nişandin? Ev wê dide nişandin ku wê gûharînen di malbatê de wê, xwe di asta bilind de wê bi civakê re wê bide dîyarkirin. Civak wê, wan bi awayekê vekirî wê bi xwe re wê bibîne. Politikayên ku ew dihên pêşxistin û meşandin jî wê, li ser esasê hebûna civakê û bandûrkirinên li wê bin. Wê di dewama wê de wê, hewlbedayin ku ew malbatên di rengê hizrên xwe yên bîrdozîkî de wê biafirênin. Minaqa olan wê di wê warê de wê, zêdetirî wê li berçav bê. Weke protîpa wê rengê bi olan re wê, di nava sîyeseta muhafazakar û ya liberal de jî wê, bi wê rengê wê xwe bide dîyarkirin. Li vir weke xate sêyemin ku mirov li wê bihizirê wê, çawa wê ew di rewşa xwe de wê pêşkeve wê, bi wê re wê li wê were hizirin. Wê, weke xate sêyemin wê mudahaleyê li jîyane civakê û pêşketina wê ya xwezayî wê, newina pejirendin. Di roja me de wê, di nava sînore welatan de wê, destûrên ku ew hatina çêkirin wê, ji girse û ankû kesên civakê wê bê xwestin ku ew weke wê destûrê bijîn. Wê

-----  
(\*Ocalan, Abdullah(1984); Personality problem in kurdistan, p.7-60

(\*Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 70-140

li tirkiya wê, minaq destûrek li ser esasê tirkitiyê wê were çêkirin û wê hem ji tirkan û hem jî ji kurdan wê bê xwestin ku ew li gorî wê bijîn. Di wê warê de wê, ne tenê wê vajî rastîya jîyane girseyê kurd bê. Komên civake tirk ku ew bi cûdahî pêşkevin wê ne li gorî wan û rewşên wan jî ên jîyanî bê. Ev rewş wê ne tenê temenê pîrsgirêkên civakan û ji holêrakirina pêşaroja wan bê wê, bi wê re wê temenê dijberîya li hevdû û ketina li hemberî hevdû de jî bê. Di wê warê de wê, sêyeseta ku wê li gorî wê destûrê wê were kirin wê, sîyesetek etnikî ku wê li dijî pîrraniya komên din ên civakî vê. Xate sêyemin wê, di wê warê de wê, rewşa komên din ên ku ew bi destûrî ne hatina hasibandin û ji neditî ve hatina dîtî û ji aliyê sêyeseta ku ew wan rast nebîne û li dijî destûrê dibîne bi hebûna wan re wê, weke aliyekê rastiya wan bê. Di wê rengê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê demokrasî wê, di rewşek dûrûst, hevgyrtî û rast de bê ku ew ji rest û rêgezên wê tawiz were dayin ku were meşandin wê, hingî wê temenê barkirina wan girseyên dervî destûrê û komên din ên civakî ku wê wan barî ramiyê wê bikê bê. Demokrasî wê di aslê xwe de wê, weke rengekê rêveberîne ku mirov wê nikaribê wê tenê bi rêveberîyek welatî re wê bi sînor wê werênê li ser ziman. Wê di çerçoveya restên destûrî ên gerdûnî de wê xwediyê wate û temenê bê. Wê ew welat jî wê, rêveberîya wê, ku ew di wê îdeaya demokrasîyê de bê wê, tabî wê bê.

### **Pêşxistina dewleta sosyal wê were çî wateyê?**

Li vir piştî şîroveya li ser malbatê, malbate demokratik û rewşa malbatê a di demên hemdem de û jîyane bi hevdû re de wê, dewleta sosyal wê, bêgûman wê wateyek wê ya giştî wê hebê. Li vir wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, dewlet wê razandina li politikayên civaknasî(\*) û dewleta sosyal wê, weke a aliyekê ku mirov li vir di dewama van mijaran de wê hilde li dest. Li jor em hineki li ser rewşa dewleta sosyal sekin in. Lê li vir razandina li dewleta sosyal û rewşa wê, weke aliyekê din ê ku mirov wê, dikarê wê, di serî de wê werênê li ser ziman bê.

Di serdema jîyane global de wê, her wusa wê, weke ku em nûha di destpêka pêşketina wê de dibînin wê, aliyê muhafazakarî û yê liberalî ku wê bi gotina serbestiyê re wê, bê bi watekirin û salixkirin wê, di vê rewşê de wê, têginekê wê karibin bidina me. Li vir em wê werênina li ser ziman ku wê muhafazakarî wê, di serî de wê, li ya bûhûrî wê, hewlbide wê biparêzê. Wê temenê wê li ser wê bê. Di wê warê de wê politikayên xwe wê bide dîyarkirin. Lê bi demê re pêşketin jî dibê di jîyanê de û mirov pêşdikeve. Aqil pêşdikeve. Jîyan bi wê re reng û awayên nû weke ku em bi pêşketina jîyanê re wê şîrove dikin wê bistênê.

Di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê, mirov dikarê werênê li ser ziman ku em di roja me de di nava pergalek kapital de dijîn û di wê de wê kirin û firotin wê zêdetirî wê li pêş bê. Wê karûxabat wê li pêş bê. Wê hewldana hilberîna zêde wê, weke armanc bê. Wê keda ku wê mirov didê wê, mirov wê hewlbide ku ew beremberê wê hilde û bi wê bijî. Di wê rengê de wê, rewşek wê, derkeve li pêş. Lê bi wê re jî weke ku me li jor hanî li ser ziman wê, keseyet jî wê pêşkeve. Wê bi wê re wê, xwestek, nerîn, têgîn, felsefê, rengên jîyanê û hwd wê, xwe bidina dîyarkirin. Di roja me de wê, pergalek giştî a kapital wê pêşkeve û wê, sînor hemû wê bo wê, dîtbar bin. Wê, sînoran wê nasnekê. Wê bi wê re wê, rewşên nû wê derkevina li holê. Di wê rewşê de wê, sazûmana bazarê wê, zêdetirî wê, derkeve li pêş. Gotina wekhevîyê û bi wê re ya 'teşwîkê' wê, li ser wê re wê, were li ser ziman. Mirov wê, hewlbide ku ew dewlemend bibê. Zêde qizinc bikê(\*)

Wê, li jîyanek wekhev wê bigerihê. Wekhevî wê, di temenê xwe de wê, ji gotina azadîyê wê, gohn bixwe û wê hîmê xwe wê biafirênê. Lê çendî ku wê, wekhevîyek bêazadî wê nebê jî lê wê, dem bi dem wê, karibê bi hevdû re wê, bikevina nava pevçûnê de jî.

Li vir wê jî wê, weke aliyekê giring wê, werênima li ser ziman wê, dema ku em demokrasiyê şîrovebikin wê, li ser esasê azadîya mirov, parastina mafên mirov, xwe hanîna li ser ziman, serbestî û wekhevîyê(\*) û hwd, bê. Ev gotin û gotinên weke van wê mirov karibê bi gelek rengên din ên wateyî re wan werênê li ser ziman. Wê, ber ku wê jîyan wê, bi rûyên wê yên têgînî re wê, ji gelek aliyên ve wê, bi awayekê pîrralî wê pêşkeve. Di wê rewşê de wê, rewşên ji hevdû cuda wê pêşkevin û wê xwe bidina diyarkirin. Di rewşa têgîna liberalismê de wê, têgîna wekhevîyê wê, temenê wê li ser teşwîk û hêza mirov wê ava bê. Mînaq wê mirovek ew bi derfetên di dest de û hêza dikarê xwe derxê astek bilind. Lê heman mirovekê din wê ew derfet di destê de wê nebin çendî ku ew xwediyê wê sêyanê û hêzê jî bê. Wê nikaribê van herdû aliyên werênê li cem hevdû. Ji aliyekê din ve jî wê, dema ku derfet di dest de hebê wê, nikaribê wê hêzê bide nîşandin. Di wê rengê de wê, ev rewş, di nava nava asayî de wê, her xwe bidina diyarkirin. Ev têgîna wekhevîyê ku mirov weke hevdû xwediyê teşwîkê ya û xwediyê heman mafê ya ku ew xwe bîne li kîjan astê wê, weke têgîneka ku mirov wê, temenê wê li ser gotina derfetê demezrenê û wê werênê li ser ziman. Ber vê yekê di serî de em, nikarin wê rengê têgîna wekhevîyê ku wê ji aliyekê ve wê temenê wê li ser ne wekhevîyê bê wê herê bikin. Ber vê yekê em, li vir wê, divê ku li şûna wê, werênina li ser ziman ku wê, sazûmanaka ku wê, heman derfetê wê karibê bide herkesekê em li wê bigerihîn û wê, lêbigerihîn. Wê di serî de wê ev wê pêwîst bê. Rengê salixkirina gotina wekhevîyê wê, hertimî wê, di serdemên hemdem de wê, dema ku em bigotina derfetê û ankû bê wê hildina li dest wê, encamên cuda wê bi têgînî wê karibê bide me.

Wekhevi di nava jîyanê de wê, mirov dikarê bi gelek gotinan û rangan wê werênê li ser ziman. Ji aliyekê din ve jî wê, mirov dikarê bêjê ku wê, rewşa dewletê wê, çawa wê, di rengê de wê, were pêşxistin wê, li ser wê bê sekin in. Piştî salên 1990î ku ew cihane bi du-qutub ji holê rabû wê, li şûna wê, dewlet wê zêdetirî wê derkeve li pêş bi awayekê aktiv. Wê bo ku wê dewleta ku ew derket li pêş ku ew zêdetirî were aktivkirin wê, laşgiranîya wê were ji holê rakirin. Rengê liberalismê ê li kêmkirina bandûra dewletê li ser jîyanê wê hinekî jî wê werênê li bîra me. Di aslê xwe de wê, dewlet wê, weke amûreka ku wê, zêdetirî wê, di bin reg û awayan de ku wê mudahaleyê li jîyane civakan wê bikê bê. Wê civakan ji xate wan ya pêşketinê wê derxê. Wê di bin navê wekhevîyê de wê, bi zimanê dewletê ê fermî wê hemû komên civakê ên ji hevdû cuda wê weke hevdû wê werina perwerdekirin. Wê bi wê re wê, çandên din wê werina halandin û zimanên din wê bi wê re wê werina tûnakirin. Ev jî wê weke meziyeteka wê rengê

-----  
(\*)Hebermas, Jorgen(1962); Strukturwandel der Öffentlichkeit, .P.11-42

(\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 95-145

(\*)dewleta sosyal wê, weke dewleta ku ew politikayên civaknasî pêşxistî û mudahaleyên xwe li jîyanê nakê lê di alikariyê de ew weke sazi li cem kes û malbatan disekinê bê. Li vir alikarî û mudahale wê, duvê ku mirov ji hevdû cuda weke du têgînên ku wê, rengên kirinên me bidina diyarkirin bin. Ji aliyê mudahaleyê ve fahmkirin û vajî wê ji aliyê alikariya saziyî ve fahmkirin wê, têgînln ji hevdû cuda wê bide me.

têgîna 'wekhevîyê' a ku bi dewletî bahse wê dihê kirin jî bê. Em li vir di serî de wê, dikarin wê werênina li ser ziman ku wê dewlet wê, weke saziyeka giştî ku wê hertimî wê hewlbide kontrolbikê. Wê hewlbide ku ew bikê bin kontrola xwe de. Politikayên sosyal û ankû razandina li jîyane sosyalî ku wê bahse wê werêkirin ku mirov bi çav û nerîna dewletê lêbînerê wê, zêdetirî wê weke ku wê bikê bin kontrolê de wê, Di wê rengê de wê, li wê werê nerîn. Bêgûman ev gotina razandina li dewleta sosyal û ankû pêşxistina wê, wê dema ku em bikardihênin em di wateyek cûda de wê, dihênina li ser ziman. Em wê di serî de wê, jî saziyekê zêdetirî li wê nahizirin. Em wê, bi têngên bîrdozikî nahizirin ku ew kifşkirinan bide çêkirin. Li şûna ku wê, ew civakan weke xwe bikê û wê bike rêya xwe de wê, ew xwe li gorî wê sazîkê û wê bikeve rêya wê de. Di wê warê de wê, politikayên sosyal û ankû razandina sosyal wê, wateyek wê hebê ku wê, bo dayîna derfetê jî herkesê re weke hevdu bê. Di warê aborîyê de wê, rengekê aborî ku ew jî xwezayê ne dîr wê li wê were hizirkirin. Di awayekê de wê, politikayên sosyal ên ku wê, werina pêşxistin wê, jî aliyê aborîyê ve wê, wateyek wan hebê. Wê, bo ku ew politika wê, werina pêxistin wê di dest de wê, hinek razandin wê bi aborî wê hebê. Aborîya xwezayî wê, di aslê xwe de wê, weke gotineka ku em dikarin di çerçoveya têngîna aborî a karma ku wê, di çerçoveya dewleta sosyal de wê li wê werê hizirin de jî bê. Lê wê, hinekî jî wê cûdatir bê. Di wê warê de wê, di warê berhevkirina di dest de wê, dema ku wê, dewlet wê, ne zêde wê xwediyê berhevkirineka mazin bê wê hingî wê karibê bi awayekê di wê çerçoveya aborîya xwezayî de wê, li gorî wê bijî. Aborîya xwezayî mirov bi rengê aborîyê li wê bihizirê wê weke aborîyek kesk jî bê. Di wê warê de wê, ev rengê aborîyê wê, rastiyên rêgezî ên xwezayî wê li berçav bigirê û wê, bi wê re wê di ahengekê de wê, bijî. Di wê warê de wê, li şûna aktivkirina dewletê wê, bi wê re aktivkirina civakê û sazûmana xwe afirandin û hilberînê a wê, were pêşxistin wê, hingî wê, civak wê, di rewşa xwe de wê, xwediyê wê pêşketina xwe ku ew divê ku bijî bê. Aborî wê, weke aliyekê giring bê. Wê di jîyanê de wê, temenê xwe dabarekirinê wê werênê li ser ziman. Jîyane civakê û têkiliyên wê yê bi hevdu re wê bi çûnûhatinên wê yên nava xwe de wê, hinekî wê, di wê çerçoveyê de bê. Lê li vir wê, dema ku me, di çerçoveyek civakî de wê, bihizirê wê, saziyên dewletê wê, tenê weke aliyekê wê, karibin li holê bimênin. Di warê parastinê de wê, karibê xwe weke saziyekê bi civakî wê, xwe bide dîyarkirin. Di wê warê de wê, dema ku wê politikayên şer û hwd wê werina pêşxistin ew jî civakê werina pirsin. Her wusa ti dewlet di aslê xwe de wê, ne xwediyê wê mafê bê ku ew bi serê xwe li ser navê civakê biryara şer bi civakek din re bidê. Ew wê ne rast û ne ahlâqî bê. Di serî wê di dewama wê de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, wateya pêşxistina politikayên civaknasî û ankû sosyal wê yek jî wan jî wê di wê warê de wê, xwe bide dîyarkirin. Ji nava civakê ku wê, girse wê endam bi endam wê li ser vîna xwe ya ku ew radest dikê ku ew xwediyê gotinê bê. Her wusa wê, bi wê re ku ew aktiv bê. Politikayên şer(\*) bê û ankû ên di warekê din de bê ku ew li ser wê xwediyê gotinê bê. Wê dema ku ew bi sosyali aktiv bê wê, hingî wê, karibê li dijî wê bisekinê. Dewleta ku ew bacê jî giştîya civakê yek bi yek distênê wê, di roja me de wê, weke ku em bi rejîma tirk re dibînin wê li dijî civake kurd bi wê bace ku ew jî wan distênê wê, pêvajoyên şer ên tûnekirinê wê bi dehan salan wê li ser serê wê bide pêşxistin. Ev jî wê, weke aliyekê dewletî ê ku mirov wê li vir wê bibîrbikê bê. Dewlet ku wê bi destek û piştgirîya gel wê li ser lingan bê ku ew bi kokî û ankû etnikî ew jî kîjan kokê bin ew bi wan re di ahengekê de bê. Weke dewleta wan nêzî wan bibê. Wê



ew ne weke tiştêkî ku ew dihê xwestin bê. Weke tiştêkî ku ew mecbûra ku ew bikê bê. Wekî din wê nikaribê bahse meşrûiyetê bi xwe re û bi navê xwe re bikê.

Ber ku dewlet temenê xwe yê bi wê ku ew xwe li ser lingan digirê ew ji wê civakê pû beşên wê distênê. Bi rêya bacan bê û ankû bi rêyên din bê ew wê dikê. Ber vê yekê ew mecbûra ku ew wê bikê. Di wê warê de wê, di serî de wê, mirov dikarê wê, ji aliyê 'rengê hizirkirina dewletê' ve wê jî bêjê ku dewlet wê, nikaribê bihizirê. Wê ew mafê wê jî wê, di aslê xwe de wê nebê. Ber ku ew li ser piştê gel û beşên wê dijî. Wê ew gel û beşên wê bihizirin û ew wê, weke wê bikê. Ya rast, ahlaqî û mecbûrî jî bo wê, ev bê.

Di warê dewletê de wê, ku em wê bi bi têgîna dewleta refah û ya sosyal wê werênê li ser ziman wê, weke aliyekê wê yê jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, dema ku dewlet hizirî wê, hingî wê ew kifşbikê çî rast û çî ne rast a. Di dema sovyetê de wê, dewlet wê bi demê re wê pîrr zêde wê dewlemend bibê. Lê politikayên bo jîyane sosyal wê, ne bin. Wê, li wan ne nerê. Wê xwestekên wan wê li wê ne nerê. Wê, di warê jîyane civakî de wê, ya ku wê li berçav bigirê wê, ne rastîya civakê bê. Wê têgîneka bi navê sosyalismê ku wê herkesek wê li gorî wê bijî bê. Sosyalism wê bi gotinî wê wateya wê, li ser temenê sosyaliteyê re wê, di aslê xwe de wê, bi wateya jîyane civakî wê, were li ser ziman. Di wê rewşê de wê, mirov karibê wateya dewleta sosyal û refah jî jî wê derxê. Lê ya ku wê nekîr jî wê, di aslê xwe de wê ev bê. Di wê warê de di awayekê bişavtinî de hewldana kirina weke hevdû wê, sovyetê bikê rewşa dewletek klanî a otoriter ku wê di wê de wê, herkesek weke hevdû bihizirê û hwd. Civak di xwezaya wê de wê, di aslê xwe de wê cihêrengîyî wê hebê. Ev hem bi hebûna civakan a bi hevdû re ku ew bijîn re wê hebê û hem jî wê bi civakekê ku wê, di nava wê de wê gelek kom wê bijîn wê, bi wê re wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman bê.

Di wê warê de wê, dema ku wê, dewlet wê, bi wê rengê wê bihizirê û tevgerihê wê, hingî wê ji rastiya civakê bi ji nedîtî ve hatina komên wê yên din ve wê, ji rastiya wê dîrkeve. Wê fahm nekê. Wê ne hilde li cidiyetê. Wê, dema ku wê dewlet wê bi wê rengê wê bijî wê komên ji nava civakê wê, bikevina hemberî wê de wê, ew li hemberî wan ku ew komên civake ku ew bixwe li ser serê wan serdest a jî bê wê, bi wan re wê bikeve şer û pevçûnê û wê li hemberî wan wê, bahse 'xwe parastinê' wê bikê. Ya ku wê di aslê xwe de wê, di temenê lêpîrsîna meşrûiyeta wê de wê mirov dikarê werênê li ser ziman jê wê weke aliyekê giring wê ev bê. Aliyê din jî wê ew bê ku wê, li şûna ku ew di xismetê civakê de bê wê dema ku ew bo xwe parastinê û pêşxistinê ew bi têgîna îteatê nêzî girseyan bibê.

Di wê warê de ya ku wê di aslê xwe de wê, dewletê ku ew di bin maskeya demokrasîyê de jî wê bikê tîranekê wê ev rewşên wê bin. Di serî de wê, mirov dikarê

-----  
(\*Politikayên şer wê, weke rastiyeke demê wê jî wê werina pêşxistin û wê bi awayekê zêdetirî bi aqil û sofistike wê werina meşandin. Mînaq rejîma tirk wê dema ku wê, plan û armançên xwe yê bi armanca hêrişî rojavayê kurdistanê bikin bo ku ew rewşa statûya kurdan xirabikin wê, bêjin "koridora aşîtiyê". Wê dema ku biryara dagirkirin û hêrişkirina li kurdan û rojava digirin di lîjnaya bilind a ewlehiyê a bi navê "MGK" de wê, bi wê rengê wê, werênina li ser ziman. Ev civina ku wê vê biryara şer wê, bigirê û wê bi navlêkiirne wê bikê 'masûna' bide nişandin wê di 29 temûza 2019an de wê bê li darixstin. Navlêkirin wê şewayekê sernûxûmandinê bê. Ev rewş wê, rewşna ku wê bi awayekê taqîtk û stretejîkî wê di serdemên global de wê zêdetirî wê, ji aliyê rejîmên dewletan ve wê, werina pêşxistin bin. Wekî din partiya ku ew xwe weke ya muxelefetê a wê demê bi navdikê CHP jî wê, ji aliyekê ve wê, navê karker lêvkê û bahse mafê wan bikê lê wê, ji aliyekê din ve jî wê, pişgirîya xwe ji wê hewldanên şer û dagirkiirne re wê bîne li ser ziman. Hanîna li ser ziman a navê karker û mafê wan bi navî wê, weke rewşek sernûxûmandinê jî wê, di wê rengê politikaya wan de wê, xwe bide diyarkirin. Di wê rengê de wê, ne muxalefet û ne jî partiya iktidaerê wê ji hevdû cûda bin.

wê, werênê li ser ziman ku wê dewletên roja me wê, di bin reng û maskeya demokrasiyê de wê, bi nîjadperestiyeka desthilatdarî re wê weke otoriter û tîranan bin(\*). Wê di wê çerçoveyê de wê, dema ku em bahse 'jidandina civakê ji aliyê dewletê ve(\*)' wê hinekî jî wê, ev rewş wê weke aliyekê wê yê ku mirov wê, dikarê wê, werênê li ser ziman bê. Dewlet wê, di wê rewşê de wê, weke ne xwediyê têgîneka rast a civaknasî jî bê. Dema ku dewlet ne civaknas bê û xwediyê şewayên weke ku me li jor hanî li ser ziman jî wê, gotina politikayên sosyal û hwd jî wê, weke maske û sernûxûmandinê wê li holê bimênin. Wê ti rastiya wan jî wê, di jîyanê de wê nebê. Di wê warê de wê, mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku demokrasi wê weke îdealek ku wê, dewlet wê bikê ku ew di çerçoveya rêxistina wê li rastiya civakê û beşên wê re ku wê bixwe bigihênîyê de bê.

Rengê dewletên roja me wê, sê aliyên wan ên giring ku mirov wan fahmbikê wê hebin. Aliyê pêşî wê aborî bê. Aliyê din jî wê rêveberîya ramyarî bê. Aliyê din ê sêyem jî wê, destûrên wan bin. Wê di ahang û balanse nava van herdû aliyên ve wê, bi nakokî û pevçûnên xwe re wê, xwe bijîn. Di serdema me ya hemdem de wê, civak wê, bi aborîya wê re wê, were naskirin. Kirîn û firotinên li nava wê û ji nava wê, wê weke rewşna ku wê, çerçoveyek aborî a wê bidina dîyarkirin bin. Civakên roja me wê, bi keseyetîyên wê re wê hebin û wan mirov dikarê werênê li ser ziman. Di wê rewşê de wê ew keseyet wê, xwediyê temenekê bê. Li ser wê temenê re wê xwestek, pêwîstî û ankû arz û telebên ku ew bi wê dijîn wê hebin. Ev jî wê, rewşa aborîyê wê di aslê xwe de wê, di çerçoveya cihane me ya global û hemdem de wê, weke aliyekê giring wê derxê li holê. Dema ku em bahse aborîyê bikin em wê dikarin wê bêjin ku wê, rengê aborîya dema me wê, ji ya berê wê cûdatir bê. Wê zêdetirî wê, têkiliyên kapitalist wê li pêş bin(\*). Wê bi wê re wê, li ser liberalismê re wê, xwediyê xwe hanîna li ser ziman bê. Di wê rengê de wê, serbestbûnê wê di bazarê de wê, bixwezê. Mudahaleyên dewletê wê li wê û sînorên wê yên li pêşîya wê, rast nebînê. Di demên berê de wê, rengê aborî ê karma wê hebê. Rengê aborîyê ê ku têgîna rêya sêyem jî ji xwe re dixwezê rast bibînê wê, bi sêwayekê wê, karma bê. Lê wê ji ya demên berê wê cûda bê. Aborîya demên berê wê du warsiyonên wê hebin. Di ya pêşî de wê, di rewşa dewlet û sektorên teybet ku wan ji hevdû cûda bikê wê, li ser wê re wê, sektorên ku ew bûna malê gelemperîya civakê wê zêdetirî wê weke ku wê nêzî wan di rewşekê de wê tevgerihê. Ya din jî em dikarin bi gotina bazare civakê re wê, werênina li ser ziman. Ev herdû têgîn jî wê li gorî dewletê wê, di astek duyem a pêşî de bin. Di wê rewşê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê rengê têgîna liberalist wê, di roja me de wê, li ser temenê wê bê ku wê bênê li ser ziman ku wê bi bazarê wê, aktivbûnê ku wê bi bazarê û qadên civakê re wê çêbikê. Wê bazar wê, rewşek tevgerîner a bi tevger wê di rewşê de wê li wê werê nerîn û wê, were fahmkirin.

Em li vir wê, divê ku wê werênina li ser ziman ku wê ev rewş wê, bi tememî wê, nerîneka aborîvan wê, bi xwe re wê biafirênê. Yanî wê, bi wê bawerbikê ku wê, tevgerê

-----  
(\*Gotinên weke jidandina bendê wê, weke gotinna ku wê, rastiya dewleta otoriter a di demên global de ku ew di bin masyeka 'demokrasiyê de hatî vêşartin jî wê bide dîyarkirin. Gotinên weke "paraastina snîoran", "pirsgirêka navxweyî" û hwd jî wê, di wê çerçoveyê de wê, weke rastiya dijmirovî ên demê ku wê bi xwe re wê, werênina li ser ziman bin. Ev gotinên weke parastina sînoran û ankû pirsgirêka navxweyî wê, weke di aslê xwe de wê, sînorên dewlertê ên ji cihane gelemper a global re jî bin.

(\*Hopkins, A.G., ed., 2003. Globalization in World History.

(\*Kennedy, Paul. (2006.) The Parliament of Man: The Past, Present, and Future of the United Nations.

bi bazarê re wê, di qada civakê û ya sektorên teybet de jî wê çêbikê. Di wê rengê de wê, rewşa bazarê û ankû piyasayê wê, weke rewşek teybet wê, werênê li ser ziman. Pîyasa wê, dema ku wê, di rewşa bazara civakê û sektoran de wê tevger çêkir wê, bi wê re wê gûharînê jî wê, hin bi hin wê li ser danûstandinê re wê, bi awayekê dewrûdayimî wê, çêbikê.

Di rewşa civakê de ku em bi wê hewlbidin ku piyasayê û rewşên wê yên bazarî û civakî û sektorî wan fahmbikin em, divê ku li vir di dewama wê de civakê ji aliyên wê yên ne aborî re ku ew hena bi wan wê ji bîrmeke. Ev wê weke aliyekê giring ku em wê li berçav bigirin. Di wê çerçoveyê de wê, ev wê, bi aliyê maddî û manawî wê, mirov wan bi hevdû re wê, hilde li dest. Wê hingî wê, di wê rewşê de wê, dema ku me aliyê aborîyê wê, zêdetirî derxist li pêş wê, weke ku wê aliyên din wê li şûn wê bimênin wê ew jî wê, bandûrê bi xirabî wê li hebûna wê ya civakî wê bikê. Di wê warê de wê, bandûrê li rewşên pêşketina wê bikê. Di pêvajoyên wê yên gûharînê de wê, ev bi awayekê vekirî wê, bi wê re wê, were dîtin.

Civak ji nava wê bixwe wê ji xwe di nava tevgerê de bê. Wê dema ku wê, kargeh wê werina avakirin û xirakirin û ankû wê dem bi dem wê hinek wê herin û wê hinek wê werin wê, ev wê bi xwe re wê, bi şewayekê wê, weke ku wê gûharînekê wê bi wê re wê, bide çêkirin. Civak wê, di wê rewşê de wê çûnûhatinan wê bi xwe re wê bijî. Wê li gorî demê wê, amûrên afirandin û hilberînê wê bi rengên wan re wê biafirênê. Ev rewş hemû û rewşên weke wan wê rewşna ku mirov dikarê ji aliyekê ve jî weke rewşna ku mirov bi aqilî wê, hilde li dest û wê, werênê li ser ziman bê. Pêvajoyên pêşketina jîyane civakê wê, bi wan rewşan re wê, weke ku wê gavekê jî wê bi pêşve wê gave xwe wê biavêjin. Wê ev rewş wê, bi demê re ku mirov di farqê de û ne di farqê de jî bê wê, bandûrê li têkiliyên nava mirov ên civaknasî û rewşên mirov ên derûnî jî wê bikê.

Di rewşa pêşketina jîyane aborî de wê, ev rewşên wekhevî û ne wekhevî wê ji gelek aliyên ve wê, bi wê re wê, xwediye regekê pêşxistinî bin. Wekhevî wê, di wê rewşê de wê, weke dîyardeyek giring a civakî wê derkeve ber mirov. Mirov wê, di vê çerçoveyê de wê, ji aliyê aborî û pêşxistina wê, û civakî û pêşketina wê ve wê hilde li dest.

Di vê rewşê de wê, mirov dikarê weke aliyekê giring wê werênê li ser ziman ku wê rewşa dewletê wê, çawa wê were fahmkirin wê, di her rewşê de wê, pêwîstî bi wê hebê ku ew ji nû ve were salixkirin. Salixkirinê bi wê re wê, weke aliyê giring bin ku mirov wê, bi teybetî fahmbikê bê. Di rewşa parastina mudahaleyên dewletê de wê, muhafazar jî wê ji hinek aliyên ve wê ew wê bipolarêzên. Lê ew rengê ku ew wê diparêzên wê cûda bê. Ew di çerçoveyê hîyaraşîkî de wê, diparêzên. Li vir wê, dema ku wê hîyaraşî di wê warê de ket dewrê de wê hingî wê, encamên ku wê, derkevina li holê wê, ji ya otorîsmekê wê ne cûdatir bin. Wê bi bendên jidadhî wê, nêz bibê. Ev jî wê, weke aliyekê ku wê, bi rehetî wê, civak wê nikaribê xwe bijî. Wê, rewşên weke jêr û jor ku ew di nava civakê de diafirin wê weke baxt û ankû qader wê bibînê û wê bixwezê ku ew were herêkirin û herkesek li gorî wê bijî. Di wê çerçoveyê de wê, di encama wê de wê, bigihê têgîna civakek îteatkar.

Di civakên hemdem wê de rewşên karûxabatê wê, hertimî wê di wan de wê gûharîn wê bibê. Minaq wê, rengê karkerîyê û ankû karûxabatê ên berê wê, hin bi hin wê ji holê rabê û wê li şûnê wê, rengên nû wê xwe bidina dîyarkirin. Di nava civakê de wê, mirov wê, di demên berê de wê, dema ku ew minaq karkerek ba wê, wusa heta mirina xwe ya bijîya û biheta nasîn. Lê di roja me de wê, ev wê, zêdetirî wê, weke aliyekê giring wê, li

holê wê bimenê. Wekî din wê, di wê rewşê de wê, xwestekên rengên jîyanê wê, bi wê re wê pêşkevin. Heta roja me jî wê, di nava civakê de wê, jêr û jorî wê hebê. Girseyên mazin ên xizan wê, ew wê, di rewşa wan de wê, were dîtin. Wê, di rewşa xwe de wê, berê wê, tiştê ku wê were ber mirov wê, weke baxt wê bibiînê wê ew wê, wusa wê herê bikê. Lê di roja me de wê, ew wê ne wusa bê. Di wê warê de wê, di nava civakê de wê, hin bi hin wê, bi keseçetiyê re wê, rewşên nû wê derkevina li holê.

Civak wê, heta salên 1990î jî wê zêdetirî wê, karûxabatên wê hêza dest wê, bijî. Lê wê hin bi hin wê, teknik û zanina teknikê ku ew pêşket wê, di wan de jî wê pêşketinan wê bide çêkirin. Ev pêşketin wê jîyane me wê, ji temen ve wê, bidina gûharandin. Wê, bidina çêkirin. Her wusa wê jî mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, weke aliyekê din ê teybet wê, mirov dikarê werênê li ser ziman ku wê mirov wê bidest jîyankirina bi encamên teknikê re wê bikê. Wê li ser wê re wê jîyane xwe wê ji nûve ava û birêxistin bikê. Pêşketina kompituran, cihazên ku ew zaninê di xwe de digirin û depodikin û hwd wê, pêşkevin. Wê bi wê re wê rewşek jîyanî wê giştî wê pêşkeve. Di rewşa jîyanê de wê, hin bi hin wê, aqil wê, kifşkariya wê xwe zêdetirî wê bide dîyarkirin. Weke aliyekê din wê, mirov wê, di nava jîyanê de wê, zêdetirî bijartinên wî pêşkevin. Wê, xwestek wê zêde bibin. Wê, rêyên ku ew di wan de bimeşê wê zêdetir bibin. Wê, bi wê re wê, di nava hevdu de wê, di bajarên de wê bijîn. Jîyane bajarên wê, dema ku mirov wê, ji aliyekê ve wê, hilde li dest wê, gelek aliyan wê yên civaknasî ên ku mirov wê, hilde li dest wê, hebin. Her wusa, wekhevi wê, gelek caran wê weknehevi wê, bi wê re wê, xwe bide dîyarkirin. Wê, derkeve li pêş. Wê bi wê re wê, pêşkeve. Di nava derûnîya civake bajarên de wê, mirov wê, fêrî jîyankirina bi derûnîya girseyê ku ew bijî bibê. Wê li ser wê re wê, xosletên xwe wê, biafirênê. Wê, restên xwe yên herêkirin û redkirinê wê, pêşbixê. Bi komî, taxî û hwd xwe bi rêxistinkirin wê, weke xosletê nava jîyane bajarên bê. Ji xwe ku ew nebê wê, mirov nikaribê bahse pêşketina civaknasîyê jî di nava jîyane de wê, bikê. Wê li ser wê re wê, hevdu herêkirin wê, hin bi hin wê pêşkeve û wê, weke kevirê domîno wê li deverên li dorê wê hin bi hin wê pêşkeve û belav bibê. Ev jî wê, weke aliyekê wê bê ku mirov wê, bi wê re wê, bijî. Di nava jîyane bajarîyê de wê, hebûna mirov ku wê were herêkirin û ankû redkirin wê weke aliyekê wê yê giring wê xwe bide dîyarkirin. Wê di nava komên civakî ên ku li bajêr mirov bi hevdu re dijî wê, di nava wan de jî wê, jor û jor bûn wê hebê. Wê ew jî wê, qatman wê hebin.

Di jîyane bajêr a heta roja me de wê, dema ku em li rengê pêşketina wê dinerin em wê dibînin ku wê kombûn wê zêdetirî wê hebê. Wê qatmanî wê derkeve li pêş. Di nava wan qatmanan de wê, komên weke yên li jor ku ew serdest bin wê, xwe ji nava girseyê dûr bigirin. Wê, ev wê, weke xwe dûrgirtina bidil jî wê, ji aliyê wan ve wê, were dîyarkirin. Di nava civakê de wê, li ser wê têgîna qatmanîyê re wê, gotinên weke herkesek di nava yên di asta xwe de bijî wê, were li ser ziman. Ya ku ew dikin jî wê, di wê rengê û awayê de bê. Mînaq wê, dema ku mirov bi nerinê muhafazakaran li wê qatmanîyê binerê wê, bê gotin ku wê, ew baxtê wan bê. Wê ti tiştê wê pêşîya wê jîyankirina wan wê negirê. Wê yên xizan wê ew baxtê wan bê. Yên dewlemend jî wê, ew baxtê wan bê. Wê, bi wê rengê wê li wê binerin. Ew weknehevi wê, di jîyanê de wê, pêşkeve û wê zêdetirî wê hin bi hin wê mazin bibê. Lê ev rewş wê, çawa wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Ji aliyê teorîkî ve wê, kesên weke **Norberto Bobbio** ku wê bi lêkolînên xwe yên li ser liberalismê wê were zanin wê, ew jî wê, di wê warê de

wê, balê bikişênê li ser wê wekneheviyê ku wê pêşkevê. Wê Bobbio wê bênê li ser ziman ku wê, bi aborî wê dema ku ew farq wê pêşkeve. Em nikarin pêşiya wê bigirin. Lê di jîyanê de wê, mirov dikarê wê bigirê. Yanê wê farqê bigrê. Ew jî wê, têgîna li ser liberalismê re bi aborî û jîyanî û ankû qada jîyanê re wê dihênê li ser ziman. Di aslê xwe de wê, rengê ku ew bahse wê, dihê kirin de jî wê, ji aliyê ve wê, weke rewşa wekneheviyê bi awayekê bênê li ser ziman(\*).

Di civak wê çendî ku wê, bijartin wê zêdetirî wê, di wê de wê werina pêşxistin jî wê, di nava civakê de wê, ne hemû kes wê karibê xwe bigihênê li wan. Di wê rewşê de wê, astengiyên aborî wê li pêşiyê wê hebin. Di wê warê de wê, dîsa mirov di gerihê û divegerihê û dihê li ser rewşa derfetê û pêşxistina wê ya ji herkesekê re weke hevdû. Wê weke ku wê hinek kes wê, ên weke Giddens wê werênina li ser ziman ku wê, bisînorkirina pergalek liyaqê a xwe dispêrê karigeriyê wê, di aslê xwe de wê, ji vê re wê nebê weke çareser. Ber ku wê dema ku wê ji aliyekê ve were bisînorkirin û ji aliyê din ve bo ku ew were nêzî hevdû li wekehevdû wê, di rewşê de wê, nikaribê bibê çareserîyeka ku wê mirov karibê wê, bo pêşketina civake wekhev wê, werênê li ser ziman. Ku ji temen ve ew temenê ku ew ne wekheviyê çêdikê ku ew hebê wê, ew rewş wê, ji xwe wê weke encamên wê bin. Wê hingî wê demê mirov divê ku wê li wê bihizirê. Di wê rewşê de wê, minaq rewşa aborî wê, mirov dikarê wê, weke aliyekê wê, werênê li ser ziman. Di wê warê de wê, mirov bêjê ku wê, rewşên aborî wê weke aliyekê wê xwe bidina dîyarkirin(\*).

Di rewşa civakê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, li sîna bisînorkirin hewldanakirina weke hevdû, di kirinê û jîyanê de bi pêşxistinê kirina weke hevdû û derfet pêşxistin wê, hingî wê, karibê weke aliyekê ku mirov dikarê wê, di serî de wê, werênê li ser ziman bê. Di wê warê de pêşxistina pergalek sosyal a civakî û razandinên li wê ku ew zêdetirî di stabiliteyekê de werina pêşxistin wê, bi wê re wê, ew refaha civakê a pozitiv ku em dixwezî ku wê pêşbixî wê, hingî wê, were pêşxistin. Di wê warê de wê, dema ku mirov wê ji vê aliyê ve wê, li wê binerê wê, hingî wê, mijar wê, weke aliyekê wekhevî û ne wekheviyê jî wê, xwe bide dîyarkirin. Di wê warê de wê, di nava civakê de wê, wekehevdû jîyankirina bi wekhevî wê, ew jî wê, weke aliyekê ku mirov li wê bihizirê bê. Di vê warê de wê, politikayên liberalismê wê ji aliyekê ve wê, dema ku mirov li wan bihizirê wê, bi dîtbarî wê çawa wê dîmenê xizaniyê wê bixwezê ku wê ji holê rabikê bê. Di vê rewşê de wê, minaq di nava civakê de komên xizan ku ew bigihijîne derfetê û bijîn wê, li ser wê bisekinê. Minaq wê, herkesek ku wê bê girêdan li maaşekê û wê bi wê re wê hin bi hin wê bijî wê, di wê rewşê de wê, weke aliyekê politikayên sosyali ê ku ew di warê de werina pêşxistin bê. Di roja me de wê, rewşa biwasifbûnê a ku mirov wê dikarê weke aliyekê wê werênê li ser ziman wê, hin bi hin wê, ji holê wê yan rabê û yan jî wê reng bigûharênê. Rewşek ku wê berê weke bêwasifîyekê dihat dîtin wê, li hemberî pêşveûnên ku ew dibin wê, di rengê wasifîyekê de wê, rengê û awa wê bistênê.

### **Dewleta sosyal û demokrasiya sosyal**

Weke mijareka din em li vir divê ku rewşa sosyal demorkasiyê û ya dewleta sosyal bi

-----  
(\*Bobbio, Nortberto(1999), Teoria Generale della Politica, p.7-45

(\*Hebermas, Jorgen(1962); Strukturwandel der Öffentlichkeit, .P.11-42

(\*Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 95-145

hevdû re hildina li dest. Di aslê xwe de wê, hebûna sosyal demokrasiyê wê, dema ku wê were li ser ziman wê, weke ku wê, dewleta sosyal wê were qastkirin. Minaq wê Kees Van Kersbergen(\*) di pirtûka xwe ya bi navê «Social Capitalism: A Study of Christian Democracy and the Welfare State» de wê, bi awayekê wê, sosyal demokrasiyê û sosyal dewletê wê, xatekê wê, di nava wan de wê bikê bikişênê(\*). Wê wan weke du aliyên ku ew ji hev cûda na wê werênê li ser ziman. Di salê 1981ê de wê, dema ku wê Ronald Reagan wê, dema ku wê werênê li ser ziman ku “hinek karên ku dewletê bi dilxweşî dikirin me kir ku dest ji wan vekişênê”. Wê ev gotinên wî wê, biriqîna xwe wê, li ewropa wê zûtir wê bide diyarkirin. Bi teybetî wê, ji aliyê cihane katolik a ku wê sosyalîzm ji xwe re wê weke ‘dijminê mazin’ bijart(\*) wê, zêdetirî wê, di wê rêyê de wê, bandûra xwe wê, li wê xwe bide nîşandin. Pêşketinên li ewropa ên bi dewleta sosyal re wê, pêşxistina demokrasiya sosyal jî wê, ji aliyekê ve wê, bandûrê li wê bikê.

Li vir em wê di serî de wê, werênina li ser ziman ku wê, dewleta sosyal wê, dema ku ew wê, politikayên xwe yên weke yên li ser malbatê û pêşxistina alikariya civakî û ankû sosyalî wê pêşbixê wê, weke aliyekê ku ew alikariyê wê pêşbixê wê were dîtin. Di aslê xwe de wê, ev politika wê, piştî salên 1980 û pê de wê, di çerçoveya politikayên cihane bi du-qutubi de ku wê bibê wê, weke pêngavna li hemberî hevdû wê, di çerçoveya wê de wê, werê pêşxistin bin. Ev rewş wê, hin bi hin wê, di nava jîyanê de wê, bandûra wê, zêde bibê. Di rewşa jîyane malbatî de wê, stabiliteyekê wê di temenê xwe de wê biparêzê. Malbat wê, gûharinên di wê de wê bibê wê, mirov dikarê weke aliyekê di wê çerçoveyê de jî werênê li ser ziman. Di nava malbatê de wê, heta wê demê de wê, xwe dabarekirina wê, bi li ser piştî kesekê wê zêdetirî wê bimênê. Lê piştî wê, dema ku wê jin jî wê, ji malê derkeve û wê, bikeve qada xabate jîyanê de û ev rewş wê, di çerçoveyek bi têgîna wekhevîyê de wê, zêdetirî wê were rojevê û wê pêşkeve wê, bandûra wê li malbatê bê. Wê ji aliyekê din ve jî wê, bandûra wê zêdetirî li têkiliyên zayendî ên nava mêr û jinê jî wê bibê. Piştî şerê cihanê ê duyem û pê de wê, di van waran de wê, hin bi hin wê pêşketinna li berçav wê bibin. Wê gavên ku wê piştî restorekirina ewropa ku ew ji şerê cihanê duyem bi awayekê rûxî derketî wê bi pêşxistina dewleta sosyal re ku wê, were pêşxistin wê, weke aliyekê din ê pêşketina ewropa ku wê ji temen ve wê, bi afrînerîyan re wê bide diyarkirin bê.

Dewleta sosyal wê, pêşketina wê, di wê çerçoveyê de wê, zêdetirî wê balê wê bikişênê li ser xwe. Di dewama wê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, dewleta sosyal wê, nava jîyanê de wê, zêdetirî wê, were dîtin. Alikariya sosyalî ku wê were kirin, rewşa parastina zarokan, kêmendana û pîrûkalan wê derkevina li pêş.

Dewleta sosyal wê, dema ku wê pergale wê ya civakî wê hinekî jî ku ew rengê wê were pêşxistin wê, ew wê, di rewşa malbatan de wê, xwe bi pêşxistina wan re wê, bide diyarkirin. Lê wê zêdetirî wê, weke saziyeka çavdêr wê dewleta sosyal wê derkeve li pêş û wê zêdetirî wê tevli jîyane malbatan wê bibê. Di wê rewşê û awayê de wê, dewlet

-----  
 (\*)Kersbergen, Kees Van(1995), «Social Capitalism: A Study of Christian Democracy and the Welfare State» , p.5-47

(\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics*, P. 120-145

(\*)Kees Van kersbergen wê li ser xateka ku mirov nikarê duri bernsteincîyan şîrovebikê wê, werênê li ser ziman. Bernsteincî wê bêjin hewceyî şerê çinî nin a. Ji felsefeya kant bi bandûrbû û wê li ser têgîneka revisyonist wê re wê marksist lê binerin. Têgîna sosyalîzm revisyonist wê, li ser wî(bernstein) re wê were pêşxistin.

wê, li şûna kêmkirina mudahaleyên wê li jîyanê wê, weke xate sêyem wê, bisererastkirina wê re wê, bixwezê ku ew li jîyanê weke saziyekê hebûna wê bidomê. Li vir wê, çi maf bê û çi weke maf bê wê, di aslê xwe de wê, dema ku mirov dewleta sosyal hilde li dest wê, bi wê re wê, weke aliyekê giring bê ku mirov wê, di serî de wê, hilde li dest û wê, werênê li ser ziman. Di wê rewşê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, ev rewş wê, zêdetirî wê weke rewşek ku mirov wê bi teybetî wê, hilde li dest bê. Di warê alikariya dewletê de wê, gotinên demokrasîyê wê, zêdetirî wê, dervî dewletê wê li ser dewletê wê derkevina li pêş. Wê ev jî wê, weke aliyna ku wê, dema ku wê alikariya ku ew divê ku ew bikê wê li ser wê bisekinê. Lê demokrasi wê, dema ku wê bihizirê wê, ji wê zêdetirî wê, di aslê xwe de wê pêwîst bê ku ew bihizirê. Mînaq wê dema ku wê, di nava mijarê de wê, weke saziyeka ku ew 'berpîrsîyarîyên wê were hanîn li cih' wê, bi wê rengê wê li wê bihizirê. Di aslê xwe de wê, ev rewşa dewletê a roja me de ku wê weke dewleta hemdem jî wê were bi navkirin wê, nava berpîrsîyarî û maf û azadiyê de wê, di ahengekê de wê, xwe bide girtin. Weke 'çiqasî berpîrsîyarî wilqasî maf' wê bi wê re wê, derkeve li pêş. Berpîrsîyarî û maf wê, weke du gotinên ku wê bi wateyan wan re wê li hevdu wê werina girêdan bin. Lê di aslê xwe de wê, dema ku mirov bi hevdu re wê, hilde li dest wê karibê maf dayinê weke 'lutfekê' jî ku wê ji aliyê dewletê ve wê, were pênasekirin ev wê, di gelek rewşan de wê karibê bibê temenê rûmet şikandin û piçûkxistina bi rûmetî jî. Li vir ji xwe wê dema ku mirovekê bizane û azad ku ew mirov li wê bihizirê wê, bi wê re wê wre dîtin ku ew wê, xwe di awayekê dûrûst de wê bide girtin û wê, berpîrsîyarên xwe wê li hemberî civakê wê bizanibê. Li vir wê, bi awayekê wê, rengê aqil ê weke aqla û hwd wê, bikeve dewrê û wê, bi têgînên weke rastî, dûrûstî û hwd re wê, rewşê wê karibê bide dîyarkirin. Di aslê xwe de wê, dema ku mirov ev windakirin û dervî wan nirxan tevgerîya ew wê, ji aliyekê din ve wê, nîşanaka dejenerebûyîna civakê bixwe jî bê(\*). Di wê nûqtê de li şûna ku mirov wê li hemberî mirovekê wê bergirên xwe wê bigirê mirov ji temen ve dahûrkiyênê li ser rengê pêşketinê bikê û bi wê re fahmbikê. Di kêlikê de fahmkirina dîrokê û di keseyetê de fahmkirina civakê wê, di wê çerçoveyê de wê, weke rewşeka ku mirov wê, fahmbikê bê. Ku mirov bixwezê rewşa dewletê û têkiliya wê ya bi civakê re wê, hilde li dest wê, hinek serekên weke dewleta sosyal(\*), demokrasiya sosyal, civak û maf û azadî ku mirov binxatbikê û wan werênê li ser ziman hebin. Em di wê çerçoveyê de pêşî ji dewleta sosyal destpêbikin û bikortasî wan serekan bikin ku werênina li ser ziman.

**Li vir em hinekî gotina dewleta sosyal derxina li pêş wê hinekî li ser wê bisekin in.** Di wê warê de wê, bi mînaqên wê yên ku ew pêşketina re wê, rewşa dewletê wê, zêdetirî wê, weke saziyekê wê xwe bide dîyarkirin. Ji wê rengê ku me nivîsand wê, di aslê xwe de wê, ew întiba wê karibê were derxistin ku politikayên rêya sêyem wê zêdetirî wê, kontrola dewletê û bi tememî jî holêranekiirna mudahaleyên wê re wê, were li ser ziman. Di wê warê de wê, çerçoveya rexneyên bi liberalismê re ku wê li hevdu wê bikin jî wê, ev encam wê derkeve li holê. Hinek rexneyên aliyê liberal wê, bêgûman ên weke serbestkirinê ku mirov hilde li dest wê, rast bin. Lê li vir di rewşa nêzikatiyê de wê mirov dikarê wê, ji aliyekê din ve wê, hilde li dest û wê fahmbikê.

Mînaqên dewleta sosyal wê, bi teybetî li welatên îskandinav ên weke isvec, norwêc û

-----  
 (\*)Noam, Chomsky (1992). *Detering Democracy.*

(\*)Giddens, Anthony (2000) *The Third Way and Its Critics, P. 120-145*

hwd re wê, hebê. Wekî din li wetatên weke almanya wê hinekî ev rewşa dewleta sosyal wê xwe bide dîyarkirin. Dewleta sosyal li almanya wê temenê wê heta almanya Bismark wê herê. Rengê sosyal dewleta ku wê bi ya bismark re wê were dîtin wê di çerçoveya dewleta sosyal a klasik de bê. Piştî jî wê li ser wê temenê wê re almanya wê xwe bi hebûna dewleta sosyal wê bide domandin.

Dewleta sosyal wê ji aliyekê ve wê, weke aliyekê ku wê, serbestiyê wê, di jîyanê de wê, zêdetirî wê karibê çêbikê. Wê, mafên mirov ên jîyanê û xwe dabarekirinê wê, di bin kontrola wê de jî bê. Di wê warê de wê, dewlet wê xwe weke saziyeka ku wê, dema ku wê, aborîya malbatê ket zorê de ku ew alikariyê bidiyê de. Alikariyên ku wê, di wê rengê de wê bi sosyalî wê bidin wê, hertimî wê ji aliyekê ve wê, di armanca herîşên liberalistan de bin.

Di wê warê de wê, dema ku ew alikarî wê were dayin wê bêgûman wê, temenekê jîyanê wê bi xwe re wê biafirênê. Dema ku mirov xwediyê karekê bê û bi wê re wê, alikariyê jî karibê ji wê sûdbigirê wê, weke aliyekê ku wê jîyane xwe bi wê di astek bilind de wê bide dîyarkirin.

Di wê warê dewleta sosyal de wê, ev aliyên alikariyê wê, weke aliyekê ku wê, di aslê xwe de wê, weke 'maf' wê were dîtin. Lê wê ji aliyekê ve wê, bi saziyên sosyal ên dewletê re wê, mirov wê weke ku wê li dewletê wê were girêdan. Rewşa aborî a dewletê wê, dema ku em di wê çerçoveyê de wê, hildina li dest wê, bi çerçoveyek politikayên dewleta sosyal re wê, di rengê karma de wê, karibê xwe pêşbixê. Di wê warê de wê, berhevûnên di destê destê de wê, ji aliyekê ve wê, di wê rengê de wê, bèn xistin temenê pêşxistina malbatê de.

Ev rewş wê, weke rewşna ku wê, bi demê re wê, gûharinên mazin wê bi xwe re wê, bi mirov û malbatê re wê bênin. Di wê rengê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşên alikariyê weke yên sosyalê wê karibin civakek karneker, wê biafirênê. Di wê warê de ku wê bi hizrên xwe yên aborî ên li ser vê aliyê civakê ve wê were zanîn aborîvanê Assar Lindbeck wê balê bikişênê li ser rewşên weke pêşketina rewzabûyîne di rewşên rewîstî ên civakê de. Minaq wê, civakek ku ew karnekê û tenê xwe bi alikariyê ve girêdabidê ku ew tirs ji wê ya ku ew wê biafirênê. Ber vê yekê wê, ev alî wê, çawa wê werina bikarhanîn wê, pêşniyarbikê ku ew alî baş werina dahûrkirin. Di wê warê de li şûna ku wê, alikariya sosyal wê ji karbikê ku ew alikariya sosyal zêdetirî teşwîkî wê bikê wê, li ser wê bisekinê. Bi mantiqê xate sêyem a sosyal jî wê, di aslê xwe de wê, di wê rengê de wê, mirov wê ew li ser vin û rewşa xwe wê ew xwediyê maf û kifşkirinê bê. Bo wê jî ew, divê ku ew di nava jîyane afirandin û hilberinê de bê. Ew di wê rengê de ew aktiv bê. Civake refah wê, ji aliyekê ve wê, di nava alikariya sosyal û civakek di kar de aktiv de wê, weke rewşeka hildana ewlehiyê jî bê. Di wê warê de wê, politikayên wê di wê warê de wê, ew wê, rewş biparêzên wê, weke politikayên ku ew bi wê rewşê re û bi wê aktiviteya mirovî re hevdû temem bikê bê. Wê di wê warê de wê, civake refah wê, saziyên weke pîr zêde wê, aktiv û wê di karê xwe de bi hişmendî wê hebin. Wê, saziyên weke yên sosyalê ku ew politikayên wê dimeşênin wê weke saziyên ku ew armanca wan ya karkirinê wê nebê. Ew wê, weke saziyna di wê warê de ku ew di xismetî civakê de bin. Wê, di wê warê de wê, jîyane civakê wê, bi refahe wê re wê, di ahengekê de wê çawa wê biparêzên wê li ser wê bisekin in. Di aslê xwe de wê, dema ku mirov ji vê aliyê ve hizirê wê, ew jî wê, weke aliyekê mirov dikarê wê li wê bihizirê ku wê, politikayên sosyalê ku ew bi şewayekê rast wrina plankirin û belavkirin wê, karibin



bibina temenê aktiviteyekê jî. Li vir wê demê mirov dikarê wê jî wê bêjê ku wê, saziyên ku ew didina karkirin û ankû kar dibînin wê, di wê çerçoveyê de wê, mesûliyetek wan di nava civake refahê de wê hebê.

Mijare karûxabatê wê, dem bi dem wê di wê de wê gûharîn wê bibê. Weke berê ji demê heta demekê karkirin wê rewşa wê zêde li holê nemênê. Di rewşa kar de jî wê pîr zêde wê gûharîn wê bibin. Mirovekê ku ew heta 60 saliya xwe kar dikê wê bêqawitandin û wê piştî wê re wê heta mirina xwe wê, maaşê ku ew dihilde wê bi wê bijî. Saziyên ku wê, di wê warê de wê, ji destpêka bûyîna mirov û heta mirina mirov wê bihizirin li mirov wê, weke aliyana civake refah û ku bi politikayên sosyalê wê xwe li ser lingan bigirin bin. Wê weke saziyên ku ew ne li bendî qizincirinekê û ankû ew xizmetekê bikin bin. Di wê warê de wê, serifandinên zarorî ku wê weke yên jîyanî bin wê, ew wê werina dayin.

Di wê warê de wê, dema ku wê, were mirov di wê çerçoveyê de li keşên pîr bihizirê wê, ew wê weke kesna ku ew êdî pîr û nikarin karbikin û ew bi maaşê ku ew dihildin ew dijîn. Wê, di wê rengê de wê, ew wê, hebin. Lê dewletek û ankû mantiqekê ku ew zêde li karkirinê bihizirê wê ev karibê di wê de bibê mijareke weke pîrsgirêk. Di wê warê de wê, dema ku mirov li wê bihizirê 'ku tu kar nekê têyê qizinc jî nekê' wê, di aslê xwe de wê, weke mantiqekê yekdûze wê, karibê di wê rengê de wê hebina pîrûkalan û maaşên ku ew dewleta sosyal bide wan jî weke pîrsgirêk bibînin. Di wê warê de wê, demê yan wê li dijî wê dayinê bê û yan jî wê bikeve nava hewldana kîmdayinê.

Di gelek welatên sosyal de wê, piştî dema qawitandinê wê, dem bi dem wê deerfet çêkirina ji karkirinê a pîr û kalan re wê,, hinekî jî wê, ev alî wê, di temenê wê de bê. Maaşê ku ew dihê dayin li wan ku ew weke 'barekê' dihê dîtin wê, di wê warê de wê, ev wê armanca wê bê. Kesên pîrûkal ew dibê ku ew nikaribin bi fizikî tevî ti karî bibin. Lê ew weke kesna ku ew bi fêr û azmûnên jîyane xwe re wê weke kesna zane jî wê karibin weyneke di wê warê de bi aqilê xwe re wê bileyizin. Di nava civake kurd de wê, di demên berê de wê, ev wê were pêşxistin. Di wê warê de wê wê, pîrûkal wê hem wê werina bi rûmetkirin û wê hem jî wê, di wê rengê de wê, ew ji wan wê sîd wê were girtin. Ber vê yekê ya ku wê, di roja me de wê, bo wan wê di nava civake kurd de wê, weke 'çîneka civakî a serdest' wê were bahskirin û bi navkirin.

Ji aliyê kar dîtinê ve wê weke ku em li î ro li welatên weke yên iskandinav ên weke isvec, norwêc û hwd dibînin wê, dewleta wê mudahaleyên wê êde li bazara kar wê nebê. Wê di wê de wê serbestiyek wê hebê. Ya ku wê, hebê jî wê, di çerçoveya alikariya civaknasî de bê. Di wê warê de wê, ku em bi politikayên xate sêyemin bi hizirin wê mirov dikarê bêjê ku wê, ya ku wê were dîtin ku wê weke ji holêrakirina mudahaleyên dewletê wê weke çareseserîyekê nebînin. Di warê dewleta sosyal a li ewropa û giştîya wê pêşketîya wê, hema bêja yek li jêr û yek li jor wê, di wê rengê de wê bihizirê. Di wê warê de wê, bi destê dewletê sererastkirinê di jîyanê de wê, biparêzê. Di wê warê de wê, dewletê wê weke çareserîyekê wê bibînin. Dewlet wê, bi sazûmanî wê, ji aliyekê ve jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê weke sazîyeka ku ew armanca wê qizincirînê nebê wê karibê wê bi rengê ew hebûna xwe biparêzê. Di wê warê de wê, qizincirîna wê, ji sînorê civakê wê derbas nebê. Wê hemû serifandin û xarckirinên wê jî wê, pêwîstî bi wê hebê ku ew bi awayekê zelalî were danîn li holê li berçav. Di wê warê de hasabê hemû kirin û serifandinên xwe bide. Mirov wê, bi pêşketina xwe re wê, çendî ku wê dem bi dem wê di jîyane xwe de wê weke mihtacê alikariyê jî bê lê wê, di

aslê xwe de wê, weke otoriteyekê wê hebûnek dewletî û hwd wê li ser xwe wê nepejirenê. Hemû pirsgirêk, pevçûn û hatina berhevdû a dewletê bi zihnîyeta re li hemberî kes û komên civakê wê hinekî wê ev di temenê wê de wê hebê. Di wê warê de ku mirov di çerçoveyê de wê, hilde li dest li ser rêjeyên welatekê û ankû di asta global de mirov dikarê gelek kronolojiyan derxê û çawa pêşketin bi aborî û hwd di jîyanê de xwe dide dîyarkirin û bûya wê, bi hijmaran wê werênê li ser ziman. Lê li vir wê weke aliyekê giring ku me zêdetirî li berçav girt ji destpêka nivîsandina û heta vir wê, ew bê ku em di serî de bi aqilî û teorîkî wê rewşeka wê di serî de wê fahmbikin. Bo ku ew fahmkirin jî di zelaliyekê de bibê me rêya hesanî û bi gotinên jîyanî ên hesanî bijart.

Di rewşa dewleta sosyal de wê, weke aliyekê din wê, çawa wê sazîyê wê, ew hertimî wê weke aliyekê ku wê li ser wê serî were wastandin bê. Di aslê xwe de wê, dema ku mirov navaroka wê li wê bihizirê wê, hebûna komelên civakî wê, weke aliyekê sîncor bê. Wê hem bo dewletê û hem jî wê, bazara sermayê û ankû sermayê ev wê wusa bê. Di wê rewşê de wê, di nava cihane global a ku wê di wê de wê, bi zêdeyî wê, aborî wê bibazarê, şirket û şermayeye gerîner û ya mazin a di cih de re wê, pêşkeve wê, di wê de wê, rewşa karûxabatê û temenê wê ye afrîner wê, bi wê pêwîstî levkîrin û peymanên civakî ên giring û mazin wê hebê. Mirov nikaribê dervî civakê û ahenge wê li aborîyê û pêşketina wê bihizirê. Di serî de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ev peyman wê, di rewşa kar û jîyanê de wê weke ku wê ahengê di nava karûxabatê û bazarê û çêkirina zêde mal de wê çêbikê wê, bi heman rengê wê, reng û awayekê de wê, rewşa wê xwe bide dîyarkirin.

Marks, wê, dema ku wê, dewletê şîrovebikê wê, weke sazîyeka bi pêşketinê re wê, hin bi hin wê holê rabê wê, bènê li ser ziman. Lê vajî wê, piştî wê hin bi hin wê, weke sazîyeka laşgiran wê, di nava jîyanê de wê, bê xwedî serdestî û pêşkeve. Têkiliyên wê jî wê, zêdetirî wê, bi awayekê tevlihev wê pêşkevin û wê derkevina li holê. Di wê rewşê de wê, dewlet wê, weke rewşekê wê, xwe bide dîyarkirin. Lê ev di hê dîtin ku em kîjan modela dewletê jî hildina li dest wê, hertimî wê, bi demê re wê bi pêşketina wê re wê, weke kirasekê tang ê li civakê wê, xwe bide dîyarkirin. Di wê warê de wê, êdî ew wê, li şûna ku ew xwe weke civakê bi reng û awa bikê wê, ew bi rêyên weke destûr, zagon û hwd re wê bikê ku ew civakê bikê weke xwe. Destûr û pergale wê, bo dewletê wê, bo “afirandina civake xwe” bê. Di wê rengê de wê, xwediyê wateyekê bê bo bê. Lê bo civakê wê, ji wê zêdetirî û vajî wê, xwediyê wateyekê bê. Di wê warê de jî wê, di salixkîrin û hêvî û bendewariyên bi gotina deestûrê re ên civakî û yên dewletî wê jî hevdu wê, cuda bin. Civak û endamên wê, ew wê jî aliyê maf û azadiya xwe ve wê wê li wê bihizirin. Wê çawa wê, weke binetereka ku wê aramî û aşîtiya nava civakê wê biparêzê û wê jî hinek aliyên weke civaknasî ve wê jîyane wan biparêzê wê jî wan aliyan ve wê li wê bihizirê. Lê dewlet jî wê jî aliyê ve wê, çawa wê, bi xwe ve girêbide, wê çawa wê, civak wê, di bin gotina wê de bê, wê çawa wê, weke sazîyeka kifşkar a li ser serê civakê bê wê, di wê rengê û awayê de wê, li wê bihizirê. Gotinên weke “hêze dewletê a jî destûrê tê” wê, karibin têgînekê di wê warê de bibina me. Di wê warê de wê karibin fahmkirinekê bi rewşa dewletê û hewldanên wê yên weke xwe serdestkirinê re wê bide dîyarkirin.

Di nava jîyanê de wê, bi teybetî jîyane demên hemdem de wê, sazûmanaka rêxistinî wê xwe bide dîyarkirin. Wê, komelên karkeran û yên bi rengên din û bo rewşên din ku wê pêşkevin jî wê bibin. Di wê warê de wê, ew komel wê, jî aliyekê ve wê, mafê wan

wê bikin ku ew wê biparêzên. Di rewşa kar de wê, mafê xwe birêxistinkirinê wê, di wê warê de wê, weke mafekê bingihîni bê. Wê di aslê xwe de wê, weke xosletekê nava jîyane civakî jî bê. Civak wê, bixwezê ku ew têkiliyên xwe di nava xwe de bi wê rengê ew dênê. Ew dema ku ew saziyên ku mirov bi destê xwe avakirî weke komelan ku ew nebin wê, ew wê, di nava xwe de wê, bi komên weke pêşdikevin re wê, ew xwe di wê rengê de wê bi awayekê wê bi xwezayî wê, pêşbixê û bisazûman bikê.

Komelên civakî wê, dewletê wê, bixwezin ku ew bikişênina li rêzekê. Wê, mafên her endamên civakê ên ji destûrê tê weke bi hemwelatî wê bikê ku ew wê bixwezê biparêzê. Wê, bi wê re wê, maf û azadî, mafê serbestîfîyê, mafê parastinê, perwerdeyê û hwd wê, ew wê, wan bişopênê. Ev wê, weke aliyana ku wê, zêdetirî wê, mirov karibê wê, werênê li ser ziman. Di roja me de wê, komel wê, weke lingna civakî ên ku ew nebin nabin. Ber vê yekê wê, rêveber wê, hewlbidin ku ew komelên aligirên xwe bidina avakirin. Kesên ku ew ji rêveberîyê na ew werina li ser serê wan. Di wê warê de wê, rewş wê, xwe bide dîyarkirin. Beşên destûran ên ku ew xat, reng û sînorê komelan wê bidestûrî bide dîyarkirin wê, weke aliyana ku wê, sînorê wê, di nava dewletê de wê, çawa wê bide dîyarkirin bê. Di wê rengê de wê, ev wê, weke aliyekê wê yê giring wê, xwe bide dîyarkirin. Di wê rewşê de wê, di aslê xwe de ev beşên destûrî wê, temenê tevlîbûyîna dewletê li nava komelan û hewldana danakifşkirinê a navaroka wê jî wê, bixwe re wê bide dîyarkirin. Di wê rengê de wê, weke aliyekê giring wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman.

Di warê kifşkarîya dewletê li ser jîyane civakê û sosyaliteya wê de wê, hin bi hin şîroveyên ku ew dihên pêşxistin wê di wan de wê, were dîtîn ku wê, zêdetirî wê derxistina dewletê li pêş bê. Di warê dîtina kar ji mirov re û her wusa alikariya sosyalî û hwd de jî wê, ev wê, bi wê re wê, were dîtîn. Di wê rengê de wê, çendî ku wê, dem têve herê wê, pêşketina bi aqil û demê re wê zêdetir bibê. Wê qadên nû ên xabatê wê, hin bi hin wê dîyarbibin. Ev jî wê, bandûra wan li jîyane mirov wê zêdetirî wê xwe bidina dîyarkirin. Lê zêdetirî karkerîya bi wasif û ankû 'qalite' wê zêdetirî wê, were û pêşkeve. Ev jî wê, di temenê wê de wê, civakeka ku ew endamên wê hema bêja hemû xwendiyeyî bin. Di roja me de wê, rêjeya xwendina dibistanê wê, zêdetir bê. Di wê warê de wê, ev jî wê, di qaliteya kar û karkerîya bi wasif de wê, weke aliyekê din ê ku wê lê were lêgerin bê.

Mînaq piştî pêşketinên teknolojîkî wê, gelek pişesazî wê pêşkevin. Wê pişeyên nû wê li ser wê re wê, xwe bidina dîyarkirin. Kesên di wê warê de perwerdekirî û bi zane wê bo wê pêwîst bin. Di wê warê de wê, ew jî wê, bi demê re wê pêşkeve. Di nava civakê de wê teşwîkên piçûk û ankû kargehên piçûk wê, di aslê xwe de wê, weke aliyana civakî ên ku wê her demê wê hebin bin. Di wê rengê de wê, ew jî wê, weke rêyna karûxabatê bin. Bi wê re wê, gav bi gav wê, hin hin di wê rêya mazinbûnê de wê, astên cûda wê, di wê warê de wê hebin ku mirov wan werênê li ser ziman.

Di roja me de wê, dema ku wê, karûxabat wê, were dîyarkirin wê li bazarê wê werê nerin. Wê çawa wê zêde mal wê were çêkirin bo zêde qizinkirinê wê li wê were hizirkirin. Ev jî wê, bi demê re wê, çawa wê, ahengekê wê, di nava jîyane aborî de wê, bi hebûna sermayê, bazarê û karûxabatê de wê, were çêkirin wê, li wê were lêgerin. Ev nerîna aborîyî ku wê serdest bê wê, ji gelek aliyan ve wê, kifşkar bê. Mirov wê, dikarê li ser wê re bêjê ku wê, di wê çerçoveyê de wê, di karûxabatê de wê, kargeh wê, bi nêzîkatîyek kapitalî wê, li pey zêde karkirinê bê. Jîyane civakî wê, ew jî wê, weke

aliyekê din ê ku wê bi her endamên wê re wê, xwediyê xwestek, pîvan û restên nû bê. Divê ku mirov ji vê aliyê ve jî li mijarê binerê û wê hilde li dest. Êdî nerîneka ku ew tenê li ser zêde karkirinê ku ew bide kifşkirin di nava civake roja me de wê, zêde kifşkarîya wê li ser ya jîyanê re wê newê pejirendin.

Di warê pêşketinên di jîyanê de wê, rewşa pêşxistinê, hilberînê wê di ahengekê de wê bandûrê li pêşketina hevdû bikin. Minaq weke rewşa teknikê ku wê di warê qadên jîyanê û pişeyên wê de wê bibê û hwd. Weke wan wê aliyên din jî wê, wusa bê. Di jîyanê de wê, teknik wê ji aliyekê ve wê destê mirov rehet bikê û kar hesan bikê. Ji aliyekê din ve jî wê, çerçoveyekê bi rewşa jîyane bi rêxistinkirî jî wê bi xwe re wê di ahengekê de wê biafirandin. Minaq wê, dema ku wê, fabrîqa wê pêşkevin wê, di wan de wê, teknik wê bê bikarhanîn. Berê manîfakturiyê(\*) bû. Piştî wê hin bi hin wê gûharîn di wê de wê, bi ber fabrîqa û teknîkên ku ew di wan de di hilberînê de dihên bikarhanîn wê bi ber wan ve wê pêşketin û gûharîn wê bibê. Ev jî wê, weke aliyekê din bê. Wê bandûra wan rewşan wê li jîyanê wê pîr zêde wê bibê. Di nava jîyanê de wê, rewşên weke yên jîyane sosyal de wê, mirov wê, hin bi hin wê, pêşketina xwe wê, bi wê re wê, çêbikê. Jîyane sosyal wê ji aliyekê ve wê, temenê pêşketina civakîyekê bê. Lê ev civakêti wê, ti carî wê ne li gorî rengê pêşketina rêveberên welatan ên ku ew hizir dikin bin. Ber vê yekê wê, bi gotina 'kontrolê' re wê, çawa wê ew wê, rengê pêşketinê wê, li gorî xwe bi reng, awa û şekil bikin wê, hertimî di nava wê de bin. Hewldanin bi gotina 'sererastkirinê' û hwd re ku ew dikin jî wê, di wê warê de wê, li ser destûran û hwd re wê, werina kirin bin. Di wê rengê de wê, civak û welat wê hertimî wê, di nava berhevdûbûnekê de bê.

Dewleta sosyal wê, di aslê xwe de wê, weke rewşeka ku mirov wê, di serî de wê, weke aliyekê giring wê, dikarê wê, werênê li ser ziman bê. Di wê rengê û awayê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, di rewşa wê de wê, jîyane civakî wê, bi rewşên wê yên weke malbatî re wê weke aliyekê ku wê li wê were hizirkirin bê. Ji aliyekê dewleta sosyal ve ku ew li şûna ku ew xûsandinê di rewş, reng û awayên pêşketina civakê de bikê ew, mecbûra ku wê weke wê herêbikê û di pêşketina wê de weyn bileyizê. Di serî de wê, weke aliyekê din ê giring mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, civak û dewlet wê, di wê warê de wê, di rewşekê de wê, li hemberî hevdû wê bikevina pozisyonekê de.

Dema ku mirov bahse civak û dewletê bikê wê, hertimî wê du gotin wê, di serî de wê weyn bileyizin di fahmkirina nêzîkatîyan de. Yek wê, mafûazadî bê. Ya din jî wê, berpîrsîyarîti bê. Wê rewşa mafûazadiyê ku wê were pêşxistin wê, dewlet wê, ew wê ji aliyê xwe ve wê, weke 'xîsmetê' wê bibînê û wê, ew wê, mafûazadiyê wê li şert û mercan wê bide girêdan. Di wê rengê de wê, civak wê bo ku ew wê mafûazadiyê baş jî wê sûdbigirê wê, şertên dewletê wê ew bin ku ew bi awayekê di bin gotina wê de bê. Weke wê bikê. Weke ku ew dibêjê 'berpîrsîyarîya xwe' werênê li cih. Di wê rengê de wê, ev wê, weke aliyna ku wê, bi hevdû ve girêdayê wê werina hanin li ser ziman bin.

-----  
(\*)Marks, wê di cilde pêşî a kapitale de wê li ser manîfaktura wê bisekinê û wê, weke xosletekê pêşketina destpêka kapitalismê û berhevkirina wê jî wê, werênê li ser ziman. Di wê beşê de wê, dema ku me nivîsand wê bi berfirehê li ser cilda pêşî a kapitale bi xwendinê em li ser wê sekinim û min xwend. Di wê rewş de wê, min xwest bi wê jî wê demê û heta roja me pêvajoyên wê yê pêşketina aborîyî fahmbikim, Di aslê xwe de wê, gelek rewşên bi ber gelemperbnûyîna roja me a piütî rûxîna sovyetê jî wê, di wê de wê, ji aliyê dahûrkiirna aborî ve wê, weke ku wê kifşbikê.

Têkiliya mirov û civakê wê, di nava têkiliya civak û dewletê de wê, were dîyarkirin.

Dewleta sosyal wê, di serdema kapital de wê, hertimî wê, weke aliyekê ku wê, hebûna wê li berçav bê. Ber ku wê, dahat û çûyinên wê weke mesrefên wê, di ahengekê de wê, hinekî wê zêdetir bin. Wê, mesrefên ku ew dihên kirin wê, weke dayinên ku ew bi şûn ve nevegerihin wê werina dîtin. Ber vê yekê wê, ev dayinên ku ew bi şûn ve nevegerihin wê, çawa wê kêmtir bikê wê, hertimî di nava hewldana wê de bê. Ber vê yekê dewleta sosyal wê ji aliyekê ve wê, li ser dewletê û armancê wê yên xwe dewlemendkirinê re wê, hertimî wê li bendekê wê bialiqê. Wê weke 'pirsgirêkekê' wê li wê were nerin. Wê, di wê rengê de wê, ew wê, weke aliyekê ku mirov wê, dikarê wê, di serî de wê, fahmbikê bê. Rewşa dewleta sosyal û hebûna jiyane endamên civakê û malbatîtiya wan wê, weke hebûnê ku ew civakê di afirênê bê. Ya ku wê, bi demê re wê, weke rewşekê wê xwe bide dîyarkirin, çendî ku mirov wê pêşkeve wê, serîlêtawandin wê, hertimî wê, bo rêveberîya dewletê wê zortir bê. Wê ev rewşên sosyal wê, hin bi hin wê weke çekekê wê di wê rewşê de jî wê, werina bikarhanîn. Wê, alikariya sosyal wê ji aliyekê ve wê, pêwîst ba ku wê mafûazadiya mirovî zêdetir bi serbestî bikira lê wê, di rewşeka ku wê, çawa wê, girêbide wê, bikeve reng û pozisyoneka bi wê rengê de. Mînaq wê, kesek wê, xaniyekê wê ji xwe re wê bikirê û wê, deynkirinan wê bikê. Wê bo dayina wan deynên ku ji bankeyê kirî û ankû ji dewletê kirî wê, bi dehan salan wê karûxabatê bikê heta ku ew wê bide. Ev jî wê, demek dirêj a jî jîyane mirov ku ew bijî bê. Di wê rengê de bendên girêdanî ên demên hemdem ku ew bahse wan dihê kirin wê, weke rengna têkiliyî ên demên nû ên xistina mirov bin îteatê de bê.

Alikariya sosyalî wê, di wê rewşê de wê, weke aliyekê dewletê û politikayên wê bê. Di aslê xwe de wê, ew diviyabû ku ew ti mesûliyet û ankû berpîrsiyarî li ser wê re jî mirov re nehatiba derxistin. Ji xwe ew alikarî jî wê ji bacên ku ew ji civakê dihên birrin wê jî wan bê. Lê ev wê, weke aliyekê wê di wê rengê de wê, bibê. Li vir wê hingî mirov dikarê gotina demokrasîyê weke têgîneka fahmkirinê wê, dikarê tevî mijarê bikê û wê fahmbikê. Wê werênê li ser ziman. Civak wê, dema ku ew mafê wê bê ku ew ne hilde ew were lêpîrsîn. Demokrasî wê, di nava sînorê welêt de wê, hertimî wê li astengiyên destûrî wê bialiqê.

Hemwelatîfî wê, weke nirxek û girêdanek demên hemdem a giring bê. Lê wê, ew wê, çawa wê baştirin wê, were xistin temenê girêdanekê de wê, rêveber wê serî li ser wê biwastênin. Di aslê xwe de wê demokrasî wê weke têgîneka ku ew dervî wê, wê hertimî wê rewşên ku wê, werina kifşkirin derxistin li pêş ku ew, wan kifşbikê û wan derxê li têgihîştinê û wan astengiyên ji pêşîya mirov û jîyane mirov rabikê bê. Di wê warê de weke têgîneka aktivkirina mirov di nava jîyanê de di çerçoveya mafûazadiya mirov de.

Ji aliyekê din ve jî wê demokrasi wê li wê binerê ku wê mirov wê, mafê xwe yê ku ew ji hebûna wî dihêt ew wê dihilde, wê li wê binerê. Wekî din jî wê, çi astengî bi destûrî û hwd li pêşîya wê hena ew wê, kifşbikê û wê bikê mijare tekoşînek demokratîkî a asîtiyane. Wekî din jî mafûazadiya mirov wê, di wê çerçoveyê de wê, di çerçoveya wê de wê weke têgîneka bihişmend ku ew bi xwe re bijî û wê bi rastî bide jîyandin bê.

Demokrasî zêdetirî ku mirov wê li ser kirinên teorîkî û ankû kirinên jîyanî re wê bixwênê wê mirov zêdetirî wê karibê li ser wê re bigihijê li encamekê. Demokrasi wê jî aliyekê ve jî wê, weke rengêkê şîrovevî ê li ser kirinên dewletê û rejimê ên ne rast ku wê beremberê wan wê bîne li ser ziman ku wê ya rast çi bê bê. Wekî din jî wê, hertimî

wê, weke şîroveyek şoreşgarenê ku wê hertimî wê li gorî demê bi dewrûdayimî ku ew xwe diafirênê û bi wê rengê pêşengîyê ji rastiye re dikê bê. Wê hertimî wê di rengê şîroveyek rexneyî a li dewletê û kirinê jî wê bê. Di aslê xwe de ti pêşketin ku ew bi awayekê têgihîştineka rexneyî newina hildan li dest wê newina çêkirin. Ti civak jî ku ew muhasabeyê li ser mejuya xwe nekê wê nikaribê pêşaroja xwe jî biafirênê. Wê nikaribê xwe barî pêşaroyê bikê. Ev weke rastiye ku mirov wê teqez dikarê wê herêbikê bê. Bipesn mazinkirin û ankû jîyankirin wê, tenê û tenê wê, ji rastiye dûr bikê. Rasti ya ku mirov di jîyanê de dijî ya, Lê dema ku mirov wê rastiye bi çavê aqilê xwe wê rast nebînê wê hingî wê, ew dûrketina jî jîyanê û rastiya wê, bibê. Di rastiye fahmkirin li ser ya jîyankirî û heyî re ya. Felsefeya rastiye teqez ji mirov dixwezê ku mirov hertimî şîroveyek rexneyî wê pêşbixê. Ya ku wê li hemberî rexneyê xwe girt û hebûna xwe parast wê ew weke cewherê ya jîyanê û ya rast wê, li holê wê bijî. Ankû wê mafê jîyanê wê ji xwe re wê qizinc bikê. Di wê warê de wê mafê jîyanê wê, weke mafekê ku ew li hebûna dijî û ya heyî ve girêdayî ew heya. Mafê jîyanê wê, ji temen ve wê, weke mafekê xwezayî û pîroz bê bo her zindiyî. Ew divê ku mirov wê biparêzê. Aqilê dîrokê felsefeya dîrokê a kurdistanî de wê, ev wê, weke ku wê zerdeşt jî wê, werênê li ser ziman wê mafekê cewherî û xwezayî bê. Têgînên weke demokrasîyê û hwd a ku em wê dihênina li ser ziman wê, di wê rengê û awayê de wê bi felsefeyekê wê xwe bi têgihîştin bikê û wê li ser wê re wê li jîyanê, zindî û jîyane wan û rengê wê jîyane wan wê bihizirê. Di wê warê de wê, ev şîroveyên ku ew werina pêşxistin wê ji aliyekê ve wê, xwe li ser rasteqîniyê wê demezrênin û wê bi wê werênina li ser ziman. Di dewama wê de wê, weke felsefeyek jîyanî wê, ew wê hebê. Felsefeya jîyanê a ku mirov wê, kifşbikê wê, bi rengê jîyane mirov re wê ji aliyekê ve wê, mirov dikarê pênasebikê û wê werênê li ser ziman. Ku hemû şîroveyên me armanca wê parastina jîyanê û rengê wê yê bi jîyane her zindiyî re bê wê demê mirov wê, dikarê wê weke diyardeyek teqez a bingihînê wê hilde li dest û li ser wê re bihizirê.

Di wê rengê de wê, zêdetirî wê, fahmkirinekê wê karibê hingî bide me. Mirov wê hingî wê, zêdetirî wê, karibê tîkiliya demokrasi, mafûazadî û serbestîtiya xwe wê bi hevdû re dênê. Wê hingî wê, di wê warê de wê, bê xwediyê fahmkirineka rast. Ji aliyekê din ve jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman di rewşa fahmkirina dewleta sosyal û demokrasîyê bi hevdû re bê. Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, çendî ku wê weke du aliyên ku ew ji hevdû cûda jî bi gotinî mirov karibê wan fahmbikê û hilde li dest jî lê wê ji gelek aliyên ve mirov wê nikaribê ji hevdû cûda fahmbikê û hilde li dest bê.

Dewleta sosyal wê, di aslê xwe de wê, dema ku ew herî hindik bi hindik kêmesîyan û têgînek rast pêkhat hanîn wê, ew wê bê weke aliyekê girîng ê temenekê demokratîkî jî di jîyanê de. Di wê rengê de wê, ew jî wê, xwe bide dîyarkirin. Lê ji aliyê dewletê ve fahmkirina dewleta sosyal û politikayên wê yên di wê warê de wê, mirov karibê bi awayekê fermî wê, di hinek wateyên din jî wê karibê werênê li ser ziman bê. Ya ku wê, rewşê weke ji hevdû cûda dide nîşandin jî wê, di kirinê de wê ev bê. Di wê rewşê de wê, sosyalîyeta demokratîkî û dewleta sosyal wê, qada jîyanê de wê bigihijina li hevdû. Wê hevdû di wê rewşa jîyanê de wê biafirênin. Di wê rengê de wê, weke du aliyên aliyekê bê. Pêşketinê sosyalî wê, dema ku ew bûna temenê serbestîtiya mirov, xwe bi rehetî hanîna li ser ziman û jîyankirina weke ku ew dixwezê di aramîyê de wê, hingî wê, ev wê, di wê rewşê de wê mirov dikarê fahmbikê bê. Lê li vir wê di esasê de wê, armanca demokrasîyê jî wê, pêşxistina sosyalîyê a di aramî û rastiya wê de bê. Ku ew pêşxist

wê, hingî wê, weke ku ew gihiştîbê armanca xwe. Wê hingî wê, demokrasî wê, weke ku ew hatîbê pêşxistin bê. Ji aliyekê din ve jî ew mudahaleyên ku wê li jîyane mirov wê werina kirin ku ew hatina kêmkirin wê, ew jî weke aliyekê wê yê din bê. Di nava berpîrsîyarîyê û mudahaleyê de wê, xateke tenik wê hebê. Di wê rewşê de wê, ew berpîrsîyarî ku ew nebê mudahale li hevdû û ankû li jîyane mirov wê, hingî wê, ew wê, weke aliyekê wê pêşketina sosyalîteyê bi rastî wê bide dîyarkirin bê.

Dewleta sosyal ku ew li ser temenekê bi wê rengê dijî wê bêgûman wê, zêdetirî wê hebûna dewletê wê kêmtir nekê. Di wê warê de wê demê wê, dewlet wê demê ku ew bi sosyalî û ankû dewleta sosyal jî wê, mirov çawa wê fahmbikê wê, weke aliyekê din ê giring wê li holê wê bimênê. Ev çerçoveya bi dewleta sosyal re ku bi çend gotinan me xîzkir wê, zêdetirî wê hebûna dewletê wê, kêmtir nekê. Wê vajî têngînê liberalistan wê zêdetirî wê, di jîyanê de wê, xorttir bikê û wê bike navendek kifşkirinê. Bo ku ew sosyal dewlet bi navendî xwe biafirênê jî wê, ew wê, rast bibînê.

Di wê rengê hildana li dest a dewleta sosyal û razandina li sosyalîteyê wê, di aslê xwe de wê, bê weke lingekê ewlehiyê jî. Wê di wê rengê de wê, were dîtin. Mînaq rewşên weke bêkarîyê, kalbûnê, serbestîtiya cihêrengî a civakî, komên etnikî ên ji hev cûda ku ew hena wê, mirov dikarê werênê li ser ziman. Di aslê xwe de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, politikayên xate dewleta sosyal wê, demê ku mirov ji kîjan aliyê ve wê hilde li dest ku ew were hanîn li ser ziman wê, bi çerçoveyek armançî wê, were dîtin. Di nava jîyane sosyal de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, desthilatdarî wê, di wê rengê de wê, xwe bi wan razandinên sosyalî wê bikê ku ew hilde misogeriyê. Di wê rengê de wê, ev di çerçoveya xortkirina hebûna kontrola dewletê û bi hebûna wê re jî bê. Piştî salên 1990î dewleta sosyal ku wê, weke dîyardeyekê wê were ser ziman wê, dema ku ew di çerçoveya mantiqê têngîna dewletîya wê demê û ya roja me de wê, hilde li dest wê, ji rewşek sosyalî zêdetirî wê, weke rewşek kontrolkirinê a jîyane sosyal û bi wê re xortkirina serwerîya dewletî û iktîdarîya wê bê. Di wê warê de wê, sosyalîteyek rast a ku mirov wê, werênê li ser ziman ku ew ji aliyê civakî ve li wê dihizirê wê, kêmtir nekê. Ya ku em qast dikin jî ew sosyalîteya ku ew hatîya dîtin bê. Em ji aliyê civakê ve wê, hinekî derxî stretejiyên razandina li dewleta sosyal ê bi armanca xortkirina dewletê zêdetirî, bi awayekê ku wê, çawa wê, dewlet wê tenê wê weke sazîyek alîkar a civakê û ne serwerî wê li holê wê bimênê wê, di wê çerçoveyê de wê gihiştina li armançek rast a bi sosyalîteyê û razandinê li wê. Di rastiyê de wê, civake sosyal û ankû sosyalîteya civakê wê, weke rewşek sêyemin wê, dema ku ew serdest bû wê, bi rastîya wê re wê, were li ser ziman. Wê weke ya roja me wê ne di xîsmeta bişavtineka bi armanca xortkirina iktidarê de bê. Emê vê aliyê hinekî din li beşa li bin vê ku emê werênina li ser ziman a dema globalismê û di wê de wateya civakê, gotina netewê û keseyetîyê re wê, hinekî din li ser wê bisekin in. Ber ku ev nûqta wê, weke xaleka giring a ku mirov wê pêwîst bê wê bi rastî wê, fahmbikê. Heta ku ev birastî newê fahmkirin wê gihiştina li rengekê rast ê sosyalîteyê û ankû civaknasîyê bi jîyane civakî re wê, zor bê. Ji aliyekê din ve jî mirov wê nikaribê astengiyên li pêşîya wê fahmbikê û derbas jî bê.

### **Serdema global, xate sêyemin û politikayên wê**

Di mijare globalismê de wê, weke aliyekê giring wê, xwe bide dîyarkirin wê ew bê ku wê, têngîna netewtîyê bê. Di aslê xwe de wê, ev mijar wê, weke mijareka ku mirov

wê, dikarê bi giştî wê, di vê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman bê. Gotina netewê û ya civakê ez ji hevdû cûda dihênima li ser ziman. Di herikina nivîsa min a vê lêkolînê de jî min ew kir. Ez di wê bawerîyê de me ku mirov têgîneka civaknasî û ankû sosyali a rast wê fahmbikê mirov wê, li ser rewşa civakê û esasgirtina çerçoveya wê re wê mirov karê bi rastî wê, werênê li ser ziman. Civak wê, mejuya wê bi dîroka wê re wê hebê. Lê çerçoveya civakî ku ew bi gotina netewê re ew dihê li ser ziman mirov nikaribê wê, bo wê bêjê. Her çandî ku wê, li ser komên etnisîte re wê bikê ku ew xwe bînen li ser ziman û wê dîrokê binivîsênê û rayna ji xwe re weke kok bibînen û werênê li ser ziman lê wê, ew nikaribê wê rastiya netewê wê, werênê li ser ziman. Pirsgirêka netewê a dewletî wê ew bê ku ew ne di rewşeka fahmker a çerçoveya civakî a heyî de bê.

Di aslê xwe de wê, dema ku mirov gotina netewê wê, hilde li dest wê wê, di nava wê de wê, gelek komên ji hevdû cûda ku ew hatina bişavtin û ankû halandin wê hebin. Di wê warê de wê, ew rewşa wê weke rewşeka ku mirov wê, di wê rengê de wê, weke rastiyeke kosmopolitan wê fahmbikê. Ev rewş wê, ji hemû aliyên nîrxî ên weke zimanî, çandî û hemû aliyên din ve jî wê, wusa bê. Kesên ku ew di nava wê netewê de dihên li ser ziman wê, li ser wê re wê, weke ku wê têgîneka aîdiyetî wê bi re wê, biafirênin. Wê bi wê mazin bibin. Wekî din wê ew jî wê, di wê rewşê de wê, xwediyê rewşekê bin.

Di nava netewekê de wê gelek xalk, nasnema û komên cuda wê hebin. Ev kom wê xwediyê têgîneka li ser mejuya xwe ya ku ew li ser wê re mazinbûna bin. Di wê warê de wê, ew wê weke rastîya wan bê. Di mejî de wê, ti carî wê, ew kom wê ji wê rastiya xwe wê, nikaribin bi şûn ve gavê biavêjin. Ber ku ew rewş wê, ne tenê weke rewşna çandî wê hebin. Ji wê zêdetirî wê, weke rewşna ku mirov dikarê ji aliyê fîzyolojîkî û ankû biolojîkî ve jî wê hebin. Ku mirov tîpolojîya navaroka gotina netewê wê hilde li dest wê, weke çerçoveyek bêdîrokbûyî a civakî ku ew hatî pêşxistin û ankû derxistin li holê bê.

Di wê rewşê de wê netewê wê bo ku ew xwe li ser lingan bigirê wê, dagerên xwe yê giştî wê biafirênê. Wê dagerên din ên komên civakî ên ku ew hena ku ew, karibê wan nêtr bikê û nikaribê wê bikê wê bikê ku wan ji holê rabikê. Wê, di wê rengê de wê, bikê ku ew xwe saz bikê.

Î ro ku em li ser gotina netewê re herin emê, nikaribin civakek zelal a saf wê bibînin. Wê hemû jî wê, ji gelek gelên ku ew di wan de tevlêhevdû bûna wê mirov karibê wan bibînen. Mînaq wê, ji ji şerê rejîma îranê, îraqê, sûrî û tirkîya ê bi armanca tûnakirina hebûna civakê kurd ku wê, di encama dîyaspora civake kurd a li ewropa ku wê pêşkeve de wê, welatên ewropa ên weke fransa, almanya û hwd ku wê çawa wê bikevina nava hewldana girtina bergiran li hemberî **dîyasporaya** kurd a ku ev rejîmên herêmê ên weke rejîma tirk, ya îranê, sûrî û îraqê bi plankirî wê pêşdixin li cihanê. Lê li gelek deverên afrika û hwd jî wê di encama şer û rewşên weke tînenengezerîyê aborî û hwd de wê, ew pêşkevin li ewropa. Antony Giddens wê, di pirtûka xwe ya bi navê “third way: the renewal of social” wê bikişênê li ser wan bergirên van welatên ewropî ên weke firansa û almanya ên li hemberî herikina goçberîya kurdan. Bi wê rengê wê ji gelek welat û deverên din ên cihanê wê goçberî wê bibê. Di wê rengê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, ev rewş wê, weke rewşna ku wê, bûnyeya netewên din ên ewropa jî wê, bandûrê li wê bikê. Heta salên 1980 û pê de wê, weke civakna di rewşa xwe dijîn bin. Lê piştê wê, bi goçberîya ku li wan dibê wê, ne tenê pirçandîtî û zimanîtî wê bi wan re wê pêşkeve wê, ji wê zêdetirî wê, çerçoveya wan netewî jî wê, bandûrê li wê



bikê. Di wê rengê de wê, alikariya sosyali ku wê dewletên ewropî wê bidina wan goçberan jî wê, di çerçoveya 'entegrekirina' wan komên cûda di nava netewa xwe de bê. Bi gotineka din wê, di awayekê de wê, bê xistin temenekê bişavtinê ê xwezayî ku ew bi wê re pêşbixin de.

Di wê warê de wê, hevnasînek wê, bi demê re wê bi çandên hevdû re wê çandî ku wê çêbibê wê bi beremberê wê, dijminatîya li beyeniyan jî wê pêşkeve. Ev jî wê, weke rewşeka ku wê, mirov dikarê wê, di wê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman bê. Dijminatîya li beyeniyan wê, ji aliyekê ve wê teşwîkên iktidarî wê di temenê wê de wê hebê. Nexwe ku ew nebê wê, netewek kosmopolitan(\*) wê, bêgûman wê, piştî ku wê hevnasînkir wê, karibê bi hevdû têkiliyek bê hêstên dijber bi hevdû re dênê. Dijminatîya li beyeniyan wê weke bergireka serdestîya netewî wê were dîtin û wê li wê were nerin û wê were pêşxistin.

Rêvebirina global û ankû rêvebirina dema global wê, weke du têngîn û rengên rêveberiyê ên ji hevdû cûdabin. Ji aliyekî din ve jî wê, di dema global de wê, weke du rengên rêveberiyê ku wê di awayekê hîyararşikî de wê, hevdû temem bikin di reng û awayekê de wê, dîmenekê wê bide nîşandin. Di demek global de wê, rêveberiyek giştî a global wê çawa bê? Ankû divê ku çawa bê? Wê weke du pirsên ku em di wê çerçoveyê de di serî de li wê bihizirin. Di roja me de jî wê, di nava têkiliyên mirovan de wê, bi hevdû re wê, dem bi dem wê hêzên fizikî ên weke tûndûtûjîyê wê derkevina li pêş. Demna jî wê rêyên bi aqil wê werina bijartin û wê, bi wê re wê, pirsgirêk wê werina çareserkerin. Rastiya civakan û jîyane mirov û xwezaya wê, hertimî di wê meylê û rastiye de ya ku ew bi aqil, çand û politika ku ew çareserî di nava wê de were dîtin. Tûndûtûjî wê, weke rêyeka rûxandinê û tûnakirinê bê. Di wê warê de encama ku ew bi wê re were pêşxistin jî wê, mirov di rastiye de nikaribê wê, weke çareseriyekê wê herêbikê. Gotinên weke 'bi şer çareserkerina pirsgirêkan' wê, weke gotineka ku di wê çerçoveyê de bi çend gotinan jî mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Li pêşîya gotina pirsgirêkan li dûv hevdû rêzkirina gotinên şer û çareseriyê wê, di aslê xwe de wê, du gotinên ku wê bi wateya xwe re jî wê li hevdû nekin bin. Mînaq wê, çareserî wê, intiba û fahmkiirna ku mirov ji wê fahmbikê wê, bi têngineka nerm ku wê, li ser aqil re wê, were pêşxistin bê. Di wê warê de wê, gotina çareseriyê ku wê gotina şer li şûn wê were danîn wê, di aslê xwe de wê, bi hebûna xwe re wê, gotina çareseriyê wê ji wateya wê ya rast wê, wateyekê wê derxê li holê. Di encama şer de ew encama ku derket li holê em, çendî dikarin wê weke çareseriyê bi navbikin û wê bi wê rengê werênina li ser ziman? Di aslê xwe de wê, dema ku ez li wê dihizirim ez digihîjima wê qanaatê û qinyatê ku mirov wê, nikaribê wê encamê bi gotina çareseriyê re wê, werênê li ser ziman. Şer bi xwe jî wê, ne rêyeka ku wê bi wê re wê çareserî wê were pêşxistin bê. Gotina çareseriyê bi etimoloji(\*), morfoloji(\*) û watezanîya(\*)wê re wê, têngineka aqilane wê

-----  
 (\*)Etimoloji wê kokzanî bê. BI fahmkirina ji temen ve wê alaqadar bibê

(\*)Morfoloji wê, bi wateyê û awayê re wê, hem cûda û hem jî wê bi hevdû re wê di ahengê lêbikolê

(\*)Watezanî wê, zanina wateê û ankû maneyê bê. Wê di wateyê de çend mana hena wê ew wê bikê ku wê fahmbikê

bide me. Di wê warê de wê, mirov dikarê li ser aqil re wê fahmbikê. Dema ku rastî ev bê ku mirov wê karibê li ser aqil re wê fahmbikê wê, demê wê mirov karibê tenê û tenê wê bi aqil re wê, hilde li dest û wê werênê li ser ziman. Wê rêya aqil wê, mirov wê karibê weke rêya çareseriyê wê pênasebikê. Di dewama wê de wê, mirov karibê wê, di wê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman ku wê, şer wê tûna bikê û ji holêrabikê. Wê dema ku wê tûnakirin û jiholêrakirinkir wê, demê wê tiştêkê ku wê bi navê çareseriyê wê were li ser ziman jî wê, nebê. Encama şer bi gotina çareseriyê re hanîna li ser ziman wê, tenê û tenê wê manipulasyoneka bi armanca aqil ji rê birinê bê. Wekî din wê ne tiştêkê din bê.

Ji aliyekê din ve jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, di serdema gobal de wê, pêşketin bi aqil re wê, zêdetirî wê xwe bide diyarkirin. Wê jiyane bi sazûman a hemdem wê derkeve li pêş. Wê kirin, xwestek û pêşxistinên me yên di jîyanê de wê, di çerçoveyek ku wê hevdû temem bikim de wê werin û bibin. Wê, di wê warê de wê, mirov wê, bihizirê ku wê ya rast wê çî bê ku ew wê bikê. Wê pêşbixê. Di wê rengê de wê, sê têngî wê bi serekayî wê di dema aqil de wê, weke rêyên çareseriyê wê bi hevdû re di ahengekê de wê derkevina li pêş. Yek ji wan wê aqil û rengên aqil bin. Wê bi aqil wê mirov bihizirê ku wê rêyên rast bibinê bi wê re bigihijê encamê. Wê armancên xwe wê bi aqil wê bibê sérî. Wê di wê warê de wê, aqilê xwe di rewşan de jî ku ew têrî pêşxistin û çareserîya rewşan nekê wê bi kirinê wê pêşbixê û wê bênê wê astê ku ew têrê bikê. Ev wê, weke aliyekê pêşî bê. Aliyê din ê duyem jî wê, ramyarî û ankû kirina politika bê. Politika di çerçoveya wê hizirkirin û aqilê ku me di aliyê pêşî de hanî li ser ziman wê bibê û wê, ew wê were pêşxistin. Wê gotinên rastkirin û çareserker wê werina bikarhanîn. Zimanê dijbar, hevdû şikandin û hêrişî hevdû û rûmeta hevdû kirin wê newê bikarhanîn. Di wê warê de wê, dema ku ew were kirin wê kirina politika wê bixwe jî wê, bê weke rêyeka ji hevdû cûdakirin û manipulakirinê. Wê bê weke rêyeka ji hevdû dûrkirin û şikandinê. Wê di wê rengê de wê, weke aliyekê giring wê, mirov wê werênê li ser ziman ku wê, di demên global û ankû hemdem de wê zimanê bi wê rengê wê, weke temenê kaos û aloziyên ku ew werina pêşxistin jî bê. Di demên global de wê serbestî û mafûazadî wê zêdetirî wê derkeve li holê weke nirxna bingihînî. Wê li ser wê re wê pêşketin di jîyane mirov de wê bibin.

Weke aliyekê ku mirov wê, di serî de wê li vir wê, werênê li ser ziman wê, kirina politika ku wê bê temenê rastkirinê wê hingî wê, zimanê wê bi rengê aqilê wê re wê bi xwe re wê pêşbixê. Di wê warê de wê, gotinên ramyarîyî ku wê bi wan politika were kirin wê, karibin bi tememî temenê aloziyên demên global bin. Wê karibê bibê temenê hanîna hemberî hevdû. Di wê warê de wê, di roja me de wê, di rastiye de wê, hemû beşî zanistên civakî û civaknasî wê werina bikarhanîn ku ew ramyariyeka bizane a kontrolkirinê wê pêşbixin. Di wê warê de xosletên mirov, qarakter û rengên hizirkirinê û hewldanên dana wê kifşkirin û hwd wê, bi wê re wê werina pêşxistin. Di wê warê de wê, ramyarî wê, zêdetirî wê bi aqilekê kûr wê di roja me de wê were meşandin. Lê di aslê xwe de wê, çendî ku wê rewş wê ev bê wê, encamên ku ew dihên derxistin li holê wê, bidina nişandin ku wê, di pozisyonên dijber de ew dihê kirin. Her wusa pevçûn, herêm bi herêm şer û dijberiyên politikî ên li hemberî hevdû ku weke encam derkevina li holê wê rastiya wê zêdetirî wê vekirî wê raxina li berçav.

Di warê de wê, mirov dikarê weke aliyekê din ê sêyem jî bahse çandê bikê ku weke rêyek çareseriyê. Di wê warê de mirov wê çandê çawa wê weke rêyek çareseriyê wê

bikarbênê. Di serî de wê, mirov werênê li ser ziman ku wê, fahmkirina çandî wê, ji aliyekê ve wê, weke fahmkirina civakê bê. Di dewama wê de wê, weke aliyekê wê yê gûharînên çandî ku wê bibin bi kifşkirina wan re wê, bi pêşxistina rêyên jîyanê bi aramî wê, bi wê re wê, were ser ziman. Mînaqên baş û di çerçoveya rastiya aramiya jîyane civakê de wê, werina kifşkirin û ew werina mînaq girtin. Wekî din rêya çareseriyê di wê çerçoveyê de di nava çanda wê ya pêşketî de lêgerîna wê, weke aliyekê wê yê ku mirov wê, dikarê werênê li ser ziman bê. Kesên weke **Ernst Cassirer** ku wê li ser felsefeya çandê wê hizrên xwe bînin ser ziman wê, li ser tîgîna çandê wê bihizirin êw hewlbidin ku ew dihê çî wateyê û mirov wê çawa wê karibê wê bi pêşketina mirov û jîyane re wê fahmbikê. Di berhema xwe ya bi navê “Philosophie der symbolischen Formen” wê li ser çerçoveyek darêjkî re wê bikê ku wê fahmbikê wê bi dagerên ku ew hin bi hin mirov di jîyane xwe de diafirinê re wê, çawa wê bijî wê, bikê ku ew werênê li ser ziman. Cassirer wê giştîya amûrên ku mirov bi wê li hewirodra xwe serwer a wê, werênê li ser ziman. Di nava jîyane şariştanî de wê çand wê weke qadaka ku wê xwe bi wê salixkirin û hanîna li ser ziman bê. Di wê warê de wê mirov dikarê bi felsefîkî weke tîgîneka pêşketiner wê werênê li ser ziman? Di wê warê de wê, Freud wê, bi pêşketinê re di hemwateyê de wê werênê li ser ziman. Ji aliyekê din ve jî wê çand wê, ew bê ku mirov wê çawa şîrove û salixbikê bê. Weke dîyardeyên çandî ziman, huner, zanist, ol û hwd bi dîrokê û tîgîna dîrokê û jîyane şariştanî a cvakî re ku mirov wê hilde li dest wê, hingî wê, di wê rengê de wê, weke tîgîneka dîyarker wê xwe bide dîyarkirin. Hemû kirin û çerçoveya hizirkirinên me wê, bi wê re wê, mirov karibê werênê li ser ziman. Çand jî wê, weke tîgîn û felsefeya dîrokê wê, temenê xwe wê li ser ya heyî û bûyî û rûdayî re wê, bide dîyarkirin û wê werênê li ser ziman.

Cassirer wê pêşî wê dema ku wê çandê wê hilde li dest wê, mirov çî ya wê jî wê dest pêbikê û hilde li dest. Wê di dewaama wê de wê fenomen û dîyardeyên çandî çî na û çawa wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê werina fahmkirin wê bi felsefîkî wê li ser wê bisekinê. Çanda ku wê di temenê afrînerîya wê de wê, mirov wê hebê wê, bi azadîya mirov re wê pêşketina wê hebê. Lê tîgîna azadîyê wê, dema ku mirov wê hilde li dest bi çand, ziman, ol, huner, zanist, dîrok û dîyardeyên çandî û hwd re wê, mirov dikarê di çerçoveyekê de wê hilde li dest. Her dîyardeyek çandî wê, temenekê wê yê çandî, hunerî, zanistî û zimanî ê cûda jî wê hebê. Çerçoveya çandê wê, di serî de wê bi hevdû re wê, di ahengekê de wê, xwe bi awayekê ahengî wê bide dîyarkirin.

Mirov wê, li hemberî ya ku ew dijî û afirênê wê çandî wê xwediyê tîgîn û zaninekê bê? Di aslê xwe de wê, tişta ku ew çêkir ku ew dibêjê ez dizanim jî wê, bi demê re wê hin bihin wê karibê wê fahmbikê. Piştî ku gihişt tîgîhiştina wan wê, hinekê wê fahmbikê ku wî ew çêkirina û wê xwe weke afrînerê wan wê bibînê. Di wê warê de wê, di aslê xwe de wê, tişta ku ew hatî afirandin wê, bi hebûna mirov re wê, di ahengekê de wê, mirov dikarê wê fahmbikê. Lê bi hizrî li ser fahmkirinê re mirov dikarê di rewşna li ser re jî wê berheme çêkirî hilde li dest.

Di wê warê de wê çand wê, li ser cewherê wê weke salixkirinê ku mirov wê hilde li dest wê, di aslê xwe de wê, ji aliyekê ve wê li ser berhema çêkirî re wê, kêrhatîni û çêkerîya

-----  
 (\*)Cassirer, Ernst (1942) Logik der Kulturwissenschaften, p.7-34

(\*)Cassirer, Ernst(1923), «Philosophie der symbolischen Formen”», p.6-52

wê berhemê weke 'funksiyon wê' mirov dikarê wê, ji aliyekê ve wê, bi teybetî wê hilde li dest. Wezîfeya wê, çi bê wê, bi wê re wê were pênasekirin. Kirina weke bi funksiyon û wezîfeya wê, di aslê xwe de wê, ezmûnê wê bi xwe re wê pêşbixê. Wê ezmûn wê, mirov nikaribê wê bigiştî bi hijmaran wê fahmbikê. Lê mirov wê bi ceribandî û fahmkirinê re wê, dikarê derxê li têgihîştinê. Tiştêk wê kêrî çî were ku ew hat bikarhanîn wê, hingî wê mirov wê, wê fahmbikê. Lê her rewşên ku ew pêkwerin jî wê bo wê tiştê hatî bikarhanîn wê, weke reng û rewşek cerbî wê bimênê. Tiştêk ku ew bû wê ji gelek rewşan re wê mirov wê karibê biakrbênê. Di wê warê de wê, kifşkirina funksiyonên wê bi rewşî wê pîr zêde pêşbixê. Di warê girtina bi mejî û bandûrbûna wê bi wê re wê, li ser wan re wê bi salixkirina wê re wê dagerîya wê jî wê bi afirê û wê di di wê çerçoveyê de wê bi awayekê sazûmanî wê di ahengekê de wê hevdû di fahmkirinê de wê temem bikin. Çand wê dema ku mirov wê li ser aliyê wê yê afirê re wê hilde li dest wê, di reng û rewşek pêwîstî de wê xwe bide dîyarkirin. Rengê vebêjinên çîrokî, kirpandin wê weke aliyekê balkişandinê ê fahmkirinê û aliyê wê bi wateya gotinê re wê bide dîyarkirin bê. Di wê rengê de wê, hevdû temem bikin. Di aslê xwe de wê, rewşa fahmkirinê wê, di wê rengê de wê, bi kirinê re wê hevdû temem bikin. Çand wê aliyê afrînerîya bi aqil a di jîyanê de jî wê, bi xwe re wê, bide dîyarkirin. Di wê warê de wê, mirov dikarê balê bikişênê li ser aqilê kirinê û ankû rewşên kirinê ên ku mirov wan bi teybetî dikarê bigirê ji jîyanê. Dager(sembol) û nîşanek (simge) (\*) wê, di warê pêkhatinê de wê, bi morfolojîkî wê hevdû wê temem bikin. Wê weke du aliyên hevdû ên ku mirov nikaribê ji hevdû cûdabikê bê. Bi çandî ya ku mirov wê, dibînê wê, di roja me de ku em werênina li ser ziman wê di nava ya sekinîner û çalakbar(\*) de wê nakokîya wê, xwe li ser rewşên jîyanî re wê bide dîyarkirin. Wê di giştîya çerçoveya çandî de jî û yek bi yek di diyardeyên wê de jî wê, weke aliyekê wê karibê were kifşkirin. Çand wê, ji aliyê civakî ve wê, weke alî û temenekê giring ê fahmkirinê bê. Di nava wê de wê bi civakî wê gelek diyarde û fenomenên ku ew hena wê, di warê dîyarkirinê de wê, kifşkar bin. Li ser wê re wê, hebûna civakê wê, weke aliyekê kifşkar wê karibê xwe bide dîyarkirin. Çand wê bi awayekê şubjektîv wê, reng û awayê nerînê jî wê, bide dîyarkirin. Di wê rewşê de wê, rengên gavavêtin, pêşketin û ankû pêşxistina mirov jî wê bide dîyarkirin. Ev wê, weke aliyekê wê yê giring bê.

Di serdema global de wê, çand wê zêdetirî wê, hem weke dîyarde û fenomeneka kifşkar wê hebê û hem jî wê, weke aliyekê rengînî wê hebê. Di wê warê de wê, çand wê, ji kîjan herêmê bûyînê û çawa bûyînê û rengê mirov jî wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Felsefeya çandê wê, weke felsefeyek afrîner a ku mirov wê dikarê bi aqilê kirinê ên şubjektîv re wê, werênê li ser ziman bê.

Çand û civak wê, weke du lingên ku ew wê hevdû temem bikin bin. Çerçoveya çandî wê, weke çerçoveyek civakî bê. Sembol û sîmgeyên wê, di aslê xwe de wê, di wê warê de wê, weke têgînna ku mirov wan dikarê kifşbikê û werênê li ser ziman. Ji aliyê sembol û sîmgeyên wê ve çand wê, hebûna civakê wê bi stûnbikê. Wê weke têgîneka bi sazûmanî wê bi rastîya giştîya civakî re wê, were ser ziman. Çerçoveya çandê wê, hem bi dîrokê re û hem jî wê bi civakê re wê bi berfirehî û dirêjehiya wê re wê kûr bê û xwediyê pîr zêde hûrgilên ku mirov wan kifşbikê bin. Çand wê rengê pêşketinê jî wê çandî ku wê bi xwe

-----

(\*)Cassirer, Ernst(1923), «Philosophie der symbolischen Formen»», p.6-52

(\*)Geertz, Clifford(1973, in London), The Interpretation of Cultures, p.11-19



re wê bide diyarkirin û nîşandin wê, bi heman rengê wê, temenê wê yê pêşketinê jî wê biafirênê. Gotina çandê wê, çerçoveya wê pîrr zêde wê berfireh bê. Di roja me de di nava jîyane global de ku em bahse çandê dikin em gotina 'çanda hemdem' û ankû 'çanda pêşketî' bi kardihênin. Di nava wê çandê de wê, mirov bi keseyetîya xwe, komelên sîvîl bi erkên xwe, saziyên fermî bi berpîrsiyarîya xwe wê û hwd wê werina zanîn. Di wê warê de wê, dema ku wê bahse çanda hemdem wê were kirin wê bi têgihiştinî û morfolojikî wê gelek wate wê ji wê werina derxistin û hanîn li ser ziman. Di dewama wê de wê, were jîyankirin. Di nava cihane global de em bahse 'pîrrçanditîyê' dikin. Wê, dema ku wê gelek çand wê bi hevdu re wê bijîn wê, ji wê rewşê wê gav were avêtin û wê ev gotin wê were bikarhanîn.

Piştî salên 1991ê û pê de wê, dema ku wê cihane du-qutub wê ji holê wê rabê wê cihanek nû ku wê bi navê cihane global wê were şirovekirin û bi navkirin wê were li holê. Di wê cihanê de wê, gelemperî û serbestî wê, hem wê ji gelek aliyên ve wê hebê û hem jî wê beremberê wê, bi sînorkirin wê pîrr zêde wê, hebin. Civak wê, bikevîna pay hemdemîkirina xwe. Wê saziyên xwe yê hemdem wê bi felsefeyek nû wê, avabikin. Wê xwenûbikin. Dema ku wê gotina 'felsefeyek nû' wê were li ser ziman wê, berê wê gotinê wê li pêş bê û wê bi wê re wê, li ser têgîna mafûazadiyê, hildan li cidiyetê mafê mirov û hwd wê, bi wê re wê, weke wateyna kirdeyî ên sernûxûmandî wê bi wê gotinê re wê, werina li ser ziman. Di wê warê de wê, mirov wê bi awayekê weke ku me di hevoka li ser wê de hanî li ser ziman wê, berê mirov wê bi felsefîkî wê li pêşî wê bê û wê li azadî, mafûazadiyê, serbestitîyê û serbixwebûna di nava wê cihanê de wê li wê bigerihê. Di wê rewşê de wê, weke gotineka din jî wê, were li ser ziman ku wê, tahakkuma ti komên civakê wê li ser komên din ên civakî wê nebê. Bi heman rengê wê tahakkuma rêveberîyê dervî îredeya wan wê, li ser ti civakê wê, newê ferzkin.

Piştî şerê cihanê ê duyemin wê saziyên global ên sernetewî ên weke netewên yekbûyî û hwd wê werina avakirin. Wê, deklarasyonên destûrî ên weke 'her netew bixwe qadera xwe tayîn bikê' wê were pêşxistin. Wekî din wê, bi heman rengê 'deklarasyonên' weke yê mafê zarokan, mafê netewan, biryara mafûazadiyê. Mafê ragihandinê, mafê perwerdeyê, mafê serbestiyê û hwd wê, bi dehan deklarasyon wê werina pêşxistin û wê ji aliyê hemû endamên netewên yekbûyî ve wê were imzakirin û wê piştî wê bo wan wê bûhûrîner bê. Di wê warê de wê, ev destûrên ku wê bi mantiqê destûra gerdûnî wê werina amedekirin wê, ji rejim û rêveberîyan wê were xwestin ku ew destûrên xwe yê netewî jî li gorî gîyane wan sererast bikin. Wekî din wê, dadgeha cezayê a navnetewî, dadgeha mafê mirovan a ewropa û hwd wê, hinek ji wan minaq û gavavêtinên ku em li ser têgîna dadî û destûrî re wê werênina li ser ziman bin. Di wê warê de wê, Gelek dozên ku em dikarin weke 'emsal' li vir wan bibîrbikin ku ew di dadgehên navnetewî de bûna werênina li ser ziman. Minaq wê, darizandina serokê dema yugoslavya Milosovic li Leheyê wê, tenê wê minaqek bê. Di wê warê de kesên ku weke sucên li dijî mirovatîyê kirina û ankû sucên şer kirina wê, werina derizandin. Di wê warê de wê, gelek doz wê hebin. Lê vajî wê jî wê, gelek kesên ku wan sucên şer û dijmirovatîyê kirina ên weke serokên rejima tirk ên weke T. Ardogan çendî ku wê bajarên kurdan bi serê wan de wê bi rûxênê û ji dîrokê bibê. Wê bi deh hezaran kurdan wê ber ku ew kurd in wê qatîlbikê wê, ew ji nedîtî ve wê were dîtin û wê newê derizandin. Li vir wê sedema wê rewşê wê çi bê? Li vir di aslê xwe de wê, li şûna ku wê tîkiliyên destûrî û bendên wê esas bihetan girtin wê, li şûna wê, tîkiliyên li ser hêzên hegomonîkî ve wê

were li berçav girtin û wê ev wê, ji kesên bi wî rengî re wê, bê weke mirtalek ku ew ji sucên ku wan li dijî mirovatîyê kiriya ew ji wê newina derizandin. Endamtîrya tirkîya a li nava NATO û tîkiliyên hêzên hegomonik ên weke Rusya û amariika a li hemberî hevdu wê, hinekî wê, di rewşên weha de wê, kifşkar bê. Dadgehên navnetewî ên suc wê, çendî ku wê weke hewldanaka rast û di cih de bê lê wê, ji bin bandûra hêzên bi vî rengê ên serdest û politikayên wa rizgar nebê. Wê ev dadgeh jî wê bina qadna şerê hegomonikî ên li hemberî hevdu. Wê di wê warê de wê, bêalîtiya wan ya bi dadî wê mirov dikarê ji wê aliyê ve bikê berlêpîrsînê de.

Wekî din jî wê, mirov dikarê rewşa rêveberiyê a di wê demê de werênê li ser ziman. Di warê rêveberiyên giştî de î ro weke neteweyên yekbûyî yekîtiya ewropa wê xwediyê sazûmanaka li berçav bê. Rêveberîya yekîtiya ewropa wê, ji hemû endamên wê pêkwere. Wê parlamene yekîtiya ewropa wê hebê. Wê saziya konseya ewropa wê weke konseyeka serbilind û xwedî biryar wê hebê. Dadgeha ewropa wê ku wê karibê dozan ji hemû welatên endamên ewropa wê bigirê bi takekesî wê hebê. Di wê warê de saziyên weke WTO, IMF, bankaya dunyayê û hwd wê hebin. Wekî din jî wê, saziyên aborî ên weke «Organisation for Economic Co-operation and Development(OECD)» ku wê rastarast wê li ser mireteya hevkarîya ewropa a aborî a bi navê «Organisation for European Economic Co-operation (OEEC)» wê were avakirin wê, xwediyê çerçoveyek giştî a sazûmana aborî a di çerçoveya ewropa û cihanê de jî bê. Di wê warê de wê, ev sazî û gelek saziyên weke wan wê werina avakirin. Wekî din saziya welatên ku ew nîftê difiroşin a bi navê «Organization of Petroleum Exporting Countries» wê, hebê. Di wê warê de ev saziyên ku wê weke saziyên global jî wê, werina pêşxistin wê di roja me de wê, weke saziya ku wê politikayên hegomonik ên cihane global wê bidina kifşkirin bin.

Ku mirov wê rewşa rêveberiyên giştî wê hilde li dest wê, di wê warê de wê, weke rengêkê giştî wê, hinek ji wan piştî şerê cihanê ê duyem ku ew bi dawî bû wê werina avakirin û hin ji wan jî wê piştî rûxîna yekîtiya sovyet wê, werina avakirin. Di wê rengê de wê, ev sazî wê, weke saziyên ku wê aborîya cihanê û politikaya wê hegomonik a giştî ku wê birêvebibin bin.

Di nava wê rewşa cihanî de wê mirov wê hertimî wê li dadê û maf û azadiyê wê bigerihê. Wê şerên imtiyaza dewletan a li ser serê civakên cûda ên din wê dawî li wê newê. Komên etnikî ên cûda wê di bin rêjeya zêde mazin a komên etnikî ên mazin de wê bîn tafisandin. Li ispanya rewşa qatalan, baskê, li ingilistan rewşa galler û iskoçya û irlanda, li tirkîya, iran îraq û sûrî rewşa kurdan, ermenîyan, asûrî û gelek komên din ên ku ewî ro hema bêja hatina ji dîrokê birin û hwd mirov dikarê navê wan werênê li sr ziman.

Lêgerîna li dadê wê, weke tîgîn û helwesteka ku wê di roja me de jî wê di cihane global de wê, were kirin bê. Hê jî ew dada ku mirov xiyale wê dijî û mafûazadiya ku ew dixwezê bigihijiyê de wê, ne ketibê dest de. Di wê warê de wê, rewşa bîndestiyê wê, di bin rewşa rêveberîya rejîman û rêjeya mazin a netewên ku ew bi halandina li nava hevdu re ku ew hatina çekirin re wê were pêşxistin. Di wê rengê de wê, cihane global wê, di aslê xwe de wê, ji salên 1990î û heta roja me, piştî rûxîna yekîtiya sovyet û piştê wê, rewşa wê, bişibihê wê rewşa dema rûxîna yekîtiya sovyetê. Bêdadî û ankû bêadeletî wê, di nava cihane global de wê li ser dewletan re wê, were meşandin. Wê li şûna mafûazadiyê, azadî û wekhevîyê wê, şerên hegomonikî wê pêşkevin û wê ew wê weke

dîyarde û fenomenne ku wê rengê pêşketina cihane global wê bidina dîyarkirin. Piştî salên 1990î û pê de wê şerê kendavê wê pêşkeve. Piştîre wê, li gelek deverên din ên cihanê wê ev şer wê bidom in. Piştîre wê heta pêvajoya mudahaleyên li libya, sûrî û hwd re wê ev pêvajo rewş wê hebûna xwe wê bide domandin. Di aslê xwe de ev pêvajoyên mudahaleyê ku wê bi çî hêncetê wê werina kirin û wê çî propaganda wê bo meşrû dayin nîşandina mudahaleyê ku wê werina kirin jî lê wê, tenê nikaribin rastiyê ji berçav dîrbikin. Ew jî wê bêdadî û ankû bêadeletîya ku ew bi serdestî dihê domandin bê. Î ro li cihanê wê bahse civakên ku ew cûda hena û dijîn li dora 2000 wê bê kirin. Lê tenê 200 netewên ku ew ji wan hatina pêşxistin wê, nimînêrên wan di netewên yekbûyî de wê xwediyê temsiliyetê bin.

Di wê rengê de wê, ev cihane global wê, bêgûman wê dem bi dem wê pêwîstî pêvajoyên xwe nûkirinê bê. Di wê warê de wê piştî rûxîna yekîtiya sovyet û heta roja me ku wê nêzî 19 sal wê bi ser ve derbasbibin weke dema global lê wê, piştî wê re wê, çawa wê xwe bi saziyên xwe re wê ev rewşa cihane global û saziyên wê werina nûkirin û ankû di başkirinê de wê werina derbaskirin wê, ez wê bi tememî nizanîm. Lê weke pêwîstîyekê wê ev wê, li ser rewşa mafûazadiyê, wekhevî û azadiya ramanan, azadiya civak û komên civakî û herêmî ên ku ew dijîn û hwd re wê, mecbûr bê ku ew wê bikê. Wekî din wê ev rewşa bi navê globalismê a roja me ku mirov wê di rengên wê yên weke rewşa şerê nava hêzên hegomonikî ku wê dide dîyarkirin û ji sefeletekê ne wîrdetira wê, di roja me de wê temenê hemû şerên roja me wê bîafirênê. Globalism heta ku ew bi felsefeyeka ku ew bi her awayê ew şer ji nava têkiliyên mirovan derdixê ku ew pêşnekeve wê, mirov nikarê bahse pêşketineka di her demên wê de bikê. Ev jî wê, di nava cihaneka ku wê bi rengê şerê xwe dewlemendkirinê û yê aborî ku ew dihê pêşxistin de wê çendî bi derfet bê ew jî wê, dem wê şanî me bide.

Di aslê xwe de wê, dema ku em nûha bi wê rengê bahse vê rewşê bikin em dikarin balê bikişênina li ser rewşa radikalisma bazaerê jî. Di wê warê de wê binerîneka aborî wê, cihane global wê were sazîkirin û wê li wê were nerîn. Di aslê xwe de wê, ev rengê nerînê wê, temenê hemû nexweşî û bêaramî û aloziyên ku wê rûbidin jî bê. Piştî şerê cihanê ê yekem wê dema ku wê di sale 1928-9an de wê, tengezerîya aborîyê wê rûbide wê, ew tengezerî wê, bi xwe re wê ne tenê wê şerê cihanê ê duyem bi faşîzma nazîyan re wê bi xwe re wê werênê wê, jî wê zêdetirî wê tiştêkê din jî wê bide nîşandin. Ew jî wê ew bê ku wê, rewşa kapitalismê wê xwe bi tengezeriyên dem bi dem ku wê bijî wê, bi rêvebibê wê were kifşîkirin. Wê piştîre wê, teorîyên mazinbûn û piçûkbûnê ên li ser teorîyên aborîyê re wê werina pêşxistin. Di wê warê de wê, ev tengezerî û şerên ku wê rejîm wê hem li hemberî civakên dervî xwe wê bidin û hem jî wê li dijî komên civakî ên ku wan di nava sînorê xwe yê ku ew 'kontrol dikin' de ku ew pêşdixin wê, bi hevdû re di ahengekê de wê bimeşê. Di rewşa tengezerîya aborî a dema Boris Yeltsin li Rusya û piştî wê re politikayên ku wê piştî dema wê hatina ya Putin re ku wê werina pêşxistin re wê, vê rewşê wê jî aliyekê din ê hegomonikî ve wê bidina dîyarkirin. Wekî din tengezerîya maksîka di sale 1994 û di dewama wê de ya başûr rojhilat asya ku wê were û pêşkeve wê, di wê rengê de wê karîbê tégînekê baş bide me. Di dewama wê de li tirkîya hertimî bi rêveberîyeka ku ew weke rejîma demên tengezeriyê ku ew civakê bi rêve dibin wê, bi tengezerîya aborî a ku ew dijîn re wê, şerê ku ew li dijî civake kurd dimeşênin re wê bi hevdû re wê bidina domandin. Di wê rengê de wê, ev wê, weke aliyekê giring ê cihane global a roja me wê xwe bide dîyarkirin. Ji aliyekê din ve jî wê,

cihane global wê, sînoran wê ji holêrabikê û wê pereyên germ ên ku ew di gerinê de na wê, zêdetirî wê rewşên tengezerîyê wê, bidina bi şûnve xistin. Tenê di salên 1997an de wê li endonezya, filipin, melezya û taylandê wê, pereyên ku wê li wan werina herikandin wê di salekê de li dora 100 milya dolar û zêdetir jî bin. Welatên weke tirkiya ku ew nêvî mirî wê, bi deynên ku ew ji bankaya cihanê, IMF û welatên dordorê bigirê wê aboriya xwe ya demên tengezerîyê wê bi rêvebibê. Wê bi wê re jî bo ku ew civakê manipulabikê û heya ti kesekê neçê li ser wê, hertimî wê şer li dijî civake kurd wê gurrbikê. Ev jî wê, weke renekê politikayê ên bi rêvebirina civakê ji aliyê rêveberîyên demên global bi politikayên desthilatdarî. Wê bazar wê were serbestkirin. Wê bi serbestî wê ew gerîn wê bibê.

Serbestî wê, aliyekê politikayên aboriyê wê bidina diyarkirin. Lê wê pêşiya tengezerîyê wê negirin. Tengezerî wê, dema ku wê bibin wê, tenê wê bi pereyên ku ew hatin û çûn re wê, hasabê wê bê kirin û bê danîn li pêşiya civakê. Lê meliyeta wê ya bi civakî û aborî ku ew dibê wê, di aslê xwe de ew newê kirin. Yan jî wê, ji berçav wê were dûrkirin. Di wê warê de wê cihane global wê, bi awayekê mirov dikarê bahse rê rengên politikayên aboriyê ku wê bi hevdû re wê, were meşandin bikê. Yek wê li ser serbestîtiya liberal re wê mirov karibê bikê. Ya din li ser rêveberîya dewletê re wê, bi awayekê karma ku wê weke aboriya civakê jî wê, were pênasikirin bê. Aliyê din ê sêyem jî wê aboriya dervî qaydê ku ew weke aliyekê kifşkar ê aboriyê bê. Bi aboriya dewletî a bi sînor a karman re wê civak wê were bi rêvebirin. Lê li ser wê re wê, aboriya serbest û gerîner a bazarê û borsê wê, ew wê, weke aliyekê din ê di çerçoveya politikayên hegomonikî de wê mirov dikarê werênê li ser ziman. Di wê rengê de wê, ev aborî wê, ji wê ve wê li politikayên cihane global wê were nerîn. Ew nerîna dewleta markentilist(\*) a ku wê armanca xwe dewlemendkirinê wê pêşbixê wê, ew di roja me de wê derkeve li ser dewletê re wê, weke aliyekê ku ew rengê bazara gerîner û borsayê dide diyarkirin bê. Di wê warê de wê, dewlet wê tenê ji binî ve wê weke saziyeka kontrol çêker a bi wê ku ew civakê bi sazûmana wê re di dest de digirê û ew bi wê re refaha malbatê û kes di rewşek û astengê de digirê wê bi wê ve wê alaquadar bê. Minaq wê, kesek wê, bi salan karbikê ku ew bibê xwediyê malekê ku ew malbata xwe di wê de bistirênê. Lê ew bi salan karkirinên wî û amûrên ku wî çêkirina wê, aboriyê dewrûdayim bikin bê ku ew wê bibînê jî.

Di wê warê de di aslê xwe de wê, ji binî ve wê pêwistî bi dahûrkirina dewletê û erkên wê yên dema globalismê û salixkirina wan wê hebê(\*). Di wê warê de zelalî û saffîtiya ku ew di kirinên xwe de bikê wê, divê ku mirov wê hinekî bibîrbikê. Di wê rewşê de wê, saziyên dewletê wê weke saziyna ku wê, li ser rewşa erka wan re wê zêdetirî wê werina pêşxistin. Di wê rengê de wê, têkiliya aboriya mazin a bi deh hezaran milyar dolaran a di bazarê û borsayê de digirê û kifşdikê wê, ji temen ve wê, weke alî û destekê ku wê civakê wê, di xizmeta pêşketin û parastina wê de bide girtin bê. Di wê rengê de wê, çendî ku wê bahse piçûkkiirna dewletê ji aliyê liberalistan ve wê were kirin jî lê wê bi erk û payên ku ew danîna li ser milê wê, bi awayekî dîtî û nedîtî wê, dewletê wê zêdetirî wê, bihêz û mazin bikê. Wê ji aliyê aboriya mazin a bazarê û borsayê ve wê bê piçûkkirin ku ew ti carî mudahaleyê li wê gerîna wê nekê. Lê wê li ser serê civakê û girêdana endamên civakê yek bi yek bi wê ve jî wê, li ser wê re wê, weke saziyeka ku wê ji wê dest newê berdan wê were pêşxistin. Di wê rengê de wê, ev wê, xwe bi awayekê din wê bide diyarkirin. Rewşa sabitkirina kurên dowîzan û bi wê re wê,

borsayê bi rêvebirina wê, di aslê xwe de wê, têkiliya wê ji temen ve wê sazûmana civakî a ku wê, bi dewletê wê were avakirin ve wê hebê. Her çendî ku wê bahse aborîya serbest a borsayê û bazarê jî lê wê, mirov nikaribê ji wê cuda wê hilde li dest. Qaxizên bi qadr ku wê, bi carekê wê dema ku ew dest di gûharênin wê di dest de wê ji sifirê wê dewlemendiyek bêhempa wê pêşkeve wê, di wê rengê û awayê de bê. Ev jî wê, weke regekê politikaya aborî a dema globalismê bê. Lê dema ku ew aborîya mazin ku ew bi rastî ew ji wê qada leyistina bi bazarê û borsayê biheta derxistin û bikiran xismeta pêşketina civakê de wê, di aslê xwe de wê hemû civakên civakê wê bi xwezayê wan ya ku ew dihê talankirin re wê werina parastin. Di aslê xwe de wê, ev rewşên aborîyê wê, civakê wê ji gelak aliyan ve wê bînin ber telukeyên mazin IMF û GATT û hwd wê, bo ku ew tengezerîya aborî a salên 1928-9an bide derbaskirin wê were avakirin. *Bretton Woods* û hwd wê, piştî şerê cihanê ê yekem wê bo ku ew li dijî feleketên mazin ên weke depresyonên mazin ên aborî ku ew bijîn, bo ku ew ji tengezerîyê derbasbikê wê werina pêşxistin. Ev sazî wê yek jî ji wan wê ne saziyên ku ew bo aborîya dema cihane global bin. Di wê warê de wê gelek tengezerîyên ku ew nikarin pêşîya wan bigirin jî wê, hewlbidin ku ew di bin perdeyê de wê bidina derbaskirin. Di wê warê de wê, bi mantiqê saziyên demên şerê cihanê ên yekem û duyem wê demek global wê bi rastî wê çawa wê pêşkeve wê, di aslê xwe de wê minaqên wê bi tengezerîyên civakî û aborî bi hevdû re ku wê werina jîyankirin re wê mirov karibê werênê li ser ziman.

Di wê rengê de wê, saziyên weke yên netewên yekbûyî wê ne saziyên aborî bin. Lê di aslê xwe de dikarê ew bi nûkirina wan a li gorî demê re wê ne tenê saziyên kontrolkirina aborîya giştî a global herêm bi herêm di bin banê de were pêşxistin wê, weke din bi wê re saziyên civakî herêm bi herêm wê di wê çerçoveyê de ku wê bi encamên wê re wê, li ser bisekinê wê pêwîstî bi wan wê hebê. Di warê de ku mirov di dewama wê de bêjê wê saziyên giştî ên ku wê giştîya cihanê û civakên wê pêşwazîbikê wê, saziyên giştî ên global ên bo wê pêwîst bin. Ya ku ew heta roja me jî ne hatina sazîkirin wê ev bin. Di wê warê de saziyên bi wê rengê ên ku wê, hemû milletên cihanê di bin banê de wê lev kom bibin ew, divê ku ew bi tememî makanîsmayên bi giştî li her deverên cihanê ên li dijî pêşxistina şer bi awayekê aktiv pêşbixê. Divê ku ne tenê çend netewên ku ew hatina pêşxistin di bin banê wê de hebin. Divê ku hemû civakên li cihanê dijîn, li piçûkatî û mazinatiya wan newê nerin û ew nimînêriya wan were pêşxistin. Ya ku li pêşîya bi regekê nimînêrkirina(temsilkirin) bi wê rengê wê di serî de wê netewên ku ew di wir de dihên nimînêrkirin wê ew bin. Lê divê ku ew di serî de were fahmkirin ku ew nimînêriya wan nabê wê nimînêriyeka giştî û rast wê mirov nikaribê bahse wê bikê bê. Di wê warê de cihane global wê bi gelek aliyan din re wê mihtacê nûkirina wê bê.

Di warê de wê heta roja me wê du rewş wê bînin bi gotinkirin û wê di nava cihane global de wê derkevina li pêş. Yek wê nediyariya globalî bê. Di wê warê de wê, ev gotin wê karibê wê ji gelek aliyan ve wê, mirov karibê wê werênê li ser ziman. Nediyarî di rewşên aborî, jîyanî û gelek aliyan din de jî bê. Wê herikina jîyanê wê bi kûve wê werê û wê çawa wê herê wê, li ser nediyariya wê re wê xwediyê wateyê bê ev gotina

-----  
 (\*)Vaggi, Gianni; Groenewegen, Peter (2003), *A Concise History of Economic Thought: From Mercantilism to Monetarism*, p.6-47

(\*)Giddens, Antony (2000), *third way: the renewal of social*

nedîyarîya globalî.

Di rewşa wê de wê, cihane global wê, dema ku wê mirov li wê bihizirê wê ji aliyekê din ve jî wê, gotina derfetên ku ew cihane global diafirênê bê. Ev gotin jî wê, weke gotineka ku wê, di wê warê de wê, bi rastî jî wê, weke wateya ku ew li wê dihê kirin wê bi wê re wê di ahengekê de wê, xwediyê pêşketinekê bê. Derfetên ku ew dibin wê, wê rastiya cihane global û bi awayekê dîtbarî ji holê rabûna sînorên fizikî ku ew hatina ji holê rakirin wê, bi wê re wê biafirin. Derfet wê, di her warê de wê, biafirin. Wê pirrrengî di afrînerîyê û pêşwazîkirinê de wê biafirê. Ji her deverên dunyê wê, amûrên xwarinê û vexwarinê, li xwekirinê û hwd wê, bên gihandin li hevdû. Wê bi wê re wê ew cihane global ew derfetên ku ew diafirênê wê, bi wê re wê, temenê wê li ser cihaneka ku ew li hevdû hatî entegrekirin re wê bibê. Di wê warê de gotinên weke 'dunya bû weke gundekê' wê piştî salên 1990î wê werina bilêvkirin. Di wê warê de wê, serxwebûna dervî fahmkirina globalismê û jîyankirina li gorî rêgez û destûrên wê, ji holê rabikê. Wê ew awayê serxwebûnê wê, bê awayekê tecrid û îzoleyê bo yên ku wê, dihênina li ser ziman. Wekî din ew rêgez û destûrên cihane global wê, bi wê re wê berpîrsîyarî wê weke aliyekê din ê wê têgînê ku wê bê hanîn li ser ziman bê.

Ji aliyekê din ve jî wê, rewşa cihane globalismê wê, astengî û aloziyên wê yên ku ew diafirin wê, dîktator û despotên ku ew derdikevin bin. Ev kesên ku wê, dem bi dem wê, rêyên bijartinê ên weke demokrasîyê wê bikarbênin û wê bênina ser desthilatdarîyê wê, vajî rastiya jîyanê a ku ew li gorî wê tevbigerihiin wê, pêvajoyên şer, aloz û hwd wê pêşbixin. Li tirkiya rewşa T. Erdogan û hwd wê, bi wê rengê bê. Weke wî li deverên din ên cihanê wê minaqên din jî wê werina dîtin. Di wê rengê de wê, desthilatdarîyên li ser esasê malbatî wê, temenê wan ê jîyanê wê ji holê rabê. Ji aliyekê ve wê gelek kes wê weke ku em di nava kurdan de bi malbata berzanî û ya talabani re dibînin wê şerê wê li hemberî civake xwe bixwe bi alikarîya hêzên ku ew hêrişî civake wan dikin û civake wan û welatê wan di nava wan de hatîya qatkirin wê ew wê li dijî civakê wê bikin. Weke kirinên ku wê ti carî di mantiqê cihane global de wê newina herêkirin bin. Bi awayekê dîtbarî jî bê wê, mecbûr bê mirov ku ew li ser esasê civakê ew rewşekê bi civakî pêşbixin. Ev rewşa nava kurdan wê, hewldana serdestkirina aloziyan bi hebûna van herdû malbatan wê armanca wê jî wê ew bê ku wê çawa wê pêşketina civakî a civake kurd a netewî û civakî wê bi wê ser binûxûmênin û pêşîya wê bigirin jî bê.

Bêgûman wê çendî ku wê derfetên mazin wê di nava cihane global de wê biafirin jî wê bi heman rengê wê, rewşên ku wê karibin zirerên mazin jî biafirin wê bibin. Minaq wê, rewşên weke bêadeletî û weknehevîyê ku ew pêşdikevin wê, ji holê wê newê rakirin. Di wê warê de wê, rewşên civakî wê, di wê rewşê de wê, di nava makanismayeka bi wê rengê de wê, bê girtîgehkirin. Pîrsgirêkên civakî wê, rewşên weke yên dagirkirinê û metingerîyê ku wê, bi şewayên nû wê hebûna xwe wê bidomênin. Her wusa rejimên ku ew şerê imtiyazê û serwerîyê li ser serê civakên dervî xwe didin û hewl didin ku ew pêşaroja wan di bin kontrola xwe bikin wê, weke aliyekê din ê ku wê temenê şer, pevçûn û aloziyên serdemê ên her demê jî bin. Tenê pêvajoyên şerên herêmfî ku wê, ji salên 1990î herêmfî wê ji aliyê rejiman ve li dijî komên civakan wê werina pêşxistin wê, vê rastiye wê zêdetirî wê piştrastbikin. Ji aliyekê din ve jî komên tundrew ên ku ew hatina pêşxistin û wê bi dehan salan wê bi hebûna civakan û pêşketina wan re wê şerê tûnekirinê wê bikin ên weke DAÎŞ, boko-haram, taliban û hwd wê, tenê hinek ji wan rewşên ku mirov bi aloziyên demê re werênê li ser ziman bin. Wê

ev minaq wê bi serê xwe wê pêşnekevin. Wê bi alikariya rejimên herêmi û li gorî armancên wan ku ew dihên bikarhanîn wê werina pêşxistin. Bi awayekê wê, ev rewş wê rengê şerên li dijî civakan ên serdestiyê ên pîr xirab û zalimane ên demên global wê ev rêxistinên tundrew wê hildina li ser milê xwe li ser navê rejimên herêman ên ji wan re alikar û ku ew wan bo armancên xwe bikardihênin.

Pirsgirêkên cihane global wê zêdetirî wê, bi ekolojîkî, civakî û bi weknehêviyê re wê xwe di wê rengê de wê bidina diyarkirin. Pirsgirêkên xwezayî û civakî wê li ser aboriyê re wê bandûrê li hevdû bikin. Wê mirov wê xwezaye ya ku ew di nav de dijî wê çawa weê biparêzê wê, weke aliyekê jîyanî bê. Parastina hewayaya paqij, hewirdorê û bi wê re pêşxistina civakek bi berpirsiyar li dijî hewirdora xwe wê, weke pêwîstiya cihane global bê. Di wê warê de wê pirsgirêka rast fahmkirin û bi wucankirina aboriyê wê, di nava demên cihane global hertimî wê, weke aliyekê ku wê, temenê pirsgirêkê bê. Di wê warê de hewldanên bo kar zêde hilberînê û firotinê bo dewlemendbûnê wê, zêdeyî wê, gasa bi jahr wê bê berdan li birchê û wê lewitin wê pêşkeve. Ev wê, weke mijareka ku wê bê mijare tekoşîna xwezayê a bi ekolojîkî jî.

Di dema globalismê de wê rêveberiyek ku ew dikarê bersivê bide xwestekên civakî wê, hertimî wê li wê were lêgerîn. Wê, di wê warê de wê, politikayên pêşxistina civake sosyal, ji holê rakirina bêkariyê û hwd wê, ku werina pêşxistin. Di dewama wê de wê, rêveberî wê, çawa wê, bersivê bide civakê û endamên wê, weke aliyekê din ê giring ku wê derkeve li pêş bê. Hildana xwestekan li cidiyetê û misogerkirina pêşaroja komên civakî ên cûda û ji wan re çêkirina derfeta jîyanê û xwe hanîna li ser ziman wê, weke aliyekê giring bê. Wê bi zêdeyî wê, ev rewş wê, derkeve li pêş. Ev ne tenê wê weke pêwîstiyeka roja me bê. Wê ya her demên piştî ku wê werin jî bê. Ber ku wê civak wê di her demê de heta ku ew bijî wê, komên cûda wê ji nava wê biafirin û wê derkevina li holê. Cihane global wê, di roja me de wê, herî zêde pirsgirêkên desthilatdariyê ên bi armanca serdestiyê û qizincirina imtiyazê li ser serê civakên din re wê xwe bidina diyarkirin. Di wê rengê de wê, çêkirina civakên mazin û ankû halandina wan li nava hevdû wê, bi armanca xwe gihandina hêzek mazin bê. Di wê warê de wê, bi gotinekê jî mirov divê ku wê bêjê ku wê, rengên rêveberî û desthilatdariyên dema global û pêşketina wan em jî zêde nikarin bi mantiq û felsefeya wê re bahse wê bikin. Di wê çerçoveyê de pirsgirêkên civakî û hebûna civakan wê weke pirsgirêkên sereka ên demê bin bi wê rengê hizirkirina desthilatdariyên demê re.

### **Encam bo vê beşê**

Piştî salên 1990î û pê de wê rewşek nû wê bi navê cihane global wê derkeve li holê. Di nava wê de wê, gelek rewşên ku ew werina fahmkirin û salixkirin wê biafirin. Di dewama wê de wê gelek rewşên nû jî wê derkevin. Çap wê, piştî ji holê rabûna 'reel sosyalismê' wê, hin bi hin wê bêhêvîbibê di xwe de. Wê di gîyaneka xwe radestkirî de wê bijî. Projeyên hizrî û teorîkî ên bo civakî û wê dema wê, di mejiyê wê de wê nebin. Her wusa wê, şaşkinbûnekê wê li ser rewşên weke yên demê re wê bijî. Di warê de pêşxistina dewleta sosyal, demokrasiya sosyal û her wusa demokratizekirina demokrasiya ku ew di roja me de bahse wê dihêkirin de wê, kêma gavavêtin wê werina avêtin. Wê her tişt ji ba û insafa rêveberiyên ku ew tekoşîna xwe serdestkirinê bi bihayê ji dîrokê birina komên civakî didina re wê bê hiştin. Di wê warê de wê, rewşek global bi

rastî ku wê, ne hafî fahmkirin û wê bi rastî jî wê di dîmenekê aloz de wê xwe bide dîyarkirin wê derkeve li holê.

Pirsgirêka serdemên global wê yek jî ji wê wê derfeta xwe hanîna li ser ziman bê. Mînaq wê, bi çandî, civakî û zimanî wê civake kurd wê heta roja me jî wê ji aliyê rejimên herêmê vew wê zimanê wê were qadaxakirin ku ew bi wê xwe bijî, perwerde bikê, werênê li ser ziman û biafirênê. Di wê warê de wê tekoşîn wê zêdetirî wê bi aqil û rengên aqil û sazûmankirina bi aqil re wê bimeşê. Bi aqil ji pirsgirêkan çareseriyên aqilane dîtina wan wê, weke aliyekê ku wê, giringîya wê, her ku wê herê wê zêdetirî wê were dîtîn û fahmkirin bê. Di wê warê de xwe hanîna li ser ziman wê, temenê pêşketina mazin bê. Di serdema global de em bi gotinekê bahse hêza aqil bikin ku wê, çawa wê hin bi hin wê hêza gûharînê wê bi xwe re wê, biafirênê.

Ji aliyekê din ve jî wê, rejimên herêman wê ji aliyekê ve wê, şerê li dijî pêşketina artarnatifên xwe wê zêdetirî wê bi civakê re wê bidin bo ku ew demek dirêj li ser desthilatdarîyê ew bimênin. Di wê warê de wê, tekoşînek civakî bi aqil û hêza aqil û pêşketinên aqil re wê, zêdetirî wê xwe bi derfetên xwe re wê bide dîyarkirin.

Ji aliyekê aborîyê û sazûmana ve jî wê, pêwîstî bi sazûmanên giring ên civakî wê hebê. Ku ew heza civakî bê afrînerê wê aborîyê wê demê ew bi rêxistinkirineka rast a ji nava wê, ew wê karibê bibê xwediyê kifşkirinê. Di wê warê de bi zanebûna endamên civakê re wê, li dijî pêvajoyên şer ên rêveberîyan jî wê karibê were sekin in. Di roja me de rêxistinên li ser olê re ku ew bi tundrewi dihên pêşxistin wê yekser wê armanca wê, domandina pêvajoyên şer li ser serê civakan û bi wan re dizaynkirina wan û nava wan bê.

Di wê warê de valahiyên ku ew bi civakî û rêveberî di nava civakê de hena wê, rêveberî wê bi wê rengê wê li gorî xwe ew wê dagirin. Di wê rewşê de wê, civak wê, ji ber wan valahiyan wê bi xatariyên tûnakirina hebûna wan re wê rûbirû wê bîn hiştin. Rejim û desthilatdarîyên dema global wê bi wê rengê wê ji derfetên globalismê wê sûdbigirin. Lê bi awayekê bi rêxistinî civak ji nava xwe ve bi rêxistinkirina xwe û komelên xwe û ew bi wan xwe bi hişmendiyek rast bi rêvebibê wê ew kêmbimênê. Wê astangiyan jî wê dênê li pêşîyê. Lê divê ku mirov wê jî wê werênê li ser ziman ku wê derketên ku ew derkevin û pêşketinên ku ew bi civakî derketina li holê jî wê, karibin bibina temenê pêşketinên mazin di dema globalismê de. Çendî ku civak pêşkevê wê sînorê rêvebirina rêveberîyê wê tang bibê. Di wê warê de wê, di serî de mirov dikarê weke aliyekê giring wê werênê li ser ziman. Di wê warê de wê, temenê pêşketinê bi civakê re wê, pêşxistinên rêyên zêde ku ew dinava xwe de bi xwe re hilbijêrê bê. Wê hingê wê, xwe yekser û mecbûrî wê mihtacê rejimê û kirinên wê yên xirab wê nebîne. Di wê warê de wê karibê li dijî wê bisekinê. Lê dema ku ew nebê wê, nikaribê hem li dijî wê bisekinê û hem jî wê nikaribê xwe jî ji hêrîşên ji wê û dordorê jî biparêzê. Di cihane global de pêşxistina rê û bijartinên nû ên din jî wê, weke rewşeka ku ew nebê nabê bê.

Cihane global a roja me hin bi hin bi ber pêvajoyên nû ve diçe. Mecbûra ku ew dem bi dem li hemberî pêşketinên nû xwe nûbikê. Di wê pêvajoya nûkirinê de jî wê, hêzên ku ew li wê serdest in wê xwediyê kifşkirinê bin. Di wê rengê de bihêzbûna civakî, saziyên wê yên komelî û di rewşek civakî li aliyê xwe bisekinê wê, temenê kifşkirinên wê jî bê. Çendî ku aqil pêşkeve wê tirs jî wê werina derbaskirin. Ev jî wê, weke aliyekê din bê. Tirsên ku ew di nava civakê û komên çap û hwd re piştî rûxîna reel sosyalismê



ku ew bûn wê, ji ne fahmkirina wan ya dema nû bê. Ew jî wê, bi xwe gihandina fahmkirin, teorî û felsefeyek rast a li gorî dema nû re wê werina li şûn hiştin. Di dema nû de wê, civak wê bi rêxistinîyên xwe nava xwe re wê derkeve li pêş. Komelên civakî ên sîvîl û hwd wê, zêdetirî wê giringiya wan wê bi hêzbûna civakê re wê mirov karibê fahmbikê. Di wê rengê de wê, di serî de mirov dikarê fahmbikê, li ser wê bisekinê û wê werênê li ser ziman.

-



